# SERXWEBÛN

JI SERXWEBÛN Û AZADIYÊ BI RÛMETTIR TIŞTEK NÎNE

Sal: 43 / Hejmar 509 / Gulan 2024


# Şehîd Gulana PKK'ê Ne



## Êdî Azadiya Fîzîkî Ya Rêber Apo Nayê Astengkirin

**Dûran Kalkan**

Em weke Tevgera Azadiya Kurdistanê û gelê Kurd 18'ê Gulanê roja şehîdan dijîn. Em di meha şehîdan de ne. Têkoşîna azadiya Kurdistanê yekemîn şehîdê xwe di 18'ê Gulana 1977'an de li Dîlokê da. Rêhevalê Hakî Karer ji aliyê encamên şerê taybet ê faşîst û qirker ve hat şehîdkirin. Rûpel:6

## Pergala Modernîteya Kapîtalîst Dixwaze Hêzên Alternatîf Bêbandor Bike

**Ji Serxwebûn**

Ji beriya ku têkiliyên wan bi Tirkiyê re zêde bibin, beriya ku bên wê xalê, dê bixwazin PKK'ê pir lewaz bikin. Di rewşek wisa de eger PKK bihêz bimîne dê tevahiyan sabote bike. Ji bo rê ji rewşek wisa re venebe, dê piştgiriya xwe ya bi PDK û Komara Tirk re zêdetir bikin. Rûpel:2

## Li Rojhilata Navîn Şer û Çareserî

**Sabrî Ok**

Astengiya herî mezin û cidî ya li hemberî demokratîkbûna Rojhilata Navîn teqez dewleta Tirk e. Hişmendiya Osmaniya Nû di AKP'ê de bihêz e. Polîtîkayek berfihbûnê ya ji dîrokê wan tê dişopînin. Bi Bi nêrîna Împaratiriya Osmaniyan gelên herêmê kêm dibînin. Niha li Sûriyê û Iraqê ji dagirkeriyê jî wêdetir xistiye nava axa xwe. Rûpel:34

## Li dijî dewletdariya Netewe Civaka Polîtîk û Exlaqî

**Rêber Apo**

Modernîteya kapîtalîst civakên Rojhilata Navîn bi tenê bi dewleta netewe bi qazoxekî qehîm ve girê neda; ji bandora bombeya atomê ya avêt Hîroşîmayê bi deh qatan zêdetir, bi dewletokên netewe bombe kir. Rûpel:20

## Pergala Hevserokatiyê Çi ye? Ne Çi Ye?

**Xebat Andok**

Piştî ku Rêber Apo paradîgmaya xwe ya civaka demokratîk, ekolojîk, azadixwaziya jin pêşxist şûnve pergala hevserokatiyê anî rojevê. Rûpel:37






## Em Di Meha Şehîdên Gulanê De Pêngava Xwe Ya Azadiyê Li ser Xeta Serkeftinê Pêş Bixin

**Komîteya Rêvebir a PKK'ê**

Em ketin nava pêvajoyeke nû ya 1'ê Gulanê. Wekî tê zanîn 1'ê Gulanê, roja yekitî, hevgirtin û têkoşîna çîna karkeran e. Ji bo Kurdan jî 1'ê Gulanê rojeke girîng e. Çima? Ji ber ku Kurd piraniya xwe karker û kedkar in. Rûpel:25

## Di Perwerdê De Rêbaz û Nûbûn

**Şiyar Amed**

Wekî ku êdî li seranserî cîhanê tê zanîn, bi saya rastiya tekoşîna 50'î salî derbas dike ya PKK'ê ve, PKK bûye tevgerek perwerdê; dema ku hîna pêngavên destpêkê li Enqerê dihatin avêtin destpêkiriye û hetanî roja me bi şiklê perwerdeya Rêbertî timî bi kûr kirinê ve berdewam kiriye. Rûpel:15

# Pergala Modernîteya Kapîtalîst Dixwaze Hêzên Alternatîf Bêbandor Bike

**Ji Serxwebûn**

Şerekî 150 salî mijara gotinê ye. Başe ev şer çi îfade dike? Bersiva vê pirsê di aliyê pêşketinên rojane de girîng e. Ji aliyê dewlet û desthilatê ve rêya terzê mêtîngeriya kapîtalîst ji Ewropayê re vedibe. Dewlemendiyên li cîhanê li Ewropayê kom dikin. Piştî ku danehevên sermayê li Ewropayê tên komkirin, dewlet û çerxa kapîtalîst ji bo parvekirina serweriya ya li ser cîhanê û ji nû ve parvekirina mêtîngeriyê pev diçin. Pergala mêtîngeriya kapîtalîst destpêkê li Îtalyayê, piştre li Hollandayê û piştî Hollandayê jî li Îngiltereyê pêş dikeve. Îngiltere dewlemendiyên li cîhanê desteser dike û împaratoriya cîhanê ava dike. Elmanya jî bi terzek cuda yê mêtîngeriya danehevek sermayê ya ji nîva sedsala 19'emîn xurttir û cudatir pêş dixe. Di bin navê bazirganiyê de desteserkirin tê kirin, Elmanya jî ji vê desteserkirinê para xwe dixwaze. Nakokî û pevçûna di nava pergala modernîteya kapîtalîst de bi vî awayî çêdibe. Sosyalîstan ji vê re got, 'qonaxa emperyal a kapîtalîzmê'. Di esas de şer li ser çavkaniya madeyên xam, çavkaniyên enerjiyê, desteserkirin û venêrîna rêyan, ji sermayê par girtinê bû. Ji bo kombûna sermayê, çavkaniyên dewlemend ên madeya xam, çavkaniyên enerjiyê, bazar û pirbûna şêniyê li Asyayê bû. Ji bo vê jî pirsgirêk veguhestina vê bazar û çavkaniyên li Asyayê ya ber bi Ewropayê ve bû. Di rêyên kurt û hêsan de mêtînkirina van çavkaniyan armanca wan bû. Ji bo vê jî di navbera komên sermayê yên cuda de têkoşîn pêş ket. Dema têkoşînek wiha bi lihevkirinan çareser nebû, ketin nava şer. Di encamê de Şerê Cîhanê yê Yekemîn bi vî awayî destpê kir.

Hindistan nîv mêtîngeha Îngiltereyê bû. Îngiltereyê, ji bo di ser Hindistanê re bi awayekî hêsan çavkaniyên Asyayê mêtîn bike, xwest rêyên nû bibîne. Di başûrê Efrîqayê re derbasbûna Hindistanê û ji wir dewlemendî bidestxistin pir zehmet, mezêxker û pir dem digirt. Bi vî awayî xwestin destpêkê vê projeyê di ser Osmaniyan re pêk bînin. Ji ber ku rêyek kurttir û erzantir bû. Di dema Abdulhamît de, di serê sedsala 20'an de ev proje anîn rojevê û demek dirêj hat nîqaşkirin. Siltanê Osmaniyan Abdulhamît ev ji bo Osmaniyan wek pêşwendiyek dît û ev di astekî de bikar anî. Xwest hîn zêdetir tawîzan bigire, lê her ku çû nakokî zêde bûn.

Projeya rêyê projeya Îngiltereyê bû. Îngiltereyê dixwest di ser Hindistanê re bazirganiya Asyayê bike, di ser axên Osmaniyan re dakeve Hindistanê. Abdulhamît jî demek dirêj di navbera Rûsya, Fransa, Îngiltere û Elmanyayê de bazarî kir. Herî dawî ji bo çêkirina rêya hesinî ya Berlîn-Bexdayê bi Elmanyayê re lihev kir. Sermaya Îngilîzan ev rê nedidan Elmanyayê, jiber dibetiya windakirina Hindistanê hebû. Bi vî awayî şerê jêre dibêjin Şerê Cîhanê yê Yekemîn destpê kir û pêşiya rê girt. Destpêkê derbasî Misrê bû, qada Ereban bidest xist, kete Korfezê û Iraqê. Projeya ku bi Osmaniyan re li ser lihev kiribû neda Elmanan. Şer heta hilweşîna Osmaniyan çû. Rojhilata Navîn a Osmaniyan weke 25 netewdewletokan parçe bû. Tevahî weke encamên Şerê Cîhanê yê Yekemîn derketin holê.

Şerê Cîhanê yê Duyemîn jî wiha ye. Tenê di aliyê aborî de temaşekirin wê kêm be, jiber ku di pergala sermayê de mêtîngerî esas e û hertişt ji bo mêtînkirinê ye. Pevçûnên bîrdozî jî, pevçûnên siyasî jî ji bo mêtîngerî û karê ye. Jixwe tişta jêre tê gotin kapîtalîzm kara zêde û dizî ye.

Çavkaniya enerjiyê li Asyayê ye, rê jî li Rojhilata Navîn e. Wê demê dê ev rê çawa çêbibe, ji bo mêtîngeriyek hêsan û rihet dê di destê kê de be? Ev 150 sale şer li ser vê bingehê didome. Pevçûn û nakokiyên di nava pergala kapîtalîst a gerdûnî de ev ava dike. Hîtler faşîst bû, lê polîtîkaya ku Hîtler dişopand, Şerê Cîhanê yê Yekemîn jî polîtîkaya sermaya Elman bû. Wî jî dixwest rêya Asya û Hindistanê bidest bixe. Dema Rojhilata Navîn a Osmaniyan parçeyî dewletan bû û hat desteserkirin, vê carê jî xwest ji Qefqasya di ser Îranê re biçe Hindistanê. Stratejiya Elman li gorî wê ava bû û ev stratejî li ser bingehê Şerê Cîhanê yê Duyemîn dewam kir. Emerîka, Îngiltere û Yekîtiya Sovyetê li dijî vê stratejiyê lihev kirin û li Îranê bicih bûn. Çawa ku di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de qada Ereban girtin, Osmanî têk birin û ev rê rawestandin, vê carê jî Îran dagir kirin û pêşiya projeyê girtin. Li ser vê bingehê piştgiriya Yekîtiya Sovyetê jî kirin, çeperek ava kirin û careke din Elmanya bin



xistin. Elmanya di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de jî bin ket. Ev şer heta roja me jî bi rê û rêbazên cuda berdewam kir, mêtîngerî nesekinî.

Şerê Cîhanê yê Sêyemîn jî bi şerê Korfezê re destpê kir. Piştî ku di sala 90-91'î de rêveberiya Seddam Kuweyt dagir kir, DYE yê venêrîna xwe li ser Korfezê çêkir. DYE yê bi 150 hezar leşkerî xeta Siûdî, derdora Korfezê xiste bin venêrînê. Ev ne rewşek asayîbû, heta wê demê hêzek wiha ya DYE yê li herêmê tunebû. Piştî wê êrîşa 11'ê Îlona 2001'an kir hêncet, êrişî Efxanistan û Iraqê kir. Efxanistan û Iraq xiste destê xwe. Xeteriyên ku ji Iraqê bên ji holê rakir. Iraq ji rewşa hêzeke ku xeteriyê çêbike derxist û Efxanistan jî ji rewşa rêbûyînê derxist. Rêya berê ya Hevrîşmê jî di Efxanistanê re derbas dibû. Çîn-Efxanistan-Îran-Kurdistan-Tirkiye-Ewropa ev jî rêyek bû, hinekan dixwest vê rêyê jî pêş bixin. Rêveberiyên El- Qaîde û Talîbanê kirin hêncet û şerê Efxanistanê dan destpêkirin. Ev şer jî ji bo sabotekirina vê rêyê bû. Lê paşê derket holê ku DYE ne li dijî Talîbanê bû. El-Qaîde jî ji xwe rêxistinek bû ku DYE yê birêxistin kiribû. Eger bi kesî re şer neke jî, hêzên ku berê dabû avakirin kir hêncet û ev hêz di şer de bikar anîn.

Bi şerê Ukraynayê re jî rêya ku diçû bakurê Derya Reş sabote kirin. Piştre bi hewl, dîplomasî û têkoşînan re lihevkirinek çêkirin û ev jî li Hindistanê îlan kirin. Di encama dîplomasiyek giran a sê salan de tê dîtin ku lihevkirinek wiha çêkirin. Li DYE yê rêveberiya Trump deriyên xwe ji cîhanê re got, Biden li dijî wî derket û bû desthilat. Biden bi armanca deriyên DYE yê li ber cîhanê veke, serweriya DYE yê ya li cîhanê çêbike bû desthilat. Ev bi awayek vekirî îlan kir. Bi şerê Ukraynayê jî venêrîna xwe ya leşkerî li ser Ewropayê bihêz kir. Ji bo ewlehiya Ewropayê Îsveç û Fîlandiya xistine nava NATO'yê, Deryaya Baltikê xiste bin venêrîna xwe. Ji ber ku Ewropa bi qutbûna ji NATO'yê re rûbirû bû. Fransa û Elmanyayê amedekariya avakirina artêşa Ewropayê dikirin, heta rêxistinên dendik avakiribûn, projeyên xwe yên li ser vê bingehê avakiribûn. Macron got, "Mejiyê NATO'yê miriye. Êdî NATO dikeve nava pelên dîrokê". Lê NATO'yê Deryaya Baltikê xiste bin venêrîna xwe û bû hegemonya leşkerî ya DYE yê. Ji berê hîn zêdetir venêrîna leşkerî ya DYE yê li ser Ewropayê derket holê.

**Ewropa kete bin venêrîna DYE yê ya leşkerî û bazirganiyê**

Li aliyekî jî projeya rê ya Çîn û Rûsyayê vala derxistin. Ji ber ku ew proje proyek bû dikarî pêk bê. Rêya herî kurt, erzan û bilez bû. Tevahî rêya bejayî bû. Dema ji Çînê û Rûsyayê biçûya Ewropayê, Berlînê, Londrayê û bigiha Parîsê dê qezenca wan pir zêde bibûya. Sermaya Ewropayê ji bo tifaqek wiha bixwestek bû. Ji xwe bi Rûsya û hinek hêzên din re gelek tifaqên enerjiyê çêkiribûn, dixwestin vê hîn zêde pêş bixin. Eger ev pêk bihata dê NATO belav bibûya, venêrîna

DYE yê li ser Ewropayê dê nemabûya. Dê Ewropa bi serê xwe bibûya vîn. Dê têkiliyên Ewropayê bi Çîn û Rûsyayê re pêş biketina. DYE yê bi şerê Ukraynayê re ev rê sabote kir û rewş berovajî bû. DYE yê hem di aliyê leşkerî de hem jî di aliyê bazirganiyê de bandora xwe ya li ser Ewropayê pêş xist. Niha ji herdemê zêdetir Ewropa kete bin venerîna lerşkerî û bazirganiyê ya DYE yê. Ewropa ji Çîn û Rûsyayê hat qutkirin. Ev jî dibe "Projeya Sazûmaniya Cîhana Nû" ya DYE yê. DYE yê ev proje piştî têkçûna Yekîtiya Sovyetê îlan kir. Hinekan ji bona vê gotin "DYE dixwaze împaratoriyê ava bike". Niha DYE ji bo avakirina Împaratoiya xwe gavan diavêje. Ev pêşketin girîng in. Ji ber wê jî şerê Ukraynayê weke ku tê fikirîn Pûtîn dernexist. Çawa ku Seddam bi daxwaze xwe êrişî Kuweytê nekir, hinekan berê wî da wir, Pûtîn jî rewşên heman jiya. Hinek amedekariyên Pûtîn hebûn, qala 'Yekîtiya Slav' dikir. Dîsa împaratoriya Rûsyan li Ukraynayê ava bibû. Nedixwestin dewlemendiyên Ukraynayê bicih bihêlin, lê di esasî de dixwestin ewlehiya rêya enerjiyê çêbikin. Rûsyayê ne bi şerekî, dixwest bi operasyonekî Zelenskî bêbandor bikin. Lê dema Pûtîn vala derket êriş pêş ket û wêranî çêbû. Di encamê de, di şerê Ukraynayê de polîtîkaya serweriya DYE yê biser ket. Ukrayna bi erdê ve bû yek. Rûsya ji gelek armancên xwe dûr ket. Çîn û Rûsyayê hewl dida Ewropayê bikişîne gel xwe û DYE yê bi tenê bihêle. Ev polîtîkaya Çîn û Rûsyayê bû. Ev polîtîka jî vala derket. DYE bi awayê leşkerî û siyasî ser ket. Rûsya û Çîn ji Ewropayê dûr xist û Ewropa xiste venêrîna xwe.

Civîna yekemîn a piştî destpêkirina şerê Ukraynayê vê tomar dike. Îsveç û Fîlandiya jî xistin nava NATO'yê. Ev bû civîna girêdana Ewropayê bi NATO'yê ve. Piştî wê DYE yê bi Israîlê re hevdîtin çêkir. Paşê çû Siûdiyê konferans çêkirin. Wê demê gotin, "DYE dixwaze NATO'ya Rojhilata Navîn çêbike. Dixwaze NATO'ya Ereban çêbike". Piştî li Pasîfîkê rakêşî çêkirin vê carê jî nirxandina "Dixwaze li Pasîfîkê jî NATO'yekî çêbike" hatin kirin. Pêşketinên niha li ser bingehê van pêngavan çêbûn. Israîl û Siûdiyê di civînên xwe de lihevkirinên bingehîn çêkirin. Eger baldarbin, bandora polîtîkaya Siûdiyê ya li Rojhilata Navîn zêde bûye. Jiber ku DYE yê di salên 90'î de Siûdî xiste bin venêrîna xwe û li wir xwe di aliyê leşkerî de bihêz kir. Di rastiyê de Siûdiyek tune ye, pergala venêrîna leşkerî ya DYE yê heye. Siûdiyê hem dewlemendiya petrola xwe bikar anî, hem jî ji rewşa DYE yê sûd wergirt û rolê xwe zêde kir. Piştî hevdîtinan tifaqa Îran-Siûdiyê pêş ket. Piştî wê hevdîtinên Misir-Îranê çêbûn, tifaq çêkirin. Elmanya û Misrê lihevkirinên aborî yên herî stratejîk îmze kirin. Sisî birin Elmanyayê. Êdî Fransa ji Misrê dernediket.

Di vê navberê de her çendî Tirkiyê gelek nerazîbûn nîşan dabe jî, DYE yê di çarçoveya NATO'yê de Yunanîstan arast.



Hêza leşkerî şand Yunanîstanê, pihêt kir, teknîk da Yunanîstanê û amede kir. Israîl û Siûdî jî amede kirin. Di encamê de bi pêşengiya DYE yê, di serî de Îngiltere, Fransa, Elmanya, sermaya Ewropayê li ser yê Asyayê tifaq çêkirin. Rêya ku li Hindistanê hat îlankirin ev bû. Rêya ku ji Tirkiyê, Iraqê û Korfezê biçûya Hindistanê bi Şerê Cîhanê yê Yekemîn re sabote kiribûn. Rêya ku ji Qafqasyayê biçûya bi Şerê Cîhanê yê Duyemîn re hatibû sabotekirin. Niha jî DYE rêya di ser Yunanîstanê, Israîl û Siûdî re biçe Hindistanê vedikin. Li ser vê rêyê lihevkirinek çêkirin, ev îlan jî kirin. Li gorî vê xebat destpê kirin. Siûdî niha xwe ji nû ve sazûman dike. Jixwe Prens Salman got 'emê Siûdiyek nû ava bikin' û ev îlan kir. Li gorî vê rêyê dixwazin bajarên nû jî ava bikin. Bi vî awayî dê Erebîstana Siûdiyê ji nû ve organîze bikin.

### Hêzên hegemonîk projeya rêya Tirkiyê xirab kirin

Dema ev proje hat îlankirin, Tirkiyê bi awayek vekirî ragihand ku dê sabote bike û got, "Emê destûrê nedin hewldanek ku em ne di navê de bin". Piştî wê şerê Karabaxê derxist. Bi şerê Karabaxê re qaşo xwest bi tengava Zengezorê rêyek alternatîf ava bike. Azerbeycanê xwest di ser Hazarê re, rêyekî ji Asya Navîn ber bi Tirkiye û Ewropayê ve ava bike. Pişta xwe da komarên Tirkî û xwest enerjiyê Asya Navîn bi rêyek wiha di ser Tirkiyê re biherikîne Ewropayê. Rûsyayê got "em piştgiriya vê dikin". Ermenî ji Karabaxê derxistin û Karabax dane Azarbeycanê. Beşê Ermenîstanê yê bi Îranê re sînor ma. Dixwestin li wir rêya hesin çêbikin, vê rêyê kurt û erzan bikin. Dema wisa bû Îran û Israîl xistin dewrê. Israîlê Azarbeycan xiste tevgerê, Îranê bi Ermenîstanê re lihevkirin çêkir. Di encamê de Azarbeycan û Ermenîstanê jî lihevkirin çêkirin û

Di rastiyê de rêya hatî îmzekirin dê ne di ser Israîl-Xezayê de biçûya Derya Spî. Di sala 2015'an de rêya destpêkê dê ji Siûdiyê biçûya Israîlê, ji Urdunê, ji sînorê Iraqê derbasî Bakurê Sûriyê bibûya, ji wir jî derbasî Derya Spî bibûya û biçûya Qibrisê. Hatina DYE yê ya ji bo Kobanê, li dijî DAIŞ'ê beşdarbûna wî ya şer, avakirina koalîsyonê ne ji bo dijberiya DAIŞ'ê yan jî dostaniya Kurdan bû. Di esasî de vekirina vê rêyê bû. Di vê xalê de ji bo Kurd sûdê negirin Tirkiye di salên 2015-2016'an de hete tevgerê, ji bo vê rêyê sabote bike. Komara Tirkiyê di têkiliyên bi NATO'yê de pir zehmetî da DYE yê. Wê demê DYE yê li hemberî vê daxwaza Tirkiyê serî tewand. Destûr da Tirkiyê ku hem ji Cerablûsê bikeve Sûriyê, hem jî ji Çelê bikeve Iraqê, di sînorê fermî de leşkeran derbas bike û êrişên dagirkeriyê destpê bike. Tirkiye xwe dipişpişîne û dibêje, "Min korîdora terorê asteng kir", lê rewşek weke astengkirina korîdora terorê tune ye. Ya rast hewldana astengkirina rêya enerjiyê ye.

Dema wisa bû DYE yê erê kir û xwest vê bi şer asteng bike. Bi vî awayî DYE yê ev şer kir hêncet û got ev herêm bê ewlehiye, bê istixrar e. Pişte ji bo avakirina rêya Hindistan, Siûdî, Israîl û Yunanîstan ji vî şerî sûd girt. Gotin, "Li vir ewlehî û istixrar tune ye, wê demê pêwîste tevahî derdorên sermayê cihê herî bi istixrar, yanî cihê niha hilbijêrin". Ev bi herkesê da pejirandin. Tirkiyê, ji bo Kurd sûdê negirin xeta di sînorê xwe de sabote kir, lê ew bixwe jî ma ji derveyî rê. Eger beşdar bibe dê li Qibrisê beşdar bibe, yan dê ji derve bimîne. Di rastiyê de dê rê di sînorê wî re derbas bibûya, dê sûd jê bigirta. Eger weke rêya berê ya Hevrîşmê bixebitiya û di sînorê Tirkiyê re derbas bibûya, dê pir sûd jê bigirta. Lê eger di Bakurê Sûriyê re derbas bibûya dê Tirkiyê gelek qezenç bikira, lê ji bo Kurd sûdê jê negirin rê sabote kir.

Projeya Çînê jî hebû. Di bin navê 'Nifşek, projeyek a rê' de projeyek amede kiribû, pêşkêşî derdorên sermayê kiribû, kiribû pirtûk û belav kiribû. Ya herî nêzîk rêya Ukraynayê bû. Li gel ku Rêya Hevrîşmê bê istixrar dihat dîtin jî lê dihat nirxandin. Ji ber ku rêya niha ya herî dirêj û biha ye hilnedibijartin, ev rê di rêza sêyem an jî çarem de bû. Dema rêyên pêşdatir ji ber sedemên pevçûnan sabote bûn neçar man di vê rêyê de lihev bikin. Ji ber wê jî wisa tê fêmkirin ku Îranê jî di vê rêyê de bi wan re li hev kiriye. Lihevkirina Îranê bi Siûdî û Misrê re di rastiyê de lihevkirina bi DYE yê re bû. Jiber ku dê rê di Tengava Hurmuzê re derbas bibûya. Heta Îran tevlî nebûya û erê nekiriba ne gengaze ku evqas enerjî û madeya xam di Tengava Hurmuzê re derbas bibe.

Xeza weke pirsgirêkekî derkete pêş, jiber ku dê rê di wir de bikeve deryayê, şer jî ji bo wê derket. Jixwe DYE û Israîl ji bo vê amedebûn. Dixwestin Hemasê bêbandor bikin û bixin bin venêrîna xwe, tenê li hêncetekî digeriyan. Êrişa Hemasê tam jî di demeke wiha de çêbû. Erê Hemasê êriş kir lê kî berê Hemasê da Israîlê, tişta ku divê bê lêpirsîn ev e. Bi dibetiyek mezin Erdogan berê Hemasê da şer. Çawa ku ji Seddam re roniya kesk pê xistin û gotin tu dikarî bikevî Kuweytê, Erdogan jî ji bo sabotekirina vê rêyê amede bû, jiber ku ev bi awayekî vekirî ragihandibû. Jêre gotin eger Hemas êriş bike dê ev projeya rê têk biçe, di ser Erdogan re Hemas xistin tevgerê. Dema ku piştî êrişa Hemasê DYE Û Israîlê êriş kirin, vê carê jî got bila agirbest çêbibe û hewl da Hemasê xilas bike. Wê demê ma napirsin, ma te ji bo agirbestê şer îlan kir! Ya rast hewldana sabotekirina projeya rêya enerjiyê bû. Lê di kêliya pêşî de fêm kirin ku ketine xefikê û hinekan berê wan daye wir. Ev tevahî ne tenê Israîl dike, hemû bi destê

DYE yê ye. Çawa şer destpêkir DYE yê tevahî keştiyên xwe yên şer şandin Derya Spî ya Rojhilat û dorpêç kir. Çawa ku dema Seddam kete Kuweytê bi 150 hezar leşker Korfez girt, bi hênceta şerê Xezayê jî tevahî keştiyên xwe yên şer û balefirên xwe şande Derya Spî ya Rojhilat û ew der girt. Ji ber cihê derbasbûna rê bû. Hem çavkaniyên enerjiya Derya Spî ya Rojhilat digire, hem jî ewlehiya rê çêdike.

Rûsyayê xwest hinekî liber rabe, bi bandor nebû. Diyare ku dê Xeza bibe benderek mezin a enerjiyê. Dê ji wir bikevin deryayê. Çavkaniyên xaza xwezayî ya li bakurê Xezayê bi vî awayî xistin destê xwe. El-Qaîde bêbandor kirin –çawa ku ji bo bêbandorkirina baldarbin rêyên deryayî pir in. Ji Hindistanê heta Siûdiyê jî derya tê. Pirsgirêka yekane ewe ku rê hem dirêj e hem jî biha ye. Lê li ser rêyek wiha lihev kirin.

**Heta PKK neyê lewazkirin rê pêş nakeve**

Libnan parçeyî ye, ne diyare dê çawa birêxistin bikin. Bandorek mezin a xwenîşandanên Hizbullahê tune ye. Sûriye hinekî xeternak e. Ji ber ku hêzên li dijî vê projeyê hene. Rûsya û Tirkiye ne. Rûsyayê Ukrayna winda kir, li Derya Spî ya Rojhilat jî îtiraza xwe winda kir. Gelê wê di Sûriyê de beşdarî vê projeyê bibe, yan li dijî derkeve, ev ne diyar e. Dema biçin Qibrisê jî bi Tirkiyê re zêde bibin, beriya ku bên wê xalê, dê bixwazin PKK'ê pir lewaz bikin. Di rewşek wisa de eger PKK bihêz bimîne dê tevahiyan sabote bike, ji ber projeyek wê ya alternatîf heye. Ji bo rê ji rewşek wisa re venebe, dê piştgiriya xwe ya bi PDK û Komara Tirk re zêdetir bikin, dê êrişên xwe zêdetir bikin. Zexta li Îmraliyê li ser vê bingehê ye. Dê bixwazin êrişên xwe zêdetir bikin. Ji bo vê Hizbulkontra weke Hemasê xistin dewreyê. Dixwazin li Bakur spartekên PKK'ê tune bikin. Çawa ku Hemasê bi zora şer Xeza ji Rêxistina Rizgariya Filistînê stand, niha li Bakur jî ji bo bandora PKK'ê bi Hizbulkontrayê bikşînin, şer jî di nav de dixwazin her tiştî bikin.

heyî bên dîtin û danin holê. Wiha dê çi çêbibe, gelo dê ev rê bê birêxistin? Dema vê rêyê rêxistin dikin, gelo dê çawa nêzî Îran û Tirkiyê bibin? Gelo wê bi temamî li hev bikin? Ev dibetî jî heye. Eger weke beriya 1975'an li Tirkiye û Îranê rêveberiyên girêdayî xwe çêbikin, li hemberî Rûsyayê dibe ku NATO'ya Rojhilat ava bikin. Ev jî dê li ser temamkirina qirkirina Kurdan gengaz be. Ev dibetiyek e.

Piştî şerê yekemîn Tirkiye, piştî şerê duyemîn Îran weke netewdewlet hatin avakirin. Di sala 1979'a de her çendî Şoreşa Îslamî nakokî jiya be jî derket holê. Niha di şerê sêyemîn de qada Ereban bihêz dikin. Projeyê dispêrin wê. Gelo dê



DAIŞ'ê hatin û beşdarî şer bûn-hewl dan Talîbanê bêbandor bikin, dê Hemasê jî bêbandor bikin. Ev tevahî ji aliyê DYE yê ve hatibûn birêxistinkirin. DYE yê ev tevahî di bin navê Projeya Kemera Kesk de rêxistin kirbûn. Ev hêz ji bo li hemberî bandorên Yekîtiya Sovyetê hatibûn avakirin. Ev hêz bi xwe derneketibûn holê, ne hêzên cewherî yên Rojhilata Navîn bûn. Rêber Apo gotibû, "Ev tevahî hêzên provekasyonê ne. Sîxwirên modernîteya kapîtalîst û pergala sermayê ne. Nûnertiya civakîbûna Rojhilata Navîn nakin". Ev nirxandin nirxandinên pir girîng bûn.

Hewl didin rêya enerjiyê birêxistin bikin. Wê di Xeza, Israîl, Qibrisa Başûr re derbas bibe û biçe Yunanîstanê. Eger dê Tirkiye bikeve rojevê. Dê Trkiyê li gorî vê projeyê ji nû ve sazûman bikin. Dê hewl bidin ku rêveberiyek xizmeta vê bike, vê bipejirîne bînin ser kar. Dema ku wisa nebe û li gorî wan tevnegerin, dibe ku Tirkiyê jî weke Sûriyê parçe bikin. Bi kurtayî wê nakokî û rakêşa navbera Tirkiye û pergalê zêdetir bibin. Dê hîn zêdetir li ser siyaseta Tirkiyê rawestin. Lê beriya bigihin wir dê hewl bidin PKK'ê, dijberên xwe bêbandor bikin û tune bikin. Heta PKK'ê pir lewaz nekin nikarin rê pêşde bibin. Jixwe ji bo PKK Iraqê negire 10 salan destûr dan ku Seddam 10 salan li Bexdayê bimîne. Bi komployê re Rêber Apo birin Îmraliyê, piştî wê jî êrişî Seddam kirin. Niha jî beriya ku têkiliyên wan

Em dikarin bi giştî wiha bêjin: Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de Osmanî belav kirin. Lê biencambûna şer weke li Lozanê lihevkirina bi Komara Tirk re çêbû. Ew jî li ser bingehê qirkirina Kurdistana Osmaniyan çêbû. Peymana Lozanê qirkirin ji Kurdan re anî. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn li Îranê careke din Şahtî xistin dewrê, piştgirî danê, pêşketina li Mihabatê perçiqandin. Wê jî qirkirin ji Kurdan re anî. Wê demê pêwîste encamên şeran ji aliyê Kurdan ve baştir bên nirxandin.

Di encama Şerê Cîhanê yê Yekemîn de Tirkiye, di encama Şerê Cîhanê yê Duyemîn de jî Şahtî ji nû ve hatin zindîkirin. Herdu jî li ser qirkirina Kurdan pêk hatin. Pêwîste rastiyên çiqas bikarin vê projeyê pêk bînin, gelo dê sabote bibe? Ev hîna ne zelal e. Hertişt bi dawî nebûye û hîna rê nehatiye çêkirin.

Sala pêşiya me dê li DYE yê hilbijartin çêbibin. Gelo dê encamên hilbijartinê çawa bin, pêwîste li wê jî binêrin. Gelo dê rêbaz û polîtîkayên niha bidomin! Pir bi baldarî tev digerin, ji ber ku di 150 salên borî de alternatîfên pergalê jî pêş ketin. Di pêvajoyek wiha de destpêkê şoreşên Ewropa yên 1848'an çêbûn, pêvajoyên jêre digotin pêvajoyên şoreşên demokratîk ên bi pêşengiya burjuvayê çêbûn. Lê bi awayek esasî dema ev pêvajo destpêkirin, di çaryeka dawî ya sedsala 20'an de Komîna Parîsê çêbû. Di salên 90'î de pêvajoya Şerê Cîhanê yê Sêyemîn destpê kir. Di vê pêvajoyê de jî li Bakur PKK'ê serhildan pêş xistin, bandor li parçeyên din jî kirin. Ev li kêleka hev çêbûn. Şoreşgerên Rûs pêvajoya Şerê Cîhanê yê Yekemîn nirxandin. Lê tevahî bizavên şoreşger ên alternatîf di wê pêvajoyê û wan nakokiyan de derketin holê. Anarşîzim, Marksîzm û tevahî bizavên din di wê pêvajoyê de derketin holê û weke alternatîf pêş ketin.

**Pergala kapîtalîst di mijara PKK'ê de pir baldar e**

Piştî Şerê Cîhanê yê Yekmîn li Rûsyayê Şoreşa Cotmehê çêbû. Gotin wê bibe alternatîfek berfihe. Lê gelek mijar di nîqaşê de bûn, nîqaşên teorî dimeşandin. Gotin, 'Şoreşa Cîhanê', qet nebe ev perspektîfa 'Şoreşa Ewropa' hebû. Dema li Rûsyayê Lenîn ber bi desthilatê ve diçû baweriya dê şoreşa Ewropayê çêbibe û şoreş belavî Ewropayê bibe hebû. Wisa bawer dikirin dê li ser lingan bimîne. Lê hewldanên li Elmanya û qadên din sernektin, dema şoreş belav nebû veguhertin teoriya 'li yek welatî şoreş'. Dest ji şoreşa cîhanê û Ewropayê berdan. Fransa û Îngiltereyê xwestin bi êrişên leşkerî şoreşê hilweşînin. Yekîtiya Sovyetê li hemberî vê Artêşa Sor birêxistin kir. Di rastiyê de ev di teoriya Marksîst de tune bû. Di encama têkoşînên leşkerî-siyasî yên di çaryeka yekemîn a sedsala 20'an de derkete holê. Serkeftinên di aliyê leşkerî-siyasî de jî veguherî sernektina di aliyê teorî de. Dewletek evqas mezin, dîktatorî û artêş weke lêgerîna parastina li hemberî êrişan derkete holê. Bi îddaya alternatîfiyê derket holê, lê dema evqas pêngavên kevneşopî hatin avêtin şoreş pêşde neçû. Kûrbûna bîrdozî çênekir, komînalbûn ava nekir, di encamê de dewletperesiyê kapîtalîzmek nû ava kir. Li hemberî yekdestiyê derdikevin. Lenîn got, "Em bi yekdestiyê re tê dikoşin, lê sermaya biçûk her roj rê ji yekdestiyê re vedike". Ji ber wê nirxandinek a wan bi jî awayî heye, pêwîste mijara milkiyeta taybet ji nû ve sermaya biçûk bigire dest. Dikaribûn tevahî êrişan bi milkbûna dewletê û

dewletperesiyê asteng bikin. Ew jî piştî 70 salan nû karî bê kirin. Lê ev jî bû sergûzeştek. Wê demê pergala moderniteya kapîtalîst ne evqas baldar bû. Niha di mijara PKK'ê de pir baldar in. Ji bo careke din rê ji rewşeke heman re venekin pir baldarî tev digerin.

Eger baldar bin artêşa Seddam şikandin, di Bexdayê de heps kirin. Heta kompIoya navnetewî çêkirin û Rêbertî bêbandor kirin, karîn 10 salan bi wê rewşê re bijîn. Dema Rêbertiyê têkoşîn dimeşand êrişî Bexdayê nekirin. Teqez ji bo ku PKK Başûrê Kurdistanê negire, belavî Iraqê û qada Ereban nebe kirin. Jixwe armanca bingehîn a Operasyona Hêza Çakûç astenkirina ketina PKK'ê ya ji bo Başûrê Kurdistanê bû. Ji bo vê jî piştgirî dan Tirkiyê û hêzên din. Ev 32 sale ev lihevkirin didome. Li ser vê bingehê êriş heye. Ev konsept hîn didome. Niha jî bi heman şêweyî nêz dibin. Hewl didin rêyek wiha ava bikin. Cara yekem li hev kirin. Ev 150 salbû pergala sermayê li hev nekiribû. Her çendî Rûsya û hinek hêz ji derveyî vê lihevkirinê mabin jî, wisa xuyaye gewdê bingehîn li ser vê rêyê lihev kirine. Gelo evê pêk bê? Gelo dê projeyek 150 salî çêbibe. Gelo mêtînkirina Asyayê ji aliyê Ewropayê ve dê bi tiştek wiha re pêk bê? Ev tevahî rewşên nû ne. Berê projeyên wiha hebûn, lê tucar pêk nehat. Niha DYE bi îdea ye, kedek mezin dide, dê bixwaze hêzên alternatîf bêbandortir bike. Çînê Rûsya destek dikir, lê ne girêdayî Rûsyayê ye. Di şerê Ukraynayê de ev rewş bi zelalî hat dîtin. Piştî wê Çînê, Hindistan û Siûdiyê re lihev kir. Serokê Çînê çû DYE yê. Eger Rûsya alternatîfekî pêş bixe û sûdê bide wî dibe ku biçe wir jî. Ev cuda ye, lê li gorî rewşa niha Çîn jî bi rêya nû ve tê girêdan. Tifaqek wiha ya li ser bazirganiyê cara yekem e çêdibe. Gelo dê ser bikeve, gelo encama Şerê Cîhanê yê Sêyemîn dê avabûna rêyek wiha be! Ev xisûsên ku divê bên nîqaşkirin. Baldarî tev digerin. Di vê mijarê de ya herî li ser baldarin PKK ye. Astengkirina alternatîfa moderniteya demokratîk e. Ji bo vê jî dikarin hertiştî bikin. Pêvajoyek wiha qasî ku gelek xeteriyan hildigire, derfetan jî dide. Pêwîste ev bên dîtin û li gorî wê têkoşîn bê meşandin, xebatên moderniteya demokratîl li Kurdistanê û qadên din bê berfirehkirin.

Jixwe li Îranê cemserên berê belav bûn. Reformîstên jêre digotin muxalefet li holê neman, desthilatperestên tund lewaz bûn. Wisa xuyaye dê li Îranê polîtîka ji nû ve tevlîhev bibe. Tê dîtin ku dê li Tirkiyê jî wisa be. Kiliçdaroglu ket, hat dîtin ku muxalefeta li dora Kiliçdaroglu kom bibû, ne muxalefeta desthilat ji Erdogan bigirtiba, berovajî muxalefetek bû ku Erdogan li ser desthilatê digirt. Ev muxalefet belav bû. Dê li Tirkiyê bi zorê siyasetê ji nû ve sazûman bikin.

Siyaset bê bîrdozî dîtin, tenê nirxandina pergala kapîtalîst û li hemberî wê avanekirina alternatîfê dê yekalî be. Nirxandina siyasetê ji bîrdoziyê qut teqez xelet e. Dê rêya nû ya enerjiyê Tirkiyê çawa bandor bike, dê polîtîkayên çawa derbikevin holê, em vê bi zelalî nizanin. Lê hîna vê pergalê hebûnek biçûk a Kurdan nepejirandiye. Hatin û li Başûr bicih bûn, lê pêşiya Kurdan venekiriye. Nêzîkatiya wan a ji bo PDK'ê jî ji bo şerkirina li dijî PKK'ê ye.

**Komara Tirk ava Kurdan ji bo qirkirina Kurdan weke amûra bazarê bikar tîne**

Dibe ku tam nayê zanîn encamên çûyîna Erdogan a ji bo Bexdayî çi ne. Lê tê gotin ku di aliyê leşkerî de tiştek nû tune ye. Li ser bingehê feraseta têkoşîna hevpar a li dijî terorê, PKK weke rêxistinek terorê ya qedexe îlan kirin. Gotin, "Em nahêlin di axa me de li dijî cîranên me çalakî bên kirin". Tiştên Iraqê pejirandine ev in. Ji derveyî vê rêveberiya Iraqê di aliyê leşkerî de tiştek din nedaye, di rastiyê de tiştek ku bide jî tune ye. Hêzek wî ya wisa jî tune ye. Weke Tirkiye dixwaze, hêza Iraqê tune ye bikeve şer, berjewendiyek wê jî têde tune ye. Ew jî berjewendiyên xwe difikirin. Di vî alî de lêgerîna avakirina hêzek hevpar ji Zaxoyê heta Silêmaniyê pêk nehatiye. Dixwestin ku rêveberiya Iraqê, PDK, YNK û hêza Tirkmen hêzek hevpar çêbikin, yekîneyên xwe yên zirxî li vê herêmê bicih bikin, tevahî Qada Parastina Medyayê ji Başûr ve dorpêç bikin û bi tevgerek sandewîç bi temamî biperçiqînin. Negihiştine planek wiha ya leşkerî. Lê ava Dîcle û Firatê weke çekekî bikar tînin. Ava Kurdan di qirkirina Kurdan de weke amûrek bingehîn a bazarê bikar tînin.

Iraqê pejirand ku di beranberî avê de PKK'ê derzagonî îlan bike. Heman demê de pêşketina bazirganiyê pejirandin. Weke amûra pêşxistina bazirganiyê jî projeyek rê ya bi navê "Projeya Rêya Pêşketinê" derxistin holê. Ev projeya rêyê tevlîhev e. Têkiliya wê bi têkoşîna gerdûnî re heye, rêya enerjiyê ya ku Erdogan dixwest di ser Ermenîstan-Azarbeycanê re çêbike hat sabotekirin. Niha jî qala vê rêyê dikin. Erdogan di lêgerînê de ye ku alternatîfekî ji rêya li Hindistanê hatiye îlankirin re bibîne. Diyare ku dê ev têkoşîna berjewendiyan a di nava pergalê de kûrtir bike. Ne tenê bi Tevgera Azadiyê û Iraqê re têkildar e. Heman demê de aliyek wê yê wiha heye. Projeyek wiha Îran jî nepejirîne, DYE û Israîl jî napejirînin. Jixwe îlan kirin ku dê bi hinek dewletên Ereb re vê projeyê pêk bînin. Kuweytê demildest ragihand ku beşdar nabe. Emîrtiya Ereban dimîne. Wezîrê Karê Derve yê DYE yê ji bo venêrîna xebatên rêya enerjiyê ya li Hindistanê hatiye îlankirin bike, li herêmê hevdîtinan didomîne. Tişta Tirkiye dike lêgerîna rêya duyemîn e. Weke rêya ku dixwest bi şerê Ermenîstan û Karabaxê çêbike. Rêveberiya AKP-MHP'ê rêyên alternatîf pêş dixin da ku vê projeyê sabote bikin. Jixwe li Xezayê Hemas xiste nava şer da ku sabote bike. Têkoşînek wiha ya cidî heye.

Li aliyê din ev rêya ku Komara Tirk dixwaze çêbike ji bazirganiyê zêdetir leşkerî ye. Di bin navê rê de dê zêdetir leşkeran bixin axa Iraqê. Dê zêdetir cihan bigirin, hîn zêdetir encamên şer û istixbaratê bicih bikin. Di rastiyê de dorpêça hevpar a dixwazin di navbera Zaxo û Silêmaniyê de çêbikin bi hêza xwe û di bin navê qaşo bazirganiyê de, di ser vê rêyê re li derveyî Kurdistanê çêbikin. Ji bo wê kar dikin. Ev rê ji derveyî Kurdistanê çêdibe. Deriyê Xelîl Îbrahîm vala derdixin. Li gel vê jî PDK heta dawiyê piştgiriyê dike. Wê demê rantê didin PDK'ê, ji ber ku ji vir tu sûd nayê girtin, wê demê pere didin PDK'ê ku evqas bi daxwaz û razî ye. Başûrê Kurdistanê winda dike, PDK pere qezenç dike. Lihevkirina wan wiha ye. Li qada Iraqê ya ku Rêber Apo weke qada navîn pênase dike, qada herî zêde ji bo pêşketina xeta netewa demokratîk dibîne, bi vî awayî dixwazin ji bo pêşketinek şoreşgerî ya demokratîk bigirin. Ya duyemîn, hîn zêdetir hêza leşkerî û istixbaratî li wir bicih dikin. Dixwazin di ser wir re şerê qirkirina Kurdan bimeşînin. Hewl didin êrişên leşkerî yên xwe dispêrin istixbara li Başûrê Kurdistanê û Iraqê zêdetir bikin. Hêza ku ji dewleta Iraqê negirtine, dixwazin bi hêza xwe di bin navê vê projeya rêyê de pêk bînin.


Dikarin vê jî bêjin: Tenê parastina azadiya Kurdan têrê nake, nêzîkatiya ku şoreşa herêmê, şoreşa cîhanê, demokratîkbûna cîhanê pêşbîn neke, tenê azadiya netewî ya Kurdan pêşbîn bike şaş e. Kurdistan ne qadeke wiha ye. Di sedsala 20'an de li gelek cihan tevgerên rizgariya netewî pêş ketin û vana pişta xwe da Yekîtiya Sovyetê. Lê li Kurdistanê tiştek wiha çênebû. Dema Rêbertî çû Romayê projeya çareseriyê ya 8 madeyî pêşkêş kir. Li beranberî wê Rêbertî birin girtîgeha Îmraliyê. Pêwîste em vê baş bizanin. Pêwîste dest ji xeyalên tenê li Kurdistanê azadî, tenê ji neteweya Kurd re azadî berdin. Dema em li van pêvajoyên dîrokî û bûyerên dîrokî dinêrin xuya dike ku wisa ye. Wê demê pêwîste sekna me ya li hemberî hevkarî û xiyaneta ku PDK di nav de ye diyarker e. Kurdperestiyek teng heye, hestên netewî yên lewaz ji rastiyên berbiçav dûr tên girtin. Ji bo ev xiyanet û hevkariya Kurdan rast bê fêmkirin, li hemberî wê têkoşînek bi bandor bê meşandin, pêwîste serkeftina şoreşgerî ya demokratîk hevkarî û xiyanetê bêbandor bike.



Li aliyê din Kampanyaya Azadiya Gerdûnî ev nîşanî me kir: Paradîgmaya moderniteya demokratîk dikare li tevahî cîhanê alîgirên herî bihêz bibîne. Çawa ku di salên 1970'an de Kurdîtî tune dibû, hatibû ber keviya kendal û qirkirin ber bi temambûnê ve bû, dema fikrên Apoyî cihê ku diketê alîgir qezenç dikir, niha jî weke ku cîhan dişibe Kurdistana salên 70'an. Bandora Kampanyaya Azadiya Gerdûnî wê tîne bîra mirov. Di salên 90'î de piştî hilweşîna sosyalîzma pêkhatî tevahî hêvî û baweriya pêkhatina sosyalîzmê û komînalîzmê ji holê rabûn, niha jî em di cîhaneke wisa de dijîn. Komên biçûk ên mane li ber xwe didin. Di nava civakê de nakokî tune ye, jin û ciwan di nava lêgerînên nû de ne, li aliyekî dixeniqin, li aliyê din jî di nava lêgerînên hebûnê de ne. Dema paradîgmaya nû digehe van beşan dibe hêvî, vejînê çêdike. Vejîna PKK'ê ya li Kurdistanê jî wiha bû.

■■■

# Êdî Azadiya Fîzîkî Ya RÊBER APO Nayê Astengkirin



***Bi awayek diyar bi lîstok û fêlbaziyan azadiya fîzîkî ya Rêber Apo desteser dikin. Pergala Îmraliyê tê domandin. Dixwazin mirovan fêrî vê bikin. Pêwîste em vê bi temamî red bikin. Pêwîste em bi herkesî bidin redkirin. Cihê gotinê nemaye û tê dîtin ku fêlbazî û lîstok tenê bi mezinkirina têkoşînê dikarin ji holê bên rakirin. Roj roja têkoşînê û rakirina qiyametê ye. Herkes li cihê ku lê ye pêwîste bi hêza xwe ya herî dawî bike, li dijî vê bêhiqûqî û bêexlaqiyê derbikeve. Pêwîste Pêngava me ya Azadiya Gerdûnî bigehe astek wiha, berfirehî û bandorek wiha qezenç bike, piralî bibe.***

*Girêdayî azadiya fîzîkî ya Rêber Apo me roportajek bi Endamê Komîteya Rêvebir a PKK'ê Dûran Kalkan re çêkir. Em vê roportajê diweşînin.*

**-Li pişt helwesta CPT yê ku piştgiriya pergala êşkence, tecrîd û qirkirinê ya li Îmraliyê dike û piştî wê daxuyaniya sosret a Wezareta Dadê ya Komara Tirk, sê meh cezayê disiplînê, lîstok, hişmendî û rastiya pergalek çawa heye? Bandor û kêmaniyên Kampanyaya Azadiya Gerdûnî ku li ser vê bingehê hat pêşxistin çi ne?**

Dûran Kalkan: Di destpêkê de ez Rêber Apo ku berxwedana dîrokî ya li Îmraliyê pêş xistiye silav dikim. Weke tê zanîn pergala êşkence, tecrîd û qirkirinê ya li Îmraliyê ji aliyê kompolya navnetewî ve derketiye holê. Êrişa kompolya navnetewî ku di 9'ê Cotmeha 1998'an de destpêkir, bi 15'ê Sibata 1999'an re derbasî rehendek din bû. Ev êriş êrişeke ku siyaset û hişmendiya qirkirinê ya li Kurdan ferz dike. Êrişek a pergala ku ev derxistine holê ye.

Hişmendî û pergala qirker piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn, bi Hevpeymana Lozanê ku di 24'ê Tîrmeha 1923'an de hatiye îmzekirin re derkete holê. Bi vê hevpeymanê re Kurdistan hat çarparçekirin, civaka Kurd ji tevahî mafên xwe yên siyasî û demokratîk hat mehrûmkirin, yanî pêvajoya tunehesibandin û tunekirina Kurdan destpê kir. Heman demê de li Rojhilata Navîn pergala netewdewleta Tirk hat pejirandin û li ser vê bingehê hewl dan pergala netewdewletê ku qirkirina Kurdan pêşbîn dike ava bikin. Di rastiyê de hegemonyaya gerdûnî ya bi Şerê Cîhanê yê Yekemîn re derket holê, xwe li ser vê bingehê şêwe kir. Vê şêwekirinê hewl da xwe bi saziya "Cemiyet-î Akvam" ku di navbera herdû şeran de pêş ket bidomîne. Piştî Şerê Cîhanê yê Dûyemîn jî ev sazî bi navê Neteweyên Yekbûyî pênase kirin. Li gel ku navê wê "Neteweyên Yekbûyî" ye jî, hîn zêdetir tê wateya 'Dewletên Yekbûy'. Ji ber ku dewletên li ser rûyê erdê di saziyek wiha de hatin gel hev û bi vî awayî serweriya dewletê ya li ser cîhanê çêkirin.

Avabûna pergalek wiha li Rojhilata Navîn li ser modelên netewdewleta Tirk û Îranê pêş ket û di vê avabûnê de Kurd xistin nava pêvajoya îmkarkirin û tunekirinê. Bêguman li hemberî hişmendî û siyasetek wiha li çar parçeyên Kurdistanê nerazîbûn, berxwedan û serhildan pêş ketin. Hîna hişmendiya Kemalîst xwe birêxistin dikir, hewl dida li Enqerê di aliyê siyasî de xwe sazî bike, Kurdên Koçgiriyê xweserî xwestin. Piştî Hevpeymana Lozanê jî berxwedan mezin bûn û berdewam kirin; Di 1925'an de bi pêşengiya Şêx Seyîd, di 1930'an de li Serhedê, dîsa di 1937-38'an de li Dêrsimê bi pêşengiya Seyîd Riza berxwedanên Kurdan ên li dijî siyaset û hişmendiya qirkirinê ya mijara gotinê ye pêş ketin. Ev berxwedan ne tenê li parçeyê Kurdistanê yê di bin dagirkeriya netewa Tirk de, heman demê de li parçeyên din jî pêş ketin. Berxwedana Simko Şikakî ku di sala 1930'an de li Rojhilatê Kurdistanê pêk ket ji vê re mînakek e.

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn jî li Rojhilatê Kurdistanê "Komara Kurd a Mihabatê" pêş ket û li ser vê bingehê bû yek ji berxwedanên herî bi bandor a netewî ya Kurdistanê. Li Başûrê Kurdistanê jî piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn bi pêşengiya Şêx Mehmûd Berzencî berxwedanek bi bandor pêş ket. Li ser vê bingehê heta îlankirina "Keyatiya Kurdistanê" çû. Li vî parçeyê Kurdistanê tu caran berxwedan bi dawî nebûne.

Di encamê de Kurdan li dijî qirkirin û tunekirina bi Peymana Lozanê re derketî holê, parçeyî jî be helwestek siyasî pêş xistin û li ber xwe dan. Yanî ev pergala gerdûnî ya tunekirin û înkarê, hişmendî û siyaseta wê weke heyî nepejirandin, li hemberî wê li ber xwe dan. Xusûsa duyemîn jî, ev berxwedan di çi astê de pêk hatibin jî di encamê de bin ketin û hatin perçiqandin. Encamek serkeftî ya siyasî negirtin. Bêguman gelek sedemên vê weke parçeyî, lewaziya bîrdozî û rêxistinî, kêmaniya rêbertiyê, kêmaniya stratejî û teqtîkê hene. Armanca me ne ewe ku kêmaniyan lêkolîn bikin, armanca me îfadekirina encamê ye ku encama wê jî binkeftin û perçiqîn bû. Weke tevgera herî dawî binkeftina PDK'ê ya bi pêşengiya Berzanî di sala 1975'an de bi Hevpeymana Cezayirê re kete dîrokê û ev pêvajo bidawî bû. Li Kurdistanê qonaxek nû dest pê kir. Ji sala 1973'an de bi pêşengiya Rêber Abdullah Ocalan weke tevgera ciwanên ronakbîr gavavêtina pêvajoyek nû çêbû. Destpêkê encamên binketina van tevgerên berxwedanê yên kevneşop hatin nirxandin, di çarçoveya pêşketinên li Kurdistan, Rojhilata Navîn û cîhanê de xwe weke tevgerek nû ya berxwedanê derxist holê. Tevahî kêmanî û şaştiyên berxwedanên beriya xwe bi rexneyek şoreşgerî nirxand, li ser bingehê derbaskirina van şaştî û kêmaniyan xwe birêxistin kir û pêş xist.

Ev tevger piştî Gulana 1977'an li ser bingehê "Xeta Tola Şoreşgerî" gav bi gav kete pêvajoya berxwedanek çekdarî. Di sala 1978'an de xwe bi navê "PKK" kir partî. Li kêleka partîbûnê, bi berxwedana Hîlwanê ya 78'an re, dîsa bi berxwedana Sîwerekê ya 1979'an de li Kurdistanê bû tevgera herî bi bandor a bîrdozî û siyasî. Li hemberî derbeya faşîst a 12'ê Îlona 1980'an li Girtîgeha Amedê berxwedanek herî mezin a dîrokî pêş xist, li aliyê din jî li qada Libnan-Filistînê li hemberî rejîma faşîst-leşkerî ya 12'ê Îlonê amedekarî û xebatên bîrdozî, siyasî û leşkerî meşand. Ev xebat di payîza 1982'an de careke din derbasî Bakurê Kurdistanê kir, bi çalakiyên 15'ê Tebaxa 1984'an ên Erûh û Şemzînanê, li hemberî hişmendî û serweriya Komara Tirk a faşîst, qirker û mêtînger berxwedana Azadiya Kurd a demokratîkbûna Tirkiyê pêşbîn dike pêş xist.

Pêşketina vê berxwedanê ji yên beriya xwe cudatir bû, tevahî şaştî û kêmaniyên yên beriya xwe nirxand, li ser bingehê derbaskirina wan şaştî û kêmaniyan xwe pêş xist û her ku çû belavî parçeyên din ên Kurdistanê bû û gihişt asta tevgerek berxwedêr a netewî. Dema derbasî 1990'an bû, bi pêşengiya jinê li Bakurê Kurdistanê berxwedana gerîlla ya mijara gotinê ye veguherî şoreşa vejîna netewî û derbasî pêvajoya serhildanan bû. Ev rewşa ku pêş ket girseyên li parçeyên din ên Kurdistanê û derveyî welat jî bi kûrayî bandor kir, birêxistin kir û xiste tevgerê. Vê tevgerê, piraniya Kurdên li Ewropayê li dora xwe kom kir û karî piştgiriya wan bigire. Kurdên li Rojava jî ji bo têkiliyên bi Filistînê re bûn pir û hatin rewşeke ku herî zêde piştgirî dan berxwedanê. Ji wê jî girîngtir, ev derbeyên li pergala Komara Tirk ketin, di rastiyê de bingeha pergala netewdewlet a li Rojhilata Navîn hejand.

Pêşketinên di serê 1990'î de li cîhanê hatin jiyîn tên zanîn. Pêvajoya têkçûna Yekîtiya Sovyetê ye. Pêvajoyeke ku DYE yê weke yekane hêza sûper bi navê "Pergala Cîhana Nû" kete nava xeyalên împaratoriyek gerdûnî. Ji bo vê pêkbîne jî di 2'ê Tebaxê de rêveberiya Seddam Hisên teşwîq kir ku êrişî Kuweytê bike. Piştî wê DYE yê pêşengî ji şerekî nû yê cîhanê kir ku ji bo hegemonya xwe ya leşkerî-siyasî şênber bike û hewl dide Rêya Enerjiyê ya nû di ser Hindistan-Tengava Besrayê-Erebîstana Siûdî-Israîl-Derya Spî ya Rojhilat-Qibrisê re bigihîne Yunanîstanê.

Vê rewşê li ser Iraqê bandorek mezin çêkir û li Başûrê Kurdistanê valahiyek mezin çêkir. Ji bo pêşketina Tevgera Azadiyê zemînek girîng derkete holê. Hegemonyaya kapîtalîst a gerdûnî ya bi pêşengiya DYE-Israîl-Îngiltereyê ev rewş ji xwe re weke xeterî û gefek mezin dît. Rêveberiya niha ya Hewlêrê ku di esas de ji bo astengkirina PKK'ê û şerê li hemberî PKK'ê hatiye avakirin

derkete holê. Ji ber ku zemînek mezin ji yekbûna serhildanên li Bakurê Kurdistanê û valahiya li Başûrê Kurdistanê re, ji avabûna "Hikumeta Şer a Behdînan û Botanê" ku PKK'ê pênase dikir û weke projeyek projeyek rizgarkirina Kurdistanê didît re çêbû. Ji bo vî zemînî ji holê rakin, Tevgera Azadiya Kurd biperçiqînin, bi vî awayî qirkirina Kurdan a bi Hevpeymana Lozanê re şênber bibû bidomînin, rêveberiya Başûrê Kurdistanê hat birêxistinkirin. Li ser vê bingehê plana ku tevgera PKK'ê di Başûrê Kurdistanê de dorpêç bikin û tune bikin hat danîn.

Li ser vê bingehê tevahî êrişên NY û rêxistina NATO'yê ku di ser Komara Tirk re dixwestin PKK'ê tune bikin, êrişên ku di salên 90'î de meşandin, dema bi têkoşîna di bin pêşengiya Rêber Apo û berxwedana gerîlla de şikestin, pergala cîhanî ya kapîtalîst ji bo vê rewşê derbas bike komploya navnetewî ku rasterast Rêber Apo tesfiye bike pêş xist û plan kir. Ji 9'ê Cotmeha 1998'an ve ev xistiye pratîkê. Di rastiyê de komployê armanc dikir ku heta 15'ê Sibata 1999'an bi awayekî kujer ne diyar Rêber Apo ji holê rakin. Dema ev êriş biser neket, li ser bingehê tunekirina Rêber Apo weke komploya 15'ê Sibatê 1999'an xwe plan kir û birêxistin kir. Di vê çarçoveyê de Rêber Apo ji Kenyayê revandin û radestî Komar Tirk kirin.

Pergala Îmraliyê pergalek wiha ye ku ji aliyê hêzên mijara gotinênê bi armanca serkeftina êrişa komploya navnetewî hat rêxistinkirin. Rêber Apo bi awayê fîzîkî nehate tunekirin. Xwestin Rêber Apo bi vê pergala Îmraliyê ya êşkence, tecrîd û qirkirinê darve bikin. Dema li hemberî berxwedana Rêber Apo û gel me bi ser neketin, vê carê jî pêşbîn kirin ku bi polîtîkaya rizandinê Rêber Apo bi awayek bîrdozî, siyasî û rêxistinî tune bikin.

Eger baldarbin, xwestin "Pergal û hişmendiya nehesibandin û tunekirina gelê Kurd" ku bi Hevpeymana Lozanê re hat avakirin, di sala 1998'an de bi komploya navnetewî re mîsoger bikin û bidomînin. Ji 15'ê Sibata 1999'an ve dixwazin vê bi pergala Îmralî ya êşkece, tecrîd û qirkirinê bidomînin. Ji ber wê jî pergala Îmraliyê pergaleke ku hewl didin hişmendî û siyaseta qirkirina Kurdan di nav de pêk bînin. Di rastiyê de ji 15'ê Sibata 1999'an ve êrişên qirkirina Kurdan li ser bingehê pergala Îmraliyê ya êşkence, tecrîd û qikirinê dimeşînin û rêve dibin.

**Ji derveyî pejirandina hebûn û azadiya Kurdan tu şansek din ê pergalê tune ye**

Rêber Apo bi terz û hestên xwe tunekirina fîzîkî ya ku di 9'ê Cotmeha 1998'an de lê dihat ferzkirin vala derxist û bin xist. Heman demê de êrişa darvekirinê ya 15'ê Sibata 1999'an û komplo dahûrand, li ser vê bingehê Tirkiye hişyar kir û ev êriş vala derxist. Piştî wê li hemberî polîtîkaya rizandinê ya Îmraliyê, li aliyekî berxwedanek bêhempa pêş xist, li aliyê din li ser bingehê guherîna paradîgmayê hişmendiyek nû, bi xeta bîrdozî-polîtîk û pratîka têkoşînê êrişa Îmraliyê vala derxist. Li ser vê bingehê karî têkoşîna Îmraliyê ser bixe. Yê ku winda kirî hişmendî û siyaseta qirkirina Kurd bû. Ya ser ketî jî azadiya Kurd û demokratîkbûna Tirkiye ye ku Rêber Apo nûnertiya wê dike. Ya ser ketî hişmendî û siyaseta Rêber Apo ye.

Niha eger em van pêvajoyan li vir bi kurtayî vedibêjin, sedemên wê rast fêmkirina bûyerên di roja me de ye. Başe, ev rastfêmkirin wê çawa çêbibe? Dema em vedigerin û li vê pêvajoyê dinêrin, bi awayekî zelal ev derdikeve pêş: Di rastiyê de qirkirina ku sed sale li Kurdan ferz dikin, bi êrişên komploya navnetewî ya pergala qirkirin, tecrîd û êşkenceya Îmraliyê re bi ser neket. Li hemberî berxwedan û têkoşîna azadiyê ya Rêber Apo vala derket û bin ket. Ji ber wê jî bin keftiye û tevgera êrişek sernekeftiye. Di vî alî de qirkirina Kurdan, li hemberî Kurdan meşandina êrişa qirkirinê, ji vê encamgirtin ne gengaz e. Ji ber ku asta herî jor a vê êrişê êrişa komploya navnetewî û pergala Îmraliyê ya tecrîd, êşkence û qirkirinê ye. Siyaset û hişmendiya qirker a gerdûnî, bi van êrişan re jî nekarî ser bikeve, ji derveyî vê êrişek din a bike namaye. Ji ber vê jî pergal neçare hebûn û azadiya Kurdan bipejirîne, rêzê ji vîna demokratîk û azadîxwaziya gelê Kurd re bigire. Rêyek din a pergalê tune ye.

Eger baldarbin tu encam û pêşketinên ku domandina pergala Îmraliyê, Rêber Apo di nava vê pergalê de hiştinê nemaye. Di aliyê bîrdozî û siyasî de rewş wiha ye. Di têkoşîna Îmraliyê de hişmendî û siyaseta qirker winda kiriye, siyaset û hişmendiya azadîxwaz û demokratîk qezenç kiriye. Wê demê domandina pergala Îmraliyê, domandina van mercan bê wate ye.

Li aliyê din, di aliyê hiqûqî de jî derfetên domandina pergala Îmraliyê ya êşkence, tecrîd û qirkirinê ji holê rabûne. Têkoşîna tê meşandin, rastiyên derketine holê nîşanî herkesî daye ku êrişa komploya navnetewî çiqas ji derveyî hiqûqê ye. Di encama vê têkoşînê de Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê neçar kir ku beriya 12 salan biryara ji nû ve darizandina Rêber Apo bigire. Diyare ku ji nû ve darizandinek wiha wê biryara dadgeha Îmraliyê xirab bike, rê ji azadiya fîzîkî ya Rêber Apo re veke. Paşverûyên êrişên komploya navnetewî û pergala Îmraliyê ya êşkence, tecrîd û qirkirinê hatin gel hev, li rê û rêbazan geriyan. Ji ber vê sedemê jî bi hêncetên cuda biryara DMME yê nexistin meriyetê. Di ser Tirkiyê û Lijneya Ewropayê re serî li fêlbazî û lîstokan dan û pêkanîna biryara DMME yê asteng kirin. Li gel vê jî pêvajoyê berdewam kiriye, pergala Îmraliyê 25 salên xwe temam kiriye. Pergala Îmraliyê pergalek navnetewî ye. Pergala NY û YE yê ye. Ji ber wê jî pêwîste Hiqûqa Yekîtiya Ewropayê bimeşe. Li gorî Hiqûqa Yekîtiya Ewropayê cezayên herî giran jî herî dereng piştî 25 salan pêwîste ji nû ve bêne darizandin. Ev mercek e. Piştî 25 salan pêwîste ji bo her



sala derbas dibe darizandinek bê kirin. Ji ber vê jî hêzên ku biryara sala 12'emîn a DMME yê pêk neanîne, niha jî bi ji nû ve darizandina 25 salan re rûbirû mane. Di encamê de çawa ku biryara DMME yê bi fêlbazî û lîstokan vala derxistin, ji bo astengkirina ji nû ve darizandina 25 saliyê, ji bo Rêber Apo bi awayê fîzîkî azad nebe li fêlbaziyên cuda digerin. Cezayên disiplînê yên tên dayî rêbazên fêlbaziyan ên ji bo astengkirina vê rewşê ne.

### Dema pirsgirêk dibe Rêber Apo û Kurd CPT tu rayedariya xwe bikar nayîne

Me di daxuyaniyên CPT yê de ev bi awayek zelal dît. Li aliyekî jî xwe weke duvikê rêvebirina vê pêvajoyê danî holê. Ev rêvebirin Lijneya Ewropayê û dewletên di nava wê de ne. Ji ber wê jî Komara Tirk, yanî dîktatoriya faşîst a AKP-MHP'ê jî di nava vê de ye. CPT neçar ma xwe weke saziyek girêdayî rêveberiya Tayyîp Erdogan îlan bike. Ji ber ku erka xwe neanî cih. Li aliyê din jî tê gotin ku CPT ne wiha ye. Di rastiyê de di mijarên din de xwedî raye ye. Vê rayeya xwe di wateya astengkirina êşkenceyê, çareserkirina pirsgirêkan de bikar tîne. Lê dema mijar dibe Rêber Apo û Kurd CPT tu rayedariya xwe bikar nayîne. Hertim helwestek li gorî Komara Tirk û siyaseta Lijneya Ewropayê girt, helwestek siyasî pêş xist. Ji ber wê jî hem li Tirkiyê û Lijneya Ewropayê pêkanîna biryara DMME yê ferz nekir, hem jî ji nû ve darizandina 25 salî ya Rêber Apo weke mercekî nedanî pêşiya Tirkiyê û Lijneya Ewropayê.

Rêveberên CPT yê dibêjin ku DMME'yê erkên xwe bicih neanîne. Ev rast e. DMME yê biryara xwe ya ji nû ve darizandinê pêk neanî, yan jî neda pêkanîn. Halbûkî weke dadgeha bilind doz li gel DMME yê ye. Pêwîste ev dadgeh her tiştî venêrîn bike û bide kirin. Lê nekir. CPT yê jî ji bo bike ferz nekir.

Wezîrê Edaletê yê rêveberiya Erdogan xwe spart pergala navnetewî, Lijneya Ewropayê, saziyên wê yên weke CPT û DMME yê û ev gotinên bêrûmet, tijî dijûn û henekpêkirinê bikar anî. Ew weke Wezîrê Edaletê dîtin jî, gotinên wî cidî girtin û bersiv dayîn jî bê wate ye. Ji ber ku bi rastî jî tu têkiliya xwe bi hiqûqê û mirovayiyê re tune ye. Li ber çavê her kesî derew kir, rûyê wî jî sor nebû, li çavê her kesî nêhêrî û axivî. Jiber ku ew qirkerek e, mêtîngerek e, faşîst e û dijminê Kurdan e. Ji kesekî wiha tenê ev tê hêvîkirin.

Lê pêwîste ev pirs bê pirsîn, kesekî wiha çawa dikare evqas bi awayek vekirî derewek wiha bêje? Cesareta kirina gotinek wiha ji ku digire, pişta xwe dide kê û vê derewê dike? Bêguman pişta xwe dide siyaset û hişmendiya qirker a navnetewî. Pişta xwe dide helwesta Lijneya Ewropayê, CPT û DMME yê. Pergala dewlet a NY vê rewşê erê dike. Ji ber ku wezîrê Komara Tirk jî ji hişmendî û siyasetek wiha tê, bi rihetî weke ku henekê xwe bike diaxive.

Herî dawî di ragihandinê de derket ku cezayek disiplînê yê sêmehî hatiye dayîn. Parêzeran ev îfade kir. Tê gotin ku ev ji bo hevdîtinên bi Rêber Apo re bên astengkirin tên kirin. Di rastiyê de ji bo ji nû ve darizandina Rêber Apo asteng bikin, ji bo negihe azadiya xwe ya fîzîkî rêbazên fêlbazî û lîstokan in. Di rastiyê de bi vê ji hiqûqê re kirasan çêdikin. Di 25'ê Adara 2021'an de Rêber Apo axaftinek kurt li ser telefonê bi birayê xwe Mehmet Ocalan re kir. Rêber Apo got, "Çima parêzer nayên, di vê rewşê de hûn hemû sûc dikin". Ev gotina Rêber Apo vê îfade dike. Dixwest bi parêzerên xwe re hevdîtinê pêk bîne, li hemberî fêlbazî û lîstonên mijara gotinê ne tê bikoşe, mafê xwe yê ji nû ve darizandinê bikar bîne. Digot, "Bila parêzerên min bên, ezê bi wan re hevdîtinan pêk bînim, karên min ên ez plan bikim hene". Lê çûyîna parêzeran hat astengkirin. Bi vî awayî me nekarî bi têkoşîna xwe ya ji derve jî van lîstokan têk bibin.

Hema bêje herkes bû hevkarê vî sûcê fêlbazî û lîstokan. Pêwîste em vê bibînin. Niha pêwîste her sal piştî sala 25'ê Rêber Apo ji nû ve bê darizandin. Lewra ji bo vê asteng bikin wê bê navber û hertim cezayên displînê bidin. Kirasan li hiqûqê dikin. Qaşo dadgeha ku Îmraliyê rêve dibe ceza dide. Bi vî awayî dibêjin, "Ji bo kesê mijara gotinê ye rewşek neyînî tê xêzkirin. Ji bo wê jî pêwîstî ji nû ve darizandinê re tune ye. Jixwe me darizandiye û ceza daye. Hûn jî erê bikin". DMME, CPT, Lijneya Ewropayê û tevahî saziyên têkildar jî vê wiha dipejirînin. Bi yekdestî lîstokek wiha derxistine holê. Niha jî bi hev re didomînin. Di sala 25'ê de azadiya fîzîkî ya Rêber Apo asteng kirin. Wê hewl bidin di salên pêşiya me de jî vê bi vî awayî bidomînin.

Eger baldarbin weke bîrdozî-siyasî tu hênceta ku Rêber Apo li Îmraliyê bigirin nemaye. Binketine. Rêber Apo qezenç kiriye. Tişta yekane ya di destê wan de jî tolgirtina vê binkeftinê ye. Ji bo bi awayekî sadîstî tolê bigirin vê tecrîd û zextê pêk tînin. Di aliyê hiqûqî de jî derfeta wan a Rêber Apo li Îmraliyê bigirin nemaye. Li gorî pêwîstiyên hiqûqa Ewropayê divê Rêber Apo bi awayê fîzîkî azad bibe. Ji bo vê asteng bikin jî van cezayên qaşo disiplînê dixin rojevê. Bi vê fêlbaziyê li hiqûqa xwe dikin, kirasan lê dikin. Azadiya fîzîkî ya Rêber Apo asteng dikin û hîn zêdetir dixwestin asteng bikin.

### Bi awayê hiqûqî gelek derfetên teşhîrkirina rastiya Îmraliyê heye

Weke gel û Tevger, weke tevahî cîhana demokratîk û mirovayiya şoreşger pêwîste em vê rastiyê bi "Pêngava Ji Rêber Apo re Azadî û Ji Pirsgirêka Kurd re Çareseriya Siyasî" re ku di 10'ê Cotmeha 2023'an de hatibû destpêkirin, van fêlbaziyan vala derbixin. Pêngava Azadiya Gerdûnî ya ji bo azadiya Rêber Apo berfireh bikin. Di rastiyê de me ev fêlbazî û lîstok nedîtin û têkoşîna hiqûqî û siyasî qasî tê xwestin dernexiste holê. Erê, pêngava azadiya gerdûnî ya di 10'ê Cotmehê de hatî îlankirin pêşketinên girîng çêkirin. Di asta gerdûnî de belav bû. Hestiyariyek diyar çêbû. Hêzek mezin derxist holê. Lê ji aliyekî ve helwest û têkoşînek derengmayî bû. Pêwîste beriya niha bihata pêşxistin.

Li aliyê din aliyê hiqûqî yê vê têkoşînê pir lewaz e. Ji ber ku xebatên hiqûqî yên di asta gerdûnî de pergala Îmraliyê ya êşkence, tecrîd û qirkirinê teşhîr bike kêm tên meşandin. Halbûkî rastiya li Îmraliyê tu têkiliya xwe bi hiqûqê re tune ye. Meyla wê ya bîrdozî û siyasî çi dibe bila bibe, qada herî zêde bi hêsanî bê teşhîrkirin û her kes li dijî derkeve qada hiqûqê ye. Kesek nikare vê rewşê di nava hiqûqê de bicih bike. Ji ber wê jî kes napejirîne. Eger ne sondxwarê dijminayiya gelê Kurd û mirovayiyê be, eger hişmendî û siyaseta qirkirinê esas negire teqez bi wî awayî nêz nabe. Yên ku hema kêmek be jî bawerî û girêdana wan bi demokrasiyê re hebin rastiya Îmraliyê napejirînin. Di vî alî de derfetên ku rastiya Îmraliyê li tevahî cîhanê teşhîr bike pir in. Ji bo wê derfet jî guncaw in.

Di vî alî de me pêşketin çênekirin. Hem me di dema wê de fêlbazî û lîstok nedîtin, bi têkoşîna hiqûqî û siyasî derbas nekir, hem her çendî pêşketinên girîng derxistibe holê jî me Pêngava Azadiya Gerdûnî nedihand wê astê. Pêşketinek diyar heye lê ji bo valaderxistina van fêlbazî û lîstokan têrê nake. Pir diyare



ku pergala modernîteya kapîtalîst a cîhanî, yanî siyaset û hişmendiya qirkirina Kurdan, her cûr fêlbazî û lîstokan dike û di pêkanîna qirkirina Kurdan de bi israr e. Wê ji bo tunekirina Rêber Apo û qirkirina gelê Kurd her cûr êrişê pêk bîne. Di vê rewşê de wê hertişt bi têkoşîna li dijî vê bê qezençkirin. Wê demê pêwîste ev têkoşîn hem bi giştî, hiqûqî, bîrdozî, siyasî û rêxistinî bê meşandin. Hem jî bi rêbazên berfirehtir bê pêşxistin. Pêwîste heta asta dawî dewlemend bikin. Aliyek ê pejirandina vê nema ye.

Bi awayek diyar bi lîstok û fêlbaziyan azadiya fîzîkî ya Rêber Apo desteser dikin. Pergala Îmraliyê tê domandin. Dixwazin mirovan fêrî vê bikin. Pêwîste em vê bi temamî red bikin. Pêwîste em bi herkesî bidin redkirin. Cihê gotinê nemaye û tê dîtin ku fêlbazî û lîstok tenê bi mezinkirina têkoşînê dikarin ji holê bên rakirin. Roj roja têkoşînê û rakirina qiyametê ye. Herkes li cihê ku lê ye pêwîste bi hêza xwe ya herî dawî bike, li dijî vê bêhiqûqî û bêexlaqiyê derbikeve. Pêwîste Pêngava me ya Azadiya Gerdûnî bigehe astek wiha, berfirehî û bandorek wiha qezenç bike, piralî bibe. Ji ber wê jî pêwîste em hîn zêdetir teşhîr bikin. Hîn zêdetir serhildan çêbikin. Kiryarên li Îmraliyê zêdetir bên teşhîrkirin, nîşanî herkesî bidin. Taybet jî li Bakur û her aliyê Kurdistanê tevahî têkiliya bi vê pergalê re bê qutkirin, fêlbazî û lîstokên heyî vala bên derxistin.

Di van mijaran de heta niha sergûzeştek çêbû. Danehevek diyar û pêşketinên erênî hatin bidestxistin. Em dersê ji wan derdixin. Hîn jî şaştî û kêmaniyên me yên cidî hene. Niha pêwîste em bi van dersan li ser bingehê rexnedayînê têkoşînê bibandortir û baştir bimeşînin. Ji bo vê jî pêwîste em têkoşîna hiqûqî, siyasî, bîrdozî li her cihî û her qadê bi rêbazên dewlemend herdemî bikin. Pêwîste em bibin xwedî têkoşînek ku vê fêlbazî û lîstokê di asta herî jor de teşhîr bikin. Di vê wateyê de roj roja têkoşînê ye, roja rabûna ser piyan e, roja qiyamet rakirinê ye.

Bi vê boneyê ez careke din herkesê têdikoşe silav dikim. Di serî de jin û ciwan, bang tevahî gelê me, gelên Tirkiyê û Rojhilata Navîn, tevahî mirovayiyê, sosyalîst, demokratîk û mirovayiya azadîxwaz dikim ku ji bo azadiya xwe, cîhanek demokratîk têkoşînê mezin bikin. Li ser vê bingehê pêwîste herkes karekterê pergala Îmraliyê ya faşîst-qirker bibîne, herkes bizane ku azadiya fîzîkî ya Rêber Apo gihiştina jiyana azad û demokratîk e. Herkes Pêngava me ya Azadiya Gerdûnî bi awayek bi bandor, têgihiştî û rêxistinkirî pêş bixe.



**Hikumeta AKP'ê tişta ku dixwest ji serdana Iraqê negirt**

**- Di 16'ê Nîsanê de Komara Tirk li dijî Metînayê pêlek din a êrişan da destpêkirin. Piştî wê Erdogan serdana Bexda û Hewlêrê kir. "Projeya Rêya Pêşketinê" ku kiribû rojev û gelek hevpeyman îzme kirin. Encamên serdana Komara Tirk a ji bo Iraqê çi ne? Ev "Projeya Rê" çi ye, hêzên din li kudera wê ne? Cara yekem e Serokkomarekî Komara Tirk serdana Hewlêrê dike û bi merasimeke fişal hat pêşwazîkirin, pêwîste ev çawa bê dîtin?**

Dûran Kalkan: Serdana ku Erdogan di 22'ê Nîsanê li Bexda û Hewlêrê kirî di gelek aliyan de bû mijara nîqaşê. Hema bêje herkesî di her mijarê de nêrîn anîn ziman. Tevgera me jî di vê mijarê de gelek nirxandin kirin. Di rastiyê de pir tiştên ku nayên fêmkirin û zanîn tune ne. Lê niha di halê hazir de pratîkek derketibe holê tune ye. Hîn jî propoganda tê kirin ku tiştek çêbibe, bendewariyê çêdike. Lê encamek dernakeve holê. Pirsa gelo wê çi bibe nediyar dikin û herkesî dixin nava bendewariyê. Dibe ku bi vî awayî aliyê hember bê însiyatîf dihêlin û dixwazin bê bandor bikin.

Tayyîp Erdogan nîva hikumeta xwe bir Bexdayê. Ji raya giştî re ragihand ku gelek hevpeyman îzme kirine. Di nava hevpeymanan de "Projeya Rêya Pêşketinê" ku ji Tengava Besrayê heta Tirkiyê rêyek nû ya bazirganiyê derkete pêş. Hinek vê rêyê weke rêyek enerjiyê jî pênase dikin. Lê pêwîste wiha lê neyê temaşekirin. Erê, rêveberiya Tayyîp Erdogan hewl dide ji bo rêya enerjiyê ya di pêşengiya DYE yê de (Hindistan-Siûdî-Israîl-Qibirs-Yunanîstan) rêyek alternatîf ava bike. Lê rêya ku dixwest di ser Azerbaycan-Ermenîstanê re çêbike hat valaderxistin, bêbandor kirin. Erdogan û Hemasê hewldan rêya li ser Xezayê re diçe asteng bikin û şerekî pir giran derket holê. Ji bo wê jî ez bawer nakim dewleta Tirk bikaribe di ser Iraqê re rêyeke wiha birêxistin bike. Ji beriya herkesî rêveberiya Iraqê beşdarî vê nabe. Jiber ku rêveberiya Iraqê li gorî polîtîkayên DYE û Îranê tev digere. Ku rêyeke wiha Îran û DYE napejirînin. Heman demê de Kûwêt û hinek dewletên Ereban diyar kirin ku ne di nava rêyeke wiha de ne.

Eger bi kurtayî bê îfadekirin ji xwe di navbera Tirkiyê û Iraqê de bazirganiyek girîng heye. Dibe ku vê hîn zêdetir pêşde bibin. Pêwîstiya herdu dewletan jî bi vê heye. Ji bo vê jî rêyên pêwîst jî hene. Ji ber wê jî pêwîste vê rêyê weke rêyek nû ya enerjiyê nebînin. Eger bixwazin vê rêyê ava bikin dê herkes li dijî derkeve. Ji DYE yê bigre heta Îranê, ji Israîlê bigire heta Ewropayê û Erebîstana Siûdî dê herkes li dijî derkeve. Hem kes piştgiriyê nade, hem jî dê ev veguhere şerekî. Ji ber wê jî zehmete ku rêveberiya Iraqê tiştek wiha bipejirîne. Di rastiyê de Iraq ji ber negirtina ava Dîcle û Firatê pirsgirêkek cidî ya avê dijî. Zehmetiyek pir zêde dijî. Ev rewşeke ku tê zanîn. Ji bo vê derbas bike neçare gelek tawîzan bide. Gelo di beranberî avê de, dikare tawîzek di vê astê de bide? Mirov nikare pir erênî lê binêre. Jiber ku dê projeyek wiha ji wî re karesatên mezintir ava bike. Dema ku bixwaze pêwîstiya xwe ya avê pêşwazî bike dê bi karesatên cudatir re rûbirû bimîne. Pêwîste hesaba van bike.

Niha dikarin bersivê bidin pirsa encama serdana Erdogan a ji bo Iraqê û tiştên ji hevdîtina li Bexdayê bidest xistiye; Erê, PKK weke rêxistinek qedexekirî da îlankirin. Armanca wî ya esasî ew bû ku li dijî PKK'ê şerekî birêxistin bike. Armanca wî ew bû ku weke ji PDK'ê piştgiriyê digire, ji YNK û rêveberiya Iraqê jî piştgiriyê bigire. Di vî alî de bikare çiqas derfetan bidest bixe hewl da bidest bixe. Di vê mijarê de projeya wî ya herî girîng ew bû ku hêzek yekbûyî ava bike. Projeya rêveberiya Tayyîp Erdogan ew bû ku hêzek ji Komara Tirk-Iraq-PDK-YNK'ê ava bike, ji Zaxoyê heta Silêmaniyê bi hêzeke xirxî çeperek hevpar ava bike, Qadên Parastina Medyayê bi hêzek wiha dorpêç bike. Lê hêz û piştgiriyek wiha negirt. Jiber ku hêzên jê piştgirî xwest ne xwedî hêzek bi vî awayî ne, ne jî projeyek wiha li gorî berjewendiyên rêveberiya Iraq û YNK'ê ye. Ji ber wê jî hikumeta AKP'ê tişta ku ji serdana Iraqê dixwest tam negirt. Negihişt armanc û planên xwe. Lê di vî alî de piştgiriyên sînordar jî girt. Yek ji vana PKK weke rêxistinek qedexe da îlankirin. Di vê wateyê de qasî dixwaze dikare istixbaratê bigire. Ya din jî qada 20 km yî ya weke "Herêma tampon" ku di venêrîna xwe de digire. Diyare ev jî hinekî daye erêkirin. Xala sêyemîn jî li şûna ev "Projeya Rêya Pêşketinê" weke rêyek bazirganiyê bê dîtin, pêwîste weke di nava plana şer de ye bê dîtin. Wisa xuyaye ji aboriyê zêdetir wateyek wê ya leşkerî heye. Armanc dike

ku di şerê li dijî PKK'ê de weke projeyek perçiqandina gerîlla û bidestxistina Qada Parastina Medyayê bikar bîne. Bi vî awayî fêmkirin û nirxandin wê rasttir be. Ji ber vê sedemê jî me îfade kir ku divê ne weke “Projeya Rêya Pêşketinê” bê pênasekirin, pêwîste weke “Projeya Rêya Şer” bê pênasekirin. Bi rastî jî dikare pişta xwe bide vê rêyê, gelek derfetan, hêz û amûran bixe hindirê Iraqê. Ji bo ewlehiya wê dê hêza leşkerî û yekîneyên istixbaratê bixe hindir. Di esasî de wê hêza istixbarata leşkerî li Başûrê Kurdistanê û Qadên Parastina Medyayê di şerê li dijî PKK'ê de bikar bîne. Jixwe di rewşa heyî de gelek hêz xistiye nava sînorê Iraqê.

Tê gotin ku ji 60 zêdetir baregehên leşkerî hene. Rewşa pratîkî ji vê zêdetir e. Niha wê bi vê projeyê re vê 3-4 qat zêdetir bike. Li aliyê din dê bi projeyek wiha re Qadên Parastina Medyayê, tevahî Başûrê Kurdistanê ji aliyê başûr ve dorpêç bike. Ev dorpêç wê dorpêçek leşkerî be û dê vê hêzê di şer de bikar bîne.

### Tirkiye dixwaze hêza xwe ya li Iraqê zêde bike, şer ji Bakur û Başûr ve bimeşîne

Erê, hikumeta Iraqê û hêzên weke YNK'ê rasterast nakevin nava şer û Tirkiyê piştgiriya leşkerî negirt. Lê dê bi navê Projeya Rêya Pêşketinê de, di têgînan de fêlbaziyan bike û hîn zêdetir hêza leşkerî bixe herêmê. Wisa xuyaye ku derfeta zêdetir hêza leşkerî li dijî PKK'ê derbasî Iraqê bike bidest xistiye. PKK weke rêxistinek qedexe da îlankirin. Dibe ku ev jî di aliyê istixbaratî de derfetanên wan zêdetir bikin, hem jî bi navê Projeya Rêya Pêşketinê li Iraqê hêza xwe ya leşkerî û istixbaratî zêdetir bike, şer ji Başûr û Bakur ve bi bandor bimeşîne. Wate û pênaseyek wiha ya vê projeyê heye.

Başe, wê encama vê çi be? Dê şer ji Qadên Parastina Medyayê derkeve û belavî tevahî Kurdistanê bibe. Heta dibe bi vê rêyê Kurdistanê jî derbas bike û belavî tevahî Iraqê bibe. Jiber ku rêya mijara gotinê ye Kurdistanê dorpêç dike. Li ser sînorê Kurdistanê, qada em jê re dibêjin “Qada Navîn” û gelek gel bi hev re dijîn tê pêşdîtin. Ji ber wê jî dê li vir ji ber Komara Tirk şer belavî tevahî qadan bibe. Ev ji bo Iraqê xeteriyek mezin e. Li aliyê din Komara Tirk PKK'ê dike hêncet hêza leşkerî dixe Başûrê Kurdistanê û Iraqê. Li gelek qadan bihaneyên hemşêwe ava dike, taybet jî di bin navê “têkoşîna li dijî terorê” hêzên dagirkeriyê bicih dike. Lê herkes dizane Komara Tirk cihê ketiyê dagir dike û careke din ji wir dernakeve. Ji ber wê jî dixwaze bi projeyek wiha hem aliyê aborî hem jî di aliyê leşkerî de heta hindirê Iraqê, heta Besrayê venêrîna xwe li ser Iraqê çêbike.

Heman demê de herêmên mijara gotinê de Komara Tirk weke “Welatê Tirkmenan” pênase dike. Bi gotina welatê




Tirkmenan e dikare sibe li vê herêmê rêveberiyek cuda îlan bike. Li Bakurê Sûriyê gelek qada wiha girtin. Ji bo Qibrisê wiha got û dagir kir. Dibe ku rewşek wiha ya dagirkeriyê li Iraqê jî pêş bikeve. Ev ji bo Iraqê pirsgirêkên cidî ne, dibe gef û xeterî. Erê, dibe ku ji ber pirsgirêka avê tiştek wiha hatiye kirin lê diyare ku ev xeteriyek cidî çêdikin. Iraq dikare vê çiqas rake? Dema wiha be ji bo Kurdan, Iraqê, heta tevahî Rojhilata Navîn dê pirsgirêkên çawa derxe holê ji niha ve ne diyar e.

Jixwe li Iraqê rewşek şer heye. Istixrar ava nebû, pergal nayê avakirin. Rewşek wiha dê bêistixrariyê, şer û pevçûnan kûrtir bike. Dê çeteyên DAIŞ'ê û çeteyên weke wan zêdetir bibin, birêxistin bibin. Dê ew çete pişta xwe bidin Komara Tirk û pêş bikevin û dê li vê herêmê bibin çavkaniya bêistixrariyê û şer. Bi kurtayî Iraq bi rewşên ne xêr re rûbirû ye.

Bêguman ev rewş ji bo Kurdan jî xeteriyek cidî çêdike. Di rastiyê de, di helwesta Berzaniyan de jî tê dîtin ku ev rê ne Rêya Pêşketinê ye. Jiber ku eger bazirganiya Iraq-Tirkiyê di rêyek wiha de çêbibe dê Berzanî birçî bimînin. Tevahî hebûna wan girêdayî deriyê Xabûr e. Bi gumrika li wir tê standin li ser piyan dimînin. Rêyek wiha dê deriyê Xabûrê, bazirganiya li vir tê kirin tune bike. Di rewşek wiha de dê Başûrê Kurdistanê û Berzanî ji bazirganiyê mehrûm bimînin.

Lê eger baldar bin ji bo rêyeke wiha di navbera Iraq û Tirkiyê de pêk bê herî zêde Berzanî xebitîn. Ev jî di rastiyê de diyar dike ku mijar ne weke tê dîtin e. Eger bi rastî jî projeya Rêya Pêşketinê eger projeyek a bazirganiyê bûye, ji ber deriyê Xabûr ên herî zêde zirar bibînin Berzanî ne. Wê demê pêwîste ji her kesî zêdetir Berzanî li dijî vê rêyê derketibûna, lê berovajî gelo ji bo îmzekirina vê rêyê çima ji herkesî zêdetir xebitîn? Wê demê li vir fêlbaziyek heye? Dibe ku fêlbaziyek çawa hebe? Xala ku em qalê dikin vê fêlbaziyê derdixe holê. Navê wê projeya pêşketinê ye lê di rastiyê de rêya şer e. Bi vî awayî Başûrê Kurdistanê bi Komara Tirk dide dorpêçkirin. Berzaniyan, rêveberiya PDK'ê ji aliyê Bakur ve tevahî xalên xwe dane artêşa Tirk û çeteyên Tirk. Dibe ku dixwazin ji Başûr ve jî bi dewleta Tirk re vê bikin û qadê bi tevahî bidin Tirkan û bikin yek ji wîlayetên wan. Atmosfera ku dewleta Tirk bi çeteyan re ji Idlibê hetanî Serêkaniyê çêkiriye, dixwazin bi PDK'ê re li vir pêk bînin. Herhal PDK ji ber ku vê dizane li dijî wan dernakeve û piştgiriyê didê.

Li aliyê din dibe ku ji vê pere qezenç dike. Erê di rewşeke wiha de wê Kurd zirarek bazirganî bibînin, lê bazirganiyek wiha dê parekî bide Berzaniyan. Dibe ku li vir lihevkirinek wan a “Bila Kurd winda bikin, Berzanî qezenç bikin” hebe. Jixwe heta niha helwesta PDK'ê wiha bû. Ev jî dide nîşan ku ev Projeya Rêya Pêşketinê ji rêyek aborî zêdetir rêyek leşkerî ye. Divê ev bê dîtin. Ev ji bo tevahî Iraqiyan karesatek e. Ji bo Kurdan jî heman e. Teqez divê li dijî derkevin. Teqez dê hebûn û azadiya gelê Kurd li dijî vê derkeve.

Li aliyê din cara yekem e Serokkomarek Tirk diçe Hewlêrê. Em baş nizanin lê pêwîste ev serdana Hewlêrê careke din hîn cudatir bê nirxandin. Bi rastî jî rewşa Berzaniyan koletî ye. Ji bo Başûrê Kurdistanê û Hewlêrê bikin rewşa wîlayetek Tirkiyê bi dil û can kar dikin. Bi vî awayî xwe bi pergala sermayeya Tirk re dikin yek. Tu aliyê wan ê netewî, pêşdîtinên wan û vîna wan tune ye. Tişta dikin şerm e. Ji ber wê jî tu têkiliya vê bi hevdîtinên dîplomatîk re tune ye.

Rewşek hemşêwe ji Erdogan re jî derbasdar e. Hewl da serdanek pir fişal nîşan bide, lê pêwîste neyê jibîrkirin ku Komara Tirk beriya niha di asta serokkomariyê hevdîtin çênekirine. Berzaniyan weke çawûşan bi rê ve dibin. Yaşar Bûyûkanit û Îlker Başbûg hertim digotin “Ma bi wan axayên eşîretan re hevdîtin tê kirin”. Hîna duh helwesta wan ev bû. Ev hîn jî di hişê me de dijîn. Lê Erdogan bixwe çû ber çokên Berzaniyan rûnişt, ev lewazbûna Erdogan nîşan dide, derdixe holê ku çiqas muhtacê Berzaniyan bûye. Taybetmendiyek din a vê tine. Nekarî bi Pûtîn re hevdîtinê bike, Serokkomarê Elman piştî bi muxalefetê re hevdîtin pêk anî bi wî re hevdîtin çêkir. Şeqşeqherên Erdogan mehekî propogandaya wê Erdogan bi Serokê DYE yê re hevdîtin çêbike kirin. Lê ew jî derew derket. Derket holê ku tiştek wisa tune ye. Di atmosferek wiha de bi xwenîşandanekî çû Hewlêrê, dîsa hewl da bi serdana Bexdayê re vê rewşê bide xilaskirin û jibîrkirin.

Erê, tu çûyî Hewlêrê, li wir bi alên Tirk hatî pêşwazîkirin. Lê tu çûyî cem kê, çûyî ku? Hevdîtina ku beriya 20 salan Wezîrê Serperştiya giştî her cûr dijîn jêre kirin, niha tu bi awayek stûxwar çûyî wê hevdîtinê. Ji ber wê jî ev ji bo Tayyîp Erdogan rewşek pir neyînî ye. Tevahî cîhanê dît ku Erdogan û Berzanî çiqas lewaz in, ji bo vê lewaziyê hevdû hembêz dikin. Weke ku bi vî awayî dixwazin moral bidin girseya xwe. Lê di her rewşê de teşhîr bûn.

**- Dîsa di dema vê serdanê de Belçîkayê avêt ser Medya Haber û Stêrk TV, dîsa li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê êrişî ragihandinê kirin. Êrişên li ser Rêber Apo zêde bûn. Çi têkiliya van êrişan û serdana Iraqê bihev re tune ye? Çawa hatin vê pêvajoyê?**

Dûran Kalkan: Serdana Erdogan di 22'ê Nîsanê de pêk hat. Di şeva 22-23'ê Nîsanê de jî li Belçîkayê bi ser navendên Medya Haber û Stêrk TV de girtin. Dîsa heman şevê ji Stenbolê heta Amedê avêtin ser mala bi dehan rojnameger, rojnameger hatin binçavkirin.

Navendên Medya Haberê û Stêrk TV yê hatin talankirin. Herkesî ev dît. Weke din fêmkirin jî ne gengaz e. Lê heman demê de jî diyare ku li Îmraliyê ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo serî li her cûr fêlbazî û lîstokan didin. Heman demê de weke dem, weke wate têkiliyek xurt di navberê de heye. Parçeyên planekî ne. Ev plan plana qirkirina gelê Kurd e. Bi êrişên zêdetir perçiqandina gerîlla, bi zexta li Îmraliyê û tecrîdê re astengkirina azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, perçiqandina gel, tesfiyekirina PKK'ê, her yekî parçeyek ê konsepta êrişan e. Teqez divê wiha bê dîtin. Li vir têkiliyek ji rêzê tune ye, parçeyek konseptek şer e, parçeyek ji plana hatiye danîn e. Rolê wan jî, demê wan jî wiha ye.

Tê gotin ku serdegirtin bi xwesteka rêveberiya Fransayê pêk hatiye. Ew çiqas raste an jî şaş e em nizanin. Di vê xalê de em armancên Fransayê jî nizanin. Dibe ku hûrguliyên wiha hebin. Lê hûrguliyên wiha tiştên me îfade kirine naguherin. Dema di çarçoveya giştî de lê bê nêrîn diyare ku ev tevahî parçeyek ji plana şerê taybet in. Başe, di vê xalê de armanckirina ragihandinê di êrişek plankirî ya weke vê de tê çi wateyê? Bêguman ragihandin wan teşhîr dike. Fêlbaziyên wan eşkere dibin. Raya giştî ya wan jî bandor dibe. Taybet jî cîhana ji derve li hemberî Kurdan hîn zêdetir enforme dike. Wê demê diyare ku ragihandin êrişên qirker ên şerê taybet ên dîktatoriya faşîst a AKP-MHP'ê baş eşkere dike. Wê demê li ser girseyan bi bandor e. Vê rastiyê dibînin û ditirsin. Hewl didin vê asteng bikin, daxin asta herî kêm.

Di rastiyê de rêveberiya Tayyîp Erdogan zêdetir dixwaze. Eger hêza wî têrê bike dê tevahiyan bigire. Çawa ku naxwazin destûr bidin gotinek Rêber Apo ji Îmraliyê derkeve, heman şêweyî naxwazin destûrê bedin tiştek bi navê Kurdan derkeve û bê nivîsîn. Eger hêza wan têrê bike xwasteka wan ew e. Ji ber ku hêza wan têrê nake nakin. Pêwîste vê rewşê bi awayek din nebînin. Ji ber ku hêza wan têrê nake tiştek wiha nakin. Eger hêza wan têrê bike dê tevahiyan asteng bikin, tune bikin û belav bikin.

Li aliyê din jî ji bo qonaxî jî pêwîste rewşa niha baş bibînin. Êrişên nû yên qirker pêk tînin, xwe amede dikin. Vê îlan dikin. Dibêjin ku dê zêdetir êriş bikin. Tayyîp Erdogan soz da û got, "Emê heta havînê PKK'ê li Iraqê xilas bikin". Ev di salên derbasbûyî de jî kirin, di vê sedsalê de jî çend caran ev bi awayek zelal gotin. Ev 50 sale PKK xilas nekiriye, gelo wê çibikin ku di mehek û du mehan de xilas bikin. Çavê herkesî li Tayyîp Erdogan e. Ji raya giştî re îfade kirin ku planek êrişek a wiha heye. Dibe ku bikin jî. Dibe ku hewldanên dînîtiyê jî bikin. Dikare ji tirsa canê xwe her cûr êrişan bikin. Ji ber ku pêwîstiya rêveberiya Erdogan jî bi vê heye. Qala nakokiyên di navbera AKP-MHP'ê de dikin. Ji bo vê derbas bikin pêwîste nîjadperestiyê, netewperestiyê, şovenîzmê pêş dixin, êrişên li ser Kurdan zêde bikin. Dîsa di bin navê "Em li lihevkirinan digerin" bi CHP'ê re hevdîtinan dikin. Ji bo CHP'ê bikişînin gel xwe yekane tişta di destê wan de heyî dijminayiya li dijî Kurdan e, dijberiya Kurdan e. Dispêrin derewa Kurd ji bo Tirkan xeteriyek mezinin. Halbûkî Kurdan hertim piştgirî dan hebûna Tirktiyê. Ev hezar sale Tirk li Anatoliyê xwe li ser Kurdan li ser piyan digirin. Berovajîkirinek di vê astê de heye.

Ji ber wê jî beriya ku êrişek leşkerî destpê bikin destpêkê qasî gengaz be wê ragihandinê lewaz bikin. Di rewşa êrişekî de ji bo propogandaya şoreşgerî, demokratîk û welatparêz zêde neyê kirin, komkujiyên dikin, çekên qedexe yên bikar tînin, teşhîrkirina çekên nûklerî yên teqtîkî û kîmyasal neyê kirin, dibe ku zemînê wê amede dikin. Ji bo êrişên xwe yên çekdarî, komkujî û sûcên xwe yên şer bi rihetî bikin, dixwazin ragihandinê lewaz bikin û ragihandina azad derbe bikin. Di vê wateyê de sekn, xebatên ragihandinê erênî û bi bandor in. Divê ev rastî bê dîtin. Ev rewşek baş e. Rewşa berxwedanê jî bi bandor bû. Wê demê ragihandina azad baş kar dike, rol dilîze. Ev rewşeke kefxweşiyê ye. Li ser vê bingehê em careke din berxwedanê silav dikin. Di encamê de pêwîste rewşa heyî baş fêm bikin, pêwîste em êrişkariya faşîst, mêtînger, qirker, hişmendî û siyaseta wê, komkujî û şerê wê yê taybet bi tevahî aliyên wê re bi awayek rast û bi bandortir teşhîr bikin. Pêwîste ragihandina azad di propogandaya her de hertim serkeftî be.

**- Di 2024'an de, di meha Gulanê ya Şehîdan de êrişên li ser Rêber Apo, xeta şehîdan di asta gerdûnî de zêde dibin û wisa xuyaye dê kûrtir bibin. Valaderxistina van êrişan bi sekn û têkoşînek çawa gengaz e?**

Dûran Kalkan: Ez di 47 saliya şahadeta şoreşgerê mezin Hakî Karer de, şoreşger Hakî Karer bi rêzdarî, heskirin û minet bibîr tînim. Di kesayeta wî de şehîdên têkoşîna azadiya Kurdistanê bi heskirin û rêzdarî bi bîr tînim. Em weke Tevgera Azadiya Kurdistanê û gelê Kurd 18'ê Gulanê roja şehîdan dijîn. Em di meha şehîdan de ne. Têkoşîna azadiya Kurdistanê yekemîn şehîdê xwe di 18'ê Gulana 1977'an de li Dîlokê da. Rêhevalê Hakî Karer ji aliyê encamên şerê taybet ê faşîst û qirker ve hat şehîdkirin. Têkoşîna azadiya Kurdistanê weke pêwîstiya xwedîderketina li vê bîranînê pêş ket. Di yekemîn salvegera şahadeta rêheval Hakî Karer de – 19'ê Gulana 1978'an- rêheval Xelîl Çavgun şehîd ket. Berxwedana Hîlwanê ji bo bîranîna Xelîl Çavgun pêş ket. PKK'yîbûn derxist holê. Berxwedana girtîhan, berxwedana Mazlûm, berxwedana Çaran a 17'ê Gulana 1982'an ku bi pêşengiya Ferhat Kurtay bi berxwedana Rojiya Mirinê ya Mezin -14'ê Tîrmehê- vê girê da. Wê jî sirûşa xwe, demê xwe ji şahadeta rêheval Hakî Karer girt. Piştî wê jî her Gulan bû meha têkoşînek pêşketîtir. Di her roja Gulanê de şehîd hatin dayîn û bi vî awayî meha Gulanê bû meha şehîdan. Tevgera me veguherî tevgera şehîdan. Rêber Apo got, "Şehîd PKK'yî ne, di şêweyê PKK'ê de dijîn". Dîsa got, "Ya PKK'ê rêve dibe artêşa şehîdan e". Xeta vê şahadetê rastiya Rêbertiyê ava kir. Meha Gulanê ji bo tevgera şoreşger a Tirkiyê jî mehek girîng e. 18'ê Gulanê salvegera şahadeta Îbrahîm Kaypakkaya jî ye. Di 18'ê Gulana 1973'an de li Amedê di êşkenceyê de hat qetilkirin. Denîz Gezmîş, Yusuf Aslan û Hûseyîn Înan di 6'ê Gulana 1972'an de li Enqerê hatin dervekirin. Di 31'ê Gulanê de Sînan Cemgîl û hevalên wî di pevçûnê de şehîd bûn. Li aliyê din di 9'ê Gulanê de dostê me yê binirx Ulaş Bayraktaroglu di şerê Reqayê de bi lehengî şehîd ket.

Ez di kesayeta Îbrahîm Kaypakkaya de tevahî şehîdên şoreşa Tirkiyê bi rêz û minet bibîr tînim. Fêmkirina şahadeta wan, ew rast fêmkirin û serkeftî pêkanîn e. Ev jî tê wateya rastfêmkirin û serxistina xeta Apoyî. Di vî alî de du rêbazên bîranîna şehîdan û rast xwedîderketina li wan hene; ya yekemîn rastfêmkirina xetê ye. Ji bo vê jî pêwîste xwe di xeta şehîdan de hertim bi awayê rexne-rexnedayîn lêpirsîn bikin, nû bikin, sererast û pêş bixin. Ya duyemîn jî rast pêkanîna vê xetê ye. Bîranîna şehîdan di têkoşînê de jiyandin e. Ji bo serxistina armancên wan hîn zêdetir bûyîna hêza têkoşînê ye. Rast pêkanîna şehîdan tê wateya di xeta şehîdan de xwe perwerde bikin, birêxistin bikin û çalak bikin. Wê demê emê di vê meha şehîdan de vê hîn zêdetir bikin.

**Pêwîste em nêrîna teng a netewî derbas bikin**

Piştî pêşekiyek wiha em dikarin di çarçoveya pirsê de van bêjin: Em tevgerek a Rêbertiyê û şehîdan in. Tevgera Azadiya Kurdistanê tevgerek wiha ye. Tevgera Apoyî teqez tevgera Rêbertî û şehîdan e. Tevgera şehîdan û Rêbertiyê tê wateya zêxkirina rêyek nû, derxistina holê ya rastiya nû, nûneriya wê kirin û pratîkkirinê. Ev rastî ji herkesî re ye. Ne tenê ji bo Kurdan, ji bo tevahî gelan e. Ne tenê ji bo çînekî ye, ji bo tevahî bindestan, ji bo tevahî jin û ciwanan e. Ji bo tevahî mirovên bindest e. Di serî de tevgera Rêbertiyê û şehîdan tê wateya, hebûna hişmendiyê ya tevgerê, bîrdozî, xeta polîtîk gihandina tevahî mirovayiyê ye; di serî de jin, ciwan, karker, kedkar, gihandina tevahî bindest û her aliyê cîhanê. Di serî de Tevgera Rêbertiyê bûyîn vê pêwîst dike. Erk û berpirsyariyek wiha dide ser milê endamên wê.

Wê demê pêwîste em weke tevahî şoreşger û welatparêz xeta Rêbertî û şehîdan rast fêm bikin, rast pêk bînin. Li kêleka wê jî erk û berpirsyariya me heye ku li çar aliyê cîhanê rast û têrker belav bikin. Pêwîste bê ku em dem winda bikin di astek bi bandor û têrker de bikin. Pêwîste bizanin ku her demê erk û berpirsyariyek me ya wiha heye û vê bi serkeftî bînin cih. Di vê mijarê de kêmanî û lewazî hene. Di rastiyê de di vê mijarê de gelek derfet hene.

Rêber Apo fikrên xwe evqas nivîsand. Li gel ku di mercên Îmralî de dimîne weke gencîneyekî xiste destê me. Em vê gencîne û nirxê mezin pir kêm bikar tînin. Yanî pêwîste em xwe tenê bi Kurdistanê, civaka Kurd, jin û ciwanên Kurd re sînordar nemînin. Pêwîste em xwe li hemberî tevahî gelên Rojhilata Navîn û Cîhanê, mirovayiyê erkdar û berpirsyar bibînin. Pêwîste em bizanin ku fikrên Rêbertiyê ji bo herkesî ne û bibin ji herkesî re. Têkoşerên Apoyî, welatparêz tenê dikarin bi vê pêwîstiya wê bînin cih. Ji derveyî vê Apoyîbûn, şoreşger û welatparêzbûyîn ne gengaz e.

Wê demê pêwîste em nêrîna netewîtiya teng derbas bikin. Divê nêrîna me ya herêmî û gerdûnî hebe. Bêguman li Kurdistanê jî di asta jin û ciwanên Kurd de, em erkên şoreşgerî bigihînin asta herî pêş. Lê divê em vê têrker nebînin. Pêwîste em xwe li hemberî tevahî gelan, tevahî jin û ciwanên cîhanê, li hemberî tevahî mirovayiyê berpirsyar bibînin. Xeta Rêbertiyê û şehîdan bi wan bidin fêmkirin, ji bo ku rastiya Rêber Apo û şehîdan bigihînin wan hertiştî bikin. Pêwîste em bi awayek bernameyî û rêxistinî kar bikin. Di asta seferberiyê de kedê bidin. Pêwîste em bizanin ku ev erkê me ye, Tevgerbûna Rêbertiyê erk û berpirsyariyên wiha dide ser milê me û divê em bigihînin serkeftinê.

Li aliyê din eger pêşketinek wiha çêbe; fikrên Rêbertiyê, hişmendî, xet û paradîgmaya modernîteya demokratîk her ku biçe dê bigehe tevahî jinan, ciwanan, bindestan, karker û kedkaran. Eger li ser vê bingehê têgihiştin û rêxistinbûn bê avakirin, wê demê li hemberî pergala dewlet û desthilatê ya 5 hezar salî, pergala modernîteya

kapîtalîst a pênçsed salî dê lêgerîna pergalek alternatîf a şaristaniya demokratîk, pergala modernîteya demokratîk pêş bikeve. Ev jî dê ji pergal û hişmendiya dewletê ya mêtînger, qirker, faşîst û desthilat re xeterî mezin bibe. Bêguman ev hêz pêşketinek wiha, pêşketinek alternatîf a jiyan û civakê ji bo xwe weke xeterî dibînin û ji bo astengkirina wê dê hertiştî bikin. Jiber ku ji bo mirovan bixapînin, serweriya xwe bidomînin pêwîste xwe bê alternatîf bikin. Dizanin ku zilm û zorê, bêmafiyê dikin. Hertim dijberiyek alternatîf ava dikin. Têgihiştin û birêxistinbûn dê dawiya wan bîne. Ew tenê bi astengkirina têgihiştin û rêxistinbûnê tenê dikarin pergala xwe ya zilm û zorê, mêtîngeriyê li ser lingan bihêlin.

Ji ber vê jî naxwazin pêşketinek wiha, paradîgmaya Rêbertiyê ya Demokratîk, Ekolojîk û Azadîxwaziya Jinê di nava mirovayiyê de belav bibe. Ji ber vê paradîgmaya ku dê tevahî mirovayiyê rizgar bike, vê alternatîfê weke tunebûna xwe dibînin. Ji ber wê jî hîn ji niha ve ji bo pêş nekeve hercûr êrişan pêk tînin. Hewl didin tevahî têkiliyan qut bikin. Ji ber wê jî li çar aliyên cîhanê kom dibin û li dijî PKK'ê biryaran digirin.

Van komploya navnetewî ya li dijî Rêber Apo di asta NY yî de birêxistin kirin û meşandin. Pergala Îmraliyê ya êşkence, tecrîd û qirkirinê pergalek gerdûnî ye. Bi pêşengiya NATO'yê û ji aliyê dewletên nava NY yî ve tê meşandin. Pergala heyî hîna di wê demê de ev dît û êrişek wiha pêk anî. Niha jî dixwazin vê rewşa êrişê pêş bixin û bidomînin. Li her cihî PKK'ê dixin lîsta terorê. Dibêjin rêxistina terorê ya herî mezin. Dibêjin PKK xeternak e. PKK'yîbûyînê weke sûcê herî mezin dihesibînin. Li her derê PKK'yîyan digirin û dadirizînin.

Kesên dibêjin em PKK'yî ne tiştekî bi wan nakin. Eger baldarbin tu beranberiyek pratîkî tune ye. Dijberiyek a leşkerî û siyasî, yan jî têkoşînek wan tune ye. Lê gel vê jî PKK'ê weke xeteriyek herî mezin dibînin. Weke rêxistina terorê ya herî êrişkar dibînin. Îlan dikin û bi vî awayî bi yekdestî her cûr rêbazê bikar tînin û êrişê PKK'ê dikin. Hewl didin pêşiya PKK'ê bigirin û pêşketina wê asteng bikin. Divê ev rastî bê dîtin. Ev dide nîşan ku têkoşînek mezin a bîrdozî û siyasî heye. Jiber ku du pergal û hişmendiyên alternatîf hene. Pergala alternatîfa moderniteya kapîtalîst pergala moderniteya demokratîk e.

Alternatîfa şaristaniya dewletperest şaristaniya demokratîk e. Lewre dixwazin pêşketina hişmendiya şaristaniya demokratîk asteng bikin. Naxwazin têgihiştin, rêxistinî û çalakgeriya moderniteya demokratîk derkeve holê û belav bibe. Wisa hesab dikin ku eger ev pêş bikeve ewê tune bibin. Şerekî wiha yê cîhanî heye. Şerê du moderniteyan, du şaristaniyan heye. Şaristaniya dewletperestiyê û şaristaniya demokratîk, moderniteya kapîtalîst û moderniteya demokratîk di nava şer û pevçûnê de ne. Li ser bingehê vê jî şerê hişmendiyê, şerê bîrdoziyê heye. Lê heman demê de, her çendî di aliyê herêmî de bi parçeyî jî be vediguhere têkoşînek siyasî-leşkerî jî.

**Pêwîste em têgihiştin, rêxistin û çalakgeriya moderniteya demokratîk pêş bixin**

Di vê xalê de pêwîste em bizanin ku dema em li ser bingehê têgihiştin, rêxistinbûn û çalakiyê pêşketina moderniteya demokratîk derxin holê, dê hêzên moderniteya kapîtalîst bi her rêbazî êriş bike, êrişan kûr bike û har bibe. Wê demê pêwîste li gorî vê bergiriyên me hebin. Pêwîste em bibin xwedî terzek ku van êrişan vala derbixin. Divê em rêbazên rast û guncaw bibînin. Hema wisa rasterast, bi hêza qeba, bê ku tiştekî bixin hesabê xebatê nemeşînin, pêwîste em têgihiştin, rêxistinî û çalakgeriya moderniteya demokratîk pêş bixin.

Pêwîste em baldar bin. Ev êriş bi awayek vekirî ji aliyê hêzên dewletê ve tên meşandin. Di aliyê siyasî de çêdibin. Astengiyan û qedexeya datînin. Digirin û cezayan didin. Lê aliyek din ê van êrişna jî bîrdozî ye, bi hişî ye. Lîberalîzma moderniteya kapîtalîst a xwe li ser olperestî, netewperestî, zayendperestî û zanistperestiyê ava kiriye, ji bo belavbûna têgihiştina moderniteya demokratîk asteng bike di rewşa seferberiyê de êrişî me dike. Li aliyekî hewl dide têgihiştina rast berovajî bike. Li aliyê din jî hertim civakê bi qirkirinê re rûbirû dihêle, tevahî amûrên propogandayê, ragihandinê bikar tîne, spor, hûner û seksê bikar tîne, mirovan dixe nava ferdperestiyê, madiyetê û tune dike, mirovan tîne wê rewşê ku nefikire, dixwaze mirov rast nebînin, jiyana azad nezanin û negihin jiyana azad. Hem êrişên jirêderxistinê hene, hem jî êrişên astengkirin û tunekirinê hene.

Pêwîste me li dijî vê astengkirina pratîka maddî bergiriyên xwe yên pratîkî pêş bixin. Lê li hemberî van êrişên bîrdozî û zîhnî jî têkoşînek bîrdozî ya bi bandor, rêbaz, islûb û encamgir bimeşînin. Ji bo vê jî pêwîste em tevahî bûyeran, pêşketinan di xeta moderniteya demokratîk de binirxînin û bi rexne û rexnedayî derbas bikin. Pêwîste em xeta sosyalîzma demokratîk, têgihiştina ekolojîk, têgihiştina azadiya jinê, ferdê azad û jiyana komîna demokratîk li her derê pêş bixin. Teqez divê em nîşanî herkesî bikin ku jiyana rast ev e. Ji bo vê jî hîn zêdetir pêwîstî bi têkoşîna bîrdozî heye.

Pêwîste me kêlî bi kêlî nîşanî mirovayiyê bidin ku bîrdoziya êrişî me dike zilm, zordarî û mêtîngeriyek çwa li ser me dide meşandin. Pêwîste em nebêjin, "Ruhê min bila bipeyîvin, binivîsin, tiştek ji vê dernakeve". Pêwîste em hemûyan cidî bigirin û bala xwe bidinê. Bersivê bidin tevahî êrişan. Pêwîste em tenê bersivê nedin wan. Ew êriş nekin jî, pêwîste em hebûna wan, şaştiyên wan bibînin, aliyên wan ên ne li gorî mirovayî û heqîqeta jiyanê rexne bikin, rastiyan bigihînin mirovayî û civakê. Ev rewşek pir girîng e. Em li aliyekî bi jiyan û sekna xwe van rastiyan; pîvanên sosyalîzma demokratîk, pîvanên jiyana azad û komîna demokratîk, pîvanên civaka exlaqî-polîtîk jiyanî bikin, bijîn û bidin jiyîn. Li aliyê din jî têkoşîna bîrdozî bimeşînin. Emê di nava têkoşînek bîrdozî ya berfireh û piralî de bin. Herkes dê vê bike. Her kadro, her sazî, tevahî welatparêzên şoreşger, tevahî demokrat vê weke erk û berpirsyariya xwe bibînin. Eger em wiha bikin emê êrişan bişkênin. Emê rê û rêbazên xwepêşxistinê bibînin. Hîna em lewazbin, hema carekî neyên rewşa aliyê dijber û bi hêsanî neyên perçiqandin. Berovajî, bi awayek rast, di cihê wê de, di demê wê de tevbigerin, êrişan hîn di destpêkê de vala derbixin, bikarin moderniteya demokratîk pêş bixin. Pêwîste sekn û têkoşîna me wiha be.




**- Di demên dawî de Israîlê êrişî Îranê kir û piştî wê jî êrişên Îranê li ser Israîlê çêbûn. Israîlê çima balyozxaneya Îranê ya li Şamê bombebaran kir. Komara Tirk, li ku dera rageşiya di navbera Îran û Israîlê de ye. Rewşa heyî gelo girêdana wê bi êrişên qirkirinê yên li ser gelê Kurd û Filistînî re heye?**

Dûran Kalkan: Ji bo em rageşiya dawî ya di navbera Îran-Israîlê de rast fêm bikin, pêwîste em destpêkê şerê li Xezayê rast û têrker fêm bikin. Şerê Xezayê ku di 7'ê Cotmeha 2023'an de destpê kir, di rastiyê de pevçûnek a berjewendiyan e.

Pêwîste em vê rastiyê bibînin. Li aliyekî bi pêşengiya DYE, Israîl û Îngiltereyê tevahî Yekîtiya Ewropayê dixwazin xeta enerjiyê ya di ser Hindistan-Siûdî-Israîl-Qibris- Yunanîstanê re derbasî Ewropayê dibe çêbikin. Ev hêz ji bo avakirina rêyek wiha piralî kar dikin. Aliyek vê xebatê yê teknîkî û aliyê wê yê ewlehiyê heye. Di aliyê xwe de dixwazin vê qadên bixin bin venêrînek leşkerî, bi ewle bikin. Rewşa li Xezayê, hebûna Hemasê ji bo vê projeyê gef bû. Ji bo ewlehiya rêya xwe çêbikin pêwîst dîtin ku Xezayê bixin venêrîna xwe, Hemasê bê bandor bikin û ev şer dan destpêkirin. Yên ku ev şer amede kirin, dan destpêkirin yên pêşengiya projeya vê rêyê dikin in. Di serê wan de DYE û Israîl hene.

Heman demê de hinek alî hene ku vê rêya enerjiyê di aliyê xwe de ji xwe re bi zirar dibînin, ji bo vê jî hewl didin dixwazin Têkiliyên xwe yên bi Tirkiyê re di vê çarçoveyê de ava kir. Lê ev tê wateya şerekî sed salî; Şerê Cîhanê yê Yekemîn ji ber rêya hesinî ya Berlîn-Bexda-Besrayê çêbû. Elmanyayê xwest di ser Osmaniyan re rêyek bazirganiyê ava bike, bazirganiya Tengava Besrayê bixe destê xwe. Îngiltere û Fransayê şer derxistin, Tengava Besrayê di aliyê leşkerî de xistin venêrîna xwe û projeya rêya Elman-Osmanî vala derxistin. Şerê Ukraynayê jî şereke ku ji bo rêya enerjiyê destpê kir. Rûsya û Çînê hêzên xwe kirin yek, hewl dan di ser Ukraynayê re rêyek enerjî û bazirganiyê ava bikin. Lê DYE yê bi şerê Ukraynayê destwerdan kir û proje vala derxist.

**Pergala modernîteya kapîtalîst dixwaze Rojhilata Navîn û cîhanek nû sazûman bike**

ji wir jî bibe Hindistanê. Lê bixwe neket. Niha derket holê ku di Şerê Cîhanê yê Sêyemîn jî DYE dixwaze di bin navê "Sazûmaniya Cîhana Nû" de projeya rêya ji Hindistanê-Siûdî-Israîl-Qibrisê heta Yunanîstanê çêbike. Bi vî awayî modernîteya kapîtalîst dixwaze Rojhilata Navîn û cîhanek nû sazûman bike. ,

Em bala xwe didinê hegemonyaya kapîtalîst a gerdûnî li ser vê xeta bazirganiyê ya Ewropa û Asyayê ava dibe, li ser bazirganiya enerjiyê sazûman dibe. Şerên cîhanê ji bo vê derketin. Ji nû ve parvekirina cîhanê li ser vî bingehî çêdibe. Mijara rêya Hindistanê di rastiyê de ji dema Îskenderê Mezin heta îro tê. Mirov dikare heta wir jî bibe. Niha dema li Hindistanê rêyeke wiha hat îlankirin, yê ku destpêkê bi awayek diyar dij derket Erdogan bixwe bû. Ji bo vê projeyê vala derbixin Bêguman niha jî Tayyîp Erdogan tiştek wiha dixwaze. Lê nikar bike, zehmet e. Li aliyekî hewl dide rêyên enerjiyê yên alternatîf ava bike û vê rêyê vala derxe, li aliyê din di ser Hemasê re Xeza kir qada şer û hewl dide wê rêyê bê ewlehî bike û vala derbixe. Di vî alî de jî du aliyên şerê Xezayê hene; ya yekemîn aliyê DYE û Israîlê ye. Van dixwest rêyê paqij bikin. Dixwestin rêya enerjiyê bi ewle bikin. Li aliyê din jî AKP-Tirkiye-Hemas heye. Ew jî dixwazin ewlehiya vê herêmê xirab bikin û vê projeyê vala derxin. Yanî êrişa Hemasê ya li dijî Israîlê li ser vî esasî bû. Jixwe DYE û Israîlê ev dixwestin û li bendê bûn. Dema derfet dîtin jî, ji bo tunekirina Hemasê û desteserkirina Xezayê şerê dagirkirina Xezayê dane destpêkirin.

**Erdogan Îran tehrîk kir û hewl da li dijî Israîlê bixe nava şer**

gelê Xezayê û Filistînê ne. Li vir lîstokek bêrûmet heye. Şerekî berjewendiyan ku qirkirinê pêktîne heye. Heman şêweyî di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de jî qirkirina gelê Ermenî, Siryanî, Rûm û Kurd jî li ser heman bingehî pêk hat. Tê dîtin ku ev şerên berjewendiyan pir xeter in. Ji ber ku bi qirkirina hinek gelan pêş dikevin. Projeya rêya ku Abdullhamît jî destpêkirî rê ji qirkirina evqas gelan re vekir. Şerê berjewendiyan ê li ser projeya rêya enerjiyê tê kirin jî niha gelê Xezayê û Filistînê ber bi qirkirinê ve dibe. Pêwîste li ser hêzên cuda wêjeya egîdiyê neyê kirin. Di cewher de pêwîste rast lê binêrin.

Niha rewşek wiha ya şer û pevçûnê heye. Rêveberiya Tayyîp Erdogan, dema ku Hemasê êriş kir fikirîn dê Filistîn bikeve zorê û ev proje têk biçe. Ji ber wê jî berê Hemasê da Israîlê. Lê dema ku dît ne wisa ye, ev êriş xwesteka Israîl û DYE yê ye û li bendê ne, demildest xwest vê asteng bike û hewl da Hemasê biparêz e. Lê derfet nedan wê jî. Ji ber ku em dibînin di destpêkê de ev lîstok a DYE û Israîlê bû. Tayyîp Erdogan û Hemasê jî xizmeta vê lîstokê kir. Ew şer dikin, lê gel diperçiqe. Rewşa gelê Xezayê û Filistînê ev e. Eger baldarbin ev rewş wisa bi hêsanî çênebû. Israîlê bi hêsanî nedikarî Xezayê dagir bike. Hêzên dijber ên piştgiriya Hemasê dikin hene. Liberxwedanek û pevçûnek heye. Pevçûn û rageşiya di navbera Israîl-Îranê de jî di atmosferek wiha de çêbû.

Di rastiyê de Tayyîp Erdogan pêvajo destpê kir. Bi awayek veşartî yan jî vekirî êrişek wiha DYE û Israîlê jê xwest. Dibe ku Erdogan di destpêkê de ev fêm nekir. Wî li gorî xwe difikirî ku sabote bike. Herhal hinekan jêre got, "Ger tu Hemasê bixî tevgerê tuyê sabote bikî". Wî jî wisa kir. Çawa ku dema Seddam Hisên kete Kuwêytê difikirî gencîneya Kuwêytê bixe destê xwe, heman tişt bi Erdogan dane jiyîn.

Bêguman hêza ku herdu aliyan jî birêxistin dike heman be ev kar bi rihetî dimeşin. Şerê Pûtîn-Zelenskî jî hinekî bi vî awayî bû. Li pişt van tevahiyan yek dest heye. Em li vê baldar bin û bibînin. Dema Erdogan û rêveberiya AKP-MHP'ê dît ku



vê rêyê asteng bikin. Mînak di serê van hêzan de Komara Tirk, dîktatoriya faşîst a AKP-MHP'ê tê. Ji ber ku ew bixwe ji vê rêyê hatin vederkirin. Komara Tirk, dîktatoriya faşîst a AKP-MHP'ê difikirî ku tevahî rêyên enerjiyê dê di Anatoliyê de di tengavên wan de derbas bibin. Berê Rêya Hevrîşmê wiha bû. Têkiliyên wan ên bi Rûsyayê re jî hinekî xwe dispart vê. Pûtîn çend caran ragihand û got, pêwîste Tirkiye bibe navenda rêyên enerjiyê.

Wisa tê fêmkirin ku DYE'yê hîna di salên 1990'an de, bi hilweşîna Yekîtiya Sovyetê re ji bo avakirin û ewlehiya xetek enerjiyê ya wiha bi Aloziya Korfezê û Şerê Korfezê re destwerdan kiriye. Ji ber wê jî Şerê Cîhanê yê Sêyemîn jî dibe şerê projeya vê rêyê. Tevahî şerên cîhanê wiha ne. Şerê Cîhanê yê Yekemîn li ser projeya vê rêyê destpê kir. Di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de jî Hîtler xwest vê rêyê di bakûrê Deryareş re bibe Qafqasyayê, hema demildest Şerê Karabaxê derxistin. Xwestin rêyek bejahî ji Azerbaycanê heta Tirkiyê bînin. Ev ji aliyê Îran û Israîlê ve hat valaderxistin. Niha jî tê gotin ku dixwazin vê bi "Projeya Rêya Pêşketinê" di ser Iraqê re bikin. Em pir dibetiyekî nadin vê. Ev rêya Sultan Abdullhamît bû. Abdullhamît piştî hevdîtinên bi Elmanan, Îngilîzan, Rûsan û Fransiyan re çêkirin, ev proje da Elmanyayê. Bû sedema destpêkirina Şerê Cîhanê yê Yekemîn.

Ev bi mehan e pevçûnên berjewendiyan, vekirina rê, yan jî astengkirina rê didome. Yê zirar dît gelê Xezayê bû. Hêjmara miriyan gihişte 40 hezar kesî. Bi milyonan mirov hatin koçberkirin. Gelê Xezayê rastî qirkirinê hat. Eger em bala xwe bidinê hêzên dewletê û desthilatê li ser rêya enerjiyê şerê berjewendiyan dikin. Ev li ser xwîna gelê Xezayê, gelê Filistînê tê kirin. Yên ku xwîna wan tê rijandin, ji welatê xwe tên derxistin, rastî qirkirinê tên

ketiye xefikê, wê nekaribe bi êrîşa Hemasê vê rêyê sabote bike, paşê kete nava hewldana berfirehkirina şer a li hemberî Israîlê. Li aliyekî kete nava lêgerîna agirbest û aştiyê, li aliyê din kete nava lêgerîna berfirehkirina çepera li dijî Israîlê.

Başe, hêza herî muhtemel a li dijî Israîlê bikeve nava şer kîhan bû? Bêguman Îran bû û Komara Tirk hewl da vê bike. Ji ber wê jî rêveberiya Erdogan ji bo şerekî di navbera Îran û Israîlê de çêbibe her tim Îran navtê da. Li ser vê bingehê hîn di destpêkê de propogandayek giran a Îran piştgiriyê dide Hemasê, li pişt êrîşa Hemasê Îran heye kirin. Li pişt van propogandayan rêveberiya Erdogan hebû. Di rastiyê de wî bixwe kir, lê dema rewş neyînî bû ji bo xwe veşêre Îran derxiste pêş. Ji ber wê jî Îran tehrîk kir û hewl da bi Israîlê re bixe nava şer. Stratejiya rêveberiya Erdogan a piştî destpêkirina şerê Xezayê wiha bû. Li aliyekî ji bo Hemasê xilas bike kete pey agirbestê, li aliyê din jî ji bo Îranê bixe nava şer bi tevahî hêza xwe hewl da. Li ser Îranê her cûr bandor kirin. Tehrîk kirin, hevdîtin çêkirin û bi DAIŞ'ê re êriş kirin. Gotin Îran van karan dike û ev li her alî belav kirin. Ev tevahî rêveberiya AKP-MHP'ê organîze kir. Ji bo Îran û hêzên girêdayî wê bikevin şer û şer belav bibe pir tehrîk kirin. Wê bi vî awayî hem Hemas rizgar bibûya, hem jî projeya rê sabote bibûya.

Rageşî û pevçûna dawî ya Israîl-Îranê bi awayek berbiçav piştî lêxistina generalên Îranê yên li Sûriyê destpê kir. Rêveberiya Netenyahû ev da destpêkirin. Rêveberiya Netenyahû çima pêwîstî bi lêxistina balyozxaneya Îranê ya li Şamê dît? Jiber ku di şerê Xezayê de zehmetî dikişand. Agirbest dihat ferzkirin. Pêwîste daxwazên agirbestê bihatina valaderxistin. Ji bo Xezayê zêdetir dagir bike pêwîstiya wî bi hîn zêdetir bikaranîna hêza leşkerî û teknîkî hebû. Ji bo vê jî zemîn pêwîst bû. Çawa ku ji bo şerê yekem zemîn amede bû û zemîn ji aliyê rêveberiya Erdogan û Hemasê ve hat avakirin, niha jî ji bo êrişên xwe yên li ser Xezayê hêncetek pêwîst bû. Ji ber vê jî xwest rageşiya bi Îranê re bikar bîne. Jixwe dema di vî alî de istixbarat girt ev derfet bikar anî û Balyozxaneya Îranê ya li Şamê bombebaran kir. Jiber ku hem Îran hem jî Israîl dema derfetên wiha dibînin li hemberî hevdu êrişên bi vî awayî pêk tînin. Dijberiyek wan a di vê astê de hebû. Bêguman ji derfetan zêdetir rêveberiya Netenyahû ji bo êrişên xwe yên li ser Xezayê zêdetir bike, zemîn û derfetê bibîne ev kir. Îranê jî bersiv da Israîlê. Israîlê bersiv da Îranê lê bersiva Îranê ya li hemberî Israîlê pir lewaz bû. Jiber ku êrîşa ser balyozxaneyê ji bo bersivek wiha nekir. Du armancên Israîlê hebûn; ya yekemîn lêxistina generalên li wir bû. Jixwe ew biser xist. Ya duyemîn û esasî jî ji bo derfet û zemîna kûrkirina êrişên li ser Xezayê bû. Ew jî bi zêdahî bidest xist. Rêveberiya Netenyahû got, Îran bi me re ketiye nava şer û daxwazên aştiyê vala derxist. Li dijî hewldanên aştiyê derket. Tevahî lêgerînên aştiyê bêbandor kir.

Li aliyê din jî êrişên xwe zêdetir kir û heta bajarê Refahê yê li ser sînor çû. Dagirkerî û komkujî zêdetir kir. Ji bo xwe derfet û hêncet çêkirin û ev jî kirin. Rageşiya dawî ya Îran-Israîlê di atmosferek wiha de çêbû. Tehrîka Tirkiyê hebû. Me armancên wan diyar kirin. Tehrîkkirina rêveberiya Netenyahû hebû. Me armancên wî jî diyar kirin. Di rastiyê de ew gihişt armanca xwe. Em baldarbin, bersivek pir lewaz da êrîşa Îranê. Tenê ji bo ku bêje, "eger bixwazim ezê bikim" bersiv da. Weke din tu wateya wê tune ye. Jiber ku ji bo wî ne bersiv, avakirina zemînê êrişên li ser Xezayê pêwîst bû û ew jî bidest xist. Êrişên xwe zêdetir kir û dagirkerî kûrtir kir, berfireh kir. Îranê jî ev fêm kir. Xebatên tehrîkkirinê yên rêveberiya Netenyahû û Tirkiyê dîtin. Ji serî ve baldar nêz dibû, bi degelî nêz dibû. Îran di ferqa van rewşan de bû. Di rastiyê de bi helwesta xwe herkesê wiha asayî lê dinêrî şelipand. Heman tişt di êrişên dawî de jî çêbûn. Armanca êrişên li ser Balyozxaneya li Şamê fêm kir, li gorî wê bersiv da. Di vê wateyê de bersivdana Îranê ne ji bo derbeyekî li Israîlê bixe yan jî piştgiriya Hemasê bike bû. Ji bo mesajekî bide girseya xwe ya hindirîn û moral bide, propogandayek bû. Nîşandayînek çêkir. Hewl da hêza xwe dane holê. Bi vê re dîmenek nîşanî cîhanê jî da, lê di rastiyê de dîmenek nîşanî hindirê Îranê da. Propogandaya "Lê binêrin evqas hêza me heye, em li dijminên Siyonîst dixin" kir.

Jixwe veguherandin propogandayek mezin. Di hindirê Îranê de bi rojan pîrozbahî kirin. Rêveberiya heyî muxalefeta hindirîn tepisand. Nerazîbûn ji holê rakirin, bandora xwe ya li ser civakê û serweriya xwe pêş xist. Ji bo vê bike ev êriş pêk anîn. Jixwe DYE yê got 'em bersivdanê naxwazin', hem Îran hem jî Israîl hişyar kir. Dema Îranê jî çalakî pêk anî got, "Ev bersivdanek yek carî bû û xilas. Şerekî me yê bi Israîlê re tune ye". Ev tevahî jî rastiya rewşê nîşan didin. Encamên şerên li ser Xezayê bûn.

### Modernîteya kapîtalîst dixwaze li ser lihevkirina Ereb-Israîlê re Rojhilata Navîn a nû ava bike

Divê bê zanîn ku şerê li Xezayê xwe dispêre Şerê Cîhanê yê Yekemîn. Dixwestin rêyek a bazirganiyê çêbikin da ku çavkaniyên enerjiya Asyayê biguhêzên Ewropayê, berhemên Ewropayê li Asyayê bixin bazarê. Ji bo wê jî rêveberiya Komara Tirk hertim ev got: "Em pira di nava Asya û Ewropayê de ne, rêya bazirganiyê ne. Cihê me yê stratejîk xwe dispêre vê". Rêveberiya Komara Tirk difikirî ku çi dibe bila bibe dê ev rê di tengavên me de derbas bibin. Ji ber wê jî pir rihet û ji xwe bawer bûn. Çawa ku li Hindistanê projeya rêya alternatîf hat ragihandin, wê demê matmayî man. Dîtin ku tevahî girîngî û berdewariyên wan ji holê rabûn. Dîtin ku ji bazirganiyê hatine vederkirin. Rêveberiya Erdogan ji ber dijminiya li hemberî Kurdan û şerê li dijî Kurdan ev proje ji destê xwe kir. Bi vî awayî hem xwe hem jî Tirkiye tune kir. Cihê stratejîk ê Tirkiyê, girîngiya wê ji holê rakir. Di rastiyê de bi vî awayî hêza rêveberiya xwe tune kir. Lê difikirî ku dê ev heta dawî bidome.

Ha dijminayiya Kurdan, dijîtiya Kurdan, hişmendî û siyaseta dijminane ya li dijî Kurdan Tirkiye û civaka Tirkiyê anî vê rewşê. Karesata ku ketine navê ev e. Anî wê xalê ku tevahî girîngî û cihê xwe winda kir. Ev tevahî çavkaniya xwe ji dijminiya Kurdan, hişmendî û polîtîkaya mêtînger, faşîst û qirker digire. Îttihat û terakkiyê jî ev erê kir û bi Osmaniyan da windakirin. Demekî Komara Tirk li ser projeya pergala beriya wê meşandin. Lê pergala modernîteya kapîtalîst niha bi nêzîkatiyek nû projeyek nû pêş dixe.

Lozan û bi tevgera Kemalîst re li hev kirin û rolek dane Tirkiyê. Tirkiye li Rojhilata Navîn weke modela pergala netewdewlet nirxandin. Tirkiyê bi vê yekê karî sed salan li ser lingan bisekine. Niha modernîteya kapîtalîst dixwaze bi lihevkirina Ereb-Israîlê re Rojhilata Navîn a nû ava bike. Rewşek wiha hem bandora Îranê hem jî bandora Tirkiyê ya li herêmê lewaz dike. Taybet jî bandora Tirkiyê lewaz dike. Tirkiye ji aliyê pergala jê bawer û di nav de ye tê vederkirin. Ev pêşwendiya ku 100 sale xwediyê wê ye winda dike. Bi tirs û nerihetiya vê re êriş dike. Bê baldarî êriş dike, her ku êriş dike têk diçe.

Başe, çima wiha dibe? Jiber ku tişta dibe sedema vê rewşê baş nabînin. Tişta ew anîne vê rewşê, bûye sedema ku ji pergalê bên vederkirin teqez siyaset û hişmendiya dijminayiya li dijî Kurdan e.

Eger baldar bin Osmaniyan hem Kurd hem jî Ermenî weke nijadpak pênase kiribûn. Dema wisa digotin Osmanî bû yek ji dewletên cîhanê. Lê dema qirkirina Ermeniyan, qirkirina Kurdan esas girt ji aliyê pergala cîhanî ve hat vederkirin. Eger hîn zêdetir şer ferz bike, bikeve nava pevçûnan dibe ku Peymana Sevrê jî bidin pêkanîn. Wê Tirkiyê parçe parçe bikin. Pêwîste desthilatên Tirk vê bizanin. Pêwîste her kesê ji Tirkiyê hez dike vê bibîne.

Ji bo vê Rêber Apo bi caran şiyarî da. Got, "Hûn xeletiyan dikin". Got, "Eger hûn vê hişmendî û siyasetê neguherin hûnê ber bi karesatê ve biçin. Zirara herî mezin hûnê bibînin. Ev lîstokek a komploya navnetewî ye. Komplo qasî ku li dijî Kurdan e, ewqas jî li dijî Tirkiyê ye". Lê Erdogan ne weke xwesteka Rêbertiyê, xwest li ser dîktatoriya faşîst a Kurdan veder dike pêk bîne. Di encamê de hem negihişt armancên xwe hem jî weke dîktatoriyek faşîst-mêtînger-qirker û dijminê Kurdan Tirkiye ji nava pergala ku di nav de ye da vederkirin. Tevahî girîngiya xwe da windakirin. Lê Tirkiyeyek demokratîk ku xwe dispêre dostaniya Kurdan, azadiya Kurdan dê ne tenê bibûya pira Rojhilata Navîn, dê bibûya pira Asya û Ewropayê jî. Wê bibûya welatek model. Wê ji bo tevahî jinan, ciwanan, karkeran, kedkaran û tevahî gelan bibûya modelek mînak. Ya hatî astengkirin ev e.

Qaşo ji ber ku piştgiriyê didin rêveberiya Erdogan vê dikin, lê derkete holê ku piştgiriya ji bo tunekirina Rêber Apo û PKK'ê, qirkirina Kurdan didin Komara Tirk tenê ji bo Tirkiyê ber bi karesatekî ve bibin. Wê demê pêwîste civaka Tirkiyê, kesên ji Tirkiyê hez dikin vê baş binirxînin. Bi rastî jî kî dost e, kî dijmin e? Hinek derdorên berjewendiyan û hinekên bêmejî hertim vê berovajî dikin. Kurdan weke dijmin, hinekên din weke dost didin nîşan. Bila li dîrokê binêrin û rastiyê bibînin. Bila li ser vê bingehê têgihiştinek rast derkeve holê.

Niha hêviya me heye û bawer dikin ku mirovên bi aqil derkevin holê, vê rastiyê bibînin, Tirkiye vê rewşê baştir nîqaş bike. Dest ji vê hişmendî û siyaseta şaş bê berdan, demokratîkbûn, azadî û azadiya Kurdan bê esasgirtin. Wê demê Tirkiye dê bibe model û mînak. Bi rastî jî dê bibe pira şaristaniyê.

■■■

# DI PERWERDÊ DE RÊBAZ Û NÛBÛN

Şiyar Amed




Wekî ku êdî li seranserî cîhanê tê zanîn, bi saya rastiya tekoşîna 50'î salî derbas dike ya PKK'ê ve, PKK bûye tevgerek perwerdê; dema ku hîna pêngavên destpêkê li Enqerê dihatin avêtin destpêkiriye û hetanî roja me bi şiklê perwerdeya Rêbertî timî bi kûr kirinê ve berdewam kiriye. Gava ku Rêber Apo dest bi tekoşînê dikir û komploya navnetewî jî di nav de hemû pêvajoyên xeter pêşwazî dikir, beriya her tiştî perwerde esas girtiye. Dema ku bi êrîşa komploya navnetewî ve ji Sûrî derdiket û berê xwe dida Ewropayê jî, diyar dikir ku sedemek vê jî ew e ku li vê derê ciwanan perwerde bike. Ji aliyekê ve qiyamet radibûn li li gel vê jî Rêbertî li ser perwerde disekinî; lewra divê qadên cur be cur baş lêpirsîn bikin ku ne kirina rojeva bingehîn a perwerdê tê çi wateyê. Her wekî din gava ku di zirûfên Îmraliyê de wekî ku di çarmixê de be; komploya navnetewî vala derdixist tevgera me diguherand-vediguherand jî, rêbaza ku Rêber Apo esas digirt dîsa perwerde bû. Perwerde wek bingeha hemû serkeftinan digire dest, di rêbaza perwerde de jî pêşwazî kirina pêvajoyên siyasî-leşkerî kiriye pîvana bingehîn. Bikurtasî tevgera Rêbertî tevgerek perwerdê ye û li dar xistina perwerde ya di her qad û her xebata ku em tê de, dibe mecbûriyetek rêgezî û jiyanî.

### Ferqa PKK'ê Ferqa Perwerdê ye

Di PKK'ê de perwerde jiyanî ye, şênber e; guhertin-veguhertin, nûbûyînê esas digire û di her zirûfê de domdariya wê heye. Bi vî awayî ferqa xwe ya ji hemû perwerdeyên cîhanê diyar dike. Dema ku li rêgezên bingehîn ên perwerdê tê mêze kirin ev ferq hê baştir tê fahm kirin. Di PKK'ê de her kes hevdu perwerde dike. Yanî ji aliyekê ve mamoste û ji aliyê din ve jî şagirt tunin. Her kes hem mamosteye û hem jî şagirte. Gelek rêyên demokratîk a veguhestina asta civakê ya vê ferasetê dikare bê pêşxistin.

Qasî gihiştina ferqa wate û girîngiya perwerdeya ku wek rêbazek serkeftinê xwe îspat kirî re, xwe perwerde kirin û fêrbûyîna rê û rêbaza wê jî esas e. Ferqa temen û zanatî-danehev ne girîng e. Çarçove û dem li gorî pêdiviyê tê diyar kirin. Lê di bingeha xebatên perwerdeyê de, nêrînek yekpare ya bi çavê perwerdeyê li jiyanê mêze kirin heye. Pergalên akademî-dibistanê parçeyek vê ferasetê ne; jiyanê dikin mijara perwerdeyê ye, ji jiyanê fêr dibin û çiqas ji guhertinên jiyan pêwîst dike bibe bersiv, ev perwerde tê domandin. Encamên perwerdeyê bi pratîkê ve tên ceribandin û ev jî dibe wesîleya ku carek din rêbazên perwerdeyê li ber çavan bên derbas kirin. Ango perwerde ji pratîkê qut nîn e. Perwerde timî cerebeyek jiyanî û pêvajoyek azadbûnê ye. Eger feraseta perwerdê kesayetek zana, ruh, exlaq-terbiye, dîsîplîn, îrade, bawerî, îdîa û şoreşgertî nede qezenç kirin, qabîliyetan dernexîne holê, pêşiya nûbûnan veneke, nebe wesîleya hê zêde xebat û pratîkek serkeftî, azadiyê nahilbirîne. Azadî di zîhniyet û kesayet de destpê dike. Di vê wateyê de dikare bê gotin ku perwerde beriya her tiştî ji bo guhertina zîhniyet û kesayet e. Ev di heman demê de dibe şerê xeta ku di zîhniyet û kesayet de tê rêvebirin. Ev şer, şereke ku li dijî hemû şaristaniya qirker tê dayîn. Li dijî her cure xapandin, hîle û derewên wî, şêwazê wî yê zîhnî û jiyanî şerek e. Pergala ava kirina civakî ya alternatîf a tevgera azadiyê ya ku ji pergal û bandorên serweriya hezar salan qutbûnê pêktîne û pêwendiyên wî yên bi gel re jî li ser bingehê perwerde û rêxistin kirinê pêşketiye. Rêya ku tu çiqas perwerde bikî ew qas dikarî rêxistin bikî derbasdar e. Çawa ku mirova/ê xwe perwerde neke û xwe rêxistin nekiribe, nikaribe ji civakê re pêşengtî bike, wê li ser bingeha rast jî nekare tekoşîna çînî û zayendî di xeta şoreşgerî de pêşbixîne. Li gel ku rastiyên herî zêde tên zanîn ev in, lê li gel wê jî ji ber ferasetên ku wekî pêwîst dike xwedî li xebatên perwerdeyê derketin çênabe an jî wek karek talî tê dîtin, lewra paradîgmaya me di asta ku heq dike de pratîze nabe. Li gel ku pergala me ya dibistan-akademiyê xwediyê tecrubeyek mezin e, lê eger bi awayek têrker encamên ku tên xwestin nayên bidestxistin pêwîste ev li her deverê bê rojev kirin û nîqaş kirin. Eger nîqaşek feraset û rêbazê bê rêvebirin, wê encamên wê di asta civakî de xwe nîşan bidin. Ji ber ku ji her demê zêdetir pêwîstî bi vê heye.

Di qonaxa ku şerê me gihiştiyê de, her kadro berpirsyare ku qasî deh kadroyên berê kar bike, ew qas berpirsyarî bigire ser xwe û erkên pir alî bicih bîne. Dema ku ava kirina civakî tê gotin dîsa rola ku li ber kadro dikeve, qasî nekare beşdariyên ji rêzê, navîn û rûtin rake mezin bûne. Şêwazên beşdariya pratîka teng, ji hindikahiyê re qeneat anîn û memûrvarî ji rizgar kirina rojê wêdatir tiştekê bi xwe re nayne, li hember pêvajoyê ji têkçûyînê cudatir nayê wateyek din. Rêbertî pir zelal û balkêş vegotiye: "Eger mejî nexebite wê ajo bixebitin." Rêya derbas kirina vê tekoşîna bîrdozî ye. Di şer û jiyanê de rêgeza ku neyê nîqaş kirin a serkeftinê, di tekoşîna bîrdozî de serkeftine. Perwerde qada tekoşîna bîrdozî ye; qada şer a navbera pîvana ne. Her kêliya berxwedana Îmrali ya ku 25 sal li pêy xwe hiştîn, bi serê xwe besî perwerde kirina mirov e. Ji ber ku Îmrali qada herî mezin a şerê bîrdoziyê ye. Dîsa berxwedan û ruhê fedaî ya ku li Mersîn, Enqere û li Zapê derketî holê, pîvanên perwerdê pir bilind kirine. Divê em bi vê pîvanê ve nêzîkî nirxan bibîn, li gorî vê bibîn xwediyê tempoyek xebatê. Bi heman şêweyî pêwîste di perwerdê de jî li ser bingehê vê xeta fedaî, zelalbûn û kûrbûnek hê bihêz bidestbixîn. Ji aliyê din ve tevgera we li seranserî cîhanê mezin bûye, paradîgmaya Rêbertî bi karakterê xwe yê gerdûnî ve mirovahiyê ronî dike û her roja ku derbas dibe ji aliyê beşên hê berfireh ve tê qebûl kirin. Li hember vê pirsgirêkên me yên pêşengtî û rêxistinî hene. Perwerde kirina kadroyê/a ku wan hemû pêşketinên leşkerî, siyasî, rêxistinî pêşwazî dike û xwe perwerde kirina li gorî vê ya kadro, xwe amade kirin pirsgirêkek bingehîn a perwerdeyê ye. Lêgerînên ku pirsgirêkên perwerdê serarast dikin an jî dadixîne asta teknîkî şaş in. Lê dema ku pirsgirêkên perwerde di bingehê de wek pirsgirêka ferasetê tê destgirtin, divê mijara rêbazê

neyê binirx kirin. Her çiqas feraset destpêka her tiştî be jî di pêşxistina feraseta rast de pirsgirêka rêbazê jî xwediyê girîngiyek diyarker e.

## Nêzîk bûyîna Şaş a ji Perwerdeyê re Nêzîk bûyîna Şaş a ji Jiyan û Şer re ye

Em di nava civakê de hatine, lewra em xwe bi perwerde kirin û bi Partîbûyînê re berpirsyarîn. Em biisrar jiber kirinên xwe yan jî tiştên ku em di nava tekoşînê de di qadên cuda de fêr bûn didomînîn û ji ber vê jî em nikarin ji pêdiviyên dema nû ya tekoşîna ku her diçe mezin dibe re bibîn bersiv. Divê em qasî jiber kirinên pergalê, jiber kirin û dubare kirinên xwe yên di nava tekoşînê de jî derbas bikin, rû bi rûbûnek heqîqî lazim e û pêwîste em rastiya xwe bikok bigirîn dest. Rêber Apo destnîşan kiriye ku em hewceye ji rastiyan nerevîn, rû bi rûbûna bi rastiyan re wê me hemûyan bihêz bike. Perwerde çawa ku xebatek rû bi rû hatinê be, her wekî din cihê qezenç kirina feraset û ezmûnê ye jî. Li vê derê beriya her tiştî feyde heye ku hindik be jî em bal bikişînin li ser meyl û lêgerînên şaş ên di vê demê de pir derdikevin holê. Her çiqas hemû qadên perwerdeyê ji bo hedef û armancek hevpar be jî, mufredat û rêbazên her qadê li gorî pêdiviyên wan ên xweser diguherin. Lê li gorî meylên ku tenê perwerdeyên teknîkî, branş û her wekî din dadixînin asta teorîk û têrkeriyê li vê derê digerin; 'divê perwerdeyên bîrdozî-felsefîk ji naverastên cuda yên perwerdeyê re bên' hiştin. Lê belê dema ku Rêber Apo alternatîfa pergala kapîtalîst çêdike, bitaybet destnîşan dike ku pêwîste bi wî (modernîteyê) re heman rêbaz neyên bikaranîn ku ev jî xala herî girîng a kar e.

Yanê tenê bi nêzîk bûyîna teknîkî ve bidestxistina serweriya profesyonel û pîsporiya li hember rastiya şaristaniya qirker têra nake. Ev teknîk li dijî çiye, wê bi kîjan armancê ve, kengî û wê bikaranîna wê çawa be, pirsgirêkek siyasî-bîrdozî-felsefî ye.

Dîtina ne girîng a teknîkê yan jî berevajî bicih kirina teknîkê ya cihê her tiştî ne pirsgirêkek rê û rêbazê ye, pirsgirêkek bîrdozî-felsefî ye. Qasî nêzîk bûyîna rast a ji teknîkê re, bidestxistina asta kesayet a ku wê teknîkê li ser bingehê rast bikar tîne jî pirsgirêkek bingehîn a perwerdeyê ye û ev pirsgirêk ji perwerdeya teknîkî nayê veqetandin û nêvengên perwerdeya bîrdozî re nikare bê hiştin. Helbet ferqek heye û lêhûrbûyîna mufredatê li gorî qada pisporiyê tê diyar kirin. Pirsgirêk ji nêzîk bûyîna ne yekpare tê. Ji hev veqetandina bîrdozî û teknîkê yan jî ji aliyê mekan, pergalê ve li pirsgirêkê mêze kirin, di mijara teknîkê de pêşiya bandorbûyînek bihêz venake. Tam berevajî yan wê ji ne serkeftinan hincet bên nîşandan an jî wê 'bandorbûyînek' ji armancê qut pêşbikeve ku rastiyeke yên li ser vê bingehê nêzîk dibin erk û berpirsyariyên şoreşgerî yên wekî tekoşîna çînî, zayendî û xetê didin aliyekê pir mekanîk ku taybetmendiyên qadan, hele ku erdnîgariyên cuda û beşên civakî mijara gotinê bin; hetanî ku dîrok û çandên wan, pergalên wan ên baweriyê û taybetmendiyên wan, ji pir aliyê ve neyên zanîn û nêzîkatiyek li gorî vê neyê raber kirin, mirov bixwaze naxwaze jî wê perwerde pir seranser û razber derbas bibe. Eger di wan qadan de pratîk dubare dibe û biawayek têrker pêşnakeve wê demê asta perwerdeyek ku li gorî xweseriya qadê guncav nehatiye bidestxistin. Her çiqas di meseleya dubare kirina perwerdeyên giştî de girîngiya rêbazê hebe jî, ya ku dubare dibe di eslê xwe de ne perwerde kesayet bixwe ye. Bes ji ber vê hesabgerî de bin û di encamê de li gorî xwe vesaz kirin, li gorî xwe erk an jî qad bixwazin. Eger bê ferq kirin ku ev ferasetek çiqas derveyî partiyê ye, wê ji şêwazê tevlîbûyîna mirov û hetanî tiştek nemîne ku mirov nexîne li ber lêpirsînê. Ji ber ku ev feraset xwe li gorî partiyê eyar nake, berevajî li gorî xwe şikl dide Partiyê. Hatiye dîtin ku eger hinek jî kevin be yan jî di pratîkê de beşdariyek diyar çêkiribe, vê jî ji xwe re dike sermaye û xwe bi şêweyên cur be cur disepîne. Di demên ku pîvanên beşdariyê bilindibin de ev cure pirsgirêk xwe hinek jî birêyên ne rasterast, bihincetên cuda û rûpoşên cuda nîşan didin, lê mesele ew bîrdozî yên ku di demên diyar ve tên lidar xistin de, dibe wesîleya lêhûrbûyîn, moral-motîvasyonek hê baştir. Lê di her kesî/ê de encama ku tê xwestin timî nayê wergirtin an jî hinek caran bûyerek qasî ku hemû perwerdeyê sabote bike derdikeve pêş. Divê li hember wan rewşan hê baldar û bi rêbaza dewlemend ve nêzîk bûyîn çêbibe. Minak dema ku rewşek suc tê jiyan kirin hemû pêkhate pir zêde bi wê re mijûl dibin. Qasî helwesta rêxistinî ya ku ev pêwîst dike eleqe bê nîşandayîn û têgihandin girîng e. Lazim e encamên wê jî vegerîne perwerdeyê, lê eger ji pêwîstiyê zêdetir rojevê dagir bike wê hemû perwerdê vala



beşdar dibin, ji civakbûyînê dûr dikevin, ji ber ku xwe nû nakin nikarin xebatên jî pêşbixînin.

Bikurtasî nêzîkatiya ji bîrdoziyê qut ji qadên ku pisportî pêwîst dike nikare bê raber kirin, lê pêwîste di lêhûrbûyîna mufredatê de pêdivî û hevsengiya lazim dike li ber çavan bê girtin. Nexwe wê her qada perwerde temamî bişibe hev û wê encamên tê xwastin neyê wergirtin. Çawa ku perwerdeya şervanê nû û perwerdeyên dibistana kadro di heman astê de nebin, perwerdeyên jin, ciwan, ava kirina civakî, qada leşkerî, branş, qada siyasî û her wekî din jî pêdiviyên wan ên pêşî tên esas girtin û welê tên li dar xistin. Lê hinek caran ji ber nêzîkatiyên ku xweseriyan nadin li ber çavan perwerde dişibin hev û jiyan kirina dubare dibe bivê nevê. Dema sedemê ferasetên ku vêya wek cezayekê dibînin ne hindik in. Lê belê wek xwezayî naverasta perwerdê di heman demê de naverastek hesab dayînê ye. Naverastek ku pratîk tê lêpirsîn kirin, tecrûbe tên wergirtin û bi wan re hesab tê dayîn hesab tê standin. Lê ferasetên ku vêya wek bêvil kaşkirin, ceza kirin an jî wek kevirek hilavêtinê dibînin; di rastiyê de ji xwe hez dikin û ji hesab dayîn an jî ji rû bi rûbûna rastiya xwe direvin. Ji ber ev wiha ye ji rêgeza perwerdeyê tawîz nikare bê dayîn. Ji ber ku perwerde herî zêde jî cihên dahûrandina wan cure ferasetan û zelal kirina kesayetên wan in. Sekn û beşdariya kesayetên ku perwerdeyê tenê wek mecbûriyetekê an jî wek rawestgehek demkî dibînin, yên ku bi zanebûna şêwazek jiyanê ve tevnagerin; wê timî di tarzê e ku di heman de eynî ye; ne ji tekoşînê re, ji hest û nêrînên xwe re mîlîtanî dike! Demek pirsgirêka perwerdeyê dibe yek jî qadên ku sepandinên wiha takekesî çareser dike di pîvanên fedaîtiyê de zelaltiyê bidestdixe.

Dema ku fedaîtî tê gotin hinek caran ji aliyê wê ya jiyanî dûrketin û derxistina pêş a pratîka teng pêkan dibe. Lê Rêber Apo herî zêde jî bi sekna jiyanî ve fedaîtiyê dinirxîne. Eger li hember jiyana Partiyê xwe berpirsiyar dîtin çêbibe, bi şêwazê xwe yê jiyanê ve ji derdora xwe re bibe mînak, li hember pirsgirêkan gazin kirin çênebe an jî bêrêgez tevnegere, wê demê wê perwerde hê zêde encam bigirin. Wê bi vî awayî li dijî pergala qirker seknek fedaî bi kîn û tolek dîrokî ve hê zêde pêkan bibe û wê vegere rewşek domdar. Perwerdeyên derbixîne. Lê hêza perwerdê ne civata sucdaran e. Heta kesê/a ku sucê wî/ê heyî jî bi hemû temenê xwe ve ne sucdar e û wê wek sucdar jî nemîne. Ev nêzîk bûyîn dijî diyalektîka guhertina jiyan û perwerdeyê ye. Ji her pirsgirêkê re li gorî giraniya wê nêzîkatî nîşandayîn û bêyî ku pir zêde belavî demê bike li ser bingehê qezenç dike çareser kirin û dîsa bêyî ku li bûyeran biqelibe çareser kirin û derxistina pêş a ferasetê û aliyên herî diyarker a şêwazê Rêbertiyê ye

Divê di pratîkê de jî pêvajoyên perwerdeyê bên şopandin û mayînde kirin. Dema ku ji vî aliyê ve bê mêze kirin di naverasta perwerdeyê de bi hedefa guhertin-veguhertinê ve, fêr kirina ku kesayet xwe perwerde bike, ji vê re îqna kirin û rê û rêbazê wê fêr kirin, hê zêde girîng e.

Guhertin-veguhertin îdiayek mezin e û domdariya wê heye. Çawa ku di nava demek diyar de nayê bicih kirin, rêbaza vê ya yekane jî ne perwerdeya gelemperî ye. Lazim e kes bizane xwe perwerde bike. Bi vê re hinek caran bûyerek pratîkî yan jî cihêtiyek ku di mejî de zelal dibe û di kêliyê de gihiştina ferqa tiştekî, ji perwerdeya bisalan hê zêdetir û bilez dibe wesîleya guhertinê ku jixwe Rêber Apo jî dibêje "Zanîn gihiştina ferq e." Çawa ku lêhûrbûna perwerdeyê ji pratîkê re ne qutbe di cewher de lêhûrbûyînek pexemberî ye. Heta dikare bê gotin ku rasterast karê 'evînê' ye. Ne hêsan e. Di pirtûka "Sekvan" a ku berxwedana Şêx Seîd vedibêje de, behsa komek ku li gundekî ji bo serkeftina Şêx Seîd û hevalên wî dia dikin û dikevin zikrê, dike. Leşkerên Tirk di wê kêliyê de gundan dişewitînin û kesên gund ne terikandin, qetil dikin. Lê li gel vê jî baweriya wan kesên ku dia dikin ew qas xurte ku ji zikrê dernakevin û li gel ku bi malê re tên şewitandin jî, lê dema ku di nava agir de ne jî dîsa dia kirinê didomînin. Ev qifilkirinek çawaye, ev baweriyek çawaye? Eger bimirin jî bi dia û zikrên xwe ve pêşiya serkeftina şervanan vedikin. Bawerî bi vê tînin. Ji ber vê jî li gel ku derfet jî hene, lê narevin. Helbet em asta vê eşqê ya herî pêş di hevalên fedaî de dibînin. Di şerê Zapê de jî gelek mînak wiha hatin jiyan kirin. Di nava herikînê de bûyîn ji aliyekê ve eşqê jî vedibêje. Danîel Golaman di pirtûka xwe de dibêje ku di nava herikînê de bûyîn dibe asta herî zêde û asta herî jor a eqlê hestan. Ev nîqaş pir balê dikişîne û me hemûyan arasteyê lêhûrbûyînek hê cewherî dike. Ev pêşî li vedike ku mirov biçavê hezkirinek mezin li hemû hevrêyên binêre. Bedewiyên di wan de hê zêde derbixîne holê û bihêle ku mirov bibîne. Cihêtiya ku mirov dike mirov, hestên merhamet û edaletê, hîs kirina heqîqetê; dikare ji çavan hê girîngtir, rol bileyîze. Çav dixape lê dil naxape!



Einsteîn gotiye "Xeyal kirin ji zanînê hê girîngtir" e. Mozart jî dibêje "Ne eqlê jîr ne hêza xeyalê û ne jî her du bi hev re dikarin afirînerekê biafirîn in. Hez kirin, hez kirin, hez kirin… Vaye ev afirînerî bixwe ye." Em li ser wan gotinên cewherî dikarin bêjîn ku ne dîtina biyanîbûnê, asayî dîtina jiber kirinên pergalê û avaniyên wî yên zanînê; hem eql û hem jî hîskirina dikuje. Ev bixwe pêşnakevin. Modernîteya kapîtalîst bi wan rêbazan ve li ser piyan dimîne. Tenê kêrî-girse na afirîne di heman demê de kesên ji xwe re muxalîf dibîne jî sewqî rêya şaş dike, xwediyê ezmûn û tecrubeya têkbirinê ye. Eger davikên pergalê qasî analîzên wî yên cur be cur di asta paradîgmayê de neyên destgirtin û fahm kirin, ji wan xelasbûyîn ne pêkan e. Şoreşgerên herî zêde bawerî bixwe dianîn jî ketine vê davikê. Ji ber ku eql û hîs ji perwerdeya pergalê re derbas bûne, lewra xeteriyên ku çavkaniya xwe ji dijmin digirin nayên ferq kirin. Lîberalîzm ev e: Civakbûyîn lewaz dibe, zanîna xweparastinê kor dibe û xetek jiyanê ya ku ji îxanetê re vekirî pêşdikeve.

**Piştî ku Rastiyek Nekeve Mejî Deh Fîlozof jî bên Valaye!**

Ji bo ku mirov li hember dijmin bigihije danehevê perwerde pêwîst e. Tenê agahiya teorîk ne armanca esas a perwerdeyê ye. Ev jî wê bê zanîn, lê şêwazê Rêbertî tenê bi daneheva teorî û agahiyê ve sînordar nîn e. Di nava hunermendên ku sedsala 20'an de dixwestin kirêtiya kapîtalîzmê nîşan bidin Hugo Ball tê, Ball dibêje "Di cihê ku agahî wek prensîbek herî bilind derdikeve pêş de çoş û ruh teqez" dimirin. Ezmûnên mirovahiyê ev jî piştrast kiriye. Di qadên ku hikmtiya dewlet û desthilatdariyê didomin de pir zêde 'zanîn' û ezmûn tên bidestxistin, lê ji ruh û maneviyeta civakî tiştek namîne. Sedemek vê jî şêwazê bikaranîn û çawaniya zanînê ye. Di vê wateyê de dema ku em çavkaniyên zanistî yên cîhana ku em avaniyên wan ên zanînê dixînin liber lêpirsînê dixwînîn, neçarîn ku baldar nêzîk bibîn. Eger vegotinên ku ji me re cazîb tên bi paradîgmaya me re dikevin nava dijberiyê, em mecbûrîn ku cîhana xwe ya hest-fikrî bixînin liber lêpirsînê. Bi vê re hewceye ji bîr nekîn ku çavkaniya esas a zanînê jiyan bixwe ye. Di civaka xwezayî de zanîn pîroz bû, ji ber ku ronî dikir. Di pergala şaristaniyê de jî 'zanîn' ji zanînê derketiye û reş û spî tevî hev bûne. Ji ber vê sedemê lazim e em zanînên xwe ji parzûna paradîgmayê re derbas bikîn. Nexwe wê li gorî me rastiyên me çêbibin, em ê timî di wan rastiyên ku em dizanîn de israr bikin û nekarîn şaşitiyên xwe bibînîn.

Dibêjin dema ku rojekê Îbnî Sîna bi kerê xwe yê ku pirtûkên xwe barkirî ve rêwîtî dike li ber aşekê sekinî ye, di bexçeyê de bêhna xwe vedide. Aşvan gotiye ku wê baran bibare û ew vexwandiye hundir, lê wî gotiye ku hewayê baranê tuneye û mayîna derve tercîh kiriye. Piştre birastî jî baran dibare. Îbnî Sîna bi pirsa "Min ew qas pirtûk xwendiye, lê min dîsa jî fahm nekir ku wê baran bibare, te çawa fahm kir?" ji aşvan pirsiye. Aşvan tenê bi rastiyek sade ve bersivek tijî ders dide û dibêje "Ji ber ku kûçikê min ket hundir lewma!" Jiyan di pirtûkan de bicih nabe. Ji ber vê sedemê ye ku gotine 'piştî ku rastiyek nekeve mejî deh fîlozof jî bên vala ye!' Ji ber wê jî bidestxistina hê baş a fahm kirinê hê zêde bi nîqaşê ve dikare pêşbikeve, lê zimanê vegotinê ya perwerdeyê jî girîng e. Çawa ku vegotinek hişk a xwe tenê dispêre zanîn û neguhertinê ne cazîb be, nabe zimanê heqîqetê jî. Rêber Apo di parêznameyên xwe de behsa şiklên cur be cur ên heqîqetê dike. Dema ku vegotinên mîtolojîk, olî, felsefîk û zanistî di nava hev de bên pêşxistin, wê demê gihiştina zimanê heqîqetê pêkan dibe. Bitaybet jî li hember nêzîkatiya ku eqlê analîtîk derdixîne asîmanan a pozîtîvîzmê; girîngî bide hêza hîskirinê ya di mirov de, nirx bide baweriyê û di wan vegotinên bingehîn de jî serî li mînakên çîrokî bide, wê demê dikare astek hê cazîb û tê fahm kirin biafirîne.

Ji ber vê sedemê Rêber Apo dibêje "Çîrok, di qadên ku bûyer û pêwendî nikare bên hejmartin de rola amûrek ku alîkariya herî binirx dide zanistê dileyîze. Ola ku pozîtîvîzm tê gotin, bi serê xwe nikare ew qas bûyer û pêwendiyan bihejmere û tespît bike, lewra ji bo pêşxistina zanistê serî li ol, exlaq û cureyên din ên hunerê dayîn wê bibe rêyek hê rastir."

Em hemû bi pratîka xwe ya jiyan û tekoşînê ve ji Rêbertî fêr dibîn. Parêznameyên Rêber Apo li her deverê hene. Yanê em ne di rewşek ku yek yekî din tewanbar bike, ji perwerde nekirina xwe re bike hincet de ne. Her wekî din mafê me jî tuneye ku em bikevin navbera Rêbertî û yekî/ê din. Em nikarîn li gorî xwe şêwazên perwerdeyê pêşbixînîn. Di rêbazê de li ser navê dewlemendiyê; derveyî perwerdeya Rêbertî, nêzîkbûyînek din nayê qebûl kirin.

Di perwerdekariya Rêbertî de her tişt zelal e. Ji bo ku hê baştir bê fahm kirin, bê têgihiştin divê bê nîqaş kirin.

Di rêbaza nîqaş kirinê de derbas kirina razberiyê, qasî ku em bikarîn daxînîn civakbûyîna xwe, pêvajoya ku em jiyan dikin, pratîka xwe û kesayeta xwe şênber û kûr kirin, dibe rêbazê esas. Divê ji bo dewlemendiyê her kes li gorî pêdiviyên xwe di rêbazê de bernameyên pêvek derbixîne û nîqaş rêvebibe, çavkaniyên dîtbarî amade bike, li cihekî ji bo nîqaşa azad naverastekê çêbikin, hewl bidin fikrên cuda derbikevin û bi nîqaş kirinê ve bigihijin hevpariyê; dahûrandinên kesayet ên ku Rêbertî berê çêkirîn bikin parçeyek nebe nabe yên hemû perwerdeyan, di çarçoveya mijarê de nîqaş rêvebibin û bi periyodên diyar ve mijar diyar bikin û bi dahûrandinan ve destek kirin wê pir bandor bibe. Dahûrandinên dîtbarî û nivîskî yên Rêber Apo bên temaşe kirin an jî bi berhev kirinê ve bên xwendin û kûr kirina nîqaş a di çarçoveya mijarek diyar de jî wê hê encamgir be. Mînak biryarek giştiye ku di her qadê de li ser burjuwaziya biçûk û lîberalîzmê nîqaş bê kirin. Em neçarîn ku li kîjan devera cîhanê bîn û di kîjan xebatê de bîn bila bibîn, pêwîste vê mijarê bixînin rojeva xwe û du rojan

carekê nîqaş bikin û cihêtiyekek biafirînîn. Di vê mijarê de broşura binavê “Di tekoşîna şoreşgerî de burjuwaziyê biçûk û rola li Kurdistanê ya burjuwaziyê biçûk” a ku di weşanên Serxwebûnê de derketî, çavkaniyek pir dewlemende. Dîsa dikarin sûd ji pirtûka binavê “Rexneya bîrdozî ya burjuwayê biçûk” a Maksîm Gorkî werbigirin ku tespîtên pir balkêş kiriye. Di roja me de jî rastiya xwe diparêz in. Dîsa dikarin dahûrandinên Rêbertî di dîrokên cuda de kirîn berhev bikin û di her astê de ji wan sûd werbigirin. Di mijara lîberalîzmê de jî nirxandinên berfireh di parêznameyan de hene. Ji bo ku em jiyana xwe, taybetmendiyên kesayeta xwe û pîvanên xwe yên tevlîbûyînê bixînîn liber lêpirsînê, dikare bê gotin ku ev cure nîqaş hestiyê pişta perwerdeyê ne.

Dogmatîzm li pêşiya zêhnê azad û afirîneriyê astengiya herî mezin e. Dema ku perwerdeyên me derbas kirina dogmatîzmê hedef dike divê ne bikeve şêwazê lîberal û ne jî rêbazên dogmatîk. Eşkereye ku bi jiyanek hatî lîberalîze kirin ve û bi şêwazek fikrî ya ku bin giraniya dogmatîzmê ve, em nikarîn ji guhertin-veguhertinê re bibîn bersiv. Gava ku ji uslub û hetanî şêwazê tevgerê gorxwe bûyîn tê rexne kirin, bi bersiva ‘hewce nake ku mirov ew qas dogmatîk be’ re, vala tê derxistin û ji aliyê din ve dikare lîberalîzmê ferz bike. Bi heman şêweyî dikare bi nêzîk bûyînên paşverû yên wekî dijbertî, pevçûn, ehbabtiyê ve tekoşîna çînî û zayendî lewaz bike û pîvanan ber bi paş ve bikişîne. Cihê ku wan bike mijara perwerdeyê, bide fahm kirin, bi nêzîk bûyînên çors û rêgezparêziya hişk û direvîne ve tenê pirsgirêkê ditepisîne.

Dema ku çareseriyek cewherî pêşnekeve şikltî, teqlîd û jiber kirin derdikevin pêş. Ji aliyê meseleyan ve dubare kirinek ku bêzar dike û direvîne tê jiyan kirin. Vekiriye ku eleqeya vê bi şêwazê perwerdê ya Rêbertî re tuneye. Gava ku çûyîna birêbaz a li ser pirsgirêkan nekare serbixîne, hele ku ji bo vê keda pêwîst nede; ji nedîtî ve hatin, paşxistin û xemsarî pêşdikeve. Bi ferz kirina pêdiviyên pratîkî ve jî pêşketinek pragmatîst a ku tekoşîna navxweyî (partî) dide aliyekê û nehatî binav kirin derdikeve holê. Nêzîkatiya pirsgirêkan dide aliyekê yan jî dinixûmîne dibe sedem ku pirsgirêk her ku biçe giran bibin û di encamê de pêşiya encamên hê zehmetir bê vekirin. Di rêbazê de neketina lez û beziyê û sebr kirin girîng e. Dema ku pêwîst dikir Rêber Apo hetanî salekê hevalê/a ba xwe rexne nedikir, tenê li ser bingeha ku ji vê re amade bike eleqe nîşan dida. Niha hinek deveran bêtehemiliyek zêde tê jiyan kirin. Bi vî awayî kes, qad û di encamê de zerar ji tekoşîna Partiyê re tê dayîn.

Ji bo ku pêşiya wan pirsgirêkan bê girtin, ji rêbazên perwerdeyê re rola mezin dikeve. Eger rêbaz têgihandin û qezenç kirinê esas nagire di destpêkê de şaş e. Lê dema ku cihê wê hat pêvajoyên rêxistinî nehat xebitandin gava ku pêwîst dike nebe hêza dane kirinê ev jî şaş e. Ew perwerde nabe zelalker. Nêzîkatiyên ditepisîne yên ku her kesî/ê dixîne qalibekî yan jî nêzîkatiyên lîberal ên ku dîsîplîn û şêwazê jiyana rêxistinî xera dike; tenê bi sabote kirina perwerdeya Partiyê re sînordar namîne, di heman demê de kes û qadê ji êrîşên dijmin, pêkanînên şerê taybet re vekirî dihêle. Berdevkên koalîsyona faşîst ên Tirkiye bigotina ‘em ê pêşiya tevlîbûyînan bigirîn, yên me nekarîn pêşiya wan bigirîn jî em ê bînîn rewşek welê ku beşdar bibin jî, bisalan rêxistinê mijûl bikin!’ ve gotinên ku lêhûrbûyîna şerê taybet dide der serf kiribûn. Perwerdeya şoreşgerî panjehra wan hemû êrîşên şerê taybet in. Bi vê re eger bandora ku kompioya navnetewî li ser kadroyan çêkirî li ber çavan bê derbas kirin, li ser bingehê dahûrandinên Rêbertî lêhûrbûyînek sosyolojîk û felsefîk bêçêkirin, wê demê wê kadro bikare xwe bigihijîne asta perwerdeyek ku ji pirsgirêkên kadro û kesayet re bersiva hê bihêz çêdike.

## Felsefeya me ya Perwerdê Felsefeya Vegera Cewher û Azadiyê ye

Felsefeya ku perwerdeyên me jê xwedî dibe, bawer dike ku mirov dikare bêsînor biguhere veguhere. Gotina “Ez ev im, naguherim” tê wateya înkara karakterê diguherîne ya felsefe û perwerdeya Rêbertî. Ev di wateyekê de ji aliyên xwe yên nebes û paşverû re teslîm bûyîne. Yek jî xapandinek wekî ‘min ji Partiyê tişta pêwîst girtiye, ji aliyê perwerdeyê ve tişta ku ez bikarim bigirim tineye’ dibe mijara gotinê. Helbet her tişt ne meseleya perwerdeyê ye, lê di vê mijarê de xwe bes dîtin, hizirandina ku êdî tiştek bigire nemaye jî li dijî diyalektîka pêşketina mirov û jiyanê ye. Ev jî dibe şiklek cuda ya ji reva guhertinê. Reva ji perwerdeyê yan jî li gorî girîngî û wateya wê cidî nêzîk nebûyîn, tê wateya israr kirina koletiya ku em dibêjîn sucdariya dîrokî û pêwîste perwerdeya li dijî wê wek nîmeta herî mezin bê pêşwazî kirin.

Rêber Apo dibêje “Şoreşgertî timî dihizire, dipirse û ji bo civakê ya herî baş, herî rast çibe lêdigere û hewl dide bibîne. Mafê jiyanê encax wiha dikare bê qezenç kirin. Hûn encax wiha dikarin bigihijin ferq û wateya hebûna xwe, hebûna civaka me û wiha dikarin biparêzin. Hûn dikarin wiha rûxariyên xwe derbas bikin. Nexwe bi gotina vaye ez hatim, ez ji mirin û kuştinê re amade me û bi nîv zanînê ve ev kar nameşin. Neteweyek wiha rizgar nabe. Ev zemîn ji bo me hemûyan fersendek e, eger hûn cidî nêzîk bibin hûn dikarin xwe ji nû ve û bi şiklek hê rasteqîntir biafirînin...” Hinek caran ji bo perwerdeyê pêwîstiya fersend afirandin û cidî nêzîk bûyînê heye, ev bigotinê nabe; bi arasteyên dijmin ve bi ezmûnên ku hatin jiyan kirin ve tê fahm kirin. Em li dijî êrîşa qirkirinê di nava berxwedanê de ne û em neçarîn ku xwe li gorî vê rastiyê perwerde bikîn. Em hetanî ku vêya nekîn nikarin azadiya xwe bidestbixîn. Asta perwerdeya rêxistina fedaiyan û rastiya gelê ku bilehengî şer dike, dîrokê diguherîne. Dema ku kesayet wan guhertinên dîrokî dibîne di fahm kirina hêza xwe de ya guhertin û veguhertinê da zehmetî nakişîne. Lê gava ku bi berpirsyariyek dîrokî ve tevnegere ne pêkane ku asta wî/ê ya perwerdeyê bîne rewşa kûr û domdar. Pêwîste bê hizirandin ku perspektîfa dîrokî ya perwerdeyê ji civakê qut nabe, ji bilî vê ji ber dîrok û sosyolojî di nava hev de wê bên destgirtin, lewra divê ya herêmî û gerdûnî jî bi hev re bê hizirandin. Lêkolîna taybetmendiyên xweser ên her herêmê, tespît kirina aliyên wê yên erênî-neyînî, di vê mijarê de berhev kirina analîzên kesayet û karakter ên ku Rêbertî kirîn, di mijarên cur be de nivîsandina broşuran, veguhestina wan a ji naverasta perwerdeyan re; li ser navê bidestxistina pêşketina şênber û veguhestina wan a ji civakê re, pir girîng in. Em dikarîn di vê mijarê de nebesiya xwe bi dahûrandinên Rêbertî ve bibînîn û derbas bikîn: “We malbatên xwe, gundên xwe, bajarên xwe hiştin û hûn hatin, ev rast e, lê we nekarî di asta fikrî de derbas bikin. Gelek pirsgirêkên ku hûn di nava partiyê de jiyan dikin çavkaniya xwe ji vê digire. Hûn şûna ku berê xwe bidin karên mezin we hewlda ehbab çawiştî, hemşerîtî, hevdu eyar bikin, bûn bav an jî dayîka cihê ku hûn dimînin. Hez kirina we jî cahîlane ye.” Nêzîkatiya cahîlane nêzîkatiyek ji rêzê ye. Lêpirsînên felsefîk nahewîne. Ne kûr e rûxar e. Cihê ku şêwaz, tempo û usluba Rêbertî bê girtin, wek hestiyarî navê Wî tê bîranîn û bi girêdayînek çors ve nêzîkatî çêdibe.

Lê belê Rêber Apo bi paradîgmaya xwe ya modernîteya demokratîk ve avakirinek nû ya civakî, nasname û kesayetek nû têşe dike. Li gorî vê di rexne-rexnedayînê de kûr bûn, guhertin-veguhertin bidestxistin hedefa bingehîn a perwerdeyê ye.

Hans George Gadamer dibêje ‘yê ku xwe nexîne liber lêpirsînê wê bikeve rewşa palyaçoyan.” Gadamer difikire ku pêwîste wate ne di bûyerê bixwe de di şîroveyê de, di kesên ku şîroveyê dikin de bê dîtin. Nêzîkatiya me ya ji dîrokê, civakê, kes û bûyeran re şîroveyek lêpirsîner esas digire. Dema ku em xwe dixînîn liber lêpirsînê em kîjan pîvanan esas digirîn? Ji bo ku em bersiva rast bidin vê pirsê Rêber Apo dibêje ku pêwîste hûn felsefîk bihizirin. Gava ku dibêje “Hûn ji Min hez nakin jî!” vêya jî di wateya felsefîk de dibêje. Divê em ji xwe, hizr û şêwazê xwe yê baweriyê, rê û rêbazên xwe guman bikin-giran jî be- em wiha fêr dibîn. Di wateyekê de eger guman tunebe, felsefe tuneye.

Em dikarîn felsefê wek rêya hikmetê binirxînîn. Hîkmet taybetmendiyeke ku mirov ji hundir ve qezenç dike. Ji derve nayê fêr kirin. Em dikarîn li vê derê tenê li ser mînak û taybetmendiyên cur be cur ên rêya hîkmetê ku rêyek çawaye lêkolîn bikin û bihizirîn. Em dikarîn bi vê sayê nirxê felsefe heq dike jî radest bikin û wê di şexsê xwe de zîndî bikin. Di vê mijarê de dîroka me ya civakî xwediyê potansiyelek pir dewlemend e û derxistina naverastê ya nirxên ku di hefizeya me ya civakî de jiyan dikin, wê bihêle ku perwerde hê zêde encamgir be.

Wek tê zanîn piştî serdema Neolîtîk li derdora desthilatdariya ku di şexsê mêrê bihêz û qurnaz de şiklek pêşket. Azadiya civakî di şexsê azadiya jinê de ket xeteriyê. Ji bo vê jî xweda û mîtolojiyên derew hatin pêşxistin. Dem dema mîtolojiyên ku koletiyê rewa dikin. Li derdora bajar-çîndewlet de şaristanî tê pêşxistin. Bi vî awayî li ser xwezaya civakî destwerdan tê kirin; civak tê



parçe kirin. Em dibînîn ku vê pêvajoyê şûnve hemû bawerî bi tekoşîna tarî û ronahî û bi tekoşîna di navbera wan de tê îfade kirin.

Mîtraîzm baweriya vê serdemê ye. Herî kêm dîrokek wê ya 6-7 hezar salî heye. Mîtra xweda-xwedawenda rojê ye. Jin an jî mêre, nayê diyarkirin. Di zimanê Hîndî de tê wateya dost, hevrê, heval. Tê gotin ku di Avesteyê de tê wateya li hevkirin-peymanê. Şahidê li hevkirinan e. Li ser navê wê/î sond tê dayîn. Stêrk çavên Mîtrayê ne, her tiştî dibîne. Wek tê zanîn wê demê hilbirîna esas çandinî ye. Ji bo civaka çandinî roj, tavehîv, stêrk jiyanî ne. Di çavkaniya Mîtraîzmê de çandinî heye. Piştre navê Mazdaîzmê hildaye. Bi heman awayî baweriya xak û hilbirînê ya civatên Aryenîk e. Zerduşt navê baweriyê ye. Wateya wê ew qas bihêze ku xwe bi hunerê îfade dike; bihûşt wek mala şarqê tê binav kirin. Felsefe di vê demê de nav qezenç dike.

Hevalên di zîndanê de lêkolîn kirine, dibêjin ku di Kurdên berê de ji felsefeyê re Zinnase hatiye gotin; ji Avestayê hatiye girtin, dibe hezkirina agahî-hîkmetê. Pênase rast e, lê dibe ku nav tam ne welê be. Tîpa J a di Kurdî de di Farisî de vedigere Z yê. Dema ku em têgeha Zinnase ya ku di wateya felsefeyê de tê hatî bikaranîn mêze dikin, tîpa Z'ya li vê derê ji ber ku Farisî ye, lewra Kurdiya wê dibe Jinnase. Wateya wê naskirina jiyanê ye, dibe ku zanista jinê ya destpêkê be, jîneolojiya wê demê be û qet guman tuneye ku pêşengên wê jî jin in. Ev pênase pêşiya têgeha felsefeyê hatiye bikaranîn – ji ber ku wateya wê têkildarî jiyanê ye- hê rastir tê. Yên ku di dema Zerduşt de li ser vê serwerî çêkirîn re Mêj dihat gotin. Bi demê re navê mug girtiye, di dema Sasaniyan de jî mobed jê re hatiye gotin. Li gorî çavkaniyên di dest de ji pêşengên ku di dema Babîlan û hetanî Medan de ilm fêr dikirin re, Zerbab hatiye gotin. Erbaba di roja me de yanî peyva hosta çavkaniya xwe ji wê derê digire. Di Êzdatiyê de jî ji aliman re heman nav tê dayîn. Dikare bê gotin ku ev nav hetanî dema Mîtraîzmê diçe. Di Farisiya roja me de ferzane, di Kurdî de jî-di zaravayên Soranî-Hewramî de- firezane tê gotin. Tê wateya kesa/ê pir tişt dizane û alim. Civak jiyana xwe bi xwe wate dike.

Bi destê pêşengan ve vedigerînin perwerdeyê. Temamî ji bo civaka wî/ê ye û dilxwaze. Kesên destpêkê bi pere ve perwerde didin, li Yewnanîstanê tên dîtin. Ji wan re sofîst dihat gotin. Fîlozofên wekî Sokrates wan şermezar dike. Dema ku pere dikeve nava kar bi pênaseyek herî giran ve wek cureyek fahîşetiyê tê dîtin. Cureya madiyatparêziya ku wek fahîşetiya Zanistê tê binavkirin, bingehê rizandina hemû civakê ye. Bila pergalek darayî ya qasî têr bike ya her qada xebatê hebe, lê li vê derê mijara ku em nîqaş dikin ne xwe fînanse kirine; li şûna maneviyatê madiyat tê tercîh kirin. Dikare bêgotin ku li dijî vê perwerde, dibe tevgera xwe vegerandinê. Vegera feraseta jiyana wekhev û azadixwaz a civaka jin dayîkê. Di vê wateyê de perwerdeya tevgera azadiyê, perwerdeyeke ku bi nasname û bîrdoziya jina azad ve wekî ku xwe ji xweliya xwe ve carek din diafirîne. Perwerdeyeke ku xwe digihîne dîrokê û dîrokê diguherîne.

## Bi Ferasta Gerdûnî ve Ber bi Yekitiya Akademiyan

Ji bo tevgera me ya ku hemû tekoşînên civakî mîrat wergirtî; rêya bidestxistina encam û serkeftinên mayînde ya li hember modernîteya kapîtalîst, ji ava kirina modernîteya demokratîk re derbas dibe. Demokratîk modernîte di zîhniyetê de destpêdike, wek şêwazê jiyanê îdîaya alternatîfbûyînê dihewîne. Ji bo ku ev ast bê bidestxistin divê hemû civak ji perwerdeya modernîteya demokratîk re derbas bibe. Divê welê bibe ku di her tişta em dikin de modernîteya demokratîk bibe pîvanê bingehîn.

Baş e, perwerdeya me di şêwazê modernîteya demokratîk de ye? Ji mîlîtaniya serkeftî re, ji pêşketina fermandiya şerê serkeftî re xizmet dike yan na? Mirov û civaka azad pêşdixîne? Gelo hunera me hunera modernîteya demokratîk e? Tekoşîna me ya ekolojîk li gorî modernîteya demokratîk e? Em dikarîn di aborî, siyaset û rêveberiyên herêmî de pîvanên modernîteya demokratîk ava bikin? Bikurtasî em bi vî çavî dikarin li her qada jiyanê binêrîn û em dikarin li gorî vê pîvanên red û qebûl kirinê pêşbixînîn?

Esasa kar li vê derê ye. Perwerde ji bo vê ye. Tenê ji bo red kirina ya heyî nîn e, divê alternatîfa wê jî bê pêşxistin. Pêwîste red kirinên me hebin, lê divê pîvanên me yên qebûl kirinê yên ku em ê çi şûna wan bicih bikin jî hebin. Nexwe wê pêşiya rewşek negatîf a ku moral-motîvasyonê na afirîne veke. Perwerde qada moral û maneviyat bidestxistinê û li ser vê bingehê, di pîvanên de zelal bûyînê ye. Bi kelecanek mezin û lêkolîna jiyanê, wate dayîna tiştên ku em jiyan dikin û parve kirin dibe perwerdeya herî mezin a moralê. Bi hêzek wiha mezin a moralê ve ava kirina ji hemû aliyan ve ya jiyana komunal a demokratîk, parastina wê û bi bedewiya vî ruhî ve jiyan û şer kirin, armanca hevpar a me hemûyan e. Ava kirina jiyanek komunal demokratîk a li ser bingehê pergala konfederal, ji bo hemû mirovahiyê tenê ne xeyalek roja me ye, hedefa hevpar a herî mezine ku her kêliyê bi tekoşînê ve tê afirandin. Dikarin pergalek perwerdeya ku ruhê şoreşgerî û rêxistina wê ya hevpar di xebatên enternasyonal de derdixîne holê, bin siwana Konfederasyona Akademiyên Cîhanê de bê avakirin. Kevirên vê rê, bi akademiyên xwecihî û herêmî ve tên bicih kirin. Li gelek welatan û di bin çavdêriya gelên cur be cur de akademiyên modernîteya demokratîk tên avakirin. Pêngavek din ava kirina yekitiya konfederal a wan akademiyan e. Dema ku li seranserê cîhanê xebatên sazîbûyî yên modernîteya demokratîk di pergala akademiyek wiha de bên destgirtin, wê demê wê taybetmendiya ku perwerde hemû mirovahiyê diguherîne-vediguherîne û zîhniyet û felsefeyek nû dide qezenç kirin bê dîtin, wê her deverê hê zêde bê berfireh kirin û wê xwedî li derketin çêbibe. Di vê çarçoveyê de pêwîste dibistan, semîner, panel bên pêşxistin, kovar û pirtûk bên nivîsandin û fîlm bên kişandin.

## Ji bo Serkeftina Hemleyê Seferberiya Perwerde

Dema bê hizirandin ku pêwîste her xebat ji perwerdeya civakê re xizmet bike, wê demê rêxistin kirin û plan kirina li gorî vê ya xebatan wê zehmet nebe. Gava ku bê vê ferasetê ve bê tevgerandin, wê demê ji bo karên ku pisportî pêwîst dike yên qadên cur be cur jî, dikarîn sûda ku ji perwerdeya-derve bê girtin, bihizirîn. Lê ev xisûseke ku pergala perwerdeya me hinek caran wek demkî û bêyî ku berevajî rêgezên me bikeve, dikare ji perwerdeya derve sûd werbigire. Ya esas ew e ku em qadên xwe yên perwerdeyê berfireh bikin û ji vêya beşên herî berfireh sûd werbigirin. Li ser vê bingehê dikarin pergalek perwerdeyê ya pir alî, pir berfireh û dewlemend pêşbixînin.

Beriya her tiştî paradîgmaya Rêbertî paradîgmayek perwerdeyê ye. Wê paradîgmaya perwerdê ya ku xwe dispêre demokratîk, ekolojîk, azadiya jinê; di pêşxistina pratîk û çalakiya azadiyê ya seranserî gerdûnê de û di gihiştina asta civakek nû ya demokratîk a ku bi rêgeza pirçandî, curbe curî û rengarengî ve hatî honandin de bibe diyarker. Nexwe em dikarîn ava kirina jiyana komunal a demokratîk; kooperatîf, komun û hemleya xwe ya azadiyê ya ku em di navê de, bi seferberiya hemleyê ve bibîn serkeftinê.

Ji bo seferberiya perwerdeyê wergera parêzname û dahûrandinên wan, dublaja wan, pirtûkxaneya gerok, pirtûkxaneya dijîtal, konferans, ava kirina hinek akademiyên nû, çalakiyên wekî roja xwendina Rêbertî bûne pêngavên pir binirx. Ji bo ku qada dijîtal hê bibandor bê bikaranîn projeyên cur be cur hatine pêşxistin. Ji bo perwerdeya civakê di cihên ku zirûf heyî de ava kirina dibistanên ku ji zaroktiyê ve kesayetek wêrek, azad, demokratîk û zîhniyet dide qezenç kirin û di her cihên cuda de xistina dewre ya rêbazên cur be cur ên ku ji heman armancê re xizmet dikin, bûne pêşketinên ku hêvî didin. Divê em bi van re li her saziyê, di her qada xebatê de û asta seferberiyê, nêzîkî perwerdeya Rêbertî bibîn ku hem Rastiya Rêbertî baş fahm bikin û hem jî di rewşa rojevayek timî de serkeftina hemleya azadiyê teqez bikin. Li ser vê bingehê di navbera qadan de pêdiviya parve kirina ezmûnan jî heye. Pêwîste di qadên ku derfetên wan heyî de materyalên dîtbarî bên amade kirin û bi her derê re bên parve kirin. Divê ev tenê bi asta parve kirinek teknîkî ve neyê sînordar kirin. Eger bi hemû encaman ve perwerde bên nû kirin, wê hê bihêz û encamgir bin.

Kom kirina ezmûnên di cihekî de yên akademî, dibistan, pergalên ocaxê û xebatên perwerdeyên astên cuda, ji wan derxistina encamên ku giştî jê sûdwerbigirin û li ser vê bingehê paş vegerandin dibe erka bingehîn a koordînasyonên perwerdeyan. Divê li her cihê ku zirûf hene ev xebat bi periyodek diyar ve, bê rêkûpêk kirin. Çawa ku qadek xebatê ya ku akademî, dibistan û rêkûpêkiya wê ya perwerdeyî tuneyî mehkumê rûxarî û bêrêxistiniyê be, wê ji her cure rêderketinê re jî vekirî bimîne. Sînor an jî îstîsnaya vê tuneye. Kîjan xebat dibe bila bibe, kîjan qad dibe bila bibe mecbure ku pergalek wê ya perwerdeyê hebe. Hetanî ku nebe xwediyê vê ferasetê nikare bêgotin ku xwediyê xeta perwerde ya tevgera azadiyê ye. Hetanî ku perwerde nebe ne seransertî tê derbas kirin ne fikr û ruhê hevpar tê qezenç kirin û ne jî dikarin kadroyê/a nû perwerde bikin. Domdariya tevger û xebatên bi perwerdeyê ve dibe. Divê em dilsozê vê rastiyê bîn. Di rewşa heyî de akademiyên diyar ên gelek qadan hene û rewşa otorîteya ku ji ezmûnên wan welidîn hene. Pêwîste ev mînak bên girtin û baş bên şopandin. Wek prensîba bingehîn beşdariya dilsoz esas e. Hema bi madiyatek diyar ve kes nikare nêzîkî wan qadan bibe. Nêzîkatiyên hiyerarşiya hişk û burokratîk, qebûl nake. Ji pêşxistina zanista nû ya civakî û hetanî avakirina civaka azad, ji pêkhatina asta pêşeng a rolan berpirsiyar in. Ji ber vê yekê nikarin daxinîn asta saziyên fikrekî; wê timî di karakterê berxwedêr de bimîne. Bi esas girtina pergalê ya xebata kolektîf ve afirînerî û berhemdariya kesayet nikare bê asteng kirin, berevajî wê ji wê derê dewlemendiyek mezin derbixîne.


Wê ji lêhûrbûyîn, xebat û hilbirînê re naverast amade bike. Wê rojev û destpêkan rast diyar bike, li gorî wan plansazî çêbike û bibe şopdarê wan. Qasî dîsîplîna xwe ya hundir wê ya ji derve re jî baldar be. Wê ji tedbîrên hiqûqî û hetanî li hember îhtîmalên her cure êrîşan tedbîrên ewlehiyê bigire. Her çiqas ev babet pirsgirêkên giştî yên tekoşîna hebûn û azadiyê bin jî, qada perwerdeyê nikare pirsgirêk û çareseriyên xwe arasteyê cihek din bike. Piştî ku ferasetek bingehîn a wekî di her astê de xwe rêxistin kirin û di mijara çareseriyê de mînak bûyîn hebe, wê di qada perwerdeyê de hê zêde xebatên encamgir bên hildan.

■■■

# LI DIJÎ DEWLETPERESTIYA NETEWE CIVAKA POLÎTÎK Û EXLAQÎ

## *(Li Rojhilata Navîn Çareseriya Moderniteya Demokratîk)*

Ji Pirtûka "Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk" a Rêber Apo hatiye wergirtin.



Modernîteya kapîtalîst civakên Rojhilata Navîn bi tenê bi dewleta netewe bi qazoxekî qehîm ve girê neda; ji bandora bombeya atomê ya avêt Hîroşîmayê bi deh qatan zêdetir, bi dewletokên netewe bombe kir. Mirov dikare bibêje; nirxên çandî yên hevpar ên ji hezarên salan ve pêk hatine, bi bombebarandina dewleta netewe ya dused salên dawî hat parçeparçekirin. Bandora ti sîleha fizîkî nikaribe nîşan bide, kir û rê li ber ji hev belavbûn û parçebûnekê vekir. Civakên Rojhilata Navîn çi weke sîstemên şaristaniyên dewletdar, çi jî weke dijberên wê sîstemên komînî, di ti dema dîroka xwe de bi qasî dema di bin hegemonya modernîteya kapîtalîst de ji nasname û yekparebûna xwe nehatin kirin, nehatin parçekirin ji xwe û hebûna xwe re xerîb neketin. Împaratoriya Brîtanyayê ev sîstema herî bi bandor (bombeya atomê ya rastî) ne tenê li Rojhilata Navîn, li her aliyê cîhanê pêk anî û bi vî awayî hegemonya xwe domdar kir. Yek ji pêkanînên herî trajîk li dijî Qralê Franseyê Louis'ê 16. bi cih anîn. Bila şaş neyê fêhmkirin, ez Şoreşa Franseyê weke komployeke Împaratoriya Brîtanyayê nanirxînim. Lê Brîtanya wê demê ji bo armancên hegemonîk ên Qraltiya Franseyê betal bike, serî li her dekûdolabê daye û kes rola van dekûdolaban di jêkirina serê qiral de nikare înkar bike. Di dest de gelek dane hene ku vê piştrast bikin, lê ji vê jî wêdetir belgeyeke girîng a vê rolê destnîşan dike ew e, bi jêkirina serê qral re di terora Jakoben a 1792'an de dewleta netewe bi awayekî fermî dest pê dike. Bi dewletoka netewe ya di 1792'an de bi awayekî fermî hat destpêkirin, bi tevahî armancên hegemonîk ên Franseyê bi awayekî berbiçav hatin pûçkirin. Teror bi kêra Brîtanyayê hat. Derketina holê û şerên Napolyon bi tenê Ewrûpa bi erdê re nekir yek, di heman demê de bi tevahî hêzên karîbûn serî li ber hegemonya Brîtanyayê rakin jî bê tesîr kirin. Napolyon bi xwe jî bû qurbanê van şerên dewleta netewe. Ev komara pêncan e ku Franseyê heta roja me ya îro pêk aniye. Lê eger di van hemûyan de hêza wê kêm bûbe û li pey Brîtanyayê mabe, di vê de para dewletdariya netewe ya burokratîk û çîna navîn a mohra Hollanda û Brîtanyayê li ser wan, heye. Heman rastiyê mirov dikare ji bo Împaratoriyên Spanya, Awûstûrya-Macarîstan, Rûs, Osmanî, heta Çîn, Hind û Japonyayê jî bifikire. Ya seyr ew e, ev dekûdolabên di dawiya çaryeka sedsala 20. û serê sedsala 21. de weke li gelemperiya dinyayê, nexasim li Rojhilata Navîn kengî dewletên netewe li pêşiya hegemonya global a modernîteya kapîtalîst (ya bi pêşengiya Ingilîstan-DYE'yê) êdî bûn asteng, ji nû ve bi awayekî dijwartir û trajîk li dijî dewleta netewe hatin gerandin. Mîna ku Louisê 16. hatibe aktualîzekirin û li Rojhilata Navîn li dewleta netewe ya Iraqê ji nû ve hatibe vejandin, weke sembola wî, dawiya trajîk a Saddam Husên bû versiyoneke temam a heman dekûdolabê. Mirov heta di çanda Rojhilata Navîn de rola dîrokî-civakî ya dewletdariya neteweyî hûrûkûr analîz neke û lê serwext nebe, ne mumkîn e ku ji ti pirsgirêka civakî re çareseriyê bibîne. Eger mirov kirinên dewletdariya netewe yên dused salên dawî bi tenê weke komployên 'parçe bike-bi rê ve bibe' yên hêza hegemonîk a modernîteya kapîtalîst Împaratoriya Brîtanyayê bibîne, ev ê bibe nêrineke gelekî besît a li diyarde û bûyeran. Ji bo mirov nekeve vê şaşiyê divê bi nazikî tevbigere. Bêguman dewleta netewe ji bo komployê şêweyekî dewletê yê di cih de ye. Lê ji vê jî girîngtir divê mirov weke heqîqet nirxa wî bi berfirehî diyar bike. Tevî propagandayên pozitîvîst hemûyan, naveroka dewleta netewe bi hemanên herî bi sir û metafizîk tijî ye. Rola wê ya di dîrokê de nehatiye rohnîkirin. Bandora wê ya li ser civakê jî hê tarî ye. Tevî îdeayên antî-teolojîk hemûyan jî dewleta herî zêde bi xisletên teokratîk barkirî ye. Gelekî girîng e ku mirov ji gelek aliyan ve rohnî bike bê ka dewleta netewe li Rojhilata Navîn çawa xuya dike. Çiqasî were rohnîkirin wê wezîfeyên exlaqî û polîtîk baştir bêne diyarkirin.

1- Dewleta netewe tevî îdeayên zanistiyê hemûyan jî weke heqîqeteke civakî antîteyeke (hebûnîtî) herî lawaz û neyênî ye. Rola wê ya bingehîn ew e ku şîfreyên xwezaya civakî yên gelekî dewlemend, bi navê homojenkirinê bike tek û yek. Ji lewra tek ziman, tek dîrok, tek al, tek millet, tek tîp siyaset, tek tîp jiyan û tek tîp îdeolojî, bi homojenkirina xwezaya civakî di zikhev de dimeşin. Kengî avahiyên civakî yên cihêreng û tevlîhev bêne besîtkirin û tek tîpkirin, heqîqet şûna xwe ji dualîteyeke mîna reş û spî ya hatiye lawazkirin û neyênîbûyî re dihêle. Nêrîna li dinyayê ya jêre herî muhafezekar, şoven, hişkebawerî û faşîst tê gotin, li ser vê dualîteya besît pêş dikeve. Sedema van kirinên tektîpçêker ên desthilatdariya dewleta netewe, meyla kara herî zêde ya kapîtalîzmê ye. Komên jiyanê yên gelekî cuda yên civakê heta rûmet û azadiya xwe biparêzin, meyla kara zêde nikare dewam bike. Lê tevahiya qadên jiyanê yên xwe disipêrin berjewendiyên cuda, heta di bin serdestiya neteweyî de bi tektîptiyê bêne helandin, civak ê ber bi du çînên weke bûrjûwa û proleter ve biçe. Pêvajoya karê ya kapîtalîst bi van tîp çînîkirinan pêş dikeve û giştî dibe. Tevahiya dîrokê danehevên çandî yên maddî û manewî yên ketine serhev dikin qurbanê du çînên bi homojenkirinê hatine çêkirin. Ev qurbankirineke rastî ye. Çiqasî ziman, bawerî û fikirên cuda, zêhniyet û avahiyên polîtîk-exlaqî hebin di çarçoveya vê qurbankirinê de ne. Du rêbaz têne pêkanîn: qirkirina çandî û fizîkî û asîmîlasyon. Eger asîmîlasyon encama tê xwestin nede, qirkirinên fizîkî û çandî dikevin dewrê. Bi giştî rêbaz di zikhev de têne meşandin. Pêvajoya jêre heqîqetkirina tektîp a lawaz û neyênî tê gotin bi vî awayî dimeşe.

Civaka du çîn a ku Marksîzmê bi şaşî hewl da weke erênî nîşan bide, rastiya heqîqeta wê ev e. Çîna jêre proleter tê gotin nirxê heqîqeta wê gelekî lawaz û neyênî ye. Bi giştî ferdê hatiye kolekirin heqîqeta wî ya civakî bi qasî ku mirov bêje tine ye, hatiye lawazkirin. Bi xwe di nava çîna efendiyan de hatiye helandin û ji ber ku ketiye rewşa pêvek û dûvikê wî, heqîqeta wexta azadbûye hilgirtiye jî derbasî beşa efendiyan bûye. Kêmasiyeke gelekî mezin e ku Marksîzm li vê serwext nebûye. Nuqteya Marks têde bûye şagirtekî xirab ê Hegel, herî zêde di vê mijara heqîqetê de derdikeve pêşiya me. Hegel li gorî Marks gelekî di asta jor de xwedî qabîliyet e ku heqîqetê destnîşan bike. Berhemên wî weke bingeh ji bo diyarkirina heqîqetê ne. Ji ber ku K. Marks kole weke hêmanê heqîqetê hildigire, destnîşan kiriye, beşa din a girîng a doktrîna xwe ku gelek rastî têde hene, bêkêr hiştiye. Kapîtalîzm bi tenê li ser hîmê kara maddî hêzê nade serhev. Tevî wê, heqîqeta civakî jî (hêza zêhniyeta civakê) desteser dike. Li gorî berjewendiyên xwe li parzûnkê dixe û dike malê çîna efendiyan. Ji aliyê heqîqetê ve jî xwe gelekî bi heybet bi hêz dike. Diyarde û bûyerên ji wan re bi xwe dewleta netewe tê gotin, pêvajoya veguherandin û veguhestina vê heqîqetê ne. Naxwe di maneya heqîqetê de ne didu, tek çînek heye. Hebûna fizîkî ya çîna karker, heta rêxistiniya wê ya teng bi tîpa partî û sendîka, di nava yekparebûna rêxistiniya demokratîk a civakî de weke parçeyekî neyê nirxandin, li derveyî kurtêl û hûrikên heqdestê, nirxeke xwe ya heqîqeta civakî çênabe. Di mijara bidestxistin û jidestdayîna heqîqetê de jî mirov dikare têra xwe ji dîroka sosyalîzma pêkhatî hîn bibe. Xulase, dewleta netewe çiqasî homojen bibe, li ser navê çîna olîgarşîk a yekdestdar ewçend heqîqetên tektîp ê bên diyarkirin. Naveroka van diyarkirin û destnîşankirinan herçiqasî hûnandî û spekulatîf be jî ev nayê wê maneyê ku ew heqîqet nînin. Divê mirov baş zanibe ku metafizîk jî cureyekî diyarkirina heqîqetê ye. Nirxê heqîqetê yê mîtolojiyan jî heye. Di xwezayê de nedîtina berdêla wan, tinebûna nirxa wan a heqîqetê piştrast nake. Divê mirov ji bîr neke ku her tim têkiliya heqîqetê bi pêkhatina zêhniyeta mirov re heye. Mirov

heta li zêhniyeta insên weke şêweyê heqîqeta herî pêşketî ya tê zanîn serwext nebe, xebatên ji dil ên zanistî, hunerî û felsefî nabin. Bêguman şertê zêhniyeta mirov civakîbûna wî ye, lewma di heman demê de ev yek têkiliya heqîqetê bi civakê re ferz dike. Di ti forma civak û dewletê de heqîqet bi qasî ya li cem dewleta netewe bi tehekumê re têkildar, lawaz û neyênî nehatiye kirin.

2- Divê mirov bi girîngiyeke hê mezintir li ser hêmanên teokratîk û teolojîk ên dewleta netewe rawestin. Hegel wexta dewleta netewe weke xwedayê daketiye ser rûyê erdê dida naskirin, bi tenê nirxandineke sembolwarî nedikir. Wî dewleta netewe, weke fikrên tevahiya serdeman li ser navê xwedê ketine serhev û kombûne, şîrove dikir. Ji bo mirov vê fêhm bike, bes e ku bi tenê fikrên kombûyî yên rê li ber Şoreşa Franseyê vekirine lêbikole. Wexta pozîtîvîstan digot, bi dewleta netewe serwerî ji xwedê hatiye girtin, dewrî netewe hatiye kirin, haya wan ji wan nebû çawa xwedatî dikirin. Ji ber ku yan jê haydar nebûn serwerî tê çi maneyê yan jî eşkerekirina wê bi awayekî rast li gorî berjewendiyên wan nebû. Di tevahiya dîrokê de tevahiya desthilatdariyên hiyerarşîk û dewletên çêbûn, li ser navê xwedê (efendî) tehekumên yekdestdaran li ser civakê û li ser vî bingehî bi destxistina berhemê zêde û mêtina nirxan, serwerî bi xwe ye. Bi qasî ku hewce bi analîzê nebe, eşkere ye ku çavkaniya serweriya xwedayî, mirovên xwe kiribûn efendî (bi maneya Reb). Mirov rabe bibêje; "Bi Şoreşa Franseyê re Çavkaniya serweriyê êdî xweda nîne û netewe ye" ev li ser navê zanista civakî sextekariya herî mezin e. Pozîtîvîzm mûcîdê vê sextekariyê ye. Tehekum û serweriya serdema destpêkê û navîn çiqasî çavkaniya xwe xwedê be, serweriya dewleta netewe ya modernîteya kapîtalîst jî qat bi qat zêdetir xwe bi heman çavkaniyê xwedî dike. Li vir a divê mirov li ser rawest e, têkiliya têgînên millet û milliyetgiriyê (netewe-netewetî) bi xwedatiyê re ye. Çawa ku tê zanîn di Îslamê de millet bi maneya dîn tê. Xwedê û millet bi xwe yek in, wekhev in. Netewebûna millet, encamê naguherîne. Lîstikeke bi gotinan hatiye kirin û hew. Çi di Pirtûkên Pîroz de çi jî di doktrînên lîberalîzma kapîtalîzmê de derbas bibe, millet an jî netewe, civak an jî cemaeta fermana xwedê (efendî, reb, yê serwer, yê fermanê dide) bi cih tîne, îfade dike. Kapîtalîstên sekuler, bi têgîna laîk ji dîn, ji xwedê û serweriya wî dernakevin, wî înkar nakin. Bi milliyetgirî, netewetî yan jî bi navê mezhebekî nû yê dînî li gorî berjewendiyên dînîbûnekê li hev tînin, çêdikin. Heta milliyetgiriya li ber sînorê faşîzmê di tevahiya dîrokê de ji dînên herî muhafezekar bêtir hişkebawerî ye. Ya girîng ne ew e, dîn bi formên berê yên weke Xirîstiyantî, Îslamiyet, Bûdîzm û Mûsewîtiyê be. Her fikir û baweriya civakê bîne asta perestinê, bi hêsanî mirov dikare weke dîn îfade bike. Di vê rewşê de xwedayê xwe heye tineye, zêde diyarker nîne. Cewherê wê bi xwe ew e ku karibe endamên civakê di asta pîroztiyê de bike hevpar, li ser hîmê cîhana fikir, bawerî û hisên zêde pev keliyayî bi şêweyên tevgerê yên ji wan re îbadet tê gotin û merasîmên wan ve girê bide. Di çarçoveya dewleta netewe de eşkere ye ku netewe û netewetî bi awayekî gelekî zêde li gorî van terîfan hatiye avakirin. Ango ev têgîn û doktrîn ewçend zêde eşkere ne, hewce nake mirov karekterê wan ê dînî guftûgo bike. Di teolojiya netewe û netewetiyê de xusûseke divê em bi girîngî li ber çav bigirin ew e, maskeya zanista pozîtîvîst datînin ser rûyê xwe û xwe mîna ku dîn û metafizîk nînin nîşan didin. Heta dijbertiya dîn û metafizîkê weke rêzik û pîvaneke bingehîn qebûl dikin û bi vî awayî li ser navê 'zanistiyê' xwe ji rakişandina li muceredkirineke dînî paşve nadin. Heqîqetgerî û dîndartiya dewleta netewe hişk bi hev ve girêdayî ne. Armanca hevpar, ew e ku şêweyên jiyanê yên cihêreng û cudahiyên rastiya civakî bihelîne, tesfiye bike, reş bike û bêdîrok bihêle. Li ser vî bingehî hewl dide îfadeyên dewlemend ên heqîqetê lawaz bike û sîstema xwe ya hegemonîk weke heqîqeta bi tenê ya rewa raber bike.

3- Avahî û zêhniyeta dewleta netewe ya li ser jiyana çandî ya Rojhilata Navîn hatiye ferzkirin, mijarek e, hê encamên wê bi awayekî yekpare û bi perspektîfa dema dîrokê nehatiye vekolan. Xwediyên van avahî û zêhniyetan bi xwe jî bi temamî haya wan ji wan nîne çi bi cih tînin. Ew jî di nava mekanekî teng û demeke kin de berjewendiyên bi sînor ên desthilatdarî û maddî ne. Ya rastî, yên dewleta netewe weke avahî û îdeolojî pêk tînin mentiqê wan weha ye "Em ji hegemonya modernîteya kapîtalîst çi biçirpînin, bibin kar e." Bi tevahî nêzîkatiyên taktîk û stratejîk bi vê nêrtinê bi sînor in. Sîstema hegemonîk wekî din firsend û keysa pêşketinê nadê. Ji ber ku ji heqîqeta me hewl da wê bi xwe bidin naskirin û teolojiya wê xebera wan nîne, li aliyekî timî dogmatîkên neteweyî yên dijwar û tûj in, li aliyê din jî timî mîna gumanbar dimînin û nikarin xwe ji vê rewşê xelas bikin. Eger em hewl bidin rewşê hê berbiçavtir bikin, em ê li nîzama dînî û qebîleyî ya Ereban binêrin. Yek ji rastiya civakî ya herî kevin a Rojhilata Navîn e. Li ser wan ji bîstan zêdetir dewletokên netewe têne ferzkirin. Ev bi tenê jiyana çandî ya hevpar parçe nake, li hebûna wan bi xwe jî di asteke nedîtî de xerîbketinê enjekte dike. Nasnameya nû ya Ereb a derketiye holê ji nasnameya wê ya serdema navîn an jî ya kevin ku gelekî tê rexnekirin, baştir nîne. Erebê li ser hîmê dewleta netewe hatiye dabeşkirin û parçekirin, Erebê herî lawaz, belovajîkirî û ji heqîqeta xwe ya dîrokî-civakî hatiye veqetandin e. Ew çiqasî bawer dikin ku bi dijwarî li dewleta netewe xwedî derdikevin jî ji yeqîna wan cudatir ew xurt nabin, berevajî hê lawaztir û qelstir dibin. Jixwe Erebtî jî ne sedema bi hêzbûnê, sedema dûrketina ji heqîqetê û qelsbûnê ye. Ti milliyetgiriya bi heqîqetê neyê xwedîkirin nikare bibe hêmana bi hêzbûnê. Ev rewş bi awayekî balkêş di pratîka Hîtler de pêk hat. Ji awirê dewleta netewe ve sînorên têne pîrozkirin bi temamî lihevçêkirî ne, û li gorî berjewendiyên hegemonya global hatine diyarkirin. Têgînên millet û welat ên di naveroka wê de, weke sembolên teolojiya nû di çarçoveya heman berjewendiyan de ne. Wexta derkevin derveyî çavçoveyê pirr zor û zehmet e ku ji xezeba xwedayê hegemonîk xelas bibin. Ya rastî, bi tevahî sînor, welat, millet, burokrasî û çîna navîn ên hewl didin di van dused salên dawî de ava bikin, bi xwedatiya dewleta netewe serkorî kirine. Rastiya ku dibînin, yeqîn dikin ku rastiyeke ezel û ebed e. Lê kesekî hinekî zêhnê wî/wê li heqîqetan vekirî, dikare bibîne û zanibe bi tevahî rastiyên behsa wan tê kirin, vedîtinên fantastîk in, bi armanca rewakirina berjewendiyên hegemonîk ên dused salên dawî li hev hatine çêkirin. Avakirina dewletên netewe yên Turkî û Îranî berhemên heman berjewendiyên hegemonîk in. Tevî ku mohra fethê ya modernîteya kapîtalîst li ser pişta wan heye jî hewl didin ji krîza xwe ya rewabûnê bi îdeolojiyên milliyetgir û radîkal dînî bibihurin. Li cem hemûyan milliyetgiriya laîk û dînî dixin nava hev, û bi vî awayî hewl didin bi zirxekî têkûz ê îdeolojîk ser dewleta netewe bigirin. Etnîsîte, dîn, mezheb û çandên dîrokî yên di rewşa hindikayiyan de hatine hiştin li hemberî dewleta netewe bi pirsgirêka man û nemanê re rûbirû ne. Yekparebûna çanda Rojhilata Navîn bi parçekeriya dewleta netewe ya modernîteya kapîtalîst re di nava nakokiyeke bi kok de ye. Modernîte li ser rastiyên jiyana hevpar qefesa ji hesin ferz dike. Ji lewra di rojevê de misêwa şîddet cih digire û ev jî vê rastiyê piştrast dike. Hêza çareserî û analîzê ya modernîteya demokratîk li hemberî dewleta netewe zelaltir e. Hêzên hegemonîk ên kevin û yên nû timî hewl dan dîroka wan bidin jibîrkirin û rastiyên wan ên civakî xistin xewê, bi nêzîkatiya modernîteya demokratîk dikarin di nava dîroka xwe de heqîqeta hebûna xwe îfade bikin. Analîzên der barê hêzên hegemonîk de, der barê dijberê wan de weke heqîqet û dîrokê bersivê dibîne. Rastiyên civakî çawa ku di ti demê de bê dîrok nebûn, bê heqîqet jî nînin. Li ser çanda civakî ya Rojhilata Navîn ku xwedî karekterê yekparebûneke dîrokî ye, hegemonyadariya dewleta netewe hatiye ferzkirin, li dijî vê, antîteza modernîteya demokratîk civaka exlaqî û polîtîk e.

a- Dewleta netewe weke înkara civaka exlaqî û polîtîk pêk tê.

Li şûna exlaq rêzikên hêzê yên ji wan re huqûqa neteweyî tê gotin bi cih dike, dide danîn. Tertîbkirina hêza bi şêweyê huqûqê herî zêde pêşketina xwe di çarçoveya dewleta netewe de pêk tîne. Li şûna civaka polîtîk jî îdareya hişk a burokratîk serdest dike. Înkara civaka polîtîk bi awayekî berbiçav di nemeşîna sîstema demokratîk de xwe nîşan dide. Herçend hilbijartin û parlement hebin jî ya dimeşe avahiya îdarî ya olîgarşiya burokratîk a destûra bingehîn a ne nivîskî ye. Desthilatdariya dewleta netewe ya heta mûrehkên civakê belav bûye xwe bi kirasê huqûqî weke îdareya gelemperiyê raber dike. Hilbijartin û parlement ji bo rewakirina vê îdareyê bi rola cîlakirinê radibin û jê pêve jî ti maneyê îfade nakin. Civak, gel û netewe bi dewleta netewe re wekhev dikin. Li hemberî vê rastiya hegemonîk a modernîteya kapîtalîst weke ku gerdûnî be ferz kiriye, ji bilî parastin û bergiriya civaka exlaqî û polîtîk rêyeke din a çareseriyê nîne. Xwezayên civakî weke cewher exlaqî û polîtîk in. Mirov nikare li civak û ferdê bê exlaq û polîtîk bifikire. Dikarin civakê neçarî bêexlaqî û bêpolîtîkabûnê bikin. Dikarin qabîliyeta exlaqî û polîtîk kotrimî bikin û ewçend lawaz û qels bikin ku nikaribe bi rola xwe rabe, lê ti carî nikarin tine bikin. Tinekirina wê bi tenê bi awayekî mumkîn e, ew jî kengî ji civakbûnê derkeve. Exlaq û polîtîka amûrên bi hêz ên heqîqeta civakî ne. Mehrûmbûna ji exlaq û polîtîkayê rê li ber bêheqîqetiyê vedike, li qadên çalakiya bi hêz a exlaqî û polîtîk jî hebe, şêwazên xweîfadekirinê yên heqîqetê jî bi hêz û şefaf dibin. Yek ji mijarên girîng ên Marksîst têde xapiyan ew bû ku wan exlaq û polîtîka weke avahiya jor raber kir. Ti ferd û komika civakê nîne exlaqî û polîtîk nebe. Her komik û ferdê civakê hem exlaqî hem jî polîtîk e. Demokrasî bi civaka exlaqî û polîtîk re di wezn û rêjeyekê de ye. Demokrasî rewşa civaka exlaqî û polîtîk a

dixebite îfade dike. Heqîqetên civakî xwe herî zêde weke civakên demokratîk nîşan didin. Îfadeyên heqîqetê bi awayên felsefe, zanist û hunerê herî baş bi civaka demokratîk bi ser xwe ve tên. Ev tespît diyar dikin, bê ka çima heqîqet herî zêde bi civaka exlaqî û polîtîk bi ser îfadeyên xwe ve dibin.

**Ferd û komikên bêexlaq û bêpolîtîka nikarin li ber xwe bidin.**

Hêmanên berxwedanê yên li Rojhilata Navîn hê bi hêz in, nîşan didin ku hêmanên exlaqî û polîtîk weke yeqîn tê kirin, lawaz û qels nînin. Ferd û komikên bêexlaq û bêpolîtîka nikarin li ber xwe bidin. Ew bi tenê hînî serîtewandinê kirine. Hewldanên ji bo hebûnê, koçberî û berxwedanên di asta malbat, qebîle, eşîr, mezheb û netewe de bi qasî redkirina dewleta netewe di heman demê de ji bo civaka demokratîk jî bangewaziyek in. Di çanda Rojhilata Navîn de bûyerên di vê astê de diqewimin mîna oryantalîzm dixwaze bide qebûlkirin paşverûtî, perestina serdema navîn û anarşî nînin, potansiyela dewlemend a moderniteya demokratîk pêk tînin. Şikandina dewlemendiya diyardeyên civakî, di encamê de bi xwe re kêmbûna hêza heqîqet û maneyê tîne. Dewlemendiya çandî çiqasî were homojenkirin, ewçend di maneya wê de û di weke heqîqet îfadekirina wê de kêmasî çêdibe. Rêveberiya dewleta netewe ya ku welatiyê tektîp diafirîne ferdiyetperestiyeke ji aliyê maneyê ve potansiyela xwe ji dest daye, ji bilî çend dogmayên jiberkirî pêve zêhnê xwe naxebite, merasîmên fermî weke şêweyekî îbadetên nû fêhm dike û ji aliyê heqîqetê ve nava xwe pûç e. Nirxên exlaqî û polîtîk ên di civaka demokratîk de bi kêr tên, ji potansiyeleke ku awayekî berevajî dewlemendiya maneyê ye, heqîqetê çêdikin. Civakeke timî bi heqîqetan xwe xwedî bike jî dikare di tewazuna îdeal a kom û ferd de bijî.

b- Li hemberî teolojiya pozîtîvîst a dewleta netewe, civaka polîtîk û exlaqî jî bi maneya zanistzanyariyê felsefeyê esas digire.

Laîktî û sekulertî weke prensîp ji dogmayên dînî zêde guhertîtir nînin. Bi lixwekirina kirasê dewleta netewe ji dîndartiyê xelas nabin; bi tenê şikil û şema diguhere. Dogmayên dewleta netewe yên zanistiya pozitivîst wan bi lez çêdike ji dogmayên dînî yên serdema navîn hişktir in. Rastiya mêtinkarî û şerên rê li ber wan vedike, vê xusûsê piştrast dikin. Divê mirov baş bizane, teolojî, modernîteya kapîtalîst jî di navê de, weke amûrê rewakirinê yê îdeolojîk ê şaristaniya çînî-dewletdar hatiye avakirin. Li dijî hêmanên zanist-zanyartiya di nava civaka exlaqî û polîtîk de weke antîtez pêk tê. Nirxên exlaqî û polîtîk rê li ber zanist û zanyartî-hozantiyê vedikin, zanist û zanyartî jî civaka exlaqî û polîtîk dewamî xwedî dikin. Îfadeya civakî ya xwe ji der ve ferz dike theo (Xwedê) û logîk (aqil) dewleta qral-xwedê ye. Ji ber ku sosyolojiya Rojava bi heman cewherê dewlet û çînê xwe xwedî dike nikare vê rastiyê bi awayekî zelal îfade bike. Bi gava xwe ya pozîtîvîst teolojiyê digihîne qonaxa herî bi tehlûke. Ma kî dikare înkar bike ku dinyewîbûna xwedê ji ezmanîbûna wî hezar qat zêdetir mêtinkarî, rondikên çavan û xwîn nerijandiye! Nexasim ezmûna dused salên muhteşem ên dawî yên xwedayê dewleta netewe hê li ber çavan be. Ma sifetên van xwedayan çi bûn? Sînor, millet, al, surûd, burokrasî û çîna navîn û welatiyên monolotîk. Di bin van sifetan de xwedayê dewleta netewe çi kir? Mêtinkarî û şerên di dîrokê de hemtayê wan nedîtî pêkanîn. Demiurg weke Xwedayê Mîmar li dinyayê nîzama dewleta netewe ava kir. Bi vî awayî piştrast kir ku ew xwedayê herî pêşketî yê xwedî xisletên pûtperestiyê ye. Civaka exlaqî û polîtîk ji bo bijî hewcedariya wê bi xwedayetiyên bi vî rengî nîne. Zanyartî û hozantiyê ji teolojiyê binirxtir dihesibîne. Hikmet, zanyartî, hozanî ne ji teolojiyê, ji zanistiyê çêdibin. Bi awayekî sosyolojî ne. Di civaka Rojhilata Navîn de tevî ferzkirinên teolojîk hemûyan, rehên zanyartî û hozantiyê her hebûn û heta îro hatin. Divê mirov zanyartiyê weke yekparebûna felsefe û sosyolojiyê û rewşa wan bi jiyanê re di zikhev de binirxîne. Zanyartî heta bi Sokrates jî formekî bingehîn bû, lê paşê bi ekolên piştre pêşketin ev rêûresm rizandin. Jiyan û doktrîn ji hev qut bûn. Vê yekê jî derb li civaka exlaqî û polîtîk da. Zanyartî weke felsefe xistin xizmeta dewletê. Di rêûresm û kevneşopiya pêxemberan de tevî ku aliyê serwer timî zanyartî û hozantî bû jî gavavêtina wan ber bi teolojiyê ve rizîn û dejenerebûn bi xwe re anî. Qasid, waiz û rahib çiqasî bikevin ser rêya teolojiyê, wê ewqasî jî ji zanyartî û hozantiyê qut bibin û ji civaka exlaqî û polîtîk dûr bikevin. Di çanda Rojhilata Navîn de, di navbera hêmanên van herdu dualîteyan de têkoşîneke zêde heye. Ev têkoşîn bi xwe tengezariya di navbera dinya şaristaniya demokratîk û şaristaniya dewletdar de nîşan dide. Têgîna xwedê ya bi awayekî vedizî têde qraltî û despotî hatiye bicihkirin û li dijî ferzkirina wê ya li ser civakê, karê sereke yê zanebûnê ew e ku bi tesewifê nasnameya civakî ya hê berbiçav dibe pêşkêş bikin. Bi vî awayî civaka exlaqî û polîtîk tê parastin. Di civakê de li keramet û hikmetê tê gerîn. Bi vî şêwazî şîrovekirina dîroka Rojhilata Navîn girîng e. Wê rojanekirina wê, bihêle ku modernîteya demokratîk baştir bê fêhmkirin.

c- civaka exlaqî û polîtîk, civaka neteweyî înkar nake.

Civak misêwa weke pêdiviyeke xwezaya xwe şêwe û awa diguherînin. Cûrbicûriya form, dewlemendiya jiyanê ye. Ya li dijî wê tê derketin ew e, hişkîbûn û girtîbûna li formên civakî ye. Muhafezekarî weke bingeh israra di girtîbûn û hişkîbûna form de ye. Formên azadîxwaz li nermahî û şefafiyê vekirî ne. Nasnameyên civakî çiqasî nerm û vekirî bin, ewçend jî cihêreng dibin ango azad dijîn. Têgihiştina dewleta netewe li nasnameyê tekperest e, serê wê girtî û hişk e. Çavkaniya faşîzmê ji vê têgihiştina nasnameyê ye. Ji ber ku nasnameyên civakî bi vî awayî têne fêhmkirin, li derve û hundirê civaka neteweyî, misêwa rewşa şer pêk tê. Nasnameyên civakî serê wan vekirî û xwezaya wan a nerm lihevçêkirî be, nasnameyên hişk û girtî li ser nasnameyan bên ferzkirin, bivê nevê şerên bi vî rengî wê biqewimin. Çi şerên dînî çi jî şerên neteweyî (Li cem herduyan jî xisleta bingehîn a nasnameyan serê wan girtî û hişk in) vê pevçûna nasnameyan îfade dikin. Di dused salên dawî yên Rojhilata Navîn de şerên nasnameyên neteweyî gelekî qewimîn û ev yek têkiliya xwe bi wê nasnameyê re heye ku modernîteya kapîtalîst ferz dike. Nasnameyên dewleta netewe yên di parzûnka xwe ya hegemonîk re derbas kirî bi xwe, dûvikên nasnameya navendî û di pozîsyona ajanên wê de ne. Nasnameya navendî timî weke biryargeha sereke dixebite. Bi acenteyên xwe yên hewcedar û mêtingeh ji nêz ve eleqedar dibe. Dema hewce bike ji nû ve tertîp dike. Çawa ku li gelemperiya dinyayê bûyî, li Rojhilata Navîn a roja me ya îro jî nasnameyên dewletên netewe yên dused salên dawî peritîn û hilhilî ne, li pêşiya kapîtalîzma dixwaze globalbûnê zêde bike, bûne kelem û asteng. Di bingehê krîza avabûnê de berxwedana muhafezekar a dewleta netewe heye. Nakokiya sereke ya di nava sîstemê bi xwe de ev e. Lê nikare çareseriyê bibîne. Ji Afganistanê heta bi Fasê, ji Qafqasyayê heta bi Okyanûsa Hindê li aliyekî nakokiyên di navbera dewletên netewe û kapîtalîzma global de zêde dibin, li aliyê din jî rê li ber şerên timî diqewimin vedike. Belavbûna kapîtalîzm bi giranî bi xêra dewleta netewe ye, lê niha baş dizane ku wê bi temamî nikaribe wê tesfiye bike. Dema ku dixwaze wê reformê bike, misêwa bi berxwedanan re rûbirû dibe. Beşên bi dewleta netewe re gelekî zêde gir û dewlemendbûn, li dijî kapîtalîzmeke rasyonel li ber xwe didin. Krîz û şer dibin encama vê yekê. Projeya Rojhilata Navîn a Mezin a dawî ya DYE'yê ji ber vê rastiyê bû sedema nemeşandina vê projeyê dîsa em li heman rastiyê binêrin, em ê fêhm bikin. Xetimîn û asêbûna li herêmê ji pêxîrtengiya sîstemê ya di Şerên Cîhanê ya Yekemîn û Duyemîn de kûrtir e. Ji ber ku welê ye, bi ti awayî çareser nabe. Têgîna krîza avabûnê jî maneya xwe ji vê xisleta rastiyê digire. Naxwe çi ji ber pêşketina çanda yekpare ya civakî-dîrokî, çi jî ji ber nakokiyên hundir ên modernîteya kapîtalîst, heta ku Rojhilata Navîn ji nasnameya dewleta netewe ya girtî û hişk nebihure, îhtîmal nîne ji ti pirsgirêkê re çareseriyeke manedar peyda bike. Li Iraq û Afganistanê tevahiya hewldanên ji bo jinûve avakirina dewleta netewe têk diçin, tewş in. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn ji bo Ewrûpaya hilweşiyayî alîkariyeke bi sînor a DYE'yê dayî (Alîkariya Marshall) têra ji nû ve avakirinê kir, lê li nava Iraqê tevî ku ji bo mekanekî piçûk alîkariyeke qat bi qat zêdetir hat pêşkêşkirin, ji nû ve avakirin pêk nayê. Ya rastî bûyerên li Iraqê diqewimin bi tevahî rastiyên li herêmê nîşan didin. Ew jî ew e, nûçeya krîz û îflasê ya modernîteya kapîtalîst a li ser sêlingan dide. Weke encam mirov dikare bibêje; tevî ewqas dewletên netewe, îndustriyalîzm û kapîtalîzma xwe, li Rojhilita Navîn wê bi tenê krîz û şer çêke. Lê belê divê ez dubare destnîşan bikim ku krîz û şerên diqewimin ne bi tenê yên dused salên modernîteya kapîtalîst in, di heman demê de krîza avabûn û şerên şaristaniya dewletdar-çînî ya pênc hezar salî ne. Çareseriyên muhtemel divê van rastiyan esas bigirin.

d-li Rojhilata Navîn li dijî modernîteya kapîtalîst modernîteya demokratîk

Di cîhana zêhnî ya Rojhilata Navîn de li ser modernîteyê têra xwe guftûgo hatine kirin. Ev guftûgo yan li ser bingehekî teknîk û zanistî hatine kirin û hêmanên din li derve hatine hiştin an jî bi temamî ew qebûl kirine, lê ji aliyê zanistî ve guftûgoyên bi vî rengî nizanin bi çi re rûbirû ne, û ji serwextbûna li vê yekê dûr in. Jixwe tercîh girêdayî wan nebû. Weke hegemonyadarî, çiqasî xwe li wan aland û bada, ji bilî pêre lihevkirinê çare nedîtin. Bêyî cudahiya fikra çepgir-rastgir, hê jî fikreke ji oryantalîzmê bihurî û xwe gihandî cîhaneke zêhniyetê, nîne. Pirr kêm fikir hene ku di nava modernîteya kapîtalîst de nehatibin helandin û pêre li hev nekiribin. Bêguman serketina di fikrê de nebe wê di jiyanê de jî nebe. Ji ber ku me der barê dijberiya sîstemê de nirxandin di beşên berê de kiribû, bi

tenê kengî hewce bikin em ê dubare bikin. Bi paradîgmaya modernîteya demokratîk analîzkirina pevçûnan û krîza avabûnê û pêşkêşkirina çareseriyên muhtemel, mumkîn e. Yekparebûna dîrokî û asêtirbûna dewleta netewe, şensê pêkhatina çareseriyên muhtemel ên bi vî rengî hê zêdetir dikin.

1- Jeoçanda Rojhilata Navîn bi parçekeriya dewleta netewe re bi awayekî kûr di nava nakokiyê de ye, û ev yek hêzê dide meylên yekparebûn û entegrasyonê. Di ti dema dîroka xwe de herêm bi qasî di dema dewletên netewe de parçe nebûye. Parçebûnên pêkhatî jî di asta desthilatdariyê de mane, zêde bandor li jiyana çandî nekirine. Cihêrengî û cudahiyên dînî û etnîk bi hezarên salan di nava hev de man û ev bi yekparebûna jeoçandî ve têkildar e. Heta mezinbûnên hegemonîk ên têkildarî desthilatdariyê jî timî di nava herêmê de bi pêş ketine. Ji hegemonê destpêkê yê dîrokê nivîsandiye û qeyd kiriye Qralê Aqad Sargon heta bi hegemonya dawî ya Osmaniyan weke desthilatdarî jî aliyê zêde giraniya xwe nîşan daye yekparebûn e. Her hêza nû ya mezin û bilind bûye, bi lez bûye hêza herêmê. Çi şaristaniyên bingeha xwe çîn û dewlet bin, çi jî şaristaniyên demokratîk ên nikarîbûne ji etnîsîte, dîn û mezheb bibihurin, bi tevahî weke çanda herêmî hebûn û şop hiştine. Nasnameyeke serê wê girtî ya şaristaniyê mîna li Japonya, Çîn, Hind û heta Brîtanyayê di jeoçanda Rojhilata Navîn de pêk nehatiye. Bêguman, tevî ku jeoçandên bi heman rengî li Efrîka û Emerîkayê hene jî bi qasî Rojhilata Navîn di asta şaristaniya navendî de pêşketî nînin. Hêmanên moderîteya kapîtalîst bi herdu meylên jeoçandên dîrokî yên herêmê re di nava pevçûn û nakokiyê de ne. Gelekî guftûgokirina pirsgirêkên Rojhilata Navîn û bi ti awayî çaresernebûna wan, bi vê nakokiya kûr ve girêdayî ne. Hêmanên bingehîn ên moderîteya demokratîk civaka ekonomîk, ekolojîk, exlaqî û polîtîk, jeoçanda herêmê esas digirin. Ev jeoçand çi hêmanekî parçeker ferz nake. Berevajî alternatîfên hêmanên parçeker ên heyî pêk tîne. Moderîteya demokratîk di têgihiştina netewe de nerm e. Bi perspektîfa avakirina neteweyê ne li ser bingehê ziman, etnîsîte, dîn û dewletê, belê di nava xwe de hêmanên pirr ziman, etnîsîte, dîn, mezheb û pêkhatinên siyasî digihîne hev û bi roleke mezin a çareserker radibe. Li dijî têgihiştina netewe ya li ser bingehê etnîsîte, ziman, dîn, mezheb û dewletê, moderîteya demokratîk bi têgihiştina neteweya hevgirtî a bi pirr hêmanan li jeoçanda Rojhilata Navîn hîmê biratî û aştiya pêdivî pê heye, bi awayekî pirr bi hêz datîne. Dikare bê gotin ku mirov dikare ji hersê dînên mezin ên yek xwedayî, ji her cure ziman, etnîsîte û pêkhatinên siyasî muteşekil milletekî mezin ê herêmê, ango neteweya Rojhilata Navîn jî çêke. Çawa neteweyekî Emerîka (DYE), neteweyê Ewrûpayê (YE) heye, neteweyê Rojhilata Navîn jî dikare pêk bê. Bingehê çandî yê vê yekê ji herdu blokan zêdetir derfet û îmkanan dide, û bi hêztir e. Pirsgirêkên hindikayî-pirranî, parçebûna neteweyên mezin (Ereb, Tirk, Kurd, Fars), tecrîda neteweyên piçûk têne hesibandin (gelên Ermenî, Cihû, Suryanî, Qafqas) dikare bi têgihiştina neteweyekî bi vî rengî mezin û serê wî nerm, çareseriyên nêzî îdealê bêne dîtin. Gelekî eşkere ye ku paradîgmaya neteweya demokratîk xwediyê wê kapasîte û naverokê ye, dikare şer û pirsgirêkên ku yekdestdarên mêtinkar û desthilatdariyan bi awayekî hişk rê li ber wan vekiriye û zêhniyetên homojenker, şerker, milliyetgir, cinsiyetparêz, dîndar û pozîtîvîst ên dewleta netewe, ji holê rake. Ya kapîtalîzm û îndustriyalîzm ferz dikin, ne bi tenê ekonomî û hawîrdorê li krîzan diqewimînin, li ser bingehê dewleta netewe parçe dikin û bi vî awayî gelekî zêde hatinê kêm dikin. Hêmanên ekonomîk û ekolojîk ên moderîteya demokratîk van bandorên girîng û neyênî bi tenê ji holê ranakin, di heman demê de hevgirtina ku pêdiviya civaka ekolojîk û ekonomîk pê heye jî pêk tîne, derfet û îmkanan dide hatina herî zêde û çarçoveya zirara herî kêm bide jî pêşkêş dike. Derfet û îmkanan dide her cure yekîtiyên kominî yên ekolojîk û ekonomîk ên li dora kominên cotkarî-av-enerjiyê pêk bên, dîsa derfetê dide palpiştiya ku pêdiviya civaka ekolojîk û ekonomîk pê heye û çanda dîrokî ferz dike, pêşiyê li bêkariyê digire, xebatê azadbûn dihesibîne û rê vedike li ber nîzamekî bereketê mumkîn dike. Hêmanên civaka exlaqî û polîtîk a moderîteya demokratîk, ji hegemonya dewleta netewe ya fetîşîzma desthilatdarî û huqûqê diafirînin, dibihurin û bi vî awayî rê li ber pêşketina civaka demokratîk vedikin. Li şûna yekdestdariyên desthilatdar ên bi nasnameyên hişk û serê wan girtî yên jeopolîtîka herêmê parçe û bêber dikin, bi têgihiştina siyaseta demokratîk, nerm, serê wê li herêmê û heta nava dinyayê vekirî radibe, di nava hevgirtina xwe de cihêrengî û cudahiyan dihewîne û bi vî awayî xuşk û biratiya gelekî pêdivî pê heye, mumkîn dike.

2- Li ser bingehê van analîzên sereke, em dikarin der barê hevgirtin û yekbûna neteweyên demokratîk de pêşniyarên berbiçav bikin. Ji bo çareserkirina pirsgirêkên ku moderîteya kapîtalîst rê li ber wan vekiriye, di rabihuriya nêz de yekîtiyên mîna Pakta Bexdayê, CENTO û RCD (Rêxistina Hevkariya Herêmî ya Pêşdebirinê) ji ber sedemên wan ên binyewî, tê zanîn çareserker û temendirêj nebûn. Rêxistinên mîna Yekîtiya Ereb û Rêxistina Konferansa Îslamî (RKÎ) ku dixwazin hê jî li ser piyan bigirin, ji bo ti pirsgirêka girîng a herêmê çareseriya wan nîne û bê tesîr in, û ev xusûs jî ji ber wesfê wan ê dewleta netewe tê fêhmkirin. Jixwe her dewleta netewe ya herêmê bi awayekî li gorî xwe bi navendeke hegemonîk a kapîtalîst ve girêdayî ye. Di wê kapasîteyê de nînin ku karibin derkevin derveyî navenda di bin kontrola wê de ne. Tevî ku civîn li ser civînê, civîna bilind li pey civîna bilind pêk tînin jî dîsa çareseriya wan nîne û bê tesîr in, ev jî bi vê rastiyê ve girêdayî ye. Hêza çareseriyê ya moderîteya demokratîk der barê yekparetiya polîtîka herêmê de ji kapasîteya hêmanên çareserker ên dike bingeh, tê. Hêmanekî hundir ê li pêşiya polîtîka yekpare raweste, û bibe asteng nîne. Berevajî, di çarçoveya yekparebûna polîtîk de hêmanên polîtîk, exlaqî, ekolojîk û ekonomîk hemû dikarin civaka ekonomîk a ku ji dil dixwazin, ava bikin. Li beramberî destwerdanên hegemonîk ên ji derve yên moderîteya kapîtalîst, hêzên civakî yên herêmê hemû di nava yekparebûna polîtîk û hevgirtina wê de bi hêsanî û bi awayekî serketî, dikarin bersivê bidin û pirsgirêkan ji hev derînin, çareser bikin. Ji lewra Komina Demokratîk a Rojhilata Navîn dikare weke pêkhatina siyasî ya komina kominan a di her qadê de were pêşniyarkirin. Hemin mirov nikare bi zêhniyeteke ku bi xwe çavkaniya pirsgirêkan e, pirsgirêkên Iraq, Îsraîl-Filistîn û Afganistanê yên di nava lepê zêhniyeta dewleta netewe de ne, çareser bike. Zêhniyetên dibin sedema pirsgirêkan bi nêzîkatiyên xwe yên pirsgirêkên civakî-siyasî yên li tevahiya herêmê di dused salên dawî de gelek zirar û ziyan kirin, û mirov ji van zirar û ziyanên wan kirî têra xwe dikare dersan bigire. Eşkere derketiye holê ku hem laîkê wê, hem jî dîndarê wê, bihêlin çareser bikin, ji astengkirina çareseriyê wêdetir bi ti rolê ranebûne. Jeoçanda Rojhilata Navîn divê di jeopolîtîka wê de bê raberkirin. Ji bo vê jî çarçoveya herî di cih de eşkere ye ku wê komina demokratîk û konfederatîf be (Ez behsa federasyon û konfederalîzma dewletê nakim). Ji ber ku çiqasî komin û yekîtiyên cuda hebin, ji hemûyan re di çarçoveya konfederasyon û komina sereke de cih heye. Di çarçoveya vê nêzîkatiyê de mirov bi hêsanî dikare fêhm bike ku dewleta netewe çiqasî bi qusûr e, û li derve dihêle. Dewleta netewe di gotinê de xwe 'serxwebûnxwaz' dihesibîne, lê bi xwe jî bi hezar ta û benî bi navendên hegemonîk ên kapîtalîst ve girêdayî ye. Pirr girîng e ku mirov zanibe li astengên dewleta netewe nealiqe û bimeşe. Li her qada herêmê mirov dikare pêkhatinên siyasî damezrîne, lê divê rengê nasnameya hişk û serê wê li komên sivîl ên demokratîk, kominên ekonomîk û ekolojîk girtî daneyne, divê xwe weke serbixwe nehesibîne, felsefeya bingehîn gerdûnî-tekane weke prensîp esas bigire, hewce ye ji besîtê ber bi tevlîheviyê avahî û tevnên gelekî berfireh werin danîn û ev mumkîn e.

### Wek navenda cazîbe ya herêmê konfederalîzma demokratîk

Yek ji navendên yekparebûna polîtîk a muhtemel bi Komina Cotkarî-Av-Enerjî ya Dîcle-Firatê ve girêdayî, ne li ser bingehê xirakirina Komara Tirkiyê, Komara Ereb a Sûrî (Sûriya Mezin, Lubnan, Urdun, Filistîn-Îsraîl jî di navê de) û Komara Federal a Iraqa îro, bi pêvajoyê re bi reforman wê were avakirin. Komarên heyî herçiqasî di destpêkê de naveroka xwe ya dewleta netewe biparêzin jî bi pêvajoyê re wê nerm bibin û veguherin nasnameyên serê wan vekirî yên dewleta netewe û bi vî awayî dikarin gav biavêjin nava yekîtiya demokratîk. Pêkhatina siyasî ya derkeve holê divê li demokrasiyeke ji ya DYE û YE'yê pêşketîtir vekirîbe. Ji ber ku wê giraniya hêmanên demokratîk ên komin hebe, ev yek ê wisa be. Tevahiya nasnameyên mozaîka herêmê pêk tînin, wê karibin di nava wê de cih bigirin. Berê pêşî ev nasname dikarin weke komikên neteweya demokratîk bêne avakirin. Avakirineke bi vî rengî wê rîska şerê çavkaniya xwe ji milliyetgiriya serê wê girtî, hişk, tek ziman û tek etnîsîte ya dewleta netewe digire nava xwe, dikare herî kêm bike. Rastiya jiyana di nava hev de ya bi hezarê salan tevahiya dîrokê dewam kiriye, wê mumkîn be ku were nûkirin. Gelên çanda qedîm ên herêmê Ereb, Kurd, Ermenî, Cihû, Asûrî (Suryanî-Keldanî), Tirk, Tirkmen, yên bi kok Qafqasî, Fars û hin etnîsîte (êl û eşîr) dema bi nasnameya neteweyê demokratîk bêne avakirin, hem ev ê bibe bersiva wan li gorî çanda wan a dîrokî, hem jî wê ji asêbûna parçe bike-bi rê ve bibe, pevçûn û şerên wê yên ku bi destikê moderîteya kapîtalîst dewleta netewe hatiye sorkirin, rizgar bibin. Ji ber ku ehemiyet û girîngiyê bi nasnemeyên nerm û serê wan vekirî didin, di nava xwe de dikarin yekparebûn û hevgirtinên gelekî dewlemend

û berdar pêşde bibin ango xuşk û biratiyê çêkin. Çawa ku di dîrokê de gelek mînakên wê hatine dîtin, ji bo nasnameyên dînî jî heman nêzîkatî dibe. Ji ber ku pirraniya wan xwediyê baweriyeke teolojîk a hevpar in, yekparebûn û hevgirtin hêsantir pêş dikeve. Dînên Brahîmî weke Mûsewîtî, Xirîstiyantî, Misilmantî bi tevahî mezheb û terîqetên xwe, çawa ku di dîrokê de gelek caran hatiye dîtin, bi têgihiştina nasnameya dînî ya nerm û serê wê vekirî, nêzî hev bibin û rê li ber sentezên bi xêrûbêr vekin. Di nava hevgirtin û yekparebûna siyasî ya siberojê de gera li pirr ziman û nasnameyên bi netewe û welatê hevpar ve girêdayî, pirsgirêk nîne. Bajarîtî, xwecihtî û herêmtî, ji ber ku wê li gorî xisletên çanda dîrokî, weke nasnameyên demokratîk bi wesfên komikan bêne avakirin, ji cudahiyên heyî re wê weke mekanên sînerjiyê yên îdeal bi mane bibin. Rengê polîtîk û exlaqî yê van nasnameyan hemûyan wê esas be. Huqûq wê di xizmeta exlaq û polîtîkayê de be; wê şûna exlaq û polîtîkayê negire. Konfederalîzma Demokratîk (mirov dikare navên weke Federasyon, yekîtiyên demokratîk û hwd. lê bike) a weke navenda cazîbê ya herêmê were pêşdebirin, ji ber ku wê kominên ekonomîk û ekolojîk esas bigire (ji ber ku erd-av-enerjî wekî din berdar nabin), li dijî sê suwarên mehşerî yên modernîteya kapîtalîst karperestiya kapîtalîst, îndustriyalîzma wê û li beramberî rewşa pevçûnan û şer, rewşa kaotîk û krîza avabûnê ya dewleta netewe rê li ber vekirî, wê bibe bersiva dîrokî û herî îdeal a bê dayîn. Jeoçand û jeopolîtîka Kurdistanê (di nava Ereb, Tirk û Farsan de cih digire, li nuqteyekê ye, çand hemû li digihîjin hev) mîna ku yekparebûn û hevgirtineke siyasî ya bi vî rengî neçar û mecbûrî dike. Di dema modernîteya kapîtalîst de polîtîkayên hegemonîk ên Brîtanyayê li ser Hindistan û Rojhilata Navîn meşandin, Kurdistan timî bi statuya welatekî çareserî lê nabe hiştin û bi vî awayî kirin weke destikekî pê kontrola xwe li ser herêmê misêwa dewam bikin. Bi vî awayî ji bo ku otorîteyên desthilatdar ên Ereb, Tirk û Fars di kontrola xwe de bigirin, Kurdistan kirin destikekî gelekî bi kêra wan bê. Di roja me ya îro de bi DYE'yê re li Başûrê Kurdistanê ya jêre Bakurê Iraqê dibêjin, li ser parçeyekî wî yê piçûk bi avakirineke dereng a dewletokeke netewe ya mîna Ermenistan û Yewnanistanê, dixwazin heman rolê dewam bikin. Weke ku dîrokê pirsgirêka Kurd û Kurdistanê veguherandibe duyemîn pirsgirêka Cihûyan. Herî kêm îro pêvajoyeke bi vî awayî dimeşe. Bêguman di vê de polîtîka modernîteya kapîtalîst a afirandina dewleta netewe ya newekhev, bi rola diyarker radibe. Dewletdariya netewe ya Ereb, Tirk û Fars jiholêrakirina Kurdistanê û qurbankirina Kurdan ferz dike. Di sêgoşeya îmhayê ya bi vî rengî de mirov bi dewlotekeke netewe ya Kurd a mînîmal bersivê bide, nabe. Eger bersiveke weha bê dayîn jî weke ku hê gelekî pêk tê, wê bi komkujî û qirkirinan bi encam bibe. Ji vê paradoksa dîrokî dersa divê were girtin ew e ku divê bi pêkhatinên siyasî yên demokratîk ên nebûne dewleta netewe de, bi kominên ekonomîk û ekolojîk, di serî de neteweyên cîran gelên herêmê hemûyan di çareseriya modernîteya demokratîk de bike hevpar û tevlî vê çareseriyê bike. Wexta mirov guh bide dîrokê, mirov ê bibîne li newalên Dîcle-Firatê li Kevana Bi Bereket serdema neolîtîkê ya panzdeh hezar salî, şaristaniya navendî ya pênc hezar salî û çanda modernîteyê ya dused salên dawiyê tişta bi mirov didin hiskirin pêkhatinên siyasî yên yekpare û hevgirtî ne. Otorîteyên siyasî yên bi navê Sumer, Aqad, Gotî, Asûr, Hûrrî, Mîtannî, Ûrartû, Hîtît, Med, Pers, Helen, Sasanî, Bîzans, Emewî, Ebbasî, Selçûqî, Moxolî, Osmanî û dijberên wan ên her hebûn, otorîteyên demokratîk ên bi heman navî yan jî bi navên cihê pêk hatin, timî pêkhateyên siyasî yên yekpare û hevgirtî bûn. Jixwe otorîteya dayikî ya serdema neolîtîkê ya bi cihêkariyê nizane û koletiyê nas nake, cewherê pêkhatinên wekhevî, exlaqa xwezayî û polîtîk e. Di dused salên dawî de provakasyên dewleta netewe yên bi şer û bi parçekirinê yên navend Ewrûpa, di nava vê pêvajoya dirêj a dîrokî de kiteyeke piçûk e. Ji bo ku dîrok careke din karibe di cironeka xwe ya sereke de li gorî rastiya xwe ya jeoçand û jeopolîtîk biherike, divê li ser mîrateya şaristaniya demokratîk modernîteya demokratîk were pêşdebirin. Li dijî pirsgirêkên mîrateya dîrokî ya dewlemend xistine serhev û li dijî krîz, şer, tevkujî û qirkirinên rojane, gava hevpar a pêşî ya çareseriyê ya divê bi awayekî berbiçav bê avêtin, dikare proje û fikra Konfederasyona Demokratîk a Dîcle-Firatê be. Fikreke bi vî




awayî di navbera neteweyên pirranî mîna Ereb, Tirk, Kurd û Fars û neteweyên hindikayî û çandan de pêvajoya bi şer û asîmîlasyonîst berepaş bike bi pêkhatinên siyasî yên demokratîk komin û piştgiriyê, dikare bibe sedema hevpariyên ji dewleta netewe wêdetir. Projeya Konfederasyona Demokratîk a Dîcle-Firatê, li gorî herikîna vê dîrokê wê bibe gaveke herî girîng û pêşî ya were avêtin. Ez qet şik û gumanê jê nabim ku bi vê projeyê kominên civaka demokratîk, ekonomîk û ekolojîk ên bi awayekî berfireh û gav bi gav bêne pêşdebirin, wê di buhaya zêr de Serdema Rojhilata Navîn a Demokratîk li gorî dîrok û çanda wê bide destpêkirin. Serdema Rojhilata Navîn a Demokratîk wê hem bibe hişyarbûna dîroka qedîm, hem jî bibe bextewarî û qêrîna jiyana azad a dîroka nû. Dema mirov di çarçoveya vê projeya sereke de li rastiya Rojhilata Navîn binêre, derfet û îmkan çêdibe behsa hin projeyên di dereceya duyemîn de bike. Çawa di serdema neolîtîk û şaristaniyê de her pêk hat, li serê rojava yê Kevana Bi Bereket ê xwe dirêjî Misr û Bakurê Efrîkayê dike, mirov dikare li Misr an jî navend Lîbyayê (navend Geliyê Nîlê) Projeya Konfederasyona Demokratîk a Bakurê Efrîkayê bi pêş bixe. Li serê rojhilatê Kevana Bi Bereket navend Pencab Projeya Konfederasyona Demokratîk a Rojhilatê Îranê, li Afganistan û Pakistanê (ev navên dewletên netewe li gorî jeoçand û jeopolîtîkê di cih de nînin) xwedî rewşeke lezgîn e. Di Modernîteya Demokratîk a Rojhilata Navîn de duyemîn projeya din a manedar divê mirov bifikire, li serê rojhilat navend Ozbekîstana îro li ser Geliyên Seyhûn û Ceyhûnê wê Konfederasyona Demokratîk a Asya Navîn be. Li Başûrê Erebistanê cemaet û qebîleyên hê gelekî şên û bi hêz hene, ji lewra mirov dikare weke projeyeke din a manedar li Konfederasyona Demokratîk a Başûrê Erebistanê bifikire. Ji tevahiya van projeyan hemûyan, mirov dikare weke utopyayekê li projeyeke mezin ango li Projeya Modernîteya Demokratîk a Rojhilata Navîn bifikire. Bêguman ev proje ji Projeya Rojhilata Navîn a Mezin a Emerîkayê DYE'yê zêdetir rastî xuya dike. Ya rastiya projeyekê diyar dike, bingehê wê yê çandî û plana dîrokî ya li pişt wê ye. Wexta mirov li berê herikîna sereke ya serdema neolîtîk û şaristaniyê binêre, wê qebûl bike ku bingehekî welê yê dîrokî û çanda hevpar pêk hatiye. Di çanda Rojhilata Navîn de yekîtiyên bi awayê Yekîtiya Ewrûpayê ji utopya û projeyê wêdetir, li her qada krîz û şer, parçebûn û xerîbketin, lêgerînê neçar dikin rastiyên jiyanê yên gerdûnî-tekane ne, divê gav bi gav bêne avakirin. Bêguman ev proje niha her yek ji wan utopyayek e. Lê bingehên wan ên dîrokî û civakî bi hêz in.

Çanda Rojhilata Navîn utopya cennet û cehennemê diyarî mirovatiyê kiriye û çandeke welê ye, bi destana nivîskî ya pêşî bi Destana Gilgamêş beriya bi hezarê salan timî li gihayê nemiriniyê geriyaye. Ez fêhm dikim ku jiyana dikare bi jina azad pêk bê, nifşên Gilgamêş ên bi nexweşiya desthilatdariyê ew wenda kirî, ev jiyana timî li pey wê ne, ne bi tenê bi awayê nemiriniyê, di pêvajoya jiyana rastî de jî wê nikaribin wê bibînin. Ji ber ku mirov tiştekî li çi deverê wenda bike, dikare li wir bibîne. Li cem cinsê mirov volkanê jiyana mezin li qûntara çiyayên Toros-Zagrosê, li geliyên Dîcle-Firatê teqiya. Jiyana bi heybet û balkêş li vir hilat; li Kurdistanê weke Jin û Jiyan pêk hat. Di nava hezarê salan de vê carê jiyan bi hiyerarşî û desthilatdariyên dewletan di rewşa berçav a Jin û Jiyanê de li heman mekanî hat wendakirin. Piştrast bûye ku destan hemû kopiyên Destana Gilgamêş in. Cennet û cehennem tev bi van jiyanên pêkhatî û wendakirî re têkildar in. Nexweşiya desthilatdariyê, bi rastî jiyanê dikuje. Bi serwextbûna li vê rastiyê, divê mirov zanibe, projeya Serdema Rojhilata Navîn a Demokratîk di heman demê de projeya wê rastiyê ye ku li devera jiyan bi nexweşiya desthilatdariyê hat wendakirin, jiyana jina azad a nebû desthilatdar weke civaka ekolojîk û ekonomîk hatiye keşifkirin û dîtin. Her proje di heman demê de utopya paşerojê ye. Civaka Demokratîk û Modernîteya Demokratîk di nava cudahiyan de utopya pêkhatî ya paşerojê ne (di nava cudahiyan de bi awayekî azad û wekhev). Ji bo yên xwedî utopya jiyana azad û mezin, şertê şêwazekî jiyanê heye yê ku dema mirov lê bigere dikare li herêmê gelek mînakên wê bibîne. Ew jî ev e: ji bo heqîqeta civakbûnê mumkîn dike, tu yê bijî. Tu çiqasî heqîqetê bibînî, tu yê karibî ewqasî bijî. Tu çiqasî heqîqetê belav bikî, tu yê karibî ewqasî civaka exlaqî û polîtîk ava bikî. Ji bo vê yekê jî tu yê li dijî astengiyên hundir û derve yên derkevin pêşberî te, rast têbikoşî. Li Rojhilata Navîn Akademiya Zanyartiyê timî bi vî awayî dibêje. Îradeya jiyanê ya bi vê vegotinê azad dibe, timî wisa dike!

■■■


# EM DI MEHA ŞEHÎDÊN GULANÊ DE PÊNGAVA XWE YA AZADIYÊ LI SER XETA SERKEFTINÊ PÊŞ BIXIN!

***Ji Bo Hemû Kadro û Sempatîzanên PKK!***

*Komîteya Rêvebir a PKK'ê*

**Rêhevalên Hêja!**

Em ketin nava pêvajoyeke nû ya 1'ê Gulanê. Wekî tê zanîn 1'ê Gulanê, roja yekitî, hevgirtin û têkoşîna çîna karkeran e. Ji bo Kurdan jî 1'ê Gulanê rojeke girîng e. Çima? Ji ber ku Kurd piraniya xwe karker û kedkar in. Em di vê 1'ê Gulanê





de dixwazin Pêngava xwe ya Azadiya Kûrevî ber bi zafereke nû ve bibin. Dîsa pêvajoya ku me bi 8'ê Adarê û Newrozê dabû destpêkirin, dixwazin ji hêla girseyî ve rengê xwe bide 1'ê Gulanê jî û vê aste derbas bike. Li ser van bingehan em destpêkê 1'ê Gulanê li Rêber Apo, li hemû hevalan, gele me yê kedkar, karker û kedkaran, jin û ciwanan pîroz dikin. Hemû kesên ku di 1'ê Gulanê de meydanan tijî kirin, ji bo azadî û demokrasiye têkoşîn kirin em silav dikin. Di şexsê Abdulkadîr Çubukçu, Mehmet Emîn Aslan, Ramazan Kaplan de, dîsa di şexsê şehîdên Taksîmê yên 1'ê Gulana 1977'an de hemû şehîdên 1'ê Gulanê bi rêz, hurmet û mînetdarî bibîrtînin. Ji bo ku gel û dostên me bikarin Pêngava Azadiya Kurevî bigihînin asteke bilindtir, divê em bikarin li her dere çalakiyên bihêzir pêş bixin, ji pîrozbahiyên 1'ê Gulanê re pêşengtiyê bikin.


**Rêhevalên Hêja!**

Wekî tê zanîn 18'ê Gulanê roja me ya şehîdan e. Meha gulanê jî, meha me ya şehîdan e. Hakî Karer, di 18'ê Gulana




1977'an de li Entabê ji hêla sîxûrên mêtînger-qirker ve hate qetilkirin. Ji ber vê ev roj ji hêla partiya me ve wekî Roja Şehîdên Kurdistanê hatiye îlankirin. Ji ber çalakiyên bîranîna Hakî Karer jî giştî meha gulanê veguheriye meha şehîdan. Ji ber vê jî meha gulanê ji hêla partiya me ve wekî meha şehîdan hatiye îlankirin. Li ser van bingehan em beriya her tiştî Rêber Apo bi rêz silav dikin ku ji me re arteşeke wiha ya şehîdan afirandiye, li ser bingehê artêşa şehîdan pêşengtiya têkoşîna me ya azadiyê mîsoger kiriye. Di şexsê heval Hakî Karer de hemû şehîdên xwe yên qehreman bi rêz, hezkirin û mînetdarî bibîrtînin. Di 48'emîn sala şehîdan de hemû şehîdên xwe yên qehreman bi rêz, hezkirin û mînetdarî bibîrtînin. Di 48'emîn sala şehîdan de ji herkesê ku Têkoşîna Azadî û Demokrasî didin meşandin re serkeftinê dixwazin.

Tê zanîn, pêşengên Şoreşgerên Tirkiyeyê jî di meha gulanê de gihiştine şehadete. 6'ê Gulana 1972'yan de Denîz Gezmîş, Yusuf Aslan û Hûseyîn Înan hatin darvekirin. Van pêşengan bi Egîdane berxwedan û şehît ketin. 18'ê Gulana 1973'yan de pêşengê TKP/ML Îbrahîm




Kaypakkaya bi îşkenceyê hate qetilkirin. Dîsa Sînan Cemgîl bi hevalên xwe re 31'ê Gulanê dema li çiya gerîlatî dikirin di nava şer de şehît ketin. Bi vî awayî meha gulanê bû Meha Şehîdên Şoreşgerên Tirkiyeyê jî. Di şexsê Denîz Gezmîş, Yusuf Aslan, Hûseyîn Înan, Îbrahîm Kaypakkaya û Sînan Cemgîl de



hemû Şehîdên Şoreşa Tirkiyeyê jî bi rêz, hezkirin û mînetdarî bibîrtînin. Bêguman emê li ser xeta zaferê şoreşên Tirkiye û Kurdistanê bikin yek, pêş bixin, yekitiya wê ya stratejik ava bikin daku bikarin deynê xwe bidin van şehîdan.

Dîsa di meha gulanê de, rewşenbîrên Ereb di nava Şerê Cîhanê yê Yekemîn de li Şamê 16'ê Gulana 1916'an de bi komî hatin qetilkirin. Ji ber vê Şoreşgerên Ereb meha Gulanê wekî meha şehîdan bibîrtînin. Heya tê gotin ku Çerkez jî meha gulanê wekî meha şehîdan digirin dest. Baş binêrin ji hêla gelen herêmê ve jî meha gulanê wekî meha têkoşînê, meha berdêl dayînê, meha xwîn rijandinê tê dîtin. Ev rastî, hem ji hêla Kurdan ve wiha ye, hem jî, ji hêla gelên Tirkiye û gelê Ereb ve wiha ye.

Ji ber vê yekê em şehîdên vê meha gulanê bi rêz û mînetdarî bibîrtînin. Diyar dikin ku emê bîranînên wan di Têkoşîna Yekîtiya Rojhilata Navîn û Konfederalîzma Rojhilata Navîn a Demokratîk de bidin jiyîn, dîsa emê bîranînên wan di têkoşîna xwûşk û biratiya gelan de bidin jiyîn.



**Rêhevalên Hêja!**

Tevgera me, tevgera Rêbertî û Şehîdan e. Baş e, wateya tevgera Rêbertî çî ye? Bêguman beriya her tiştî tê wateya Tevgera Zaferê. Tê wateya afirandina jiyaneke nû, tê wateya pêşbîniya nûbûn û guhertinê. Jixwe yê rê dibîne, diyar dike, nişan dike re Rêbertî tê gotin. Yê vê riyê saz dike û di vê riyê de dide meşandin rêbertî ye. Ji hêla Kurdistanê ve wateya derketina Rêber Apo wiha ye; li vir dîtin, vekirin û nîşandana riyeke nû heye.

Ev riyeke çawa ye? Riya azadiyê, riya demokrasiyê, riya wekheviya ku xwe dispêre cudahiyan e, riya sosyalizme ye. Yanî ev dibe riya rizgariyê. Çima? Ji ber ku dema gelê Kurd di bin zext û zilma faşist-mêtînger û qirker de bû Rêber Apo vê qebûl nekir, ret kir û wisa derkete ser dika dîrokê. Diyar ku jiyaneke wiha nabe û ev nayê pejirandin. Gelekî nikare di bin êrîşekê wiha de bijî. Ji ber vê yekê got divê bi ti awayî ev gel bê berxwedan, bê têkoşîn tinebûnê qebûl neke. Da diyarkirin ku ev gel ger berxwe bide, riya xwe jî rast

deyne holê ji her demê bêhtir xwediyê derfet û fersendan e ku bikare xwe bigihîne zafere. Jixwe derketina Rêbertî ya 1973'yan jî xwe spart vê rastiyê. Baş e, wateya Tevgera Şehîdan çi ye? Bêguman tevlîbûna herî rast e. Rastiya şehîdan, tê wateya îspata zaferê, tê wateya rastiya Xeta Rêbertî. Jixwe yê ji tiştek re şahidî bike re dibêjin"şehît."

Baş e, dibin şahidê çi? Dibin şahidê rastiya xeta Rêbertî. Dibin şahidê qezenckirina zaferê. Ji ber vê yekê yê herî zêde Rêbertî rast fêm dikin şehîd in. Yê herî rast û bihêz tevlî Rêbertî dibin şehîd in. Yê hêrî zêde ji xeta Rêbertî re tevkariyê dikin şehîd in. Di esas de herî zêde şehît xeta Rêbertî pêş dixin, ji Rêbertî re di bin alîkar, xeta Rêbertî di riya zaferê de pêşde dibin. Rastiya şehîdên me wiha ye. Ji ber vê yekê Rêber Apo ji bo Hakî Karer got "wekî rihê min ê veşartî bû." Yanî got di asta ruhî de bi min re bibû yek, ji ber vê min pir baş fêm kir û tevlîbûna wê jî wiha bû. Ji ber ku di asta ruhî de yekbûnê çêkiribû, xwe di nava vê rastiyê de helandibû xeta min, fikir û hestên min di asta herî jor de, bê qisûr fêm kir û pêkanî."

Şehîdên me yên din jî dan ser şopa Hakî Karer û bûn rêviyên vê riyê. Bi vî awayî di 18'ê Gulana 1977'an de li Entabê bi şehadeta Hakî Karer re meşeke nû ya azadiyê dest pê kir. Karwanê şehîdan kete rê. Tevger û meşa me ya azadiyê di bin pêşegtiya şehîdan de çêbû. Avabûn û çêbûna Rêbertî, di pratîkê de wekî artêşa şehîdan xwe da der, hemû têkoşîn, partî û gel di bin fermandartiya şehîdan de pêşket, meşiya û heya roja me ya îro hat.

PKK tevgereke wiha ye. Heya dawiyê di şêwaza jiyana rast de têkoşîn kirine. Jixwe wateya Tevgera Rêbertî û Şehîdan jî ev e. Yanî ji bo jiyana rast li ser xeta fedaîtiyê têkoşîn meşandine. Ji ber vê tevgera me, partiya me bû partiyeke fedaî. Partî û gelekî fedaî derxiste holê. Tê zanîn, hişmendî û siyaseta faşîst-qirker-mêtînger hertim mirinê, tinebûnê ferz dike. Bêguman tevgera me vê ret kir û di têkoşîna azadî û demokrasiyê de jinûve dayîk bû, çêbû û ji jiyana azad a gelê herêmê û mirovahiyê re tevkariya herî mezin kir. Ji ber vê têkoşîna ku niha di bin pêşengtiya PKK'ê de wekî tevgera fedaiyan li ser xeta şehadetê tê meşandin ji hemû mirovahiyê re pêşengtî dike. Di serî de jin û ciwan hemû bindest, têkoşîna gerîlayê Kurd, têkoşîna jin û ciwanan a di bin pêşengtiya PKK'ê de pêşdikeve bi heyrantî temaşe dikin. Bi demê re nas dikin, fêm dikin û li ser vê esasê jî tevlî dibin, destekek mezin didin.

Tevgera me destpêkê wekî tevgera Rêbertî û Şehîdan pêşket û li ser vê hîmê têkoşîna azadiyê gihand asta zaferê. Niha jî dibe tevgereke kûrevî. Rêber Apo jî bi guhertina paradîgmayê re bû Rêbereke kûrevî. Xwe kire Rêberê hemû bindestan. Ji hemû pirsgrêkên ku dewlet û desthilat derxistine holê re çareserî pêşxist, li ser vê esasê fikreke nû, xeteke nû danî holê. Bêguman herî baş, vê xetê rastiya şehîdan fêm dike û bi serkeftî pêktîne.

Di esas de Rêbertî ji bo tola şehîdan hilde, ji bîranên şehîdan re bibe bersiv derket pêş û li ser vê riyê meşiya. PKK ji bo bîranîna Hakî Karer xwe rêxistin kir, pêşket. Rêber Apo vê wiha anî ziman; ji bo PKK got; " Rêxistinbûn û çalakbûna bîranîna Hakî Karer e." Baş e, derketina Rêbertî çi xiste pratîkê, çi rast da fêmkirin? Me destpêkê anî ziman, bi vî awayî ji armanc û bîranînên Şehîdên Şoreşa Tirkiyeyê re bû bersiv, rast da fêmkirin. Bû domandina têkoşîna Denîz, Mahîr û Îbrahîman. Rêber Apo hertim bi kêfxweşî qala vê rastiyê kir. Hertim diyar kir ku Tevgera Azadiyê, têkoşîna wî, ji nava Tevgera Ciwanên Şoreşger ên Tirkiyeyê derketiye. Ji bo bikare li dijî darbeya 12'ê Adara 1971'an xwedî li têkoşîna Denîz, Mahîr û Îbrahîman derkeve û bide domandin vê têkoşînê meşandiye û hertim şoreşgertiya xwe jî girêdayê vê rastiyê pênase kiriye.

Em vê pir baş dizanin: Herî baş Rêber Apo berxwedana ku li dijî derbeya 12'ê Adara 1971'an hatiye pêşxistin rast fêm kir, rexnedayîn da û rexne kir. Hêrî bi hêz û rast xwedî li wê berxwedanê derket, jê encam derxist û ji xwe re kire tecrûbe. Piştî lêhûrbûneke wiha û dersên hatine derxistin bingeha PKK'ê avêt. Kom ava kir û ber bi Kurdistanê ve bir. Di vê pêvajoyê de pêşengê koma Entabê, cîgirê Rêber Apo Hakî Karer, di 18'ê Gulana 1977'an de li Entabê hate qetilkirin. Beramberê qetlîameke wiha Rêber Apo got "Me wisa hîskir ku li ser serê me de ava kel hat xwarê." Rêber Apo di vê astê de ji şehadeta Hakî Karer bandor bû. Ji ber vê yekê jî dîsa herî baş Rêber Apo vê şehadetê rast fêm kir û xwedî lê derket.

Li ser vê bingehê Rêber Apo çi pêkanî? Rêxistinbûna PKK'ê pêşxist. Pêvajoya partibûnê da destpêkirin. Li ser bingehê bîranîna Hakî Karer du bîryar hatin girtin; Ya yekemîn pêşxistina berxwedana çekdarî bû, yanî pêşxistina şerê tolhildana şoreşgerî, çalakiyên bersivdayînê bû ku Têkoşîna Gerîlayê Azadiya Kurdistan îro jî li ser vê bingehê têdikoşe, berxwe dide. Ev têkoşîn, têkoşîneke pîroz e.

Ya din jî bîryara partibûnê ye. Li ser vê bingehê bi amadekirina pêşnûme(taslak)- program pêvajoya partîbûnê hate destpêkirin. Wekî encam di 27'ê Mijdara 1978'an de li Lîcê gundê Fîs bi civîneke PKK hate damezrandin. Li vir bîryara berxwedana çekdarî û partîbûnê hate dayîn.

Baş e, çalakiya pratîkî bi çi pêşket? Li ser xeta şehadetê pêşket. Li ser bingehê rast xwedî derketina bîranîna şehîdan pêşket. Bi meşa li ser şopa şehîdan pêşket. Binêrin, Halîl Çavgun di nava çalakiya ku ji bo bîranîna Hakî Karer hatibû rêxistinkirin de, 19'ê Gulana 1978'an de li Hîlwanê bi destê hêzên faşîst-qirker-mêtînger hate qetilkirin.

Baş e, wateya şehadeta heval Halîl çi bû? Bêguman, nîşaneya mezinbûna têkoşînê bû, têkoşîn êdî dikete nava gel, girseyî dibû, dibû malê gel, jiyanî dibû. Jixwe, ji bo bîranîna heval Halîl Çavgun berxwedana Hîlwanê hate pêşxistin ku îro jî ev berxwedana muzafer, ji pêşengtiya xwe, rol û mîsyona xwe tiştek winda nekiriye. Têkoşîna ku li ser bingehê bîranîna Hakî û Halîl hate meşandin, piştî derbeya leşkerî ya 12 Îlonê li zindanan û li derveyî welat awayekî bi bandor berdewam kir. Dîsa di meha gulanê de, di pêvajoyên salvegera şehadeta heval Hakî Karer de berxwedanên mezin, çalakiyên mezin, şehadetên mezin hatin jiyîn. Heval Abdulkadîr Çûbûkçû dema li dijî sîyonîzm û emperyalîzmê bi gelê Fîlîstînê re mil bi mil şer dikir, 1'ê Gulana 1982'yan de li Beyrut'ê şehît ket.

Baş e, şehadeta heval Abdulkadîr Çûbûkçû dihat çi wateyê? Bêguman di eniyên şer de rêhevaltiya gelên Kurdistan û Fîlîstînê afirand, bû nîşaneya xwûşk û biratiya van gelan. Ger em berxwedana gelê Fîlîstînê wekî berxwedaneke gelê Ereb, şoreşgertiyeke gelê Ereb bibînin, wê demê dikarin bêjin ku hê di destpêka salên '80'yî de 1'ê Gulana 1982'yan de bi şehadeta Abdulkadîr Çûbûkçû tifaqa stratejîk a Kurd-Ereb, xwûşk û biratiya Kurd-Ereb pêkhat. Me xwûşk û biratiya gelê Fîlîstîn-gelên Ereb û gelê Kurd bi rijandina xwîn ava kiriye, bi parvekirina jiyanê, li dijî dijminê hevpar bi meşandina têkoşînê ava kiriye.

Me wekî hin kesan, bi taybetî jî wekî Tayîp Erdogan û AKP, vê ji bo ku ji têkoşîna gelê Fîlîstînê bixwin nekir. Berovajî, me vê ji bo ku bikarin xwûşk û biratiya gelan biafirinîn, têkoşîneke hevpar bidin meşandin kir, ji bo bikarin bi hev re zaferê hembêz bikin kir. Xwûşk û biratiya herî saxlem ev e. Îro hê jî hêz û tifaqa herî şoreşger a Rojhilata Navîn li ser vê bingehê derdikeve holê. Ya ku li Bakur Rojhilatê Suriyeyê tê jiyîn û pêktê ev e. Ji ber vê yekê divê bizanin ku tifaq, xwûşk û biratiya Kurd-Ereb, jiyan û têkoşîna hevpar a Kurd-Ereb bi Şoreşa Rojava re derneketiye holê. Hê di destpêka salên '80'yî de li Lubnanê di navbera PKK û Rêxistina Rizgariya Fîlîstînê de ava bûye, bi pratîk û têkoşîna li Lubnanê bingehên wê hatine avêtin. Bingehên vê tifaqê bi xwîn hatiye avdan. Bi hevaltiya çek hatiye zeximkirin. Ji ber vê yekê bingehê vê tifaqê saxlem e û îro jî ev bi heman awayî didome.

Ji aliyê din ve me di heman pêvajoyê de li zindanan jî berxwedaneke mezin dît. 17'ê Gulana 1982'yan de Ferhat Kurtay û hevalên xwe, hevalên ku em jê re dibêjin koma çaran bi berxwedana xwe zindanê ronî kirin, tarîtiya 12'ê Îlonê rûxandin. Berxwedana mezin a Necmî Oner, Mahmut Zengîn, Eşref Anyik û Ferhat Kurtay, rast xwedî derketina bîranîna Hakî Karer bû, bi vî berxwedanê dan ser şopa Hakî Karer.

Berxwedana Çaran di xwe de çi hewand? Berxwedana Newrozê ya Kawayê Hemdem Mazlum Doxan, bi Berxwedana 14'ê Tîrmehê ve girêda. Bû bingeha Berxwedana Mezin a Zindanê. Ji hêla bîrdozî ve hişmendî û siyaseta faşîst-qirker-mêtînger di zindanê de têk bir. Baş binêrin, têkoşîna ku li ser xeta şehadetê hatiye meşandin bi xwe re encamên çawa derxistine holê. Em dizanin ku ev têkoşîn, di meha gulanê de li zindanan û li çiya bi dayîna şehîdan belavê çiya bûye, di têkoşîna gerîla de xwe daye der.

Li çiya jî di meşandina vê têkoşînê de me di pêvajoya 1'ê Gulanê de şehîdan da; 2'yê Gulana 1983'yan de li Qendîlê rêheval Mehmet Karasungur û Îbrahîm Bîlgîn şehît ketin. Rêheval Mehmet Karasungur fermandarê berxwedana Hîlwan û Sîwerekê bû. Heman awayî li Botanê ji bo gerîlatî amadekariyan kiribû. Bi heval Egîd re ji bo vegera welat û li Botanê ji bo pêşxistina gerîla xebatên amadekariyê dabû meşandin. Yekemîn berpirsyarê konseya leşkerî ya PKK'ê bû. Yanî di PKK'ê de yekemîn fermandarê leşkerî Mehmet Karasungur e. Endamê Komîteya Navendî ya Partiya me bû. Beriya ku şehît bikeve hem ji bo meşandina vê erkê kar dikir hem jî dixwest pêşiya êrîşên noker bigire ku li Kurdistanê ji bo berjewendiyên derdorên mêtînger û emperyalîst diketin nava pevçûnan. Dixwest vê birîna kûr a civakî bikemilîne, li ser bingehê demokrasî, wekhevî, têkoşîna şoreşgerî yekîtiya netewî ya gelê Kurd biafirîne. Dema hewil dida gerîlatiyê pêş bixe û li ser xeta azadiyê yekîtiya netewî ya gelê Kurd derxîne holê şehît ket.

Baş e, wateya vê çi bû? Nexwe li ser bingehê azadiyê çarenûsa yekitiya netewî ya gelê Kurd û gerîla yek e, bi hev ve girêdayî ne. Gerîla pêşeng û afrînerê Yekîtiya Netewî Ya Gelê Kurd e. Ji hêla ruh, hest, fikir û pratîkî ve pêşengtiya vê dike. Em vê yekser di çalakî, kesayet û şehadeta rêheval Mehmet Karasungur de dibînin.


Piştre têkoşîna gerîla tê. Me her sal di gerîla de şehîdan da. Beriya salvegera yekemîn

a Pêngava 15'ê Tebaxê, 1'ê Gulana 1985'an de li Xerzanê Ramazan Kaplan bi koma xwe re li dijî dijmin tam hefteyeke şer dike û şehît dikeve. Dîsa rêheval Hecî(Sabrî Gozûbûyûk) dema dixwest bi hevalên xwe re berê xwe bide Semsûr, ber bi Torosan ve here 25'ê Gulana 1985'an de li Bozovayê di nava şer de şehît ket.


Wekî tevger, hê di sala yekemîn a gerîla de, em di meha gulanê de ketin nava pevçûnên mezin, me çalakiyan pêşxist û şehîdan da. Ev rewş salên pêş jî her berdewam bû. 1'ê Gulana 1988'an de li Mêrdînê Mehmet Emîn Aslan şehît bû. 25'ê Gulana 1988'an de li Şemzînanê rêhevel Ahmet Kesîp(Cimşît) şehît bû. Hem Mehmet Emîn Aslan hem jî Ahmet Kesîp endamên Komîteya Navendî ya partiya me bûn. Yek ji van pêşeng û fermandarê Serhadê bû, ya din jî pêşengê bi nav û deng ê gelê Mêrdînê bû. Dîsa li Xerzanê dema erkê fermandartiya eyaletê dida meşandin me 11'ê Gulana 1992'yan de rêheval Mizgîn şehît da.

Baş e, piştî Pêngava 15'ê Tebaxê û şûnde di her meha gulanê de şehadeta gerîla bû nîşaneya çi? Nîşanda ku çalakiya şoreşgerî di gerîla de berdewame. Têkoşîna azadiyê di gerîla de berdewame. Xeta şehîdan di gerîla de dijî û berdewame. Her tiştî gerîla hilgirtiye ser xwe û jê re pêşengtî dike. Bêguman hem wekî hunermendeke hem jî wekî jineke şehadeta heval Mizgin wateyeke mezintir lê barkir. Hem hunermendiyê hem jî şervantiya azadiyê û fermandartiyê di kesayeta xwe de kir yek. Vana di Milîtantî û Xeta Azadiya Jin de kir yek, bi hev ve girêda. Wekî pêşengek li hemû qadan têkoşîna azadiya jin a ku heval Sara dabû destpêkirin li her derê bi serkeftî pêkanî. Ji ber vê bû sembol û mînak. Bêguman ev rastî hemû dibin hebûn û nasnameya me.

Dîsa di Gulana 1997'an de qetlîama Hewlêrê hate jiyîn. Di vê li vir qala wê jî bikin. Di bin pêşengtiya Hevala Hêlîn, Hevalê Salih û Ozan de derdorê heftê heval ji hêla xiyanet û nokeriya Kurd ve bi namerdane hatin qetilkirin. Mirov ger bixwaze PDK'ê fêm bike divê temaşeyê qetlîama Hewlêrê bike ku îro ji bo Dagirkirina Qadên Parastina Medya bi TC re li dijî me şer dide meşandin. Di vê bûyerê de xuya dike ka nokerî û xiyanet xeteriyeke çiqas mezin e. Em nikarin wisa ji rêzê nêzîkê vê rewşê bibin. Nexwe me di nava têkoşîna li dijî nokerî û xiyanetê de şehîdên mezin dane.







Baş binêrin di her meha gulanê de têkoşîna me hemleyên nû kirine û nirxên nû derxistine holê. Bi xwe re şehadetên nû anîne, li ser zincîra şehîdan xeleqên nû zêde kirine, ji ber vê yekê meşa azadiyê ya partiya me bihêztir kiriye. Ev meş bi gerîla re hertim mezin bûye.

Meşa şehîdên meha gulanê piştî komploya navnetewî jî berdewam kir. Têkoşîna ku em 26 sal in li dijî komploya navnetewî dimeşînin di bin pêşengtî û fermandartiya şehîdan de pêşket. Bi vî awayî xeta şehadetê şênbertir bû. Rihê fedaîtiya mezin derkete holê. Di têkoşîna me ya li dijî komploya navnetewî de jî meha gulanê ciheke girîng girtiye. Di vê têkoşînê de jî hema bêje me her roj di meha gulanê de şehîdan dane.

Rêheval Uta û Amara 2005'an de dema me hewil dida paradîgmaya netewa demokratîk fêm bikin bi qezayê şehît bûn. Bi rastî jî ev herdu heval di asta pêşengtiyê de bi coş û maneviyateke pir bilind tevlî pêvajoya înşayê û xeta azadiya jin dibûn. Hevalek ji Elmanyayê, ya din jî ji Tirkiyeyê hatibû. Ji bo bikarin Têkoşîna Azadiya Kurdistanê ku xwe li ser bingehê paradîgmaya konfederalîzma demokratîk jinûve ava kiribû li dijî komployê biparêzin, belavê dinyayê bikin, beriya herkesê têkoşîna Rêber Apo dîtin, xwedî lê derketin, pê re bûn yek. Jixwe herî dawî di nava têkoşîneke wiha de şehît bûn.

Dîsa piştî têkoşîna li dijî komploya navnetewî jî heman bîryardarî berdewam kir, seknên fedaî yên Apoyî derketin holê. Li ser vê bingehê divê em fedaiyên li vir ên gulanê jî bi bîr bînin. Hê di Gulana 2007'an de rêheval Erdal wekî bersiv li dijî jehrî kirina Rêber Apo li Enqerê, Meydana Ulusê bi çalakiyeke fedaî Serfermandariya Tirk kire hedef. Heval Erdal, nefereke bijarte ya vê tevgera Fedaî bû. 25'ê Gulana 2012'an de rêheval Erdal û Andok li ser heman xetê Li Qeyseriyê derbên giran li dijmin dan û gihiştin şehadetê. Bêguman di nava berxwedana li dijî komployê de her roj şehît tên dayîn. Di nava berxwedaneke wiha de 27'ê Gulana 2020'an de endamê Komîteya Navendî ya Partiya me rêheval Qasim Engîn li Qadên Parastina Medya şehît bû.

Bêguman me hertim di têkoşîna xwe ya beramberê komploya navnetewî û êrîşkariya faşîst-mêtînger-qirker de şehîdan neda. Di vê pêvajoyê de têkoşîna me, ji Bakur heya Başûr, ji Rojava heya Rojhilat li her çar parçeyên Kurdistanê li dijî êrîşa konsepta nû ya komploya navnetewî li ser xeta berxwedanê bi bîryardariyeke mezin berdewam kir. Qasî êrîşan berxwedan jî belavê hemû parçeyên Kurdistanê bû. Me beramberê komployê çiqas xebatên fikrî, xebatên rêxistinbûnê pêşxistibe, van hêzan jî çi wextî firsend dîtin bi êrîşan ewqas bersiva me dan. Baş binêrin qaşo Dewleta Îranê dibêje li Rojhilata Navîn herî zêde ez li dijî bandora DYA têkoşîn dikim, lê heman Îran Milîtanên Azadiya Kurd darve kirin. 9'ê Gulana 2010'an de di dîroka têkoşîna me de cara ewil Şirîn Elemhulî û hevalên wê hatin darvekirin. Van hevalan li dijî paşverûtiyê, li dijî dijmin bi sekna xwe ya egîdane, bi dayîna xwîn ji bo Têkoşîna Azadiya Rojhilat xetê diyarkirin, wê ev xet çawa bê pêşxistin zelal kirin. Dîsa em dizanin ku Berxwedana Azadiya Rojava di meha gulanê de bi sedan, heya bi hezaran şehît daye. Ji ber ku di têkoşîna lehengane ya li dijî dagirkeriya DAIŞ û TC'yê pêşxist de zêdetirî deh hezar şehît da. Bêguman em nikarin van hemû şehîdan li vir bînin ziman. Lê wekî mînak dikarin yek-du navan bidin; qehremanê mezin Ebu Leyla ku berxwedana Mimbiçê li ser navê wî hate meşandin şehîdeke gulanê ye. Dîsa di nava şehîdên Berxwedana Mezin a Reqayê de ewladê qehreman ê gelê Tirkiyê, dostê me yê Tevgera Şoreşgerên Yekbûyî ya Gelan(HBDH) Ulaş Bayraktaroglu roja 9'ê Gulanê şehît ketiye. Ev hemû nîşan didin ku di berxwedana Rojava de jî hejmara şehîdên gulanê pir zêde ne.

Ji aliyê din vê tê zanîn ku sembola berxwedana Başûrê Kurdistanê, jina şerker Leyla Qasim 13'ê Gulana 1974'an de ji hêla rejîma BAAS ve hatiye darvekirin. Dîsa em dizanin ku bîryara qirkirina Dêrsîmê jî di 4'ê Gulanê de hatiye girtin. Dewleta qirker-TC ji bo qirkirina Dêrsîmê têxe pratîkê cara ewil 4'ê Gulanê qanûn derxistiye. Ji ber vê yekê 4'ê Gulanê ji hêla gelê Dêrsîmê ve wekî destpêka roja qirkirinê tê bîranîn. Bêguman hemû kesên di vê êrîşa qirker de şehît ketine, şehîdên Gulanê ne. Me bi vî awayî li vir behsa hin navên sembol kirin. Lê em dizanin ku di her roja meha gulanê de bi dehan şehîdên me hene. Wekî Tevgera Azadiya Kurdistanê me di meha gulanê de bi hezaran şehît dane. Ji ber van şehîdan meha gulanê bûye meha şehîdan.

Helbet şehît tenê di meha gulanê de nîn in. Tenê di meha Gulanê de, di meşa azadiyê ya Hakî Karer vekiriye de berxwedanî pêşneketiye, şer nehatiye kirin. Me tenê di meha gulanê de berdêl nedaye, şehît nedane. Me di hemû mehan de şehît dane. Di hemû rojan de şehîdên me hene. Îro, di bin pêşengtiya PKK'ê de li çar parçeyên Kurdistanê hejmara artêşa şehîdan gihiştiye 50 hezarî.

Baş binêrin yê civakê hişyar dike, rêxistin dike, di vê astê de dikêşe çalakiyê, bi îdîa û îrade dike, têkoşîna me ya azadiyê ser piyan digire, hertim bi serkeftinê tacîdar dike, rastiya Rêbertî aniye vê astê, cîhanî kiriye ev rastî ye, rastiya şehîdan e. Artêşa şehîdane ku hejmara wan gihiştiye 50 hezarî. Wekî tevger me hebûna xwe bi van şehîdan parast, li ser piyan man. Di sala 1986'an de Rêber Apo di Kongreya 3'yemîn de got "Yên şehît PKK'yî ne." Wê demê PKK bi rastiya şehîdan tê pênasekirin ku hejmara wê gihiştiye 50 hezarî.

Ji ber vê çavkaniya me ya herî bingehîn a perwerde û rêxistinbûnê ev rastî ye, rastiya şehîdan e. Rastiya Rêbertî, di meşekê wiha ya şehadetê de bi awayekî vekirî rastiya xwe û hêza xwe ya zaferê daniye holê, dost-dijmin nîşanî herkesî daye. Divê em vê rastiyê baş fêm bikin. Ev hema wisa ji ber xwe ve çênebû. Bi feraset û hewildaneke rast çêbû. Bi fedekarî û wêrekiyeke mezin çêbû. Bi fedaîbûnê çêbû. Wê demê divê em ji her demê bêhtir ji xeta şehîdan, ji rihê wê yê fedaîbûnê, ji bîr û baweriya wê fêm bikin, derxînin zanebûnê û temsîl bikin.

Hê destpêkê dema tevgera me derkete holê vê rastiyê diyar kir. Rêber Apo, dema pênaseya teoriya şoreşgerî kir, wê derbasê rêxistin û çalakiyê kir, rastiya şehadetê pênase kir, li ser girîngiya wê sekinî. Diyar kir ku em ancax bi têkoşîna li ser xeta şehîdan dikarin Li Kurdistanê xwe bigihînin zaferê. Em ancax di bin pêşengtiya şehîdan de dikarin civakê perwerde û rêxistin bikin, bikêşin têkoşînê. Dîsa diyar kir ku em ancax bi têkoşîna li ser xeta şehîdan dikarin êrîşên pergala modernîteya kapîtalîst a kûrevî, hişmendiya faşîst-mêtînger-qirker bişkînin, em ancax bi têkoşîna li ser xeta şehadetê dikarin ji hêla ruhî, hestî, fikrî ve xwe azad bikin, xwe nû bikin, jinûve ava bikin, xwe bigihînin şoreşa kesayetî. Jixwe ev jî niha ketiye pratîkê. Bûye rastiya herî

bingehîn. Bûye heqîqeta hebûn û azadiya Kurdistanê. Îro du çavkaniyên me yên bingehîn hene ku gel perwerde dike, dikêşe têkoşînê, dike yek, ruh dide, vîn dide, bîr û baweriya azadiyê dide, wêrekî û fedekarî dide qezenckirin; yek ji van Rastiya Rêbertî, ya din jî rastiya Şehîdan e. Baş binêrin wateya Tevgera Rêbertî û Şehîdan di pratîkê de bi vî awayî şênber dibe.

Niha di ketina 48'emîn sala şehîdan de divê em wekî gel û tevger ji her demê bêhtir vê rastiyê fêm bikin û derxînin zanebûnê. Bêguman Rastiya Rêbertî û Şehîdan nasname daye me, me aniye van rojan, me perwerde û rêxistin kiriye, kiriye yek, ruh, bîr û bawerî daye, îrade û hêz daye. Wê demê divê em li ser bingehê Xeta Rêbertî di sala 48'emîn de Rastiya Şehîdan ji her demê bêhtir fêm bikin. Divê li ser vê xetê bihêztir bimeşin, wekî pêkanînerên serkeftî, bibîryar ên xeta şehîdan, wekî hemû rêhevalan divê em vê rastiyê bizanin û teqez pêk bînin.

Bêguman di pêvajoyeke wiha de ji her demê bêhtir pêwîstiya me bi vê heye. Çavkaniya hêza me ya herî bingehîn jî rastiya şehîdan e. Mînak dema qala hêza dijmin tê kirin, em qala asta êrîşên wê dikin, hêza wê bi van êrîşan pênase dikin. Lê çavkaniya hêza me jî Rastiya Rêbertî û Şehîdan e. Divê vê rastiyê pir baş bizanin.

Baş binêrin çavkaniya vê hêzê wisa lawaz nîn e. Ger rast bê fêmkirin, rast bê nirxandin, xwedî derketineke baş çêbe, ji çavkaniya hêza Rêbertî û Şehîdan mezintir hêz nîn e. Rexmê hemû êrîşên paşverû jî ev hêz 50 sal in li ser piyane û hertim pêşketiye. Nekeftina xwe îspat kiriye. Wekî taybetmendî dikare xwe bigihîne zaferê û vê jî nîşanî herkesî daye.

Wê demê divê em di 48'emîn sala şehîdan de vê rastiyê baştir fêm bikin, vê hêzê baştir bikar bînin, derxînin zanebûnê, têxin pratîkê. Ger bikarin vê pêkbînin wê ji her demê bêhtir sala 48'emîn a şehîdan bibe sala têkoşîn û zaferê. Wê demê ti car êrîşên dijmin nikarin me bide sekinandin, lawaz bixe, bişkîne. Divê em heya dawiyê ji vê bawer bikin. Bi vê baweriyê divê em di 48'emîn sala şehîdan de Xeta Rêbertî û Şehîdan baştir fêm bikin, li ser vê xetê zêdetir lêhûrbûn bikin, rastir nêzîk bibin û baştir pêk bînin. Em bawer dikin ku wê hemû heval wiha nêzîk bibin, ji ber meha gulanê wê zêdetir li ser rastiya şehîdan bisekinin, li ser xeta Rêbertî û Şehîdan xwe nû bikin, bibin milîtanên serkeftî û şerkerên bihêztir.

**Rêhevalên Hêja**!

Em dizanin, hûn dixwazin girêdayê rewşa Rêber Apo agahiyên nû, baş bigirin. Ev di astek jor de li gel hemû hevalan, gel û dostên me heye. Em di ferqa vê de ne, rewşa me ji hev cuda nîn e. Lê mixabin agahiyeke wisa nîn e ku bi we re parve bikin. Rewşa heyî di sala çaran de didome.

Divê em vê wekî tecrît negirin dest. Jixwe 26 sal in li Îmraliyê tecrît her heye. Ji roja destpêkê heya îro pergala Îmraliyê, pergala tecrît, îşkence û qirkirinê ye. Tê zanîn li dijî gelê Kurd sed sal in qetlîam-qirkirin heye û ev nîjadkujî 25 sal in jî li Îmraliyê tê meşandin. Ji ber vê, niha navenda qirkirina gelê Kurd Îmralî ye, ev qirkirin li Îmrlayiê tê rêvebirin. 25 sal in Kurd li ser bingehê pergala Îmraliyê têne qirkirin. Li ser bingehê pergala Îmraliyê nîjadkûjiya Kurd tê meşandin û rêvebirin. Ev polîtîka li ser Rêber Apo wekî êrîş, zext xwe dide der û belavê hemû civakê, civaka Kurd, Kurdistanê dibe. Bêguman tenê bi Kurdistanê re sînordar namîne. Belavê Tirkiye û çar aliyên cihanê jî dibe. Lewra herkes fêm kir ku tecrît wan jî bandor dike. Jixwe vê jî bi eşkere tînin ziman.

Niha ev tecrît di sala xwe ya çaran de bi awayekî girankirî didome. Dîktatoriya faşîst a AKP-MHP êdî vê ji xwe re kiriye siyasetek. Naxwaze gotineke Rêber Apo jî derkeve derve, bigihije gelê me, partiya me, mirovahiyê. Ji vê ditirse. Bi eşkere diyare ku çiqas ji fikrên Rêbertî, ji gotinên Rêber Apo ditirse.

Gelo, niha tenê dîktatoriya AKP-MHP û Dewleta TC ditirse? Na. Giştî pergala kapîtalîst a kûrevî wiha ye. Ji ber ku komploya navnetewî pergala Îmraliyê derxistiye holê. Komploya navnetewî jî êrîşeke faşîst-mêtînger-qirker e ku li ser bingehê pirsgrêka Kurd hatiye afirandin. Ji ber vê yekê ev hemû girêdayê pirsgrêka Kurd in, girêdayê hişmendî û siyaseta qirker e ku sed sal in li ser gelê Kurd tê meşandin.

Esas ev ne pirsgrêka Kurdan e. Pirsgrêka pergala dewlet û desthilata cîhanê ye, pirsgrêka modernîteya kapîtalîst a kûrevî ye. Yên dibin pirsgrêk ew in. Li ser Kurdan nîjadkujiyê ferz dikin. Xwediyê siyaset û hişmediya qirker in. Yên bi pirsgrêk ew in. Pirsgrêk, ev hişmendî û siyaset e. Ji ber vê yekê êrîşa li ser Rêber Apo êrîşa van hêzan hemû ye. Yên çar sal in Îmraliyê bi temamî ji derve re girtine ev hêz in. Jixwe di dawiyê de ev bi awayekî vekirî derkete holê jî.

Saziya CPT rapora xwe ya sala 2023'yan eşkere kir. Di civîna çapemeniyê de bersiva pirsan da. Li vir her tişt eşkere derkete holê. Hat dîtin ku pêkanînên li Îmraliyê tenê xwestek û daxwaza dîktatoriya faşîst a AKP-MHP nîn e. Ji CPT bigire heya Konseya Ewropa, ji Yekitiya Ewropa bigire heya saziya NY hemû saziyên pergala modernîteya kapîtalîst a kûrevî di navê de ne, vê pergalê bi hevbeşî didin meşandin. Gotinên CPT pir vekirî û eşkere bûn. Navê vê "saziya pêşî lêgirtina îşkenceyê ye lê beramberê îşkenceyê tişteke nabêje. Dibêjin me rapor nivîsandî ye lê nikare rapora xwe eşkere bike. Dibêje ancax Dewleta Tirk dikare raporê eşkere bike. Wê demê rapor nabe rapora CPT. Kî bikare eşkere bike dibe rapora wê.

Ji aliyê din ve diyar dibe ku CPT ne saziyeke kontrol û venerînê ye, ji bo pêşî lêgirtina îşkenceyê nehatiye avakirin, tenê wekî saziyeke rapor dide rêveberiyê. Ji ber vê rapor dide Dewleta TC. Rapor dide dewletên di Konseya Ewropayê de cih digirin. Wekî sazî û karmendê wan dewletan e. Jixwe ev dewlet îşkence, zext û zilmê dikin. Wê demê saziya CPT nabe saziya pêşî lêgirtina îşkenceyê. Esas dibe saziya pêkanînerê îşkenceyê. Dibe saziya rewakirina îşkenceyê. Yanî saziyeke demokratîk nîn e. Dibe saziya rêveberina pratîkên faşîst-mêtînger, dibe saziya rêvebirina pratîkên îşkence û zextê. Lê naveke cuda li xwe daniye, fonksiyoneke cuda hilgirtiye û li ser vê bingehê mirovan, gelan, civakan dixapîne. Saziyeke xapandinê ye. Herî kêm ji tiştên hatine gotin me vana fêm kir. Lê parêzer tiştên cuda dibêjin. Esas CPT, dema mijar dibe Kurd, dibe Rêbertî wiha nêzîk dibe. Li cihên din wiha nêzîk nabe. Yanî, roleke wî yê têkoşînê heye. Lê vê nake.

Di encama vê de ev derkete holê: Di sala 25'an de wê rewşa Rêber Apo jinûve hatiba destgirtin. Wê ji hêla hiquqî ve jinûve darizandin hatiba rojevê. Heya dibe ku tehliyeya Rêbertî hatiba rojevê, ji zindanê derketiba. Lê van saziyan bi hev re pêşiya vê girtin. Di salên derbasbûyî de li Îmraliyê ji bo vê asteng bikin cezayên dîsîplînê dihatin dayîn. Bi van cezayên derewîn qilifeke hiquqî çêkirin û ne tenê faşîzma AKP-MHP, hemû saziyên Ewropa, saziyên pergalê di vê plansaziyê de bûne yek. Wekî planeke hevpar pêşxistine. Ji ber vê cezayên derewîn afirandin. Halbûkî sedemeke ceza dayînê nîn e. Ji ber ku em Rêbertiya xwe nas dikin. Ev hemû ji bo nirxandina sala 25'emîn asteng bikin wekî qilifekê hiquqî hatine pêşxistin. Ji ber vê CPT qet qala raporê nekir, ji pirsên çapemeniyê re got tişteke ku em bikarin bikin nîn e. Yanî dixwazin bêjin ku "tişta pêwîst me kir, ma hûn fêm nakin!" Rastî ev e. Divê em vê rast fêm bikin, di vê mijarê de lazim e rewşa xwe baş binirxînin. Diviyabû me têkoşîna hiquqî û siyasî bibandortir bidaya meşandin. Diviyabû me ji bo vala derxistina lêyîskên wiha hiquqê bihêztir xistiba dewrê.

Dîsa diviyabû me bikariya bi çalakbûna xwe li ser mekanîzmayên hiquqî zext çêkiriba, pêşiya lêyîskên wiha girtiba. Divê em rexnedayîna xwe bidin. Rast e, di vê 26 salê de em di nava çalakbûneke mezin de bûn. Beriya herkesî Rêber Apo berxweda. Îmraliyê kire qada herî mezin a şoreşa zîhnî, şoreşa ronakbîriyê. Guhertina paradîgma pêkanî û xwe kire Rêbereke kûrevî, kire rêberê hemû bindestan. Ji bo çareseriya pirsgrêkên pergala dewlet û desthilata pênc hezar salî fikrên nû pêşxistin, projeyên çareseriyê derxistin holê. Xwe kire rêberê hemû karker-kedkaran, hemû gelên bindest, jin û ciwanan.

Halbûkî armanca pergala Îmraliyê çi bû? Dixwest Rêber Apo bê fikir bihêle, nekare bifikire, nekare tiştek pêş bixe. Yên pergala Îmraliyê avakiribûn wiha digotin, îdaya wan ev bû. Digotin "mirov li Îmraliyê rojê deh caran dimire." Ji ber vê daxuyaniyan didan, digotin "êdî me Apo hel kir." Bi vî awayî xwestin civaka Tirkiyeyê bixapînin. Em van hemûyan dizanin. Lê Rêber Apo karî ciheke wisa bike dibistan. Di van şert û mercan de jî karî berxwedan û têkoşîna herî mezin pêş bixe. Pêşketina herî mezin a şoreşgerî derxîne holê, bi guhertina paradîgmayê re şoreşa fikrî pêk bîne. Van hemûyan di nava têkoşîna Îmraliyê de pêşxist. Niha beriya her tiştî divê em vê rastiyê jî pir baş fêm bikin.

Baş e, têkoşîna me gihiştiye asta têkoşîna Rêbertî? Me berxwedana Rêbertî ku 26 sal in li Îmraliyê dide meşandin rast fêmkiriye, kariye veguherînin rêxistin û çalakiyê? Niha pirsên lazim e ji xwe bipirsin ev in. Binêrin dek û dolabên hiquqî kirin û hê jî dikin. Me nekarî vê vala derxînin. Hiquqê nadin meşandin. Lê ji bo bidin meşandin me nekariye zext bikin. Divê destpêkê em ji li vir vê encamê derxînin; em kêm mane. Divê rexnedayîna vê bidin. Jixwe me di civîn û nîqaşên vê zivistanê de van nirxand û rexnedayîna vê nêzîkatiyê hate dayîn. Niha girêdayê bûyerên derketine holê ev rastî baştir zelal bû.

Ya duyemîn divê em têkoşîna hiquqî û siyasî pêşdetir bibin. Yanî di vê pêvajoyê de kêmasiyên ku me rexnedayîna wê dane pêwîst e derbas bikin. Ev kar bi gotina "Em rexnedayîn didin" nabe. Ger şaşitiyê sererast bikin, kêmasiyê derbas bikin wê rexnedayîna wê bê dayîn. Ji ber wê jî divê berxwedana Îmraliyê rast fêm bikin û pêwîstiyên wê di pratîkê de rast û serkeftî pêk bînin. Niha tişta lazim e em bikin ev e. Van dek û dolaban ancax dikarin bi têkoşîneke wiha bişkînin.

Em 26 sal in têkoşîn dikin. Me bi hezaran şehît dan. Bi dehan komployên navnetewî vala derxistin. Baş binêrin, komploya navnetewî dixwest di yek rojê de encam bigire, lê 26 sal in di êrîşên xwe de serkeftî nebûye, bê encam hatiye hiştin.

Ev pêşketinên girîng bûn. Ev encama berxwedana tevgera me, gel û dostên me bû. Lê me sala derbasbû nebesiya vê astê jî ferq kir û ji bo wê derbas bikin me di asta kûrevî de pêngaveke azadiyê da destpêkirin. Bi vî pêngavê me xwest xwe bigihînin azadiya fîzîkî ya Rêber Apo û çareseriya pirsgrêka Kurd. Pêngaveke wiha ji bo me pir girîng û watedar bû.

Esas ji bo bikarin kêmasi, nebesiyên xwe bibînin û wan derbas bikin pêngaveke wiha hate destpêkirin. Ji ber vê yekê divê paşerojê li ser vê bingehê bigirin dest. Em li ku derê kêm man, me kîjan kêmasiyan nîşanda, em vana çawa dikarin derbas bikin, bi hêz û têkoşîneke çawa dikarin êrîşên faşîst-qirker-mêtînger bişkînin, dawî li pergala tecrît û îşkenceya Îmraliyê bînin, dek û dolabên hiquqî ji holê rakin? Em çawa dikarin li ser siyaset û hişmendiya mêtînger-qirker zextê bikin, wê têk bibin? Niha pirsên divê bipirsin ev in. Li ser vê bingehê divê xwe jî ji lêpirsînê derbas bikin, xwe nû bikin û pêngava xwe ya azadiya kûrevî pêşdetir bibin. Ji 10'ê Cotmehê heya 15'ê Sibatê pêvajoyek hate jiyîn. Têkoşîna me belavê çar aliyê cîhanê bû. Gihişt karker û kedkaran, jin û ciwanan, gelên bindest. Mirov li çar aliyên cîhanê ji bo azadiya Rêber Apo ketin nava têkoşînê. Rastiya Rêbertî, têkoşîna azadiya Kurdistanê naskirin. Xwe, bi xeta Rêbertî dane nasîn, perwerde kirin. Bûn şervanên azadiyê. Tevgereke kûrevî ya demokrasî û azadiyê pêşket. Bêguman ev gavên girîng bûn, destpêk û vebûnên nû bûn. Lê divê bihêz bikin. Yê heyî bes nebînin. Di pêngavê de wekî qonaxa duyemîn, roja 8'ê Adarê têkoşîna azadiya jin li ser bingehê azadiya fîzîkî ya Rêber Apo xwe gihand asteke pêşdetir. Helwesta jinê nîşanî herkesî da. Gelê Kurd careke din di Newrozê de nîşanî herkesî daku çiqas girêdayê Rêbertî û azadiya xwe ye. Di asta platform de, di asta kongreyeke vekirî de vê rastiyê bi çalakiyan anî ziman; Dema deh milyonan mirov ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo li qadên Newrozê kom bûn vê kirin. Encama van, 31'ê Adarê di hilbijartinên xwecihî de derkete holê. Dîsa bandora wê li ser çalakiyên 4'ê Nîsanê diyar bû. Niha 1'ê Gulanê dibe lûtkeyeke nû. Divê vê astê pêşdetir bibin. Ji aliyê din ve pêwîst e çalakiyên me domdar bin, qut qutî nebin. Divê xeteke çalakiyê derxînin holê ku hev temam bikin, daîmî bin, her biçin mezintir bibin û bi xwe re encamê bînin.

Bi kurtî divê meha şehîdan bi Pêngava Azadiya Kurevî re bikin yek ku bi armanca azadiya fîzîkî ya Rêber Apo radibe. Ji bo pêşxistina Pêngava azadiyê divê berê xwe bidin çalakiyê. Divê em vê li çar parçeyên Kurdistanê û li çar aliyên cîhanê bikin. Li ku derê Kurd û dostên Kurdan hebin, divê li wê derê çalakî zêdetir pêş bikevin. Divê afrînertir bin. Çalakiyên xwe bînin wê astê ku bikarin bi berxwedana xwe ya gerîla, bi têkoşîna xwe ya bîrdozî, bi propaganda û ajîtasyona xwe, bi huner û wêjeya xwe, bi çalakiyên xwe yên jin û ciwanan, bi çalakiyên xwe yên girseyî leyîskên dijmin vala derxînin, hemû êrîşên pergala tecrît û nîjadkujiya Îmraliyê bişkînin. Ji ber vê jî divê asta heyî derbas bikin. Wê demê divê heval li ser vê rastiyê zêdetir bisekinin. Rewş cidî ye. Dema Rêber Apo 25'ê Gulana 2021'an de li ser telefonê bi hêrs ji birayê xwe re got "Hûn sûç dikin" van rastiyan anî ziman. Leyîsk û fêl hebû. Xwest bêje bila parêzer bên, ez ê têkoşîn bikim, sedema nehatina parêzeran pirsî. Bi qedexekirina çûyîna parêzeran têkoşîna Rêber Apo asteng kirin. Me nekarî vê bişkînin û têkoşîna hiquqî ji derve de bidin meşandin. Hêrsa Rêber Apo, tişta ku digot "sûç" ev bû, lê me nekarî vê derbas bikin. Jixwe wê demê me vê rewşê jî wisa baş fêm nekiribû. Rastî niha baştir derketine holê, şênber bûne. Em hemû, wekî kadro û gelê welatparêz niha vê dibînin. Wê demê divê em ji vê rewşê ders derxînin. Rewşa heyî derbas bikin.

Heya em bi çalakbûneke mezin vê rewşê ji holê ranekin, nikarin xwe ji rewşa bi sûç derxin. Ji bo em bikarin xwe ji vê rewşê derxînin divê li her qadê û ji her hêlê ve têkoşîn bikin ku bikarin pergala îşkence, tecrît û nîjadkujiya Îmraliyê parçe bikin, van fêl û lêyîskan vala derxînin. Divê em vê rastiyê wiha bibînin. Rewşa heyî ancax wiha dikare bê şikandin. Ancax bi vî awayî Rêber Apo dikare têkoşîn bike, fikrên xwe bigihîne derve, siyaset bike. Erkê me jî pêkanîna vê ye.

Wê demê divê hemû heval bi vê zanebûnê tevbigerin û bêjin "êdî bese." Bi vî awayî xwe ji rewşa kevin derxînin, 24 saet, hertim, xwe û gel di pozîsyona çalakî de bigirin. Ev, car caran bi pêşxistina çalakiyan nabe. Wê ev pêngav teqez encam bigire. Wê pêngava me ya azadiyê mezintir bibe, pêşbikeve û zaferê ferz bike. Ji ber ku ev pêngava zaferê ye. Derveyê vî tiştеke din nayê pêjirandin. Di vê mijarê de pêwîst e astekî me yê çalakiyê hebe, ji zindanan heya çiyayên Kurdistanê, li çar parçeyên Kurdistanê heya derveyî welat divê em dubare dubare li ser têkoşîna ku em dimeşînin bisekinin, binirxînin, kêmasî, nebesiyên wê bibînin û vana derbas bikin. Li ser vê esasê divê pergala îşkence, tecrît û nîjadkûjiya Îmraliyê bişkînin, xwe bigihînin azadiya fîzîkî ya Rêber Apo. Divê em vê erkê kêlî bi kêlî pêkbînin, êdî nabe ev erk bê taloqkirin. Em bawer dikin ku wê hemû heval wiha nêzîkê vê rewşê bibin, sekna xwe binirxînin, şert û mercên heyî li ser bingehê derfet û firsendan rast bikar bînin, ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo vê veguherînin çalakbûna ku zaferê qezenc dike.

**Rêhevalên Hêja!**

Li vir wisa ne lazim e li ser rewşa siyasî û leşkerî pir tişt bêjin. Lewre em hemû di navê de ne, dijîn û di zanebûna vê de ne. Yanî di esas de em rewşa siyasî û leşkerî dizanin, rewşa heyî fêm dikin. Ji ber vê wisa pêwîst nîn e li ser bûyerên biçûk dirêj dirêj biaxifin. Ji bo me rewşa esas girîng e. Divê vê rewşa bingehîn bizanîn û di vê çarçoveyê de xwedî li erk û berpirsyartiyên xwe derkevin û pêwîstiyên wê pêk bînin.

Dema em di vê çarçoveyê de rewşê dinêrin, dibînin ku pêvajoya heyî ne tenê awarte ye, ji wê jî wêdetir e. Jixwe em wisa di nava têkoşîneke ji rêzê, asayî de nîn in. Lê ji rewşa heyî re jî nikarin bêjin awarte ye. Rewş, ji vê jî wêdetir e. Çima rewşa heyî, ji rewşa awarte jî wêdetir e? Ya yekemîn herkes di nava vê têkoşînê de ye. Ya duyemîn hezar û yek fêl, lêyîsk, êrîş hene. Ya sêyemîn jî hema bêje faşîzma AKP-MHP, heya Dewleta TC hebûna xwe bi vê têkoşînê ve girêdane. Jixwe ew bixwe ji vê re dibêjin "Têkoşîna man û nemanê." Yanî îdîa dikin ku ger nekarin Kurdan qir bikin wê Tirkbûn ji holê rabe. Bêguman dema rastiya heyî wiha be, mirov nikare vê pêvajoyê bi gotina awarte jî îzah bike. Rewş ji vê wêdetir e, divê em rewşa heyî wekî têkoşîna man û nemanê bigirin dest. Ev demeke rewşa heyî wiha ye. Esas ev neh-deh sal in rewş wiha ye. Berxwedana me ya topyekûn a demokrasî û azadiyê ku em li ser bingehê şerê gel ê şoreşgerî beramberê êrîşên faşîst-qirker ên plana çokdanînê dimeşînin tê vê wateyê. Di asta giştî de pêvajo wiha ye. Lê ev du-sê salên dawî, vê rewşê jî derbas kiriye.

Ji ber wê jî em di nava têkoşîneke pir dijwar û mezin de ne. Ev rastî tê zanîn. Niha em wisa pir zêde qala vê rewşê bikin lê zêde tiştêk jê fêm nekin nabe. Divê tiştên ku em dizanin baştir fêm bikin û li ser vê esasê derbasê pratîkê bikin. Em jî dixwazin wiha bikin. Di van demên dawî de ji bo bikarin ji pêvajoya derbas bû dersên rast derxînin, di nava têkoşîneke wiha de xwe bigihînin zaferê, ji her hêlê ve di nava hewildanê de ne. Jixwe heval ji van mijaran jî agahdar in. Bo nimûne me di vê çarçoveyê de zivistana derbasbû wekî pêvajoya pêngaveke mezin bikaranî. Me Pêngava xwe ya Azadiya Kûrevî ku 10'ê Cotmeha 2023'yan de destpêkiribû, di pêvajoya zivistanê de awayekî bibandor li hemû eniyan da meşandin. Di serî de hêzên gerîla yên qehreman, zivistana çûyî veguherand pêvajoya pêngava herî mezin.

Gerîlayê Zapê bi operasyonên xwe yên şoreşgerî derbên herî giran li dîktatoriya faşîst a AKP-MHP'ê da. Ev pêvajoya ku 1'ê Cotmeha 2023'yan li Enqerê bi çalakiya heval Rojhat û Erdal dest pê kir, heya roja me ya îro her pêşket, her çû bihêztir bû. Di encamê de derbên mirinê li dijminê faşîst-qirker hatin xistin. Bi rastî jî pêvajoyeke watedar, serkeftî bû. Me hertim xwest bikarbînin. Me hertim hêzên gerîlayên qehreman ji ber serkeftinên wan pîroz kirin. Behsa vê performansa baş kir. Niha jî ev pozîsyon berdewam e. Vê pêşketinê mohra xwe li her tiştî xist. Encama vê di tevgera girseyî de hate dîtin. Bo nimûne çalakiyên protestokirina komploya 15'ê Sibatê bi hêz derbas bûn. Çalakiyên 8'ê Adar û Newrozê asta Pêngava me ya Azadiya Kûrevî pir bilind kir. Dîsa encama van hemûyan xwe di hilbijartinên xwecihî yên 31'ê Adarê de nîşan da. Pêwîst nake em qala wurdekariyên encamên hilbijartinê bikin. Lê em dikarin vê bêjin ku AKP hilbijartinê winda kir û êdî ne partiya yekemîn e, bû partiya duyemîn.

Esas berî jî, 7'ê Hezîrana 2015'an de jî binketibû, hilbijartinê windakiribû lê fêl kir, bi hilbijartineke nû rewşê guhert. Niha nikare wê jî bike. Êdî rêveberiya Tayîp Erdogan rewatiya xwe ji sindoqên hilbijartinê nagire. Ji ber vê yekê ev hem li Tirkiye hem jî derveyî Tirkiye bandor dike.

Ji aliyên din ve gelê me rexmê hemû zext, zilm, dek û dolaban careke din rê neda faşîzmê. Qeyuman girt û avêt. Careke din israr û xwesteka xwe ya xwe birêve birinê, rêvebirina bajarê xwe danî holê. Îrade, îdîa û israra xwe ya jiyana azad nîşanî herkesî da. Careke din israr û bîryara xwe ya demokratîkirina Tirkiyeyê nîşanî herkesî kir. Li ser van bingehan di siyaseta Tirkiyeyê de guhertin tê jiyîn.

Wek Kiliçdaroglu, IYI Partî û hwd. yên hilbijartinên Gulana 2023'yan windakirin ji guhertin û veguhertineke derbas dibin. Niha nava AKP'ê dikele. Êdî wekî berê kesayeta Tayîp Erdogan hakimê her tiştî nîn e. Vê hêza xwe winda kir. Dubare dixwaze xwe hakim bike lê ev rê girtiye. Êdî nikare wekî 2015'an bike. Ji ber vê yekê wê guhertin çêbe. Me got guhertina Kemal Kiliçdaroglu wê bibe guhertina Tayyîp Erdogan. Bi rastî jî niha ew rewş tê jiyîn. Siyaseta Tirkiyeyê mecbûrê guhertinê ye. Bi awayekî din nikare xwe li ser piyan bigire. Ji ber ku em demokrasî û azadiya Kurd li ser ferz dikin, nikare xwe biguhere jî. Ji ber vê yekê bi temamî xitimiye, bê çare ye û dirize. Niha rewşa rêveberî û dewleta mêtînger-qirker wiha ye. Ev jî girêdayê encama têkoşîna me ye. Me di pêvajoya zivistanê de ji milêkî ve têkoşîneke

hemleyî meşand, ji milêkî ve jî amadekariyên girîng kirin. Me analîza paşerojê kir û li ser vê esasê mekanîzmayên rexne-rexnedayînê pêşxist. Dîsa li ser bingehê pratîka berê dersan derxist, xwe ji pêvajoya nû re amade kir, têkoşîna salê plan kir, ji her hêlê ve bi amadekariyeke mezin ketin pêvajoya nû. Ev jî ji hêla têkoşîna salê ve rewşeke pir girîng bû.

Niha pêwîst e em encamên vê pêngavê rast binirxînin, van amadekariyan rast bigirin dest û têxin pratîkê. Êdî nîqaş hatine kirin, bîryar hatine standin. Ji bo me pêvajo, pêvajoya pratîkê ye, hem jî di asta hemle de pêvajoya pratîkê li pêşiya me ye. Niha pêngava me ya azadiya Kurevî li ser riya zaferê pêşdikeve. Divê her kêlî, her roj, hertim em hemû xwediyê sekneke wiha bin. Ger wiha bin, daneheva pêngavê bi amadekariyên xwe yên rêxistinî re bigirin dest, binirxînin, dikarin pergala îşkence, tecrît û nîjadkujiya Îmraliyê parçe parçe bikin. Dikarin têkoşîneke pêş bixin ku pêşiya azadiya fîzîkî ya Rêber Apo veke. Divê em hemû ji vê bawer bikin, di vê mijarê de pêşbîn bin, plana vê bikin, bi bîryar û baweriyeke mezin, bi şêwazeke afrîner û uslûbeke qezencker vê têxin pratîkê.

Ji aliyê din ve em hemû hewildanên dijmin ji nêz ve dişopînin. Seranserê zivistanê gerîla û gelê me di çarçoveya pêngavê de çalakiyên mezin pêşxistin. Diktatoriya faşîst a AKP-MHP ji milêkî ve beramberê van çalakiyan hejiya, ji milêkî din ve jî ji bo êrîş û dagirkeriyên nû 24 saet dîplomasî meşand. Li ser vê esasê xwest ji cihên cuda ji xwe re hêz kom bike. Vê bi raya giştî re îlan jî kirin. Yekser Şefê Faşîst Tayîp Erdogan got "Em ê heya havîna 2024'an li Iraqê PKK'ê tine bikin." Ji bo vê ji Rusya heya Ewropa, ji Emerîka heya Irak, Îranê bi her hêzê re hevdîtin kirin. Jixwe girêdayê Swêdê, di çarçoveya bazariyên endamtiya wê ya NATO'ye de ji NATO û DYA'yê di astek de destek girtibû. Lê me fêm kir ku zêde bawerî neda vê hêz û destekê. Faşîzma AKP-MHP dît ku bi vê destekê nikare êrîşên xwe yên dagirkeriyê pêşdetir bibe. Ji bo vê çû ber piyê Iraq û Îranê. Li ser vê bingehê bi Dewleta Îranê re hevdîtin kir. Dîsa bi Iraqê re gelek hevdîtin kirin. Dîsa ji bo bikarin ji Başûr ve gerîla dorpêç bikin, ji Zaxo heya Silêmaniyê bi hêzên Iraq û Başûrê Kurdistanê re xwestin hêzeke hevbeş ava bikin û di vê xetê de bi cih bikin. Ji bo vê gelek caran bi rêveberiya Başûrê Kurdistanê re hevdîtin kirin. Herî dawî 22'yê Nîsanê Tayîp Erdogan hem çû Bexdayê hem jî Hewlêrê. Dibêjin me bi dehan peyman mohrkirine. Hema bêje ji nîv zêdetir endamên hikûmetê tevlî van hevdîtinan bûn. Rêveberiya PDK'ê bi rêûesmeke(toren) mezin li Hewlêrê Erdogan pêşwazî kir. Her cihî bi alên TC'yê xemiland. Me fêm kir ku ji hevdîtin û lihevkirinê zêdetir xwestin reklama Tayîp Erdogan bikin, têkçûna hilbijartinê bidin jibîrkirin. Qaşo bi desteka rêveberiya Kurd xwestin Tayîp Erdogan bi dinyayê bidin qebûlkirin. Niha xwestin ji li vir hin encaman bigirin. Ev tê nîqaşkirin. Bi Iraqê dane qebûlkirin ku PKK rêxistineke qedexekiriye. Bi taybetî xwestin li ser Fırat û Dîcleyê re Iraqê bê av bihêlin, bi bazariya avê Iraqê mecbûrê hin tiştan bikin. Yek ji van projeya rê ye. Lê qasî ku tê fêmkirin derveyî destek û xiyaneta PDK'ê wisa destekeke nû ya leşkerî nîn e. Yanî nekarîn hêzeke hevbeş ava bikin. Wisa tê fêm kirin ku Îran û Iraq, dîsa YNK'ê vê tam qebûl nekirine. Lê beramberê bazariya avê projeya rê qebûlkirin. Ev rê jî ji Kurdistanê derbas nabe. Bi awayekî ku Kurdistanê dorpêç bike xeta rê çêkirine. Rêber Apo qada ku vê riyê înşa dikin re got "Qada Navîn." Îhtîmaleke mezin bi hinceta em rê çêdikin wê hêza leşkerî, îstîxbarat têxin vê qadê. Bi vî awayî wê bixwazin beriya pêşketina me bigirin. Başûrê Kurdistanê ji xeta Başûr ve dorpêç bikin. Di encamê de wê bixwazin tevgera xwe ya li Iraqê zêdetir bikin.

16'ê Nîsanê li ser Mêtînayê êrîşeke dagirkeriyê pêşket. Girêdayê vê êrîşê Fermandariya Bîryargeha Navendî, dîsa HPG-BÎM agahiyên têrker didin. Dixwazin êrîşên xwe yên dagirkeriyê zedetir bikin.

Ji aliyê din ve êrîş û zextên xwe yên li ser qada civakî didomînin. Li Tirkiye û Kurdistanê kedkarên çapemeniyê girtin. 23'yê Nîsanê li dijî çapemeniya Azad bi destê Belçîka operasyon dane kirin. Esas çapemeniya AKP, êrîşkarê dide dest. Awayekî vekirî navê AKP'ê dide. Dewleta Belçîka piştî rexne û zextên pêşketin, navê Fransa da. Bi xwesteka Fransa vê êrîşê kirine. Vê êrîşê Fransa jî kiribe, yê daye kirin teqez Tirkiyeye, dîktatoriya faşîst a AKP-MHP ye. Jixwe dema Tayyîp Erdogan li Iraqê hevdîtinan dikir, Rêveberiya Belçîka avêt ser navendên Stêrk û Medya TV. Xwestin çapemeniya azad bê deng bikin ku li ser êrîşên xwe yên qirêj, nemirovî bigirin. Diyar e, wê karên qirêj bikin. Qetlîam, zext û zilmê zêdetir bikin. Ji ber vê êrîşê çapemeniyê dikin.

Jixwe ji ber encama hilbijartinê wekî rêveberiya partiyê me got " Rêveberiya Tayîp Erdogan ji bo bikare temenê desthilata xwe dirêj bike, divê şer pêş bixe." Ji ber vê Tayîp Erdogan dibêje "Ez li dijî terorê têkoşîn dikim" û li ser vê esasê ji Tirkiye û dinyayê destekê dixwaze. Ji ber vê hewil dide bi muxalefetê re li hev bike. Di vê çarçoveyê de wê li Başûr, Rojava êrîşên xwe yên dagirkeriyê zêdetir bike. Nexwe bi riyeke din Tayîp Erdogan ne dikare bibe navnîşana lihevkirinê, ne dikare mal û milkên xwe yên dizî mayînde bike ne jî dikare temenê desthilata xwe dirêj bike.

Jixwe girêdayê van êrîşan niha dixwazin bi Serokê Giştî yê CHP'ê re hevdîtin bikin. CHP jî dixwaze destekê bide. Tê fêmkirin ku wê herdu alî jî ji bo lihevkirinê di nava lêgerînê de bin. Ji bo bikarin vê jî bikin wê PKK'ê bikin hedef. Êrîşa li dijî PKK'ê ji xwe re bikin hincet. Di vê çarçoveyê de wê êrîşên dijmin bidomin. Ji ber vê yekê divê pêvajoyê şaş negirin dest. Hem rêveberiya Tayîp Erdogan ji bo bikare li ser piyan bimîne, hem jî ji gotinên "bekaya TC" tê fêmkirin ku mecbûr in li Kurdistanê şer kûr bikin. Yanî ji milêkî ve wê bixwazin pêşiya pêşketina têkoşîna azadiyê bigirin, gerîla lawaz bixin, xebatên partiyê sînordar bikin, ji aliyê din ve jî wê hewil bidin jêr navê "têkoşîna li dijî terorê" li Tirkiyeyê şovenîzmê, nîjadperestiyê, netewperestiyê pêş bixin, eniyeke dijî Kurd ava bikin.

Li herêmê jî hemû hewildanên rêveberiya faşîst a AKP-MHP ev e. Xwestin ji Îranê destekê bigirin. Lê wisa zêde encam negirtin. Herî kêm heya niha wisa diyar e. Heman tişt ji bo Iraqê jî derbasdar e. Ji aliyê din ve hewil didin şerê Xeza'yê kûrtir bikin. Yanî dîktatoriya faşîst a AKP-MHP ji bo bikare şerê Îran-Îsraîl derxe serî li hemû provokasyon û tehrîkan da. Heya ji bo vê berê DAIŞ'ê jî da Îranê. Rêveberiya Îsraîl jî heman polîtîkayê dide meşandin. Çima? Ji ber ku dixwaze li Xezayê qetlîamên xwe zêdetir bike, êrîşên dagirkeriyê kûrtir bike. Ji bo vê pêwîstiya wê bi hincetan heye. Li ser vê esasê firsend dît, li Suriyeyê li generalên Îranê xist. Ji ber vê yekê di pêvajoya derbasbû de Îran-Îsraîl di asteke de pevketin. ji ber vê Tirkiye pir kêfxweş bû. Xwestek û armanca Tirkiyeyê ev bû. Lê pratîk wisa pêşneket. Êrîşa Îranê ya li ser Îsraîlê, êrîşa Îsraîlê ya li ser Îranê wekî xwesteka Tirikiye ji bo lêdana derbên leşkerî pêşneketin, zêdetir ji bo propaganda bûn. Heya niha nekarîn Îranê bikêşin nava şereke wiha. Lê hê jî tehrîk dikin. Divê em şerê li Xezayê rast fêm bikin. Di vê mijarê de me ji roja ewil ve rewşê rast nirxand û polîtîkayeke rast şopand. Her çiqas her du alî jî xwe wekî parêzvan nîşan bidin jî şerê berjewendiyê yê di navbera Tirkiye û Îsraîlê de, rê li ber qetilkirin û sirgûnkirina gelê Xeza vekir.

Di rewşa heyî de di navbera Îsraîl û Tirkiyeyê de şerê berjewendiyê heye. Ev teqez wiha ye. Lê herdu alî jî şerê xwe yê berjewendiyê li ser xwîna gelê Xeza didin meşandin. Di vê polîtîkayê de lihevkirine. Ji ber vê yekê qasî dewleta Îsraîl, dîktatoriya faşîst a AKP-MHP jî ji şerê li Xezayê berpirsyar e. Di encamê de gelê Xeza tê qetilkirin.

Hin derdor xizmeta xeta Hamasê dikin. Bi navê çepgiriyê, bi navê sosyalîzmê pesnê siyaseta Tayîp Erdogan didin. Ti eleqeya van bi rastiyê nîn e. Li holê siyasetek wiha nîn e. Ya rast li Rojhilata Navîn şerê berjewendiyê ye. Me vê vekirî got.

DYA, hewil dide li ser bingehê tifaqa dewletên Ereb û Dewleta Îsraîlê, riyeke nû ya enerjiyê ava bike û li ser vê esasê Rojhilata Navîn jinûve dîzayn bike. Lê Dewleta TC, dîktatoriya faşîst a AKP-MHP ji ber siyaseta xwe ya dijî Kurd derveyî vê riyê hate hiştin. ji ber vê TC, niha girîngiya xwe ya li Rojhilata Navîn winda dike. Ji bo bikare vê asteng bike hewilda li ser Ermenîstanê re rê veke, ji bo vê şerê Karabax derxistin lê nebû. Berê Hemasê dan Îsraîlê, Şerê Xeza derxistin dîsa nebû. Hê jî bi Iraq û hin dewletên Ereb re dixwaze bi projeya rê, riyeke alternatîf ava bike ku bikare pergalê mecbûrê xwe bike. Şereke wiha vekirî ya berjewendiyê heye.

Rojhilata Navîna a ku sed sal berê şekil girtiye niha di pêvajoya guhertinê de ye. Pergal, Rojhilata Navîn a ku 1923'yan de bi peymana Lozanê ava kiriye êdî nikare bide meşandin, dixwaze biguherîne. Berê xwe dide qadên nû yên berjewendiyê, hewil dide pergaleke nû ya berjewendiyê biafirîne. Vê jî di rewşa heyî de Tirkiyeyê lawaz xist. Li Rojhilata Navîn girîngiya Tirkiyeyê daxist asta herî jêr. TC, vê rastiyê dibîne. Ger nekarin asteng bikin dibe ku Tirkiye ber bi parçebûnê ve jî here. Wekî ast peymana Sevr bikeve dewrê. Di ferqa vê de ne û bi tirseke mezin êrîş dikin. Ancax ne dikarin bi êrîşan encam bigirin ne jî bi riya teslîmiyetê.

Wê demê di rewşa heyî de divê vê pêşbiniyê bikin: Dibe ku dîktatoriya faşîst a AKP-MHP êrîşên xwe yên li ser Qadên Parastina Medya, Şengalê, Bakur Rojhilatê Suriyeyê zêdetir bike. Divê em ji vê re amade bin. (...) Lê ji milêkî ve divê em di nava amadekariyeke wiha de bibin, ji milêkî din ve jî xebatên xwe bidin domandin. Yanî hertim benda êrîşan nesekinin, li gorî vê amadekariyan nekin. Temam, wê ji milêkî ve sekna me wiha be, lê ji milêkî din ve jî wê amadekariyên me di asta pêngavê de bikevin pratîkê. Divê teqez nekevin nava bendewariyê. Nekevin nava parastina pasîf. Ev teqez şaş e.

Ji bo bikarin êrîşan bi berxwedanê bişkînin divê baldar bibin, li dijî êrîşan amadekariyên me hebin. Lê ji aliyê din ve divê em jî bikarin taktîk pêş bixin, bibin hêza êrîşê. Divê vê li qada siyasî, bîrdozî û leşkerî bikin. Wekî qada rêxistinbûna jin û ciwanan vê bikin. Wekî tevgera gerîla

şerê heyî ber bi metropolan ve, bajar û deştan ve bibin. Li ser vê bingehê teqez firsend nedin dijmin me dorpêç bike. Divê têkoşîna xwe ya bîrdozî, xebatên xwe yên huner-wêjeyê, propaganda-ajîtasyonê li gorî vê pêş bixin. Bi taybetî tevlîbûnê zêdetir bikin, rêxistinê mezin bikin. Yanî divê di xebatên me de tengbûn, parastina pasîf nebe, bendewarî, sekinandin nebe.

Jixwe me pêngavek da meşandin, niha jî didomînin. Me amadekariyan kir, bêku benda êrîşa dijmin bisekinin divê em bikevin tevgerê, dijmin vala derxînin, bi awayekî çalak êrîşê dijmin bikin.

Di vê çarçoveyê de berxwedaniyek heye. Divê hem sekna xwe ya berxwedêr biparêzin, bidin domandin, hem jî bikarin jîr bibin, hemleyan pêş bixin. Bo nimûne gerîlayê me li Metîna, li qadên din bi lehengane li dijî êrîşên dagirkeriyê berxwe dide. Her roj çalakiyan pêş dixe, derbên giran li dijmin dixe. Bi vê wesileyê em gerilayên HPG û YJA-Star'ê, hemû hêzên me yên şer didin meşandin slav dikin, serkeftinên wan pîroz dikin.

Ji aliyê din ve kedkarên çapemeniya azad li dijî êrîşên hevpar ên li Bakurê Kurdistan, Tirkiye û Ewropayê sekneke berxwedêr nîşandan. Helbet divê vê berxwedanê pêş bixin û bidomînin. Em berxwedana kedkarên çapemeniya azad slav dikin.

Ji aliyê din ve beramberê zextên li ser qada siyasî û êrîşên şerê taybet, berxwedana gelê Wanê, berxwedana gelê Şirnexê pir girîng û watedar bû. Di encamê de li her derê di bin pêşengtiya jin û ciwanan de çalakiyên girseyî pêşketin. Ev jî girîng û bi wate bûn. Beramberê êrîşên şerê taybet ên faşîst-qirker divê sekna welatparêziyê çawa be nîşanê herkesî da. Em van berxwedanan slav dikin.

Zindan hertim di nava berxwedanê de ne. Çalakiya greva birçîbûnê, veguherandin çalakbûneke nû. Hem çalakî pêşxistin hem jî bi berfirehkirina van çalakiyan bûn xwediyê sekneke afrîner. Ji bo bikarin berxwedanê bibandortir bikin, di nava lêgerînê de bûn. Em li ser vê bingehê berxwedana zindanê jî slav dikin.

Baş binêrin, sekna me ya berxwedana topyekûn didome. Li hemû qadan li ser bingehê Stratejiya Şerê Gel ê Şoreşgerî, berxwedana hêza me ya partî û gel awayekî bibandor didome. Divê em vê afrînertir, dewlemendtir bikin.

Yanî divê em ji aliyêkî ve êrîşên dijmin bişopînin, ji bo şikandina van êrîşan xwe bi cih bikin, di nava amadekariyan de bibin, ji aliyê din ve jî divê ji hêla bîrdozî, siyasî, leşkerî û girseyî ve pêngavê bi têkoşînên çalak pêş bixin, dewlemend û mezin bikin. Divê em hemleyan pêş bixin, têkoşer bin. Di vê mijarê de divê teqez şaş fêm kirin nebe, bendewarî, sekna pasîf nebe, derfet û firsend bêne nirxandin. Em bawer dikin wê hemû heval vê pêvajoyê wiha rast binirxînin, wê hem êrîşên dijmin bişkînin hem jî wê li her qadê di pêşxistina têkoşîna hemleyî de erk û berpirsyartiyên ku dikeve ser milên wan di pratîkê de bi serkeftî bînin cih.

**Rêhevalên Hêja!**

Vê rastiyê em hemû dizanin. Ji bo vê hemû derfetên Tirkiyeyê seferber dike, li çar aliyên dinyayê van derfetan dixe bazarê. Ji bo bikare hêzeke wiha kom bike, diçe ber piyê herkesî. Di encamê de hêzeke sînordar dest dixe. Ev rastiyek e. Lê ev hêz sînordar e.

Ji aliyê din ve ji hêla stratejîk ve, ji hêla bîrdozî ve pir lawaz e. Bi van bazariyan jî nikare ji bo xwe têkiliyên pêwîst biafirîne. Baş binêrin, Îranê ewqas tehrîk kir, hevdîtin kir, hewilda. Lê wisa destekeke negirt. Di vê mijarê de têkiliyên wan di asta berê de man. Di hevdîtinên Iraq û Başûrê Kurdistanê de, TC ji hêla aborî ve li ser bingehê zêdekirina tevgera xwe ya leşkerî hin derfetan bi dest xist. Li vir bi taybetî avê, hem jî ava Kurdistanê wekî çekekê bikaranî. Lê ji bo plansaziya xwe ya leşkerî destek negirt. Gelek hêz, partiyên siyasî, pêşengên Iraqî li dijî vê sekinîn. Zexta li ser YNK'ê jî zêde encam nade.

Esas bi wesileya vê riyê qada ku em jê re dibêjin "Qada Navîn" wê hêzên xwe zêde bikin. Ev tê fêmkirin. Dagirkeriya xwe jî da pejirandin. Em vê dizanin: Jixwe Dewleta Iraqê, li ser sînor qasî 20 kîlometre dabû Tirkiyeyê. Ev ji peymanên berê jî tê. Yek jî vê dubare dane qebûlkirin. Niha Tirkiye dixwaze vê derxîne 40 kîlometreyan.

Yek jî dixwaze rêveberiya Iraqê, bi YNK, PDK û Tirkmenan re li dijî gerîla, li dijî PKK'ê şer bike. Em texmîn nakin destekeke wiha ya leşkerî girtibe. Diyar e wê beramberê av bazirganî pêş bikeve, piştgiriya aborî bê dayîn.

Ji ber vê yekê divê em vê projeya rê baş bişopînin. Wê bixwazin bi riya vê projeyê hêz bînin herêmê. Îstîxbaratên xwe, hêzên xwe yên şerê taybet li wê xetê bi cih bikin. Tişta ku nekarîn bi hêza hevbeş bikin vê hewil bidin bi vî awayî bikin. Ji ber vê divê em jî beramberê van qadan hişyartir, hesastir tevbigerin. Pêwîst e ji bo van qadan hem tedbîrên me hebin hem jî xwediyê sekneke têkoşer, hemleker bibin. Teqez divê destûr nedin Dewleta Tirk, faşîzma AKP-MHP kontrola qada navîn têxe destê xwe. Niha ji bo me ev qad, wekî qadeke girîng a têkoşînê derketiye pêş.

Ji aliyê din ve tifaqa AKP-MHP çend meh e bangî Putîn dike lê nekarî Putîn bîne. Dîsa çend hefteye dibêjin wê Tayîp Erdogan biçe Emerîka, lê ew jî derew derket. Rêveberiya Emerîka, berdevkê Birca Spî daxuyakirin ku di plansaziya wan de tiştekî wiha nîn e. Halbûkî çapemeniya AKP'ê li ser vê ziyaretê her propagandaya Erdogan kir. Êdî ma çi negot; got "piştî çar salan şûnde cara ewil e Tayîp Erdogan daweteke taybet digire." Dîsa got "Erdogan, dubare li Emerîkayê tê qebûlkirin, hurmet dibîne." Wekî ku tê dîtin planeke wiha ya Rêveberiya Emerîkayê nîn e. Yanî tiştên dihatin gotin hemû derew û şantaj bûne. Tu dibêjî qey xwestin bi zext vê bi DYA'yê bidin pejirandin. Lê hêviyên wan şikestin. Niha wê di Tîrmehê de civîna bilind a NATO'yê çêbe. Tayîp Erdogan wê ancax li vir bikare bi Serokê DYA'yê re rûne. Halbûkî hê hefteyek beriya niha Serokwezirê Iraqê çû Emerîkayê, bi wezîrtiya DYA'yê re hevdîtin kir.

Baş binêrin wisa bandoreke Tayîp Erdogan nemaye. Serokomarê Elmanyayê hat, pêşî çû bi muxalefet re rûnişt, pişt re çû Erdogan re rûnişt. Di rewşa heyî de tenê Berzanî bi Tayîp Erdogan re hevdîtin dikin. Wan jî destpêkê her cihê bi alên TC'yê tijîkirin, piştre hevdîtin çêkirin. Berzaniyan çima Erdogan wiha pêşwazî kirin? Ji ber ku wê anîn ber piyên xwe. Tayîp Erdogan hat ber piyê Berzaniyan. Hema bêje wê piyên wan maç kiriba. Ji bo bikare temenê desthilata xwe dirêj bike ewqas mecbûrê Berzaniyan bûye. Ev pêşketineke nîn e, nîşaneya lawaz ketina Erdogan e. Em ne dikarin vê ji bo PDK'ê wekî pêşketinê bibînin ne jî ji bo Tayîp Erdogan.

Li vir tu dibêjî qey PDK hinek pêşketiye lê rastî ne wisa ye. Herkes dibîne ku her tişt bi saya PKK'ê çêdibe. Yanî marîfetekî wan nîn e. Bi dijmindariya PKK'ê prîm dikin. Rêber Apo berê ji vê re digot "Prîma Apo dixwin." Niha rewşa PDK'ê ev e. Asta xiyanetê ev e. Serokê Cîhanê! Tayîp Erdogan nekarî biçe DYA'yê, nekarî bi Putîn re hevdîtin bike, nekarî beriya muxalefetê bi Serokkomarê Elmanyayê rûne. Tayîp Erdogan xwest vê rewşê bi hevdîtinên Hewlêr û Bexdayê berovajî bike. Propagandaya xwe bi wan bide kirin, reklama xwe bike. Xwest li ser lawaziya xwe bigire. Rewş ev e. Divê em vê rastiyê bibînin. Hikûmeta heyî wisa dem dirêj nîn e, lawaz e. Ew rewş ji bo hundirê Tirkiye jî derbasdar e. Wê hem di nava AKP'ê de hem jî li Tirkiyeyê tevlihevî çêbin. Ger em bi aqilane tevbigerin, xebatên xwe yên siyasî-rêxistinî pêş bixin, şerê heyî mezintir bikin û derbên bibandor li faşîzmê bixin wê AKP parçe bibe. Bi rastî jî beramberê vê em bihêztir in.

Wekî tevger me berê hin zehmetiyan dijiya. Lê niha me wê derbaskiriye. Bi rastî jî di vê pêvajoya zivistanê de pêngava Zapê bû vebûneke nû ya taktîkî. Derbên mirinê li faşîzma AKP-MHP'ê hatin xistin. Êdî gerîla dikare di mewziyekê de, di girêkê de jî artêşa duyemîn a NATO'yê bide sekinandin, xwe gihandiye performansekê wiha. Berxwedana me ya gel, berxwedana me ya jin û ciwanan li her derê di asteke jor de ye. Ji vê jî wêdetir potansiyela me pir bi hêz e. Baş binêrin êdî di destê faşîzma AKP-MHP de tiştêk nemaye ku bikar bîne, yanî êdî xwe bi xwe dixwe. Piştî hilbijartinê Tayîp Erdogan derket got "ev ketineke nîn e." Yanî di esas de xwest bêje êdî hatiye dawiya rê. Lê ji aliyêkî din ve em hê ancax dikarin sedî sîh, sedî çilê potansiyela xwe têxin tevgerê, bikar bînin. Ger em bikarin vê potansiyelê, derxînin jortirê sedî pêncî jî em ê pir bibandor bibin. Ji bo vê divê em li ser xwe, li ser rewşa xwe bisekinin. Em dijmin jî bişopînin, taktîk û şewazê wê fêm bikin. Temam, em beramberê êrîşên dijmin amade bin lê esas divê em bizanin hêza xwe têxin tevgerê. Bikarin potansiyela xwe perwerde, rêxistin bikin, awayekî bibandor têxin pratîkê, vê hêzê nîşan bidin. Jixwe pirsgrêka me jî ev e. Di vê mijarê de bi rastî jî tengbûn, girtîbûn, îdarekirin, xwe sînordarkirin, bûrokratîzm heye. Xwe bi ya herî kêm re sînordar dihêlin, bes dibînin. Halbûkî li derdor evqas derfet û firsend hene. Ger bi qismî jî be em bikarin van derfet û firsendan bikar bînin wê pêşketinên mezin derkevin holê. Lê ji ber sedemên cuda li cihê xwe disekinin. Teng nêzîk dibin. Rûxartî(yûzeysel) heye. Hemleker, jêhatî nîn in. Di pozîsyona êrîşa taktîkî de nîn in. Pir zêde di parastinê de dimînin. Divê em teqez vê seknê derbas bikin. Bi tena serê xwe berevanî(parêzgerî) nabe tedbîr. Em hem bi tedbîr bin, hem baldar bin hem jî di êrîşê de bin. Hertim êrîşa taktîkî pêk bînin. Parastina pasîf mirin e. Derfetan dîtin lê van bikar neanîn mirin e.

Ya esas di pêvajoyeke wiha de mirov bikare vê veguherîne têkoşîn û çalakbûneke wisa ku bikarin faşîzma AKP-MHP'ê têk bibin, ji hêla siyasî û leşkerî ve 31'ê Adarê veguherînin têkçûyîna faşîzmê, pêngava azadiya kûrevî bigihînin zaferê. Divê em vê di têkoşîna bîrdozî de, di xebatên hunerî-wêjeyî û xebatên girseyî de bikin. Di rêxistinkirina gel de, di berxwedana girse de pergalên berxwedanê yên bibandortir pêş bixin. (...) Ya esas, tempo, ûslup û şêwaza Apoyî ye. Dema şoreşgerî berê xwe dide pratîkê ev dibe şêwaz, ûslup û tempo. Rêber Apo hertim wiha got. Di şêwaza Apoyî de evqas tengbûn, xwe sînordarkirin, xwe kişandina nava xwe, parêzgerî nîn e. Şêwaza Apoyî jêhatî ye, afrîner e, hemleker e, hemû derfetan dinirxîne. Teng nîn e, xwe sînordar nake.

Nabêje ev ne karê min e û bi vî awayî xwe ji erkên şoreşgerî nade paş. Şoreşgereke komple ye. Ûsluba Apoyî qezencker e, dikêşe, kar dide kirin, înşa dike, perwerde dike, rêxistin dike.Tempoya şêwazê Apoyî bilind e. Rêber Apo ji vê re got "24 saet maraton." Lê em ji vê pir dûr in. Hertim ji me re digot "Hûn nikarin wekî kûsî jî bimeşin."

Divê em bibin bezvanê maratonê, bibin bezvanê sed metreyî. Ji ber vê yekê tempoya me jî lawaz e. Em wext, firsend û derfetên xwe kêm bikartînin. Em xeta berxwedana Zapê baş binêrin. Di tûnelan de, wekî tîm çiqas derfetên hevalên me hene. Li qadên ku dijmin dorpêç kirine, bi derfetên pir kêm derbên çawa bibandor li dijmin dixin. Halbûkî li cihên din li gorî Zap û Avaşînê derfet deh qat, pêncî qat zêdetir in. Lê piraniya wan nayên bikaranîn.

Temam, em nebêjin biçûk-mezin her awa çalakî pêş bixin. Lê divê li kêleka çalakiya biçûk çalakiya mezin jî hebe ku wateya çalakiya biçûk çêbe. Şerê gel ê şoreşgerî an jî parastina rewa wekî pêşbaziya fitbolê(gogpî) tê dîtin. Ma wiha dibe? Piştre dema şerê taybet êrîşan dike radibin dibêjin "zarokên me tiryakê bikartînin, ji însaniyetê derdikevin." Ger wisa be helbet wê ji însaniyetê derkevin. Tu li vê dinyayê ancax bi têkoşînê dikarî li ser piyan bimînî. Ji ti kesê re wisa jiyaneke hazir nîn e. Bêguman ev li Kurdistanê zêdetir wisa ye, şerê man û nemanê heye. Em di bin êrîşekê qirker a bêqisûr de ne. Kurdistan ne wisa tenê hatiye dagirkirin, ne jî wisa mêtîngeriyeke klasîk heye, ji her aliyê ve bi qirkirinê re rûbirû ne. Dijmin ji bo me tine bike evqas hewil dide, ked dide, afrîner nêzîk dibe. Qet nebe em jî ji bo bikarin bijîn qasî dijmin bi hestiyar tevbigerin, têkoşîn bikin. Bila herkes tevlî têkoşînê bibe, em herkesî bikêşin têkoşînê. Di vê mijarê de lawazî hene.

Nîqaşên parastina cewherî çêdibin. Lê dema em van nîqaşan dikin, divê nava van têgînan vala nekin. Rêber Apo têgînan bikaranî, partî bikaranî. Ev di destê me de wekî mîrate nirxên pir mezin in. Lê em nava wan vala dikin, ji cewhera wan derdixin, bikaranîna têgînê wekî pêkhatina armancê digirin dest. Wisa nabe.

Parastina cewherî karê zanebûn û têgihiştinê ye. Di heman demê de karê rêxistin, çalakî û şer e. Bi navê şerê parastina cewherî rastiyeke heye. Çalakî, bi bîr û fêmkirinê, bi perwerdeyê dibe. Ger fêmkirin, zanebûn nebe wê pêşiya xwe nebîne, dibe ku her awa çetegerî pêş bikeve. Ew şaş e. Wê serkeftî nebe. Lê ev tenê di asta zanebûn û têgihiştin de bimîne, derbasê rêxistin û çalakî nebe ti qîmeta xwe nîn e. Wê tenê bibin gotinên vala. Ji ber wê divê van nîqaşên parastina cewherî rast bikin, rast fêm bikin. Yektiya çalakî, rêxistin û têgihiştinê heye. Ger yekbûna van sê xalan bê destxistin wê demê dikarin xwe bigihînin feraseteke rast a parastina cewherî. Esasa pergala me, prensîba me ya şer ev e. Em rastiya gel ê şerker li ser bingehê şerê parastina cewherî diafirînin. Em dixwazin gel bikêşin nava çalakbûn, rêxistinbûn û perwerdeyeke wisa ku bikare parastina xwe bi xwe bike. Hêzeke me ya din a parastinê nîn e. Wê herkes parastina xwe bi xwe bike. Ji bo vê jê re dibêjin parastina cewherî. Ji yekê din re nayê hiştin, hewaleyê kesên din nayê kirin. Bixwe dike. Ji ber ku rastiya azadiyê vê dixwaze. Jiyana azad jiyana bi ewle ye, jiyana parastî ye. Yek ewlehiya xwe, parastina xwe ji yekê din re bihêle, wê bibe kole, nikare azad bibe. Kî parastinê di destê xwe de bigire, parastina kî bike, dike kole. Ji ber ku ew dibe hêz. Wê demê divê pişta xwe bi hêzên wiha germ nekin. Ji bo bikarin xwe bikin xwediyê hêz, divê bîr û zanebûna parastinê, rêxistin û çalakiya wê pêş bixin. Divê li dijî êrîşên şerê taybet, li her derê şerê parastina cewherî rêxistin bikin. Divê tevgera jin û ciwanan hemû gel rêxistin bike. Yê bikare çek rake, bikare şer bike wê ewlehiya xwe bigire, parastina xwe pêş bixe, li dijî êrîşên dijmin berxwe bide, şer bike. Ji ber vê pêwîst e di nêzîkatî û şêwaz de sererastkirineke cidî bê kirin. Divê şêwaz, ûslup û tempoya Apoyî pêş bixin. Ji xapandinan, şaşitiyan xwe rizgar bikin. Ji bo bikarin derfet û firsendên heyî baş bikarbînin, amadekariyên xwe derbasê pratîkê bikin, pêwistiya me bi şêwaz, ûslup û tempoyeke wiha heye. Divê em vê tengbûnê, rûxarbûnê, nebûna hêza çareseriyê, bûrokratîzmê, xwe sînordarkirinê bi temamî derbas bikin. Divê girtî nebin. Şoreşgerek çima bisekine, çima hêz û derfetên xwe tênexe pratîkê? Rêber Apo digot "Hûn benda çi ne, hûnê derfet, firsend û zanebûnên xwe bibin goristanê." Ger nebin goristanê wê demê divê kêlî bi kêlî têxin pratîkê. Divê em hemû hêza xwe, derfetên xwe, firsendên xwe li her derê di her astê de bikar bînin.

Yek jî niha di xebatên me de pir zêde legalîze bûn heye, yanî qanûnîbûn heye. Li gelek qadan hema bêje tenê xebatên legal têne meşandin. Herî zêde jî di xebatên jin û ciwanan de wiha ye kî rol û mîsyona wan a pêşengtiyê heye. Baş e, xebatên şoreşgerî, di bin dîktatoriya faşîst de dikare xwe tenê bi xebatên qanûnî re sînordar bike? Dikarin şoreşê bi xebatên legal bikin? Bi vî awayî dîktatoriya faşîst dikare bê rûxandin? Nîzama heyî dikare bê guhertin? Bêguman ev nabin. Xwe tenê bi xebatên legal re sînordar bikî, tu yê bibî hêzeke navpergalî, halbûkî em naxwazin bikevin nava pergalê, em ji bo guhertina vê pergalê têkoşîn didin meşandin. Pêwîst e vê rewşê biguherin. Şêwaz û feraseta ku legalîteyê esas digire divê derbas bikin, li ser bingehê rêxistinbûna îlegal, serhildan û şerê parastina cewherî teqez bi ser bixin.

Di vê çarçoveyê de ji bo em bikarin di vê pêvajoyê de êrîşên dijmin bişkînin, bibin xwediyê têkoşîneke serkeftî ya demê, divê em şêwaz, ûslup û tempoya xwe sererast bikin, pêş bixin, li gorî xeta Apoyî rêxistin bikin. Em bawer dikin ku wê hemû heval di vê pêvajoyê de li ser van mijaran zedetir bisekinin, li ser vê bingehê hev perwerde bikin, bi şêwaz, ûslup û tempoya Apoyî xwe gurçûpêç bikin, li ser vê bingehê xwe nû bikin, bibin mîlîtanên demê yên ser dixe.

**Rêhevalên Hêja!**

Di şêwaz, ûslup û tempo de rastî û têrkerî di sekna hişmendî û bîrdozî de rastî û têrkeriyê dixwaze. Yanî divê têgihiştina xwe û şêwazê jiyana xwe li ser xeta azadiyê sererast bikin û pêş bixin. Rêber Apo hertim ji me re vê got: "Hûn ne di şer de, di jiyanê de winda dikin." Diyar kir ku bixwe jî bi şêwazê xwe yê jiyanê qezenc dike. Wê demê ji bo em jî bikevin xeta zaferê, bikarin wê pratîze bikin divê şêwazê jiyana me bide qezenckirin. Yanî lazim e li ser xeta azadiyê pêş bikeve. Ji ber vê divê em wan qalibên zihnî bişkînin. Bi rastî jî em qalibên xwe yên zihnî bişkînin, biavêjin. Şoreşa zîhnî hertim pêş bixin. Li ser hişmendiya(zîhniyet) Rêbertî bisekinin, hertim bixwînin, li ser bifikirin, fêm bikin. Li ser vê bingehê qalibên xwe yên zihnî bişkînin. Têkoşîneke mezin bidin meşandin. Divê ji fikirandinê, ji pêşketin û guhertina fikrî, ji afrînerî û dewlemendiya fikrî netirsin.

Ji aliyê din ve divê sekin û xeta xwe ya bîrdozî sererast bikin. Kêmasî, şaşitî hene. Di têkoşîna çînî û zayendî de lawazî hene. Li dijî pergal û hişmendiya zilamê serdest, di fêmkirin û têkoşînkirina wê de kêmasiyên me yên cidî hene. Ji ber vê yekê di fêmkirin û şêwaza jiyana xeta azadiya jin de lawaz dimînin.

Wê demê esasê têkoşîna bîrdozî Rêbertî rast fêmkirine, bi awayekî komple tevlîbûna Rêbertî ye. Di bingeh de ev jî bi rast fêmkirina têkoşîna çînî û zayendî ve, awayekî têrker bi rêveberina wê ve girêdayî ye.

Em niha di pêvajoya 1'ê Gulanê de ne. Di feraseta me ya sosyalîst de lawazî heye. Rêbertî ji bo xeta me got "Sosyalîzma Zanistî û demokratîk." Bîrdoziya modernîteya demokratîk, sosyalîzma zanistî û demokratîk e. Li vir tenê azadiya netewî nîn e. Di bingehê wê de çi heye? Azadiya jin heye. Ekolojî heye. Li ser esasê ekolojiya civakî û azadiya jin, azadiya civakî heye. Pîvanên civaka exlaqî û polîtîk ev in. Dijî zext û mêtîngeriya kapîtalîst pîvanên me yên bîrdozî, nirxên me yên exlaqî-polîtîk ji li vir tê. Lê dema Rêber Apo bi awayekî mafdar got "civak bi çînan nayê pênasekirin," gelek heval bûn xwediyê wê nêzîkatiyê ku êdî di civakên roja me ya îro de çîn nîn e, çîn ji holê rabûne, ji ber vê yekê têkoşîna çînî nemaye.

Em tevgera kîjan çînê ne? Ji navê me diyar e, em partiya karkeran in. Tevgera karker û kedkaran in. Helbet em li dijî çîna burjuvayê biçûk têkoşîn dikin. Divê li dijî tengbûn, rûxarî û sekna şemitok a burjuvayê biçûk têkoşîneke bîrdozî, têkoşîneke zîhnî bidin meşandin. Divê li dijî xiyanet û nokeriya çîna serdest têkoşîn bikin. PDK, xiyanet û nokeriyê derxistiye asta herî jor. Lê rexmê vê rewşê jî li gelek cihan ji bo yekitiya netewî bangawazî têne kirin. Di vê mijarê de hin kes me rexne dikin û em dengê xwe dernaxin. Hema bêje di mijara yekitiya netewî de wekî PDK'ê nêzîkê me dibin. Heya nokerî, xiyanet neyê mehkumkirin, azadî esas neyê girtin ma yekitiya netewî dibe? Em ê kîjan yekitiyê ava bikin? Ev hemû, mijarên wiha têkoşîna çînî dixwaze. Em ê karkertî, kedkarî çi ye baş fêm bikin, civaka polîtîk-exlaqî çî ye baş fêm bikin. Ji bo vê jî em ê li dijî ezezîtî, milkperestî, sekna şemitok, rûxarî, tengbûn, girtîbûna burjuvayê biçûk, li dijî xiyanet û nokeriya çîna serdest bi awayekî herî çalak têkoşîn bikin. Hem jî li dijî çîna serdest di asta bîrdozî-polîtîk de, li dijî êrîşên çîna burjuvayê biçûk di asta bîrdozî de em ê bi awayekî çalak têkoşîn bidin meşandin. Ger tiştek wiha pêş bixin ancax dikarin têkoşîna zayendî rast bidin meşandin. Dikarin hişmendî û pergala zilamê serdest rast fêm bikin. Ji ber ku hişmendî û pergala zilamê serdest, pergala dewlet û desthilat, çînîbûn û milkê taybet pi hev re, di heman wextî de pêşketine, hêz dane hev, hev mezin kirine. Hemû jî li ser kolekirina jinê pêşketine. Ji bo wê Rêber Apo ji bo jin got "Netewa bindest a ewil, çîna bindest a ewil, zayenda bindest a ewil." Ji ber vê yekê di têkoşîna azadiya jin de, têkoşîna zayendî jî heye, têkoşîna çînî jî heye, têkoşîna netewî jî heye.

Ji ber vê yên nekarîne jiyana milkiyeta taybet derbas bikin, yên nekarîne têkiliya milkiyeta taybet û çîna serdest bi dewlet û desthilat re bibînin, yên nekarîne têkiliya pergal û hişmendiya zilamê serdest bi dewlet û desthilat re bibînin, ne dikarin azadiya jin rast fêm bikin, ne dikarin azadiya civakî rast fêm bikin, ne jî dikarin bi awayekî rast û têrker têkoşîna çînî û zayendî bidin meşandin.

Divê em xeta azadiya jin rast

fêm bikin. Li ser vê bingehê têkoşîna zayendî rast derxînin zanebûnê. (…) Ji ber wê di van mijaran de rexneyên PAJK'ê hene. Esas nêzîkatiyên şaş ên beramberê Rêbertî, çavkaniya xwe ji hişmendî û ruhiyeta zilamê serdest digire. Ji bo ku ji têkoşîna zayendî bireve ji têkoşîna çînî jî direve. Di asta giştî de ji pergala dewlet û desthilat qut nebûyîn heye. Halbûkî qutbûn esas e. PKK, piştî derketina Rêbertî û şûnde qutbû. Ji vê jî wêdetir, dema serdema paradîgmaya dewlet û desthilat de jî, PKK ji pergala dewletperest qut bibû. Ji ber ku azadiya Kurd vê dixwest.

Niha xeta azadiyê ya paradîgmaya nû, xwe dispêre azadiya jin û ekolojiya civakî. Halbûkî feraset, zanebûna ekolojîk qet nîn e. Bi azadiya jinê re sê piyên paradîgmaya me hene. Ekolojî yek ji wan e. Piyê sêyemîn civaka demokratîk, exlaqî-polîtîk e, yanî sosyalîzm e. Lê rexmê vê rastiyê jî em wisa pir zêde qala sosyalîzmê nakin. Bi pîvanên civaka exlaqî û polîtîk re mijûl nabin. Baş binêrin, li ser wê bingehê têkoşîna me kêm e. Di astek de tevgera azadiya jin, azadiya jinê pêşxistiye. Rêbertî bi Jîneolojiyê pîvanên vê diyar kir. Kêm jî be ev di asteke de tê meşandin. Lê ekolojî qet nîn e. Ne feraset, hişmendiya ekolojî heye, ne rêxistinbûna wê, ne jî çalakiya wê.

Bi xwezayê re nebin yek, nebin dost, xwezayê rast fêm nekin, azadiya jin, civaka exlaqî-polîtîk dibe? Nabe. Wê demê heya têkoşîna rizgariya xwezayê neyê meşandin têkoşîna rizgariya çînî jî nabe, têkoşîna rizgariya zayendî jî nabe. Têkoşîna azadiya civakî jî nabe. Nîjadkujî herî zêde êrîşê xwezayê dike, êrîşê dîrokê kir, êrîşê çandê kir. Ji bo bikare van pêk bîne herî zêde êrîşê xwezayê dike. Ti cihê Kurdistanê nemaye ku nehatibe talankirin. Li Colemêrgê gel li dijî êrîşên ser xwezayê bertek raber dike, qebûl nake. Di civakê de refleksekê xwezayî heye, lê em nikarin vê rêxistin bikin. Me nekarî vê feraset û têgihiştinê pêş bixin. Ewqas dar hat tinekirin, av hat tinekirin.

Ava Kurdistanê di qirkirina Kurd de dikin mijara bazare, lê ji bo vê em nikarin tiştekê bikin. Bi riya bendavan evqas xweza hate wêrankirin. Li kêleka me nirxên çandî, dîrokî têne talankirin. Me yek ji van ji bo xwe nekire hinceta têkoşînê. Li ser vê xetê civakê perwerde û rêxistin nekir, zanebûna civakê zindî nekir. Wiha nabe. Bêguman bi vî awayî em ê nekarin rast nêzîkê paradîgmayê bibin, nekarin bibin xwediyê tevlîbûneke komple. Ger em paradîgmayê esas negirin, nikarin civakê perwerde û rêxistin bikin, nikarin civakê ji bo çalakiyê seferber bikin. Ger wisa be wê potansiyela me jiyanî û çalak nebe. Ji ber wê em ancax pir bi kêmî pratîze dibin. Rêber Apo gotibû "Hûn ancax ji sedî yek pratîze dibin." Ji sedî not zêdetir potansiyel heye. Ev ji ber sekna me ya bîrdozî-rêxistinî wiha ye. Divê em vê teqez derbas bikin.

Di bingeha her tiştî de têkoşîna bîrdozî heye. Ji bo bikarin xwe bigihînin zaferê, di qada siyaset û leşkertiyê de, dîsa li qadên din têkoşîn bimeşînin, afrîner bibin, tarz pêş bixin, destpêkê têkoşîneke rast û serkeftî ya xeta bîrdozî-rêxistinî lazim e. Ev erkê herkesî ye. Têkoşîna bîrdozî tenê erkê hin kadroyan, rêveberiyan an jî tenê erkê xebatên qada bîrdozî nîn e. Hemû kadroyên partiyê îdeolojîk in. Şêwazeke jiyanê, pîvanek, hişmendiyek heye. Ret û qebûlên xwe hene ku ji hêla Rêber Apo ve hatine diyarkirin.

Wê demê ji bo bikare tiştên red dike derbas bike, tiştên qebûl jî dike têxe jiyanê divê têkoşîn bê meşandin. Têkoşîna şoreşa kesayetî ev e. Rêber Apo ji vê re got "Şoreşa zîhnî û wijdanî." Divê em vê şoreşê pêş bixin. Em têkoşîna siyasî-leşkerî didin meşandin, gelek erk hene. Ji ber wê gotina "têkoşîna siyasî-leşkerî nayê meşandin" şaş e. Nabe tiştekê wiha bê gotin. Kî wiha bêje hê destpêkê di têkoşîna siyasî û leşkerî de binketinê qebûl kiriye. Rêber Apo got "Hûn di şêwazê jiyanê de winda dikin." Yanî dibêje ji ber ku hûn têkoşîna bîrdozî-rêxistinî nadin meşandin winda dikin.

Wê demê ji bo bikarin di şer û siyasetê de qezenc bikin, divê têkoşîna bîrdozî bidin meşandin. Çima bandora Berxwedana zindanê, Çalakiya 14'ê Tîrmehê qet kêm nabe, her diçe zêdetir dibe? Ji ber ku têkoşîn û zafereke bîrdozî ye. Girîngî û bandora têkoşîna bîrdozî tiştek e wiha ye. Ji bo ku bikarin di şêwaz, ûslup û tempo de xwe bigihînin asteke têrker, şêwaz, ûslup û tempoya Apoyî fêm bikin, têxin pratîkê, beriya her tiştî divê sekna me ya bîrdozî rast û têrker bibe. Pêwîst e têkoşîna me ya bîrdozî bibandor, têrker û serkeftî bibe. Divê hemû heval di vê pêvajoya pratîkê de vê rewşê bibînin, beriya her tiştî li ser sekna xwe ya bîrdozî bisekinin, têkoşîna bîrdozî-rêxistinî bi şêwaz û ûsluba Apoyî awayekî rast û têrker bimeşînin. Pîvana serkeftinê ev e.

Em niha li ser xeta zaferê hemle dimeşînin. Wê demê em ê vê pêngavê destpêkê di têkoşîna xeta bîrdozî-rêxistinî de bibin zaferê. Ji bo wê Pêngava Azadiya Kûrevî beriya her tiştî pêngava xwe azadkirinê ye, pêngava şoreşa kesayetî ye. Di kesayet de pêngava têkoşîna bîrdozî-rêxistinî ye. Beramberê koletiyê di kesayeta xwe de pêngava têkoşînê meşandin e. Teqez li dijî dijminê derve serkeftinê bi dest xistin, girêdayê têkoşîna bîrdozî-rêxistinî ya hundirîn e, girêdayê serkeftina xetê ye.

Em di wê baweriyê de ne ku hemû heval ji bo bikarin di vê pêvajoyê de li ser xeta zaferê bimeşin wê rastiya vê têkoşînê wiha bibînin, têkoşînê wiha komple bigirin dest û li ser vê esasê tevlî pêvajoyê bibin û biçin serkeftinê.

**Rêhevalên Hêja!**

Di Meha Şehîdên Gulana sala 2024' an de ji hêla têkoşîna me ya azadiyê ve hin mijarên girîng hebûn. Me xwest li vir careke din van bînin ziman. Me hem xwest qala hin pêşketinên nû bikin hem jî dubare jî be qala hin mijarên bingehîn bikin. Ji hêla girîngî, awartebûna pêvajoya heyî ve pêwîstiyeke wiha hebû. Di heman demê de ji ber pêngava me ya azadiya kûrevî ve jî pêwîstî bi tiştek e wiha hebû. Bêguman îlana hemle baş e, rast û pêwîst e. Lê ger pêngav neyê meşandin, di nîvî de bimîne, pratîka wê pêşnekeve, neçe encamê, neçe zaferê, wê demê hem rast nabe hem jî wê bi xwe re dejenerebûnê bîne. Wekî tevgera Apoyî, em bi ti awayî nikarin rewşeke wisa qebûl bikin. Ti heval rewşeke wisa layiqê xwe nabîne û nikare qebûl jî bike. Ji ber ku xeta Apoyî, sekna Rêbertî vê ret dike.

Wê demê ji bo nekevin nava rewşeke wisa, divê pêngava xwe ya azadiya kûrevî bibin zaferê, xwe bigihînin azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, wextê xwe, derfet û firsendên heyî baş û rast bikar bînin. Pêwîst e yek çirkeyê me, derfeta herî biçûk jî vala neçe. Divê her tiştî li cihê rast, di dema wê de arasteyê têkoşîna azadiyê bikin. Lazim e hemû hêzên me; hêza partiyê, hêza gerîla, hêza jin û ciwanan, hemû civak û dostên xwe di asta herî jor de seferber bikin. Mirovan derveyî têkoşînê negirin, bikêşin têkoşînê, di nava têkoşînê de çalaktir bikin. Rêxistinê teng nekin, mezin bikin. Divê ji ciwanan re nebêjin "herin bi karên din re mijûl bin, xwe bifikirin, bidin jiyîn!", berevajî em bikêşin têkoşîna herî germ, bikêşin qadên gerîla, şerê parastina cewherî û divê bêjin ciwanên welatparêz, ciwanên Apoyî wiha dibin. Li ser vê bingehê divê em hemû civakê bikêşin têkoşîna çalak. Xeta Apoyî ev bû. Helwesta Rêber Apo ev bû.

Baş binêrin xwûşka Rêber Apo ya nikare li ser piyan bisekine dema çû hevdîtina Rêber Apo, Rêbertî, ji bo pêkbîne gelek erk danê. Negot tu bi vê halê xwe nikarî tiştek e bikî, li cihê xwe rûne, tiştek e neke. Baş binêrin wiha nêzîk nebû. Lê piraniya me wiha nêzîk dibin. An bi nêzîkatiya xwe dikevin nava helwesteke wiha an jî hin kes vê vekirî tînin ziman. (…) Têkoşîneke evqas berfireh heye, em ê pêwîstiya wê ya kadro li ku derê bînin, biafirînin? Ger em her roj rêxistinê mezin nekin, wê demê em ê hêza şikandina dijmin çawa derxînin holê. Rêber Apo di salên notî de dema fermandariyekê eyaletê 2 roj tevlîbûn nekiriba hişyar dikir, digot "wê tevlîbûn çêbe, tu yê rapor, bîlanço bidî. Tu li wê derê çi dikî, çima tevlîbûn nîn e."

Me xwest careke din van bînin ziman. Ji ber ku em têkoşîna man û nemanê didin meşandin. Ev rewş êdî zêde wiha nameşe. Pergala Îmraliyê êdî nikare wiha bidome.

Rast e, 25 sal wiha çû lê hertim wiha naçe. Wê Rêbertî vê rewşê qebûl neke, jixwe nake jî. Em vê fêm nakin? Herî dawî Rêbertî ji birayê xwe re got "Hûn hemû sûç dikin." Ev gotin ji bo me hemû bû. Wê demê divê em xwe ji vê rewşê xilas bikin, derxînin. Ji bo wê jî di vê pêvajoyê de wisa teng, pasîf nesekinin, bê înîsîyatîf nebin, kêm kar nekin, di asta pêngavan de kar bidin meşandin. Jiyana komûnal û kolektîf zêdetir pêş bixin. Li her derê her awa têkoşînê pêş bixin. Teqez sekneke ji vê kêmtir nayê pejirandin. Xeta Rêbertî û Rastiya Şehîdan vê fermanê dide me. Meşa li ser Xeta Rêbertî û Şehîdan ji me şoreşgertiyeke wiha dixwaze.

Bi kurtî jî be me xwest careke din van mijaran bi vî awayî bînin ziman, bala hevalan bikişînin û di şertên heyî de pratîkeke şoreşgerî ya serkeftinê hemû heval derxînin holê. Li ser vê bingehê jî mijarên girîng hatin ziman. Em bawer dikin wê hemû heval li ser van lêhûrbûn bikin, bi derxistina dersên têrker şaşitiyên xwe sererast bikin û li ser vê esasê bibin milîtanên Apoyî yên xwe digihînin zaferê. Careke din 1'ê Gulana hemû hevalan pîroz dikin. Divê hemû heval li ser Xeta Rêbertî û Şehîdan xwe nû bikin, Zafera Pêngava Azadiya Kûrevî biafirînin, bibin milîtanên pêşeng a serkeftinê!

***-Bîranîna Şehîdê me yê Mezin a Destpêkê Hakî Karer û Bîranînên Hemû Şehîdên me Nemirin!***

***-Şehîdên me Hertim li Her Derê Çavkaniya Hêza me ya Herî Bingehîn in!***

***-Bimre Dîktatoriya Faşîst-Mêtînger-Qirker!***

***-Bijî Têkoşîna me ya Azadî û Demokrasiyê!***

***-Bijî Şerê me yê gel ê Şoreşgerî!***

***-Şehît Namirin!***

***-Bijî Yek Gulan!***

***-Bijî Rêber Apo!***

***1'ê Gulanê 2024***


■■■

# LI ROJHILATA NAVÎN ŞER Û ÇARESERÎ

Sabrî Ok

Statûya netewdewletên îro li Rojhilata Navîn hene beriya 100 salî hatibû avakirin. Heta xwe dispêrê beriya wê jî. Napolyon di serê Sedsala 19’an de ji bo bigihe Hindistanê seferên ji bo Misir û Moskowayê ceriband. Ev jî ji polîtîkayên li ser Rojhilata Navîn ne qut e. Jiber ku Ewropayê hertim girîngî daye Rojhilata Navîn. Ji bo berjewendiyên xwe hem girîngiyek mezin dayê, hem jî ji çanda Rojhilata Navîn tirsiya ye. Ev nirxandina Rêber Apo ji bo vegotina Rojhilata Navîn pir girîng û balkêş e. Rêber Apo got, “Êrişa herdu sedsalên dawî Napolyon da destpêkirin. Brîtanyayê pêş xist û DYE didomîne” û ev hîn jî didome. Îngiltereyê, bi awayek xwezayî polîtîkaya xwe ya ji bo Rojhilata Navîn li gorî berjewendiyên xwe ava kir. Jiber ku bidestxistina rêya Hindistanê ji bo Îngiltereyê pir girîng bû. Heman demê de çavkaniyên dewlemend ên pertolê hertim bala Îngiltereyê kişandin. Dema lewazbûna Osmaniyan û Çartiyê jî lê zêde bû Îngiltere bê ku dereng bimîne li Rojhilata Navîn projeya xwe ya netewdewletê pêk anî. Ji wê rojê heta niha li Rojhilata Navîn dijminî, nakokî û pirsgirêk kêm nebûne. Eger em bêjin Rojhilata Navîn bi avabûna netewdewletan hate jehrîkirin dê ne şaş be. Ji beriya netewdewletan pirsgirêkên Rojhilata Navîn kêm bûn. Nirxên civakî û kevneşopî hîn bihêztir bûn.

Rastiya dîrokî û şênberiya îroyî ya Rojhilata Navîn bi rêbazên çareseriyê yên modernîteya kapîtalîst, taybet jî hişmendiya netewdewletên hatine avakirin re nayê dahûrandin. Rêber Apo têkildarî binavkirina civakên Rojhilata Navîn wiha dibêje, “Her ku di dîrokê de diçî paş, ne navê wîlayetan dimîne ne jî welat. Bi Îslamê re li ser bingehê hesta aliyan ve hatine binavkirin. Dibe ku hîn rasttir, ‘Beled –ul Îslam’ (Welatê Îslamê) ku xwedî wateyekî ye, weke navê giştî dihat pejirandin û bi vî awayî binavkirin pir nedibû pirsgirêk. Perestiya welat tune bû. Hebûna perestî jêre dihat kirin tenê Xwidê bû. Ew jî wijdana hevpar a civakê bû. Bi berjeng û navên xwe têgînek diyar ava kiribû. Dibe ku ya rasttir ev bû”.



Li Rojhilata Navîn dema em diçin destpêka dîrokê sê olên mezin ên ezmanî derdikevin pêşiya me. Ev olên ku em jêre dibêjin olên Îrbrahîmî ne, Yahûdîtî, Xiristiyanî û Îslam e. Ev hersê olên mezin ên ezmanî ji Rojhilata Navîn derketine. Di cewhera hemûyan de heskirin, zanist û aştî heye. Gotina destpêkê ya Hz. Îsa “heskirin” bû. Gotina destpêkê ya Hz. Mihemed “bixwîne” bû. Hersê olên ezmanî ku hema hema cewher û taybetmendiyên wan hevpar in, çawa dibe hîn jî di nava şer de ne. Tê zanîn ku Yahûdiyan li Babilê 40 salan mişextin jiyane. Tê zanîn ku di 30 salên şerê Ewropayê de baweriya Katolîk çawa û çiqas ketibû nava desthilatê, beriya wê jî operasyona mezin a pîrhevokan çawa hat kirin. Îslam di serî de ji herdu olên ezmanî, ji gelek bawerî û olên dîrokê parzûn bû û derkete holê. Îslam bi şûrê edaletê tê nasîn. Di nava tevahî olan de olê ku xwe naspêre nîjadekî Xiristiyanî ye. Weke tevgerek a hejaran derketiye holê. Xwe dispêre Esseniyên ku bi kedkarî û hejariyê tên nasîn. Lê dema dêr nêzî desthilatê bû, Xiristiyanî hem dabeşî gelek kiras û mezheban bû, hem jî gelek tişt ji cewherê xwe winda kir. Heta li Elmanyayê Martîn Lûther, li Fransa û Îsvîçreyê Kalvînizm, piştre li Îngiltereyê jî Dêra Anglîkan bi bandor bû, bi vî awayî berdewam kir. Pevçûnên pir giran di Xiristiyaniyê de hatine jiyîn û di nava wê de gelek mezheb û şax pêş ketine. Piştî ku xwe bi Reformasyonê ji dewlet û desthilatê dûr kir, bi Ronakbûn û Ronesasê re xwe nû kir û veguherî cewherê xwe.

**Îslam her ku bi dewlet û desthilatê re nêz bû ji pîvanan dûr ket**

Yahûdîtî di destpêkê de hinek cudatir, weke olê êlekî, weke olê nîjadekî pêş ket. Pêşketina Îslamê jî hinekî cuda çêbû. Îslam pir bi lez belav bû. Di demek qasî 30 salan de bû pergalek cîhanê. Lê dewlet û desthilat nas kir, rastî erozyonê hat, di nava xwe de kete nava hesabxwestin û şeran. Di dema Emewî-Ebbasiyan de Îslam ji bo desthilatê di nava xwe de kete nava şerên hovane. Komkujiya Kerbelayê mînaka vê ya herî berbiçav e. Ji ber wê jî tişta dihat jiyîn êdî şerek mezin ê desthilatê û xirabbûn bû. Di pîvanên exlaqî de hertim mehtbûn û erozyon pêş ket. Halbûkî Hz. Mihemed gotibû, “Ez hatime exlaqê xweşik temam bikim”. Yanî ne madîyet, girîngî dida manewiyet û civakîbûnê. Îslam zû bû desthilat, zêde kete nava madiyetê, jiyana dewlemendiyê bû sedema bertekên di nava civakê de û bû sedema pêşketina aciziyan. Di wê demê de her çendî beşên bi bawer û rast ji bo vegerin asr-î saadetê deng derxistinbin jî lê bi ser neketine. Hz. Mihemed gotibû ez ji bo temamkirina exlaqê xweşik hatime, Îslamê rêzek mezin dida civakîbûn û mirovan. Îro kom û rêxistinên weke DAIŞ, Nûsra, El-Qaîde bi navê Îslamê derketine, lê tu têkiliya wan bi Îslamê re tune ye. Bêguman pêwîste em van kom û rêxistinan fêm bikin. Li holê ye ku rejîmên netewdewletan, hêzên modernîteya kapîtalîst van rêxistinên çeteyan qaşo Îslamî ne çawa ava dikin, bikar tînin û didin şerkirin. Lê ev jî girînge ku rêxistinên wiha faşîst, jirêderketî û çete bi Xiristiyaniyê yan jî Yahûdîtiyê, yan jî ol û baweriyek din dernakevin. Lê bîrdoziya Îslama ku xwe nû nake û reforme nake ji derketina van çeteyan re zemîn çêdike û têr dike. Rêber Apo dibêje, li Rojhilata Navîn li aliyekî dogmatîzmek giran heye, li aliyê din îdealîzmek hişk heye. Tiştên Rêber Apo qalê dike hinek jî ev xisûs in.

Wê demê yek ji pirsgirêkên bingehîn a Rojhilata Navîn jî nîjadperestiya ol e. Bêguman hêzên modernîteya kapîtalîst pir bi awayek bêexlaq û bêwijdan bi xala hestiyar a Rojhilata Navîn yanî Îslamê lîstine, bikar anîne. Îslama siyasî li Rojhilata Navîn piştî hilweşîna sosyalîzma pêkhatî û şerê Korfezê pêş ket. Bêguman ev ne rasthatin e. Hêzên modernîteya kapîtalîst hewl da valahiya siyasî ya çêbûye bi pêşxistina Projeya Îslama Siyasî dagire. Li aliyekî komên Îslamî yên tundrew destek dikir, argûmana Îslama siyasî pêş dixist. Tê zanîn ku Projeya Rojhilata Navîn a Mezin, AKP û Erdogan ji bo vê amede dikir. Difikirîn ku di ser AKP’ê re netewperestiya Şîa ya Îranê û netewperestiya Sûnî nerm bike, bi heman şêweyê netewperestiya laîk jî di ser AKP’ê re bixe nava pergala hegemonîk. Lê pêşketin nîşan didin ku li holê ne Projeya Rojhilata Navîn a Mezin maye, ne jî nermkirina netewperestiyê û ne jî karî bixe nava pergalê. Pir diyare ku pirsgirêka netewperestiya ol ya Rojhilata Navîn sedema bingehîn a tevahî nakokî û pevçûnan e. Gel di ser van netewperestiyan re hevdu qir dikin, dixeniqînin. Derkete holê ku weke hêzên xwediyê vê pirsgirê ne difikirîn, ev pirsgirêk bi nermkirina netewperestiya olî yan jî restorekirinê çareser nabe. Pirsgirêk bi giştî pirsgirêka demokratîkbûnê ye. Demokratîkkirina Rojhilata Navîn e. Yan jî dê hertim netewperestiya netewdewletê û ol li Rojhilata Navîn bidome, dê hertim weke amûra dewlet û desthilatê bê bikaranîn.

Nakokiya di navbera Ereb-Yahûdiyan de, jiholêrakirina nakokiyê yanî çareserkirina pirsgirêkê jî pêwîste bi vî awayî bê nirxandin. Pirsgirêka Filistînê, hîn rasttir nakokiya Ereb-Israîlê bêguman di aliyê dîrokî de weke pirsgirêkek a pergala şaristaniyê ava kiriye heta roja me ya îro didome. Hêzên modernîteya kapîtalîst jî pirsgirêkê nû dikin, giran dikin û hema bêje çareseriyê ji holê radikin. Lihevhatina Îslam û Yahûdîtiyê û çareseriya pirsgirêkê tenê bi vebijêrka xilasiya ji hişmendiya dewlet û desthilatê gengaz e. Bi israrkirina di heman hişmendiyê, hîn zêdetir hembêzkirina netewperestiya ol û nîjadî lihevkirinê bide aliyekî, weke yekane rêya çareseriyê dê tunekirina hevdû esas bigirin.

**Di netewdewletên li Ewropayê de têkoşîna gelan a demokratîk-şoreşgerî diyarker bû**

Pirsgirêka herî mezin a duyemîn a Rojhilata Navîn jî netewperestiya dewletê ye. Derketina holê ya netewperestiya olî, dema me qala pirsgirêkê û çareseriya wê ya li Ewropayê kir, di vê mijarê de Rojhilata Navîn çend sedsalan li piştî Ewropayê ye. Heman rewş di aliyê netewdewletê de jî heye. Weke tê zanîn yekemîn mînaka netewdewletê li Hollanda û Îngiltereyê derketiye holê. Ji wê zêdetir jî projeya netewdewletê di pêvajoya berxwedana li

dijî împaratoriya Ispanyayê zelal bûye û derketiye holê. Li Fransayê jî piştî ku Louîsê 16. birin giyotînê, derbasî netewdewletê bûne. Cewhera hemûyan ev e; li Ewropayê netewdewlet bi rêbazên ji jor ve bi awayek vekirî pêk nehatine, di encama têkoşînên civakî yên tunraw û berfireh de derketine holê. Ji ber ku netewdewlet bi têkoşîna şoreşgerî ya gelan hatine avakirin, di vir de têkoşîna gelan a demokrasiyê li pêş û diyarker e. Şoreşên di bin navê burjuvayê de pêk hatin, lê di cewher de têkiliya xwe bi burjuvayê ve nebû. Ev şoreş di cewherê de ji aliyê gel ve hatin pêşxistin. Burjuvaziyê tenê bi fêlbazî û zordariyê dest danî ser desthilatê.

Li Ewropayê piştî pêvajoya netewdewletê di astek mezin de temam bû, vê carî jî di navbera netewdewletan de şerên giran çêbûne. Bi şerên 6 sal, 10 salan hema bêje hevdû wêran kirine. Piştî wê ders ji van şeran derxistine, li şûna cudabûnê, şer û parçebûnê, li ser nirxên demokratîk hevparî û yekîtî ji berjewendî û pêşeroja xwe re rasttir dîtine. Di encamê de yekîtiya bi Yekîtiya Gumrikê re destpêkirî, niha bi li hevkirina di aliyê aborî, siyasî, hiqûqî û gelek aliyan de derketiye holê û îro gihiştiye Yekîtiya Ewropayê. Bi vê re êdî Ewropayê pêvajoya netewdewletbûnê derbas kiriye. Lê li gel vê hîna li Ewropayê jî dikarin qala netewperestiya netewdewletê bikin. Lê ew şerên berê yên 6 û 10 salan li ser sînor û sembolan çêbûn êdî bi dawî bûne. Ev rastiyek e. Hebûna Yekîtiya Ewropayê di vî alî de girîng e. Civak hestiyariyek mezin nîşanî têkoşîna demokrasiyê dide. Ji ber vê jî dibe ku li Ewropayê lihevkirina demokratîk pêş bikeve.

Bêguman em ji bo karekter û cewherê netewdewletên li Rojhilata Navîn baş fêm bikin van diyar dikin. Pêwîste li vir demildest ev bê diyarkirin, tu netewdewletên li Rojhilata Navîn weke yên li Ewropayê di necama şoreşan de ava nebûne. Netewdewletên destpêkê yên Rojhilata Navîn Komara Tirkiyê û Îran in. Tevahî netewdewletên din bi temamî ji aliyê pergala hegemonîk ve hatine avakirin. Weke me beriya niha jî got Îngilatereyê di vir de rolek sereke û diyarker lîstiye.

Tê zanîn ku emperyalîzma kapîtalîst qet ji istixrarê hez nake. Tevahî stratejî, berjewendiyên xwe yên polîtîk û hesabên xwe li ser hilberîna aloziyan çêdike. Hêzên hegemonîk di vê wateyê de ji istixrarê hez nakin, xwe bi aloziyan xwedî dikin û hez dikin. Polîtîkayên wan ên li Rojhilata Navîn jî li gorî vê ne. Çiwas netewdewlet, çiqas sînor û sembol ewqas pirsgirêk, nakokî û pevçûn. Wê demê netewdewletên Rojhilata Navîn ji bo li hev bixin, hevdû bixeniqînin û bêhez bikin hatine avakirin. Yan jî çima 22 dewletên Ereb ku ji heman nîjadî û heman erdnîgariyêne çêbikin. Çiqas bi şev re şer bikin û bêhez bibin dê ewqas hewceyî hêzên hegemonîk bibin, dê zêdetir bêvîn bibin. Bi vî awayî dê tevahî bi hêsantir û bê pirsgirêk bên rêvebirin, hem jî dê di beranberî hebûna wan de bibin hevkarên hemû çavkaniyên wan.

Ro di şerê Filistîn-Israîlê de jî tê dîtin ku hêzên modernîteya kapîtalîst vê çiqas baş dikin. Li ber çavane ku 22 netewdewletên Ereb çiqas bê vîn û bandor in. Dema mirov ji netewdewletên Rojhilata Navîn re bêje sîxwir dê rasttir be. Dewletên piyon in. Li hemberî ji derve çiqas bêvîn û radest bibin, di hindir de li hemberî gelê xwe ewqas hov dibin. Yekane armanca wan parastina desthilata xwe ye û ev dibe sedema domandina desthilata wan. Ji ber vê jî çiqas sîxwirî û hevkarî ji hêzên hegemon re pêwîst be bê sînor û bê kêmasî pêk tînin. Heman şêweyî li hemberî hindirê xwe jî sînor di zilm, zodarî û zextê de nas nakin. Tevahî pêwîstiyên sîxwirtiyê pêk tînin, ev kesayeta netewdewletê ye. Rêber Apo ji bo rejîma netewdewletê mînaka bax û baxvan da. Çawa ku baxvan di baxê xwe de giyayekî dijraber naxwaze, yê heyî jî ji kokê radike û xwe dike xwediyê bax, hişmendiya netewdewletê jî wiha ye. Mafê jiyanê nadin nasname û çandek cuda. Di vê mijarê de weke encam pêwîste vê diyar bikim; netewperestiya netewdewletê qasî netewperestiya olî xeternak e. Eger li Rojhilata Navîn netewperestiya olî û netewperestiya netewdewletê evqas bihêz e, wê demê çareserî çiye û li ku ye?

Rêber Apo dibêje, “Weke ku li tevahî cîhanê, li Rojhilata Navîn jî netewdewlet ne ji bo derketina ji pêxirtengiyê ne, amûrên kûrkirina pêxirtengiyê ne”. Wiha didomîne, “Li Rojhilata Navîn tevahî nîşaneyên derketina ji pêxirtengiyê, nîşan didin ku bi restorasyona netewdewletan xilasiya ji pêxirtengiyê dibetiyek pir lewaz e”. Û diçesipîne ku çareserkirina Rojhilata Navîn çareserkirina mirovayiyê ye.

**Rojhilata Navîn ji bo hêzên modernîteya kapîtalîst herêma herî stratejîk e**

Beriya niha jî me hewl da bînin ziman; Pergala niha ya Rojhilata Navîn beriya sed salî ji aliyê hêzên hegemonyaya navnetewî ve, ne bi erêkirina gelên Rojhilata Navîn hat avakirin. Taybet jî piştî hilweşîna sosyalîzma pêkhatî û şerê Korfezê, di alên 1990’an de li Rojhilata Navîn pêvajoya şerekî nû destpê kir. Bi vê re hêzên modernîteya kapîtalîst xwestin pergala siyasî ya sedsala 21’an li ser Rojhilata Navîn ava bikin. Ji bo vê jî hêzên hegemonyaya gerdûnî nakokî û têkiliyên xwe yên hundirîn li gorî vê sazûman kirin û bi hemû hêza xwe serde çûn. Hêzên hegemonîk ên gerdûnî ku DYE serê wan dikişîne, nîşanî herkesî dan dê netewdewletên weke Iraqê ku yên li dijî wan derdikevin ji çav derxistine. Ev jî bi darvekirina Seddam nîşan dan. Rêber Apo ji ber vê sedemê got, piştî bidawîbûna şerê sar, dê li Rojhilata Navîn şerê germ bigihe asta herî jor. Wê demê ya derdikeve holê ev e; şerê ku ev 20 sale li Rojhilata Navîn didome, di rastiyê de Şerê Cîhanê yê Sêyemîn e. Di vî şerî de hem hêzên hegemonîk di nava xwe de rikberiyê dikin û bi nakok in, hem jî weke mînaka rejîma Seddam bi netewdewletên li dijî wan têdikoşin re di nava şer de ne. Hem jî di esasî de ev şer di nava hêzên modernîteya kapîtalîst û modernîteya demokratîk de tê kirin. Bêguman li cihên cuda yên cîhanê jî nakokî û pevçûnên heman tên jiyîn. Lê divê bê pejirandin ku Rojhilata Navîn ji bo hêzên modernîteya kapîtalîst hîn jî herêmek stratejîk û sereke ye. Ji ber cihê xwe yê jeopolîtîk û jeostratejîk, heman demê de ji bo dewlemendiyên xwe yên madî herêmek wiha ye. Ji ber vê sedemê jî Rojhilata Navîn ji her kesê xwedî hêz û sermaye re girîng e. Ji ber vê sedemê di serî de DYE, hêzên hegemonîk ên cîhanê, Rojhilata Navîn wiha bi hêsanî û bê pirsgirêk bicih nahêlin. Yan jî dê ev ji bo DYE û hêzên din ên hegemonîk bibe binkeftinek teqez. Ne gengaze ku DYE vê erê bike û bipejirîne. Wê demê eger em bêjin ji bo li ser bingeha berjewendiyên hebûna xwe dê aloziya li Rojhilata Navîn venêrîn bikin, li Rojhilata Navîn sazûmaniyek nû ava bikin, dê ne şaş be. Her çendî DYE yê erkê pêşengiya pergalê dabe ser milê xwe, taybet jî ji bo xeta enerjî û bazirganiyê, lê di aliyê bidestxistina bazarê de pergala di nav xwe de bi nakok e. Li aliyê din li kêleka lêgerînên Çînê, rewşa Rûsyayê û rastiya Hindistanê jî heye. Wê demê hêzên hegemonîk ên navnatewî li ser Rojhilata Navîn bi hev re ketine nava hesabxwestin, rikberî û nakokiyên cidî. Lê divê bê zanîn ku hîn jî hinek netewdewlet ku di serê van de Îran tê, di netewperestiya netewdewletê de israr dike. Ev netewdewlet qasî bi netewdewletên din re bi nakok in, lê pirsgirêka wan a bingehîn bi hêzên modernîteya demokratîk re heye.

Têkilî û nakokiyên DYE, Ewropa û hêzên din ên hegemonîk bi Îranê re girîng in. Jiber ku Îran li hemberî ji nû ve avakirina Rohilata Navîn weke pirsgirêkek cidî tê dîtin. Ji ber vê sedemê Îran li hemberî DYE yê bi Rûsya û Çînê re têkiliyan çêdike û nêz dibe. Stratejiyek ku ewlehiya sînorên xwe ji derve de diparêze dide meşandin. Weke dewletek bîrdozî, li herêmê bi taybet jî netewperestiya Şîa birêxistin dike. Ji Yemenê bigire heta Iraqê, Libnan, Sûriye û heta Bahreynê bandora Îranê tê dîtin. Diyare ku heta pirsgirêka Îranê çareser nebe, pergala ku ji bo Rojhilata Navîn tê fikirîn bi hêsanî pêk nayê. Li Îranê jî gelek pirsgirêk tên jiyîn. Hem di aliyê polîtîkaya ji derve de di bin zextek mezin de ye, hem jî di hindir de bi berteka civakî ya pêş dikeve re rûbirû ye. Eger em bêjin Îran di rewşa heyî de bi du vebijêrkan re rûbirû ye dê ne şaş be. Vebijêrka yekemîn, di hindir de destpêkirina pêvajoyek cidî û berfireh a reformê ye. Di rastiyê de Îran baş dizane ev çiqas pêwîst û girîng e, nikare hîn zêdetir ji vê bireve. Lê tirsa wî heye; Îran civakeke pirçandî û pir nasname ye. Mozayîkek rast a gelan û çandan e. Dema di aliyê azadîxwazî û demokratîk de bê nirxandin, dewlemendiyek pir mezin e. Îran li şûna ku vê wiha binirxîne, ji vê ditirse. Dibêje, gelo reformeke ez çêbikim ezê çiqas bikarin venêrîn bikin û ditirse. Tişta tê dîtin ku dewleta Îranê ji bo pêşdîtinek wiha ya demokratîk û vîna wê, biryara reformekek cidî û berfireh ne xwedî biryar e. Dema wiha be vebijêrka duyemîn a li pêş Îranê jî nermkirina paradîgma û polîtîkaya niha ye. Jixwe niha hewl dide wê bike.

Diyare ku ev ji bo Îranê zehmetiyan çêdike. Eger polîtîkayek guherîn û veguherînê pêk neyîne, dizane ku nikare bi paradîgmaya heyî re zêde li ber xwe bide. Eger wiha bidome dê di hindir de muxalefeta civakî di her astê de pêş bikeve. Hêzên hegemonîk ên navnetewî dê di aliyê aborî, siyasî û leşkerî de her cûr cezayan bidin, dê zext û tundiyê zêdetir bike. Jiber ku rewşa niha tê jiyîn hinek jî ev pêvajo ye. DYE ji derveyî însyatîfê nabe alîgirê şerekî ku venêrîn neke. Niha li gel Israîlê pir zêde zextê çêdike û polîtîkaya bêhêzkirinê dişopîne. Jiber ku şerekî vekirî bi Îranê re dikare bi rihetî û rasterast veguhere şerekî Rojhilata Navîn. Şerekî wiha niha tu kes nade ber çavan. Heman rewş ji bo Îranê jî derbasdar e. Îran hîn jî şerê wekaletê dide meşandin. Ji şerekî bi însyatîf û derveyî venêrînî yê rasterast direve. Şerekî wiha naxwaze û li gorî berjewendiyên xwe nabîne. Li Rojhilata Navîn şerê ku em jêre dibêjin Şerê Cîhanê yê Sêyemîn wiha ye. Dirêjbûna vî şerî ji ber van sedeman e.

Bêguman Rojhilata Navîn weke bê Tirkiyê nirxandin dê kêm bimîne. Dewleta Tirk jî weke Îranê li ser kevneşopiya împaratoriyê hatiye avakirin û li Rojhilata Navîn netewdewleta destpêkê ye. Li hemberî Şahtiya Îranê nûnertiya Sûnîtiyê dike, heta wisa bû ku demekî Erdogan xwe weke Xelîfeyê 5’emîn ê Îslamê didît. Bêguman tam jî ji ber vê ye ku AKP û Erdogan weke projeyek a DYE’yê hatibûn amedekirin. Projeya Rojhilata Navîn a Mezîn jî berhemê vê bû. AKP’ê bi çeteyên weke DAIŞ’ê û komên çete yên ji rêderketî re

ji heddê xwe zêdetir têkilî pêş xist. Hewl da bi DAIŞ, Nûsra û El-Qaîdyê re li Rojhilata Navîn, taybet jî li Sûriyê li hemberî Kurdan bibandor bibe. "Îslama Nerm" da aliyekî, li gorî cewhera xwe tundraw bû. Bi vî awayî Projeya Rojhilata Navîn a Mezin jî berhewa bû, ji holê rabû.

### Komara Tirk li hemberî demokratîkbûna Rojhilata Navîn astenga herî mezin e

Astengiya herî mezin û cidî ya li hemberî demokratîkbûna Rojhilata Navîn teqez dewleta Tirk e. Hişmendiya Osmaniya Nû di AKP'ê de bihêz e. Polîtîkayek berfihbûnê ya ji dîrokê wan tê dişopînin. Bi Bi nêrîna Împaratiriya Osmaniyan gelên herêmê kêm dibînin, kêm dibînin. Li ser gelê Kurd polîtîkaya qirkirinê dimeşînin. Niha li Sûriyê û Iraqê (Rojava û Başûrê Kurdistanê jî di nav de" ji dagirkeriyê jî wêdetir xistiye nava axa xwe. Dewleta Tirk bi piranî li Rojhilata Navîn dewleteke ku aloziyan çêdike, li ser alozî û pirsgirêkên ku çêdike polîtîkayan dimeşîne. Li cihên ku lêgerîna çareseriyê heye ne gengaze ku dewleta Tirk bê dîtin. Lê li ku alozî û pirsgirê hebe dewleta Tirk bi şêweyekî li wir e. Di vê wateyê de astnegiya herî mezin û cidî ya li pêşiya demoratîkbûna Rojhilata Navîn dewleta Tirk e. Xwedî polîtîkayeke ku hertim pirsgirêkan çêdike ye. Ji ber wê jî teqez li dijî çareserî, istixrar, çareseriya demokratîk û aştiyê ye. Dema ev vê formûlê berovajî dikin tişta derdikeve pêşiya me ev e; Tirkiye ya ku pirsgirêka Kurd çareser bike, demokratîk bibe dê di demokratîkkirina Rojhilata Navîn de bigihe astek girîng û kartêkek mezin çêbike. Lê diyare ku rejîma AKP-MHP'ê ya faşîst li hemberî vê pir li ber xwe dide. Lê ji derveyî vê tu çareserî û vebijêrka wî tune ye; dê pirsgirêka Kurd çareser bibe û Tirkiye demokratîk bibe. Liberxwedana rejîma faşîst a AKP-MHP'ê nikare li pêşiya vê bibe asteng.

Dema ji aliyek din ve lê binêrin, herdu netewdewletên ku hema bêje bihev re hatine avakirin Îran û Tirkiye, niha pir zehmetiyan dikişînin. Dewleta Tirk jî qasî Îranê zehmetiyan dikişîne. Hem jî li gel ku endamê NATO'yê ye, êdî hêzên hegemon ên navnetewî di têkiliyên bi Tirkiyê re zehmetiyan dikişînin. Tirkiye ji gelek projeyên navnetewî yê ji bo bazirganî û enerjiyê hat vederkirin. Sedema vê vederkirinê ev e. Hîn jî ne di wê ferqêde ye ku jeopolîtîkbûna wî ne weke berê stratejîk e. Aboriya wî têk çûye, siyaseta wan xitimiye, rûmeta wan a navnetewî û giraniya wan pir derbe xwariye. Bi kurtayî tişta em dixwazin bêjin ev e; Tirkiye nikare bi rewşa xwe ya heyî di pergala nû ya dixwazin li Rojhilata Navîn pêk bînin de xwe bidomîne. Têkoşîna Azadiya Kurdistanê û hêzên Tirkiyê yên demokratîk jixwe dewleta Tirk dixin zehmetiyan. Ji ber wê jî li pêşiya Tirkiyê jî du vebijêrk hene. Rêya yekemîn rêya ku niha li ser dimeşe ye; encamên wê li holê ne. Vebijêrka duyemîn jî azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, çareseriya pirsgirêka Kurd û demokratîkbûna Tirkiyê ye. Dewleta AKP'ê niha pir li paş vê ye, diyar ku di rejîma faşîst, a totalîter a olîgarşîk de israr dike. Jixwe ji ber vê ye ku pêvajo pir awarte ye.

### Pirsgirêka Kurd pirsgirêkek a Rojhilat Navîn e, şoreşa Kurdistanê Şoreşa Rojhilata Navîn e

Wê demê pirsgirêka demokratîkbûna Rojhilata Navîn di wateyekî de jî demokratîkbûna netewdewletên destpêkê Îran û Tirkiyê re têkildar e. Dema ev wiha be demokratîkbûna herdu welatan jî bi çareserkirina pirsgirêka Kurd re têkildar e. Heman demê de rewşek berovajî jî rast e, demokratîkbûna van welatan tê wateya çareserkirina pirsgirêka Kurd. Têkilî û diyaklektîka çareseriya pirsgirêka Kurd û demokratîkbûna Rojhilata Navîn bi vî awayî nirxandin teqez rast e. Rêber Apo wiha dibêje, "Kurd dikarin rolê di avabûna şaristaniyê de lîstine, niha jî di avabûna şaristaniya demokratîk a Rojhilata Navîn de bilîzin. Teşiya Kurdan dê bizivire û Rojhilata Navîn bigihîne çaxê şaristaniya demokratîk". Di vê nirxandinê de jî tê dîtin ku şoreşa Kurdistanê, yanî çareseriya pirsgirêka Kurd ji her demê zêdetir pirsgirêka Rojhilata Navîn û şoreşa Rojhilata Navîn e.

Li Rojhilata Navîn pirsgirêkek a netewdewletên Ereb, dîsa têkiliyên Ereb-Israîlê û pirsgirêka Filistînê heye. Netewdewletên Ereb her yekî rejîmên xwe dispêrin hêzên derve ne, ji wê zêdetir hinek taybetmendiyên wan tên dîtin. Lê dema Rojhilata Navîn ji nû ve tê sazûmankirin ev rejîm weke pirsgirêkek tekûz in. Hêzên hegemonîk difikirin ka dê çawa netewdewletên Ereb veguherînin, lê dizanin ku pirsgirêk ne pirsgirêka restorasyonê ye. Ji ber wê jî neçarin pirsgirêkê weke



pirsgirêka demokratîkbûna Rojhilata Navîn bibînin. Di vê xalê de du çareseriyên alternatîf derdikevin holê. Ya yekemîn, çareseriya hêzên hegemonîk ên gerdûnî ye. Tişta dixwazin hinek reformên pir bi sînordar in. Ku hişmendiya netewdewletê ewqas hişk û paşverûye, destûrê nade guherînek evqas biçûk jî. Ji ber vê sedemê Rêber Apo dibêje, netewdewletên Rojhilata Navîn pêxirtengiyê çareser nakin, berovajî ew bi xwe pêxirtengiyê çêdikin. Pir hişk û dogmatîkin ku qet nerm nabin. Ji bo wê jî ev restorasyon, guherîn û veguherîn ji van rejîman re ne derbasdar e. Eger bibe jî dê hinek lêgerînên ji bo guherîn û çareseriyê çêbibin ku ew jî teqez nayê wateya guherîn û veguherînek rast a van rejîman. Ji bo vê jî moderrnîteya kapîtalîst li Rojhilata Navîn di wateya demokratîk de nabe çareseriyek alternatîf. Nikare bibe jî. Jiber ku afrênerê pergala heyî ew bixwe ne. Yên ku ev sedsale tevahî gel, çand û civak di bin zilma netewdewletan de qir dikin ew bixwe ne. Mînaka herî dawî di şerê navbera Israîl-Filistînê de tê dîtin. Yanî careke din tê dîtin ku çavkaniya tevahî pirsgirêkan, xirabî û êşan netewperestiya olî û netewî ye. Ku ev bi salane li serê gelê herêmê bûye bela. Eger bi hişmendiya heyî Israîl û Filistîn sed salên din jî şer bikin, teqez nagihêjin rewşek ji vê baştir û pêşdetir naçin. Jiber ku netewperestî dikuje. Ji ber ku hebûna xwe di tunekirina hevdû de dibînin, bi vê hişmendiyê tu caran çareserî ne gengaz e. Pirsgirêka demokratîkbûna Rojhilata Navîn bê guman dê bi têkoşîna demokratîk a gelan, çandan û civakan li dijî hişmendiya netewdewletê pêk bê. Paradîgmaya vê çareseriyê paradîgmaya Rêber Apo ya demokratîk, ekolojîk û azadîxwaziya jinê ye. Rêber Apo dibêje ev ji bo pirsgirêka demokratîkbûna Rojhilata Navîn derman e. Ev sed sale netewperestiya ol û netewî Rojhilata Navîn jehrî dike. Avakirina paradîgmaya Rêber Apo girîngiyek jiyanî ye. Rêber Apo dibêje netewa demokratîk ruh e û konfederalîzma demokratîk jî beden e.

Di şerê ku bi êrîşa Hemasê ya li ser Israîlê re destpêkir û bi mehane didome de bi dehhezaran mirovan jiyana xwe ji dest da. Bi sedhezaran kes birîndar bûne. Li Filistînê gelek cihên jiyana mirovan û Xeza bi erdê re bûne yek. Hemasê çima ev şer da destpêkirin û çi qezenç kir. Bi rastî jî ev pirsek girîng e. Îsraîl çima hîna di şer de israr dike? Ev jî pirsek girîng e. Diyare ku Israîl dixwaze bi awayekî tekûz vîna Hemasê bikşêne û bêçek bike. Dixwaze li ser rêyên enerjî û bazirganiyê însyatîfê bidest bixe. Niha hîn baştir tê fêmkirin ku şerê Israîl û Filistînê ji ber vê hatiye derxistin. Tişta bi rikberiya nîjadperestiya ol û netewê çêbibe tenê ev e. Li ser vê xetê, dê tu car siyaseta rageşiyê, nakokî û pevçûn xilas nebin. Derket holê ku DYE û Îran ne alîgirin ku ev şer sînorê herêmê derbas bike. Pêvajo hinekî bi vî awayî dimeşe. Raste Israîl dixwaze di asta herêmî de rasterast şerekî li dijî Îranê çêbibe. Lê DYE vê naxwaze. DYE bi vê perspektîfê nêzî pevçûn û pirsgirêkên li Iraq, Sûriye, Yemen û Libnanê dibe. Di pêvajoya jêre digotin Bihara Ereban de derket holê ku heta ev hişmendî li cem netewdewletan hebe guherînek cidî çênabe. Berovajî gelek caran pirsgirêkên girantir derketin holê. Ji ber vê ye ku di mijara Sûriyê de polîtîkayek kêrhatî nameşîne. Ji ber ku guherîna rejîma Bassê gengaz jî be, hêzek şûna wê dagire tune ye. Ji derveyî Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li kêleka rejîma Bassê çeteyên DAIŞ û El- Nûsrayê yê girêdayî dewleta Tirk hene. Hêzên navnetewî di halê hazir de çeteyên girêdayî El- Nûsra û El-Qaîdê ji bo rejîma Bassê weke alternatîf nabînin.

Bi kurtayî; bi perspektîfa moderrnîteya kapîtalîst pirsgirêkên Rojhilata Navîn çareser nabin û ne gengaze Rojhilata Navîn demokrat bibe. Di vê wateyê de êdî vebijêrka moderrnîteya kapîtalîst di astek mezin de şansê xwe yê bûyîna vebijêrkiyê winda kiriye. Her çendî aliyê demokratîk ê di cîhanê de pir kêm be jî, di nava gelan de mînakên weke federasyon, xweserî û konfederasyon hatine avakirin. Welatên weke Belçîka, Rûsya, Îsvîçre, Îtalya, DYE, YE, Iraq û gelek welatên din xwedî sergûzeştên federasyon, konfederalîzm û xweseriyê ne. Bi taybet jî mînakên federasyonan, bi xweseriyê re ceribandinên konfederasyonê çêbûne. Ev Şerê Cîhanê yê Sêyemîn ku 20 sale li Rojhilata Navîn dimeşe, hîna ne diyare dê heta kengê bimeşe, dê bi demokratîkbûna Rojhilata Navîn re biencam bibe. Pêşketina diyakletîk a dîrokê vê nîşan dide. Di Şerê Cîhanê yê Yekemîn de Rûsya heleqa herî lewaz a pergala emperyal-kapîtalîst bû. Şerê Cîhanê yê Yekemîn bi Şoreşa Cotmehê ya li Rûsyayê pêk hat bidawî bû. Li tevahî cîhanê têkoşînên rizgariya netewî destpê kirin. Piştî binketina faşîzma Şerê Cîhanê yê Duyemîn lîberalîzmê xwe birêxistin kir, bi mejiyê sermayê re Yekîtiya Ewropayê derxist holê. Şerê Cîhanê yê Sêyemîn ku li Rojhilata Navîn didome, bê guman li gorî herikîna dîrokê dê encamên wê jî hebin. Her çendî niha nediyare lê dê bidawîbûna Şerê Cîhanê yê Sêyemîn li Rojhilata Navîn bibe sedema ku gel bigihin azadî, nasname û çanda xwe. Bi bîra xwe ya cewherî û vîna xwe konfederalîzma demokratîk a pergala demokratîk ava bikin.

■■■

# PERGALA HEVSEROKATIYÊ




## Çi Ye?

## Ne Çi Ye?

**Xebat Andok**

Piştî ku Rêber Apo paradîgmaya xwe ya civaka demokratîk, ekolojîk, azadixwaziya jin pêşxist şûnve pergala hevserokatiyê anî rojevê û ji hemû rêxistinên ku ev paradîgma esas girtîn xwest ku derbasî vê pergalê bibin. Kurdên çar parçeyên Kurdistanê û yên derveyî welat ev paradîgma esas wergirtin jî, xwe bi vî şiklî rêxistin kirin. Li ser vî bingehî ketina destpêkê ya pergala hevserokatiyê, di PKK'ya ku bi Kongreya 9'emîn a PKK'ê ve ji nû ve hatî ava kirin a ku 28'ê Adarê-4'ê Nîsana 2005'an de çêbû ve pêkhat. Pergala hevserokatiyê, di qada siyaseta demokratîk a li Bakur û Tirkiyeyê de jî bi Partiya Civaka Demokratîk a ku di 9'ê Cotmeha 2005'an de hatî avakirin ve destpêkir, ji rêzê ve bi Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), Partiya Aştî û Demokrasiyê (BDP), Kongreya Demokratîk a Gelan (HDK), Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) û Partiya Herêmên Demokratîk (DBP) ve, hetanî roja me hat. Niha jî heman pergal bi DEM-Partiyê ve tê domandin. Dîsa ev pergal tenê ji aliyê partiyên siyasî û kongreyan ve esas nehat wergirtin; ji Saziyên Civaka Sivîl hetanî konfederalîzmên kedê, ji şaredariyan û hetanî komeleyan ev pergal belavî hemû qadên rêxistinkirî yên jiyanê bû. Hîna jî di gelek rêxistin û saziyan de ev pergal tê pêkanîn. Ji aliyê din ve ev pergal tenê ne li Bakur û Tirkiye jî, di parçeyên din ên Kurdistanê û derveyî welat de jî hatine pratîze kirin û hemû yekeyên civakî yên ku paradîgmaya civakî ya demokratîk-ekolojîk-azadixwaziya jin esas digire, li gorî vêya rêxistin bûne. Dema ku pergala hevserokatiyê ji aliyekê ve xwe bi vî şêweyî belav dike, ji aliyê din ve timî bûye mijara nîqaşê. Çawa ku di wekî her tiştî de navendên modernîteya kapîtalîst cewher vala dike, di vê pergalê de jî hewl didin cewherê vê pergalê vala bikin û gelek partiyên ku wekî Keskan cih dan pergala hevserokatiyê, bûne diranek esas a rêvebirina pergala kapîtalîst a kûrewî.

Wek qanûnî hevserokatiyên partiyên siyasî encax bi tekoşînek mezin a li hemberî rejîma qirker ve hatine qebûl kirin. Komara Tirk a faşîst qirker, sazî û rêxistinên ku pergala hevserokatiyê esas girtîn derqanûnî îlan dike, sûcdar dihesibîne û dike hinceta êrîşên xwe.

Dema ku teklîfa hevserokatiya Kongreya Neteweya Kurdistanê ji Barzaniyê feodal û dixwest bibe dîktator re çû, ji ber ku wê ev serokatî bi jinekê re parve kiriba, lewra ji bo xwe heqeret hesibandibû û qebûl nekiribû. Bi vî awayî çûyîna kongreya neteweyî ya ku bi şiklek zêde amadekariyên wê dihatin kirin pêknehatibû û hevserokatiya Leyla Zanaya ku pir nirx dide wê jî asteng kiribû.

Heta partiyên hewldan pergala hevserokatiyê di navbera du mêran de pêkbînin jî derketin. Di qada siyaseta demokratîk de jî jin xwedî li vê pergalê derketin û ji bo pêkanîna wê tekoşînek mezin dan, li gel nebesiyên hundir û êrîşên derve re jî di hatina hetanî îro de rolek diyarker leyîstin. Asta xwedî derketina mêran a hevserokatiyê, li gorî ya jinan hê lewaztir e, cih cih jî wekî hilbijartinên xwecihî ya Êlihê hat dîtin namzetê mêr vê rewşê vedigerîne qeyranê hem zerar dide xwe û hem jî dide nirxên mezin ên ku pêwîste nûnertiya wan bê kirin. Afirînerê paradîgmaya demokratîk, ekolojîk û azadixwaziya jin a ku pergala hevserokatiyê xwe dispêrê Rêber Apo jî, her carê daxwaz kiriye ku di pergalê de israr bê kirin û hemû astengiyên li pêşiya hevserokatiyê bên rakirin.

Bikurtasî pergala hevserokatiyê berfirehbûna xwe bi nîqaşên zêde û nêzîkatiyên cuda ve di paralelê paradîgmayê de didomîne. Bi şiklek pir vekirî ve tê dîtin ku bi pejirandina paradîgmaya demokratîk-ekolojîk-azadixwaziya jin re wê ev hê zêde belavî hemû yekeyên jiyanê bibe.

Baş e, di rastiyê de ev pergal pergalek çawaye û çi armanç dike? Rêber Apo çima vê pergalê ew qas dipejirîne û pêwîst dibîne? Ma eger birastî jî ev pergal nebe nabe? Wê jin, mêr, bi yekpare jî mirov û gel bi vê pergalê re çi qezenç bikin? Girînge ku bersivên rast ji wan pirsên ku dikare hê bên zêde kirin bên dayîn. Ji ber ku mijar ji bo ava kirina ji nû ve ya li ser bingehê jiyana azad, di girîngiya jiyanê de ye.

Girîngiya mijar, çavkaniya xwe ji rola jin a di jiyana civakî de û mêrê ku ji aliyê pergala serdest ve çiqas ji jiyanê hatiye dûrxistinê digire. Di pênase kirina jiyana civakî de û di ava kirina wê ya ji nû ve de, jin hêmanê navendî ye. Tişta bin destgirtina ku em zanista civakî ya wek xwedawenda hemû zanistan pênase dikin dispêrîn jîneolojiyê ew e; em eqlê tijî hest a jin wek mifteya çareser kirina hemû pirsgirêkan dibînîn, pergala şaristaniya demokratîk a ku bûye pergala xwezaya civakî wek pergala jin pênase dikin, ji bilî vê sosyalîzmê ne derdora çîn li derdora jin dinirxînîn, destgirtina me ya wek partiyek jin PKK'ê û dîsa tişta ku dihêle em bîrdoziya rizgariya jin ne tenê ya jin, wek bîrdoziya hemû pirsgirêkên mirovahiyê çareser dikin dibînîn; rola jin a navendî ye.

Ev hemû dibin rastiyên ku ji rejîma me ya heqîqetê derketin ku ev ne babetên welê hatin ava kirin an jî ji nedîtî ve bên dîtin in. Birastî jî yên ku dixwazin tekoşînek wekhevî-azadiyê li gorî xwezaya civakî rêvebibin, ji bilî vê dixwazin carek din xwe bigihijînin xwezaya mirov mecbûrin ku şoreşek wiha ya zîhniyetê pêkbînin. Biawayek têrker derketiye holê ku zîhniyet û siyaseta mêrê serdest îflasekê dijî û em dest ji çareser kirina pirsgirêkên heyî yên civakî berdîn, bixwe bûye afirînerên hemû pirsgirêkên civakî û her ku diçe ev pirsgirêk hê zêde kûr dibin.

Ji ber wê sedemê yên ku di lêgerîna jiyana azad de bin; pêwîste xwe ji qalibên zayendparêz ên ku zîhniyet û siyaseta mêrê serdest têkildarî jin çêkirîn rizgar bikin, lêgerînên xwe yên azadiyê bispêrin jinê û çareseriya pirsgirêkan, di eqlê tijî hest a jin de lêbigerin. Lazim e neyê ji bîr kirin ku yên vêya nekin an jî nêzîkî vêya nebin wê xwe ji xizmeta pergalê re nekarin rizgar bikin. Li gel hemû hewldanên hêza şaristaniya demokratîk jî eger vegera ji nû ve ya xwezaya civakî pêknayê, ev nîşan dide ku teqez ji aliyê şaş ve hatiye destpêkirin. Yên ku bi dewletbûyîn, desthilatdar bûyîn, serweriya çînî û zîhniyetên dişibin wê ve destpê dikin; ên ku nikarin jiyana civakî bi şiklê hevjiyana-azad ve tesewir bikin, jiyanê li ser vî bingehî jiyan nakin, bi zîhniyetek mêrparêz ve nêzîkî jinê dibin, divê di wateya teqez de bizanin ku wê nekarin xwe ji nava sînorên pergala desthilatparêz-dewletparêz rizgar bikin. Bi wan ve girêdayî yên ku heqîqeta jiyana civakî nespêrin jinê, hêza xwe ji rewşa girêdayî azadiyê ya jin negirin û xwe ji ew qas direwên mêrê serdest têkildarî jinan kirî nekarin rizgar bikin, ên ku potansiyel û afirîneriya di jinê de nebînîn ne pêkane ku serbikevin. Di vê mijarê de paşeroj û dem tijî ders û fêrker e.

Bikurtasî jiyana mirov, jiyana civakî ye û jiyana civakî jî bi navend jin e. Ev nayê wateya ku mêr bê civake yan jî civak dikare bê mêr jî bibe. Mêr jî wek

hebûn civakî ye. Civakbûyîn şert û mercê hebûna mirov e. Tişta ku tê behs kirin, jiyana civakî li derdora jin û di pêşengtiya jin de pêkhatiye. Ev, form li derdora 'dema herî dirêj' a jiyana civakî pêkhatiye. Ya ku hemû dem û mekanan de pêkhatî ev e û ev ontolojîk e. Heta dikare bêgotin ku ev pêkhatin ne tenê ji bo jinê, ji bo mêtiyê jî pêkan e. Wek piranî, di hemû zindiyan de hatiye dîtin ku yê ku hemû zindiyan perwerde dike, ji jiyanê re amade dike û jiyanê ava dike mê ye. Ji vê hêlê ve birastî pêwîste bê gotin ku xweza û jiyana girêdayî wê, hê zêde di karakterê mê de ye.

Jixwe pênaseyên wekî 'dayik ax', 'dayika bibereket' û 'jin-jîn (jiyan)' rastiyên bingehîn in ku hevşibîn nasnameya jin û jiyanê derdixînin holê. Vaye jina ku ji bo jiyana li gorî xwezaya mirov û civakê ew qas girîng û jiyanî, wek pêwîstiyek zîhniyet û siyaseta serdestiya mêr li derveyî jiyanê hatiye hiştin. Jixwe pirsgirêkên civakî jî ji aliyê pergala mêrê ku hemû nirx xesp kirin û xwe li ser qirkirina jin ava kirî ve hatine afirandin. Ji vê hêlê ve pêwendiya hemû pirsgirêkên civakî yên ku mirovahî hîna li ser disekine, bi qirkirina jin ve eleqedar in. Kengî ku jin avêtibe derveyî jiyanê, ji afirîneriya ku ji bo civakê jiyaniye hatibe dûrxistin, qada wê hatibe teng kirin şûnve jiyana mirov û civakê bi pirsgirêkên re bar bûye. Kîjan demê bi zîhniyet û polîtîkaya mêrparêz ve nêzîkî jinê bûye, di pirsgirêkên civakî de jî kûrbûn pêkhatine. Ji wî aliyê ve xwebûntiya jin, li ser bingehê xweseriya xwe û di nava jiyanê de cih girtina wê, çareseriya pirsgirêkên heyî yên civakî û ji bo pirsgirêkên nû yên civakî neyên jiyan kirin, di girîngiya jiyanê de ye. Ji ber ku çawa xwezaya jin û pergala wê ji pirsgirêkên civakî re girtîbe, eqlê tijî hest a jinê jî ji bo çareseriya pirsgirêkên heyî yên civakê re nebe nabe ye.

Dema ku em mêze dikin di roja me de şoreşger, jin, ciwan û çînên bindest jî di nav de hemû beşên civakê bi pirsgirêkên civakî yên ku pergala mêrparêz afirandî ve mijûl in. Ev derdixîne holê ku divê ji bo çareseriya pirsgirêkan ji ku derê bê despêkirin. Vaye Rêber Apo ji ber wê sedemê wek şoreşgerek ku hewl dide pirsgirêka Kurd jî di nav de pirsgirêkên heyî yên civakê çareser bike, bi derbas kirina zîhniyet û polîtîkaya mêrparêz ve û xwebûntiya jin ve destpêkir. Dîtina ew qas pêwîst û jiyanî ya pergala hevserokatiyê çavkaniya xwe ji vê derê digire.

### Di wateya teng de Hevserokatî ne parvekirinek rayeyê ye

Çarçoveya felsefîk a ku hatî diyarkirin datîne holê ku di wateya teng de pergala hevserokatiyê nikare wek parvekirina rayeyekê bê destgirtin. Her çiqas pergala hevserokatî wekhev jî be tenê wek parvekirina rayeyekê dîtin dibe nêzîkatiyek teng. Ji ber vê yekê rast nîn e. Lê mixabin di rewşa heyî de herî zêde jî wiha tê fahm kirin, aliyê wê yê parve dike hê zêde derdikeve pêş. Wek esas jî mêrê ku hemû rayeyên têkildarî jiyanê bidestxistîn, nêzîkî nîqaş kirina vê pergalê nabe û rayeya di destê xwe de bi jinekê re parve nake. Mejiyê serwer ê zilamê ku xwe kirde, jinê bireser; xwe têrker, jinê nebes dîbîne; ji ber ku timî rola 'alîkara mêr' daye jinê, lewra jinê wek wekhevê xwe nabîne. Mêrê serwer ê ku timî jinê wek kesayeta tê rêvebirin û xwe jî rêveber dîbîne û xwe timî wek kesê ku gotina dawî dibêje dibîne; bi vî awayî pergala biçîn, serwer a ku pêwîste di rastiyê de dijberiyê jê re bike dide jiyan kirin. Eşkereye ku kesên tekoşîna azadî, wekhevî, demokrasiyê didin nikarin wiha nêzîk bibin. Aliyê ku xweşbînî bê dîtin a vê zîhniyet û siyasetê tineye, li hember vê zîhniyet û siyasetê encax tekoşîn dikare bêdayîn. Ji ber ku ev mejî, pergala serwerparêz, desthilatparêz-dewletparêz diafirîne.

Ji ber vê yekê pêwîste ku bêyî bê mêze kirin ka ev li ku derê û li ser navê kî tê rêvebirin, divê li hember vêya tekoşîna azadiyê bê dayîn. Nexwe wê çareserkirina prisgirêkên civakî û ava kirina jiyanek azad a li gorî xwezaya civakî, nebe mijara gotinê. Divê encama ne girîng, ji tiştên ku hatin diyar kirin û derxistina li ser bingehê wekhev a rayeya di navbera jin û mêr de neyê derxistin. Bêguman hema di xebatekê de, di jiyana civakî de bûyîna xwedî rayeya wekhev a jin û mêr girîng e.

Lê divê neyê ji bîr kirin ku ev jî bi dayîna tekoşînek mezin a wekhevî û azadiyê ya li hember zîhniyet û mêrê serdest ve hatiye qezenç kirin. Wê demê pergala hevserokatiya ku tê behs kirin tenê wek parvekirinek rayeyê nikare bê dîtin. Ji aliyê din ve ji bo xwezaya civakî tişta hê girîngtir ew e ku pêwîste kesên xwedî raye ji bo rêvebirina civakê nayên diyar kirin. Ya ku ji xwezaya civakê re guncav, ne rêvebirina civakê ya ji aliyê kesekî/ê ve ye, berevajî civak bixwe bê rewşa ku xwe rêvebibe. Rastiya civaka exlaqî-polîtîk a ku tê wateya xwezaya civakî jî vêya pêwîst dike. Mirov wek hebûn xwediyê exlaq-polîtîkayê ye, dema ku mirov çavdêrî bike civakên herî heqîqî civakên ku xwe rêvedibin in. Li vê derê encax rewşek xwe rêvebirinê ya li ser bingehê koordînasyona kar û rol dikare bê jiyan kirin. Ji ber vê yekê her cure xebata 'rêvebirinê' ku nayê wateya xwe rêvebirinê, wek cureyek 'îdarekirin' a ku aîdê pergala dewletparêze û mirovan ji cewherê wan a exlaqî-polîtîk dûr dixîne nirxandin, hê rastir e. Ji ber vê sedemê jî divê her yekeya civakî ya ku pergala hevserokatiyê heyî; yekeya mijara gotinê yan jî li ser civakê nebe serwer, eger rayeyek hebe jî bila îradeya kolektîf a wê yekeyê bixwe be. Nexwe ne pêkane ku xwe ji xizmeta pergala desthilatparêz, dewletparêz a mêrê serdest re tê kirin bikarin rizgar bikin. Demek mesele ne ew e ku şûna serokekî heman raye ji du serokan re bê dayîn û bi her duyan re kar bê îdare kirin. Ji vî aliyê ve wek çawanî di navbera pergala hevserokatiya ku Rêber Apo behs dike û pergala hevserokatiya ku partî û rêxistinên navpergalî dikin de ferq heye. Ya wan parve kirinek rayeyê ye. Ya Rêber Apo behs dike jî tenê ne modelek rêvebirina siyasiye; jin û mêr, hevjiyana azad di her kêlî û mekanê de li ser bingehê wekhev û azadiyê ava dikin.

### Pergala hevserokatiyê pergala ava kirina ji nû ve ya jiyana azad-wekhev e

Wek esas, ev pergal modelek jiyana azad e. Rewşa hev jiyana-azad e ku xwe di pergala rêveberiyê de dide der. Pergaleke ku ji her du zayendan du kesan dike wekhev, pêwendiyên di navbera wan de li ser bingehê azad û wekhev carek din ava dike. Ji aliyê din ve ev bingehê felsefî ya ku carek din arasteyê ava kirina jiyana azad û wekhev dike, tenê bi nêzîkatiya li hemberî hev a zayendan ve nikare bê sînordar kirin. Bêguman pergaleke ku pêwîste destpêkê di navbera jin û mêr de bê ava kirin. Ango divê mêr, ji mêrtiya serdest derbikeve, dest ji nêrîna ku xwe navend, xwediyê her tiştî dibîne berde, jinê jî wek wekhevê xwe bibîne. Hewceye ku jin jî bi xwebûnê ve rola xwe ya diyarker a di jiyana wekhev de bibîne; carek din rola xwe ya serarast dike, diguherîne û ava dike bidestbixe. Beriya her tiştî jî pergaleke pêwîst û pêkan dike ku her du zayend jî vegerin cewherê xwe. Nexwe wê jiyan ne li gorî cewherê jiyanê, wê eynî şêweyê pergala mêr a desthilatdar a pênç hezar salî şaş û bizerar bê ava kirin.

Ji ber vê yekê ava kirina carek din a li ser bingehê wekhev û azad a jin-mêr û ji bo ava kirina jiyana azad, nebe nabe ye. Dema ku jiyana civakî tê ava kirin a vê şêweyê pêwendiyê pêkan dike jî pergala hevserokatiyê ye. Binêrin li vê derê behsa parve kirina raye yan jî erkek a di navbera jin û mêr de nayê kirin, behsa şêwazê jiyan û pêwendiya ku jiyan li ser bê ava kirin tê kirin. Ji bilî vê şêwazê pêwendî û jiyana ku pêwîste di navbera hemzayendan de bê ava kirin, mecbure ku wiha be. Di kîjan kêlî û yekeya jiyanê



de be bila bibe pêwîste xwe ji şêwazê pêwendî û jiyana desthilatparêz-dewletparêz rizgar bike. Nexwe wê nekare xwe ji navpergaliyê rizgar bike. Ji ber vê sedemê lazim e pêwendiyên mêr a bi mêran re, dîsa pêwendiyên jin a bi jinan re jî wekhev û azad bin. Ji vî aliyê ve hevjiyana-azad a ku pergala hevserokatiyê xwe dispêrê, tercîha yekane ya jiyana ku xwe gihandina wê tê xwestin û li gorî xwezaya civakê ye. Ji ber vê yekê mecbûre ku li gorî cewherê jiyanê bê jiyan kirin ku ev jî hev jiyana-azad e. Derveyî vê pêkan nîn e ku hemû şêweyên din ên jiyanê jin, mêr û di yekunê de jî mirovan bigihine jiyanek guncav a li gorî xwezaya wan. Ji vî aliyê ve pergala hevserokatiyê bi şêweyekê ve dikare wek modela rêveberiya hevjiyana-azad a li gorî xwezaya civakê guncav bê dîtin.

### Pergala hevserokatiyê destwerdana li ser mêrê serdest e

Pergala hevserokatî, di pergala heyî ya serdestiya mêr de di lehê jinê de ye, li dijî mêr e. Jixwe şikestina çandî ya sêyemîn a ku Rêber Apo da diyar kirin ku pêwîste pêkbê jî tam tê vê wateyê. Yanî jin destpêkê bi her du şikestinên zayendî ve ji hêz hatiye xistin, li pêy wê jî hatiye lanet kirin. Mêrê serdest ên ku ev kirîn jî, hemû pîrozî ji xwe re kirine mal û li ser bihêz xistina jin jî xwe bihêz kiriye. Vaye şikestina zayendî ya sêyemîn, tê wateya derketina ji vê rewşê ya jin û mêr û vegera wan a ji xwezaya xwe re ye. Ev jî bi xwebûna jin û derketina mêr a ji serweriyê ve pêkan dibe. Yanê ji ber pergala hevserokatiyê; qada desthilatdariya mêrê serwer ê ku bûye xweda, jin jî di nav de xwe kiriye xwediyê her tiştî teng dike, dijî mêrê serdest e; ji ber qada jiyanê ji jinê re vedike, lewra pergaleke ku di lehê jinê de ye.

Binêrin, ev mêrê serdest-di hevsengiya jina ku dixwaze azad bibe de wiha ye. Ji ber ku ev pergal armanç dike ku qada mêrê serdest teng bike û ji jina ku dixwaze azad bibe jî qad vebike. Lê ev ji bo mêrê ku di mêrtiya serdest de israr nake, tekoşîn dide ku ji zîhniyet û siyaseta serdestiya mêr rizgar bibe, tekoşîna azadî û wekheviyê dide re, tam berevajiye.

### Pergala hevserokatiyê ji bo mêrê ku dixwaze azad bibe rexnedayîne

Ji ber ku tekoşîna jin, ji bo mêrên tekoşîna wekhevî û azadiyê li dijî pergala serdestiya mêr didin dibe tekoşîna guhertin û veguhertina herî şoreşgerî, lewra tekoşîna jin hebûn û azadiyê diparêze.
Mêrê ku tekoşîna wekhevî û azadiyê dide, divê destpêkê bi zanebûna ku vê tekoşînê li dijî zêhniyeta mêrê serdest ê ku bûye afirînerê hemû pirsgirêkên civakê dide ve tevbigere û di jiyana xwe de vêya nîşan bide. Bi gotina wekhev pêwîste mêrê ku tekoşîna wekhev û azadiyê dide, xwe ji îmaja mêrê serrdest ê ku xwe di jinê de ava dike (ev caran dibe bav, caran dibe birayê mezin-biçûk, hinek deman dibe hezkirî, hinek caran jî dibe dewleta zordar) rizgar bike. Hetanî îmaja mêrê ku di zêhna jinê de hatî ava kirin û nahêle ku mêr bi jinê re pêwendiya wekhev-azad ava bike neyê kuştin, wê ava kirina jiyana azad a jin û mêr bi hev re ava dikin, nebe mijara gotinê. Rêber Apo ji ber vê sedemê behsa "Kuştina Mêr" kir. Hetanî ku ev mêrtî neyê kuştin ne pêkane ku mêr bibe xwebûn, vegere cewherê xwe û ji aliyê jina azad ve wek şirîkê jiyana wekhev û azad, bê dîtin. Ji ber ku mêrê heyî zordest e, zorba ye, egoîste, xwe ferz dike, milkiyetparêz e û ditepisîne. Mêrê ku bi vê mêrtiyê ve hatibe honandin jî, ne pêkane ku beramberî pîvanên hevjiyana-azad bê qebûl kirin, hez kirin û rêz bê girtin.

Demokratîkbûyîn, wekhevtî, dilnizmiya jiyana azad qet bêguman kuştina mêr pêwîst dike. Hetanî ku mêrtiya di xwe de nekuje, îmaja mêrê ku bi hezaran sal di serê jinê de hatî ava kirin nerûxîne, rêz û hurmet nîşanî jinê nede, jinê wek dengeya xwe nebîne, wê tê hewldana têkildarî jiyana azad encam nede. Ji ber vê yekê kengî ku mêr xwe ji mêrtiya serdest derxist, dest ji nêrîna serdestan a ku jinê dinêre berda, wê demê wê biawayek kûr fahm bike ku tekoşîna jin a hebûn û azadiyê tekoşîna wî bixwe ye jî û wê bibe neferek vê tekoşînê.

Wê ev rastî mecbûr bike ku hemû mêrên di lêgerîna wekhevî û azadiyê de destpêkê pergala hevserokatiyê, xwedî li pêşxistina pêwendiyên azad û wekhev a jin û mêr derbikevin. Lê mixabin ku nêzîkatiyên serdestiya mêr a ku bitaybet jî di pêvajoyên rêveberiyên xwecihî de li Bakur û Tirkiyeyê hatin jiyan kirin, hebûna xwe didomînin.
Li hember wan nêzîkatiyan eynî wekî me jor jî anî ziman tenê li ser bingehê derbas kirinê tekoşîn tê dayîn. Şans ji xwediyê wan ferasetan re nayê dayîn, ev cure feraset bi ti hincetê ve nayên qebûl kirin. Ji ber ku wê ev bê wateya dest ji pergalê tê berdan, dest ji hevjiyana-azad tê berdan ku ev jî tê wateya xwe radestî pergala serdest û jiyana wî dike. Ji ber vê yekê her kesê/a ku di siyaseta demokratîk de cih digire û di oxira xeyalên azadî-wekheviyê de tekoşîn dide, bitaybet jî divê mêr; bi vê zanebûnê ve tevbigerin. Wê nêzîkatiyên şaş a ji pergala hevserokatiyê re, ne girîng dîtina vê pergalê, bi refleksa mêrê serdest re pêkanîna pergala serdest û her wekî din nebe mijara wan kesên wiha tevdigerin. Berevajî, yên ku wiha tevdigerin wê îspat bikin ku di şênberiya her hevserokatiyekê de; jin û mêr di eynî wekî destpêka civakbûyînê de, wek mirovên wekhev û azad hevdu temam dikin, bihêz dikin û jiyana azad ava dikin.

### Encam

Tê zanîn ku pergala heyî ya desthilatparêz-dewletparêz pergalek serweriya mêr e. Ji ber vê yekê saziyên heyî jî ya serdestiya mêr in. Sûd dide mêr ku destpêkê li ser jin û piştre jî li ser hemû beşên din ên civakê serweriya xwe çêbike. Ji vî aliyê ve pergala desthilatparêz-dewletparêz, dijberê jin, civak û jiyanê ye. Me li jor da diyar kirin ku ev di heman demê de pêşiya texrîbatên pir mezin vedike, jiyanê çawa şaş ji ber vê yekê bizerar ava dike. Bi vê pergalê re ti pirsgirêkên civakî çareser nabin, berevajî wê tunebûyîn pêkbê. Encama ku ji zîhniyet û siyaseta mêrê serdest û di saziyên wî de derdikevin holê ev e. Ev, heqîqetek wekî rojê vekiriye.
Wê demê ji bo ji nû ve ava kirina li gorî xwezaya jiyanê û çareseriya hemû pirsgirêkên heyî yên civakî, ava kirina pergalek derveyî pergala heyî pêwîst dike. Wê demê wê ev pergala mêr biguhere. Wê saziyên dijbertiya jinê dikin a vê pergala mêr jî biguherin. Qet bêguman wê mêrê serdest ê ku ew hemû afirandin jî biguhere. Jixwe yê biguhere wê biguhere, li hember ê neguhere jî wê tekoşîna hebûn û azadiyê bê dayîn. Vaye bingeha xebatên ku jinê dixîne nava xwe yên Rêber Apo tên vê wateyê. Ji vê hêlê ve ya ku tê xwestin derketin û avakirinek pergalî ye. Hewl tê dayîn ku li hember pergala desthilatparêz-dewletparêz a mêrê serdest, rastiya civaka exlaqî-polîtîk a ku li derdora jin ava bike.
Sedema pêşxistina bîrdoziya rizgariya jin, paradîgmaya civaka demokratîk-ekolojîk-azadîxwaziya jin, pergala hevserokatiyê û ji aliyê din ve jî dahûrandina ew qas zêde ya mêrê serdest jî ev e. Tê xwestin ku zîhniyet, paradîgma û pergala jiyanê ya pergala dijber bê derbas kirin. Zîhniyetek nû, kesayeta şoreşgerî û ava kirina jiyana civakî tê pêşbînî kirin. Tiştên ku tên diyar kirin û rastiyên ku derketin holê nîşan dide ku tekoşîna Rêber Apo, Tevgera Azadiyê û Tevgera Azadiya Jin rêvedibe tekoşînek çiqas dîrokî ye. Ew hemû datînin holê ku yên dixwazin di rêya azadî û wekheviyê de tekoşîn didin û yên ku dixwazin ji wan nirxan re bibin hevkar, pêwîste çiqas hesas û hestiyar nêzîk bibin. Dema ku di vê çarçoveyê de bê mêze kirin bitaybet jî rakêşiyên bêwate yên ku di demên pêvajoyan hilbijartinê de di qada siyaseta demokratîk de hatin jiyan kirin, hela ku nêzîkatiyên serdestiya mêr ên ku jinê talî dibîne danîn holê ku çiqas bêwate, navpergalî û bizerar in. Wê demê divê pêwendiya bi zîhniyetê û girêdayî ya pirsgirêkên pêkanîna pergala hevserokatiyê ya ku di cihên cur be cur ên tekoşînê de tên pêşxistin rast bên dîtin, her hevalek jin û mêr hesab ji zîhniyet û siyaseta serdestiya mêr bixwaze û tişta ku dikeve li ser milê wan, di ava kirina hevjiyana-azad de pêk bîne.



■■■


# JIYANA ME JIYANEKE KU BI ŞEHÎDÊ XWE RE ÇÊBÛYE

Rêber APO









Jiyana me, jiyaneke ku bi şehîdê xwe re çêbûye; jiyaneke ku bi şehîd û hevalên wî/ê yên ku mayîn ên dozê re, di nava hev de çêbûye. Ew nava hev ew qas diyare ku cihêtiya kî/ê şehîd ketiye û kî/ê maye pir ne biwate ye. Ji ber ku yek ji bo yê din heye. Em şehîdên xwe temamî dixînin nava xwe û welê jiyan dikin. Ev di PKK'ê de teqez e. Ji ber vê yekê ne dema ku hevalek me şehîd dikeve dihizire ku wê bê ji bîr kirin û ne jî yê mayî dikare bêje ku biserê xwe maye. Na, di me de pêkhatina yekî di yekparetiyê de û yekparetî jî di yekî de esas e. Ya serdest ev e. Em ê ihtîmamê nîşanî vê bidîn. Xizmeta herî mezin a em li ser bîranîna şehîdan dikin ew e ku jiyana xwe bikin îfadeya şênber û berdêla azadiyê. Piştî ku em bi vî awayî bûn civatek hevalên ku bi hev re kelijîn şûnve, wê ti zehmetî nekarin me bêzar bikin.

Em wek civata hevalan li ser vê bingehê çiqas dirûst, dilsoz û hetanî dawiyê girêdayî bîn -ku welê ne- wê hedefên ku em xwe nekarîn bigihijîn û zeft nekin jî, ew qas kêm bibin û nemînin. Dema ku me erkên xwe li gorî şêweyên ku em dixwazîn bikin, wê demê mirin ji ku deverê tê bila bê nexem e. Birastî jî divê her PKK'yî bikare xwe bigihijîne vê dirûşmeyê. Eger xwe nekare bigihijîne vêya wê nekare serkeftinê bidestbixe. Eger em li hember wan zehmetiyan tam bigihijîn encamê û kesayeta vê qezenç bikin, ev tê wateya ku em gihiştîne armancê. Ji çi re dibe mal bila bibe, dema ku di bingehek pir bisînor de jî bigihije vêya, wê bibe deskeftiya herî bingehîn a ku PKK dikare bidestbixe. Em çi ji bîranînên şehîdê xwe yê dawî û çi jî ji bîranînên hemû şehîdên xwe re nirxek mezin bidîn û eger pêwîst bike carek din jiyanên wan lêkolîn bikin, bipejirînîn, mezintiya wan neqşî dil û mejiyê xwe bikin, ji bo vê jî hewldana zêde xerç bikin û em ê hewl bidin layiqê bîranînên wan bibîn. Dema ku em hîna hewl didin bîranînê şehîdê xwe yê destpêkê jiyan bikin, zehmetî dikişînîn. Şehîd dayîna me ya pêşî bi heval Heqî Karer re destpêkir, bi heval Hesen Bîndal re gihişt vê xalê.

Lê ma me çi nexist navberê? Eger em ya îro şûnve jî li ser vê esasê rêvebibîn, bêguman wê ev me bibe serkeftinek herî biwate. Me li hember şehadeta Heqî çong nedanî. Hîna jî baş tê bîra min: Ji bo berxwedanê derfetek me jî tine bû; demançeyek me jî nebû. Me nedizanî em şûna wê çi bixînîn, lê me bi baweriya xwe ve û dilsoziya samîmî ya ji bîr anînê re, ji wê destan afirand. Hem jî ne yek çend destan afirand. Me hetanî niha wiha bersiv da bîranînên hevalên xwe yên ku şehîd ketîn. Dîsa me bi dahûrandinek mezin ve bersiv da hemû windahiyên ku çavkaniya xwe ji kesayetên nebes ên di nava me de cih digirin û encamên wê. Her dahûrandin pêşiya deskeftiyên mezin vekir. Ji ber vê yekê em windahiyên ku bûne encamên nebesiyên me jî baş telafî dikin. Em wan windahiyên xwe dikarin vegerînîn çavkaniya qezancê.

■■■